*Ji Bexçê Dilan*

# JI EXLAQÊ NIMÛNEYÎ YÊ DOSÊN HEQ 2

Osman Nûri TOPBAŞ



WEŞANÊN ERQEM

بسم الله الرحمن الرحيم

Istanbul: 2016 M / 1438 H

© Weşanên Erqem 1438 H / 2016 M

Ji Bexçê Dilan

JI EXLAQÊ NIMÛNEYÎ YÊ

# DOSTÊN HEQ 2

Osman Nûrî Topbaş

| | |
|---|---|
| **Navê Resen:** | Hak Dostlarının Örnek Ahlakından 2 |
| **Nivîser:** | Osman Nûrî Topbaş |
| **Wergêr:** | Mehmet Seyhan<br>[Mela Mûhemmedê Bêrkevanî] |
| **Rastker** | Abdusselam Kartal<br>[Mela Ebdusselamê Bêcirmanî] |
| **Qordînator:** | Muhammed Davuthan Kılıç |
| **Grafiker:** | Ahmet Taha Bilgin |
| **ISBN:** | 978-9944-83-892-4 |
| **Navnîşan:** | Ikitelli Organize Sanayi Bölgesi Mah.<br>Atatürk Bulvarı, Haseyad 1. Kısım<br>No: 60/3-C Başakşehir,<br>Istanbul, Turkey |
| **Tel:** | (+90-212) 671-0700 pbx |
| **Fax:** | (+90-212) 671-0748 |
| **E-mail:** | info@islamicpublishing.org |
| **Malpera We bê:** | www.islamicpublishing.org |
| **Sertifika çapê:** | Weşanên Erqem |
| **Language:** | Kurdish |

WEŞANÊN ERQEM

*Ji Bexçê Dilan*

## JI EXLAQÊ NIMÛNEYÎ YÊ

# DOSTÊN HEQ 2

Osman Nûrî TOPBAŞ

WEŞANÊN ERQEM

# NAVEROK

**PÊŞGOTIN ........................................................................ 11**
**JI HEZRETE PÊĞEMBER RE ÎTAETA BI MEHEBBET ........ 25**
BI ÇAVÊ DILÎ YÊ HZ. EBÛBEKR.......................................... 26
MEHEBBETA JI CAN EZÎZTIR... .......................................... 28
HEKE HÛN JI XUDA HEZ DIKIN.......................................... 33
SELEWATÊN ŞERÎF.............................................................. 34
DI MEHEBBETA PÊĞEMBER DE
ZARAFETA OSMANÎYAN ...................................................... 36
**BÛNA EHLÊ QUR'ANÊ ........................................................ 43**
SEWDADARÊN WEHYÊ ........................................................ 44
QUR'AN EZÎZ E, ÎZZETÊ DIBEXŞÎNE.................................. 46
EWÊN JI XUDA NÊZÎK IN: EHLÊ QUR'ANÊ NE ................ 48
HER WEKÎ KU BI XUDA RE DIAXIVE................................ 52
MES'ÛLÎYETA ME LI HEMBERÎ QUR'ANÊ ........................ 54
**HÎÇÎTÎ / هيچ ........................................................................ 61**
KAKILA EVDÎNÎYA XALIS.................................................... 64
HER IŞ DI PIŞTÎ HÎÇÎTÎYÊ DE DESTPÊ DIKE..................... 65
BIBE HÎÇ KU TU BIBÎ TAVA TAVEROJAN... ........................ 67

DILÊN DERGEHÊ HÎÇÎTÎYÊ........................................... 71
ÎSYANA PÊŞÎNA LI HEMBERÎ HEQ: EZPERESTÎ ............... 73
**Maîyyet (معية)**
**DIGEL XUDA BÛN ........................................................................ 79**
TU BI KÊ RE BÛYÎ?............................................................. 80
TE EZ BI KÊ RE GUMAN DIKIRIM? .................................... 82
NEXWEŞÎYA JI HEMÛ NEXWEŞÎYAN ÊŞDARTIR............. 85
LI HIZÛRA YARÊ BILIND..................................................... 86
DEST DI KAR DE DIL DI YAR DE... .................................... 88
FECAETA ĞEFLETA JI HEQ................................................ 91
**ZIKRÛLLAH -1.............................................................................. 97**
DEMA ÇÎYA Û KEVIR ZIKR DIKIN... .................................. 98
KILÎLÊN/MEFTEHÊN ZIKRÊ.............................................. 101
MECLISÊN/DÎWANÊN ZIKR............................................... 105
ZIKRÛLLAH, ÇI ÎBADETEKÎ MEZIN E ............................. 107
**ZIKRÛLLAH -2............................................................................ 115**
AMELÊ JI SELTENETA DINYAYÊ BI QÎMETTIR .............. 117
EWLÎYAYÊN KU JI ZIKRÊ QUT NABIN............................ 121
JI BO ÎHMALA ZIKRÎ MAZERET NÎN E!........................... 128
**TEFEKKUR.. ............................................................................... 133**
BILA DIL LAŞGIRAN NEBIN! ............................................ 133
EM DI TEFEKKURA ÇI DE NE? ......................................... 134
KEŞ Û HEWAYA TEFEKKURA RASTÎN............................ 137
KITÊBA KAÎNATÊ BIXWÎNE! ............................................ 138
TEFEKKUR DI HEYATA ÎBADETÊ DE............................... 140
HALÊ TEFEKKURA MEZINÊ ME PÊĞEMBER.................. 141
ESL MARÎFET... .................................................................... 144
**BI NÊRÎNA ÎBRETÊ XWENDIN............................................... 149**
ESIL QELB DIXWÎNE .......................................................... 150

NEZARÊN ÎBRETÊ ........ 155
KARÎNA DÎTINA ÎBRETA DI HADÎSEYAN DE ........ 159
**ŞUKIR ........ 165**
NÎMETA KU ŞUKIRÊ LAZIM DIKE;
KARÎNA ŞUKIR-KIRINÊ ........ 166
QISMÊN ŞUKIRÊ ........ 168
NÎVÊ DÎN.. ........ 170
MİN JI HINDIKAN BIGERÎNE!.. ........ 172
EXLAQÊ ÎLAHÎ ........ 174
DI HER HALÛKARÎ DE ŞUKIR! ........ 176
NÎMETA RASTÎN.. ........ 177
WELHASIL ........ 178
**JÎYÎNA BI WECDA ÎBADETÊ ........ 183**
FÊKÎYÊN ÎBADETÊ ........ 183
JI SEHERAN FEYZ STANDIN... ........ 185
REXAWET DI ÎBADETÊ DE NÎN E! ........ 186
DELÎLA QEBÛLA ÎBADETÊ; BERDEWAMÎTÎ ........ 190
XILASÎYA JI XUSRANÊ ........ 193
**BI EXLAQÊ ÎLAHÎ EXLAQBÛN ........ 201**
XESLETÊN KU EVDÎ Bİ REBBÊ WÎ DİDİN HEZKİRİN ... 205
DILÊ XWE JI BO EXLAQÊ ÎLAHÎ BIKE AYNE ........ 208
RÊWÎTÎYA HEQ ........ 211
DOSTANÎYA HEQ ........ 213
**JÎYÎNA EXLAQÊ ÎLAHÎ -1- ........ 219**
el-MÛSEWWIR.. ........ 220
el-BARÎ.. ........ 222
er-REZZAQ ........ 223
MALÎKU'L-MULK.. ........ 226
el- MÛMÎN.. ........ 228

es-SABÛR......... 230
el-KERÎM......... 232
er- RAHMAN, er-RAHÎM......... 233
**JÎYÎNA EXLAQÊ ÎLAHÎ -2- ......... 239**
el-WEDÛD......... 239
el-EFUW......... 243
el-HELÎM......... 249
es-SETTAR ......... 252
**DILÊ XWE BI DERGEHÊ RAHMÊ KIRIN ......... 258**
MEHEBBET û ÎTAET......... 260
GIHANA/KEMALA MANEWÎ......... 261
FEZÎLET LI SER FEZÎLETÊ ......... 263
UFÛQA/ASOYA MERHEMETÊ......... 265
MÎROYÊ JÎ NEÊŞÎNE!......... 270
JI BO XATIRÊ AFERÎNERÎ!......... 271
**JI BO XATIRÊ AFERÎNERÎ MERHEMET-KIRINA LI AFERÎNDEYAN ......... 275**
JI BER GOTIYE; HEQ EW AFERAND......... 277
NEZARA RAHMÊ ......... 278
ÎLAHÎ EXLAQ ......... 282
**DI PEVREBÛNA DIGEL SALIHAN DE UFÛQA TEBERRUKÊ ......... 293**
TRANSFERA HALÎ/GUHASTINA REWŞÊ ......... 293
BI CIVAKA ZALIMAN RE NERÛNE! ......... 296
DEMA PÎVAN ZIRAV BIBIN......... 298
COŞ Û XUROŞA TEBERRUKÊ......... 300
MEHEBBET ŞERT E!......... 306
BI ĞAYE-KIRINA WASÎTEYÊ......... 307
**TEWESSUL......... 311**

WESÎLEYÊN WUSLETA HEQ ........................................ 312
WESÎLEYA ME YA JI HEMÛ WESÎLEYAN MEZINTIR..... 315
BI HURMETA DILÊN ŞIKESTÎ.. ........................................ 318
TEWESSULA BI EVDÊN SALIH........................................ 319
TEWESSUL NE ŞIRK E.. ........................................ 321
**HAZIRÎYA AXRETÊ û ZÎYARETÊN QEBRAN ........................ 327**
WEKÎ KU DI HEMÊZA MIRINÊ DE DIJÎ........................... 332
ZÎYARETÊN QEBRAN ........................................ 334
**FERHENG........................................................................ 341**

# PÊŞGOTIN

Hemd û senayên bêdawî ji Ellah Teala re bin; Ewê ku em bendeyên bêçare yên xwe meccanen, yanî digel ku me hîç ti hemberek (bedelek) nedaye jî bi lutf û kerema xwe ji "hîçbûn" û "tinebûn"ê anîne alema hebûnê, em ji navbera hemû aferîndeyan wek însan xelq kirine, em ji navbera însanan jî kirine ji ummeta Mûhemmed û bi nîmeta îman û Qur'anê jî şeref daye me.

Selat û selamên bêdawî her li ser Hezretê Mûhemmed Mûstefa bin û li ser alê mûbarekê Wî û eshabê Wî bin; Ewê ku ji bo xatirê ava rûyê wî alem hatine aferandin. Ewê ku wek rehmeke îlahî ji alemê re hatiye hinartin. Ewê ku heta tu bibêjî bes, dilê wî bi ummeta wî ve bû û ew ji bo wê reûf û rehîm bû.

Dîsa şukr ji Cenabê Heq re bin ku Wî ji me re kire nesîb, em rêze nivîsa xwe ya bi navê "**Ji Exlaqê Nimûneyî Yê Dostên Heq**" ku di Kovara Me Altinolukê de dihatin weşandin, kitêba duduyan jî temam bikin. Wekî ku di cildê yekê de jî wisan bû, di vî cildê li ber destê we de jî me hewl daye, em gellek esasên exlaqê Îslamê di ronahîya Qur'an û Sunnetê de bi mîsalên ji heyata pêğemberan, eshabê kîram, selefê salihîn û dostên Heq îfade bikin.

Bêşiwar ev nivîsên naçîzane yên me, ji gaveke mûtewazî îbaret in ku di vê rê de hatine avêtin ji bo em karibin modêla

“însanê kamil” tarîf bikin ku têde adeta şexsîyeta Îslamê xwe lê kiriye û li goşt û hestîyan pêçaye. Heke em ji mijarên meqale û gotarên xwe yên ku di vê kitêbê de cih girtine behs bikin, bi kurtî em dikarin van bibêjin:

Em ji bo **marîfet** û **ûbûdîyet**ê hatine vê alema îmtîhanê. Yanî, em ji bo vê alemê hatine şandin ji bo Cenabê Heq nas bikin û jê re evdînîyê bikin. Di vê mijarê de mezintirîn rêzanê me yê ku bi destên me bigre û rê ji me re şanî bide jî **Mezinê me Pêğember** e. Ew qistaseke fiêlî û şexsîyeteke nimûneyî ya bêemsal e. Ew mahîyeta wê evdînîya ku Rebbê me li me ferman kiriye, ji me re îzah dike.. Li ser vî esasî, rêya mehebbet û riza’ya ku diçe ser rêya Cenabê Heq “**DI ÎTAETA HZ. PÊĞEMBER A BI MEHEBBETÊ**” de derbas dibe. Çawa Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

“(Resûlê min!) **Bibêje: Heke hûn ji Xuda hez dikin li dûv min werin da ku Xuda jî ji we hez bike û gunehên we efû bike**...” [1]

Wate Cenabê Heq hezkirina ji xwe, bi şertê îtaeta ji mehebbeteke ku ji bo wî ji can jî ezîztir ve girêdaye. Lewra ew, ji hewa û hewesa xwe xeber nade. Her hal û hereketa wî; ji bo wehyê şerh û îzah e. Sîreta mûbareka wî, ji halê wî yê ku heqîqetên Qur’anê xwe di heyata wî de daye xuyakirin îbaret in ku ew ji qelbê pakê wî re hatiye nazilkirin.

Wek ummeta Mûhemmed em jî, ji bo karibin li pey şopa bi nûra wî herin û exlaqê wî ji xwe re bi exlaq bikin, em mecbûr in ku “**BIBIN JI EHLÊ QUR’ANÊ.**” Lewra bi îfadeya dêya me **Hezreta Aîşe**; *"exlaqê wî Qur’an e."*[2] Ji bo em karibin dinyaya hundurîna xwe bi wê hissîyata di tevna dilî ya wî de tezyîn bikin,

1. Alî Îmran, 3/31.
2. Mûslim, Mûsafirîn, 139.

pêşî îhtiyaca me bi terbîye û tehsîleke manewî ya di bin rûhanîyet û feyza Qur'ana Pîroz de heye.

Mezinê me, di bin şertên ji hemû şertan zortir de jî tehsîla vê li eshabê xwe talîm dikir. Ev tehsîl, ji bo ummeta xwe ya ku wê heta qiyametê were jî tewsîye kiriye. Lewra însan, bi awayekî ji hemû awayan rasttir dikare xwe di keş û hewaya Qur'anê de bibîne û dikare ji diltengîyên xwe yên maddî-manewî bibûre. Qur'ana Pîroz, ayneyeke îlahî li ber însanî digre û jê re temîn dike ku ew xwe bi wechê xwe yê eslî têde bibîne û nas bike. Lewra Qur'ana pîroz, ne kelamê beşerekî ye; lêbelê ew nameyeke hîdayetê û rêbera seadeta ebedî ye ku wî Xudayê me ew şandiye, ewê ku em aferandine û ji her kesî baştir bi xusûsîyetên me jî dizane.

Ew mûmînê ku bi dilekî semîmî û ji dilûcan bikeve keş û hewaya maneya Qur'ana Pîroz û karibe bi awayekî layiqê wê sirr û hikmetên wê tefekkur bike, berî her tiştî ewê li hemberî qudret û ezameta bê dawîya Rebbê me "**HÎÇBÛN**" û aczîyeta xwe îdrak bike. Ev şiûr û îdrak; di wî de ne ji doza hebûnê (ez heme, ez tiştek im) re, ne jî ji îddîaya xwedbînî û ezperestîyê re cih û mecalê bihêle. Bileks (berevajî vê) ewê bi hesta aczîyet û hîçbûnê adeta wî bixe wekî mûmekî ku dihele. Digel ku ew dizane ji îbadet û dûayên wî pê ve wî ti qîmetekî din[3] nîn e jî, ewê fehm bike ku ew çi qeder amelên salih bike bila bike, ev, ji bo xilasîya wî ya ebedî di hukmê "hîç"ê de ne û daîm îhtiyaca wî bi rehmet û meğfîreta Rebbê wî heye..

Rewşa evdînîyeke xalis jî bes bi vî awayî teheqquq dibe. Mesafe standin di evdînîya ji bo Heq de, yanî di piştî mirov bigihîje qiwameke dilî ya wiha de yanî di piştî mirov bigihîje rewşa "hîçbûn"ê de destpê dike. Çawa dostên Heq şexsîyetên mezin jî

3. Li Furqan, 25/77'an binêrin.

piştî bûne xwedî ji bo dilekî dergehê hîçbûnê, karîne ji bo zirweyên manewî derkevin.

Giringtirîn şertê ku mirov karibe bi awayekî layiq evdînîya ji bo Heq îdrak bike, ev e mirov zanibe; em di her an û gavê de li pêşberî kamerayên îlahî ne, Rebbê me di her an û bîstekê de me dibîne, heta ew her bi me re ye. Yanî ev e; em bi hesta “**ME‘ÎYYETÊ: BI XUDA RE BÛN**”ê dilê xwe ji hêla maneyî ve sağ û zindî bigrin û em karibin ser û saman bi hal û hereketên xwe bidin.

Ellah Teala, dide zanîn ku ew ji şahraya me jî bêhtir ji me nêzîk e.[4] Ya mûhîm, em jî ji vê heqîqetê ğafil nebin û em jî bi Ellah re bibin. Lewra ew qelbê ku bi Heq ve meşğûl nebe, batil dê wî îşğal bike. Qelbekî ku bi Ellah re be jî ji ber meşğûlîyeta wî bi karên dinyayê ve zirar jê re nayê. Lêbelê ew îbadetên bi qelbekî wilo hatibin kirin jî ku mijûlahîyên dinyayê ew ji Heq ğafil kiribe, ti xêr ji wan nayê hêvîkirin.

Ji lewma hesta ‘bi xuda re bûn’ di dilan de bi daîmî kirin elzem e. Sipehîtirîn rêya vê jî; di nav heyecan, wecd û îstiğraqê de dewamkirina li ser “**ZIKRÛLLAH**” e. Lewra ew însanê ku hîç ti zemanekî nikarîye ji îlleta nîsyan û ğefletê xilas bibe di her zeman û mekanî de îhtiyaca wî zehf pê heye ku Xuda zehf di bîra xwe bîne û bi qelbê xwe pê re bibe..

Dilê ji mehebbeta îmanê tije, ji xwe heta ew zikrê Rebbê xwe neke, hizûrê nabîne. Di nêrîna wî de zikr; bi qasî xwarin-vexwarin û teneffus-kirinê îhtiyaceke jêneger e, heta ew jê re dibe lezzeta ji hemû lezzetan mezintir. Hîç ti meşğeleyeke dinyewî û cazîbeyeke nefsanî nikare wî ji kirina zikrê Xuda asteng bike.

4. Li Qaf, 50/16’an binêrin.

Lêbelê ji bo gihiştina heqîqeta zikr, divê mirov di dilê xwe de hest bi Cenabê Heq bike, mirov îdrak bike ku her tişt ji Wî ye û mirov bedena xwe ji şubhe û heramîyan mûhafeze bike.

Yeke dîtir ji usûlên mûhîm ên ku mirov ğefletê berteref bike û qelban şîyar bike jî "**TEFEKKUR**" e. Xwe bi şertkirina bi şertên dinyewî û nefsanî; ji bo nexweşîyên qelbî dibin sebeb. Yanî ew, ji bo zeîftîya îdrakê û kuhbûna hessasîyetê dibin sebeb. Ji lewma divê mirov wan qelbên ku westîyabin û sist bûbin bi tefekkura sirr û hikmetên îlahî tedawî bike û wan îhya û candar bike. Lewra tefekkur, ji bo xeta û nîsyanên (jibîrkirinên) ku însan bi zehfî bi bêhişane bi nav wan ve tê kişkişandin, haya wî ji wan çêbibe û berê xwe bide telafîkirina wan mûhîmtirîn wesîle ye. Çawa tefekkur, kilîleke îmanê ye.

Dîsa tefekkureke meqbûla ku di keş û hewaya rûhanîyetê de tehqîq bûbe, adeta mektebeke terbîya manewî ye. Îcab dike em wek mûmîn her yek ji me bibe xwendekarekî jîr û şûmê ê mektebê û em hewl bidin ji bo para xwe ji mûhtewaya fermana celîla Xudayê xwe ya di vê ayetê de: "**Bi navê Rebbê xwe yê ku aferandiye, bixwîne!**"[5] wergirin. Lewra li kaînatê her heyber û her hadîse kitêbeke hikmetê ye, divê were xwendin were fehmkirin. Tehsîla esasî jî ev e ku; mirov hikmetên îlahî yên di her tiştî de meknûz, "**BI NEZARA ÎBADETÊ BIXWÎNE.**"

Lewra ew însanê ku karibe vê xwendinê tehqîq bike, berî her tiştî ewê îdrak bike ku ew heta bi awayekî layiqê wan ji fehmkirina tecellîyatên hikmet û sirrên bêdawî yên Rebbê xwe jî nekar û netêr e. Ewê fehm bike ku hemû zindîyên li ser rûyê erdê di nav wan endazên ku heta tu bibêjî bes hessas ên ku heyatê mûmkin dikin de adeta wek berhema mûcîzeyê dijîn.. Hîç ti aqil, mentiq, îz'an û wij-

5. Elaq, 96/1.

dana ku van fehm bike jî nikare li hemberî Ellah Teala yê ku Xaliq (aferîner) û Nazimê (rêxerê) alemê ye, nankorî û bêşermîya serhildanê bike. Bi berevajî vê, hesta "**ŞUKR**"ê ya li hemberî Rebbê wî, rûhê wî dinixumîne. Lewra ew bi nezara îbretê li kuderê meyzîne, menzara lutfeke îlahî ya cuda û dîtir dibîne. Ji xwe di esasê xwe de şukr jî, naskirina xwediyê eslî yê nîmetê ye.

Dostên Heq, li hemberî nîmetên bêjimar ên Ellah Teala bi hest û şiûra ku çi qeder şukr bikin hindik e, daîm hewl dane ku şukrê xwe her zêde bikin. Dîsa şukr ev e ku evd, di hemberî nîmetên ku ji bo wan naîl bûye de, xwe bi xwe, bi peyvên xwe û bi tevgerên xwe ji Rebbê xwe yê ku ew jê re îhsan û bexş kirine re evdînîyeke xalîsane bike. Yanî mirov tim û daîm "**BI WECDA ÎBADETÊ BIJÎ**" ye.

Lewra mislimanetî, ne rêwresmeke ji bo zemanekî diyarkirî taybet e, lêbelê heyata teqwayê ya ji bo temamê emr e. Ji lewma îcab dike ku em di mijara heyata xwe ya îbadetê de nekevin rexawetê (sistahîyê) û em bi ti awayan nîyeta xalîsane û amelan terk nekin. Divê mirov bi mûcibê vê fermana îlahî: "**Û heta yeqîn** (mirin) **were te her ji Rebbê xwe re îbadetê bike!**"[6] emrê xwe tevî di nav wecdeke bilinda îbadetê de derbas bike. Lewra meqbûlîyeta îbadetan bi qasî berdewamîya wan dibe.

Li rexê din ğayekeke dîn jî perwerdekirin û gihandina "însanê kamil" e. Însanê kamil ew kes e ku alema hundurîna xwe ji hemû tiştên menfî û neyênî temîz kiriye, xwe bi exlaqê xweş xemilandiye û xwe kiriye însanê rûh zirav, zarîf û qenc. Rêya gihiştina vê emancê jî di netîca terbîya manewî de di "**EXLAQBÛNA BI EXLAQÊ ÎLAHÎ**" re derbas dibe. Heke mûmîn, bi maneya tam ji Qur'ana Pîroz a ku fermanên îlahî beyan dike re ram bibe, ewê

6. Hicr, 15/99.

ji weswese û pêvemanên xwe yên nefsanî bibûre û adeta ewê jê re ji bo exlaqê îlahî bibe ayneyek. Ew ayneyeke wilo ye ku kî lê meyzîne, ewê li wir ne halên malûl ên bi zeîftîyên nefsanî, lêbelê ewê têde tecellîyatên navên cemalî yên Heq, temaşe bike.

Di tesewwifê de meqseda terbîya manewî, yanî hedefa tezkîye û tesfîyê jî ev e ku mirov karibe alema hundurîna xwe ji arzûyên nefsanî û xuyên suflî temîz bike û xwe bixe rewşeke ji bo tecellîyatên Heq amade.

Dostanî û mehebbet serkehnîya wan mûşterekîyet e. Heke mirov karibe dilê xwe ji bo herka esma û navên cemalî bike cok, ev sipehîtirîn mûşterekîyet e ku ji bo dostanî û mehebbeta Xuda dibe wesîle. Ji vê hêlê ve her hal û hereketa mûmînê ku ji Xuda hez dike û dostanîya bi wî re arzû dike, divê şopekê ji sifet û navên cemalî yên Wî di xwe de hilgire.

Çawa tê zanîn Ellah Teala, ji her tiştî mûsteğnî ye. Hîç tiştekî sipehî û bi qîmet nîn e ku di xezînên bêdawîn ên Wî de nebin. Bi vê bi sebebê em wek evd, meqbûltirîn dîyarî û hedîyeya ku em karibin ji Rebbê xwe re teqdîm bikin ev e; em xwe ji qirêjên masîwa paqij bikin, em xwe bikin xwedî ayneya dilekî mûcella, mûseffa û pak ê ku ji bo tecellîyatên exlaqê îlahî makes (xuyageh) e.. Yanî ew qelbekî selîm e ku dema Rebbê me lê nezar bike, têde sefetên cemalî yên xwe bibîne û jê razî bibe.

Bi vê sebebê em wek mûmîn, divê bi awayê “**JÎYÎNA EXLAQÊ ÎLAHÎ**” li ser erdê ji Xuda re bibin şahid û em di bizav û hereketên xwe de nezaket, zarafet û rûkenîya Îslamê raêxin ber çavan. Divê em di her firsendê de îsbat bikin ku em evdên Rehman in û em ummeta Pêğemberê Rehmê ne û divê em hewl bidin ku em dilên xwe ji bo hemû mexlûqatan bikin dergehê rehmê. Lewra “**DILÊ XWE JI BO REHMÊ XISTIN DERGEH**” sipehîtirîn

wesîle ye ku mirov bigihîje mehebbet û dostanîya Ellahê Rehman û Rehîm.

Çawa dostên Heq, şexsîyetên wisan bilind in ku bi qiwama dilekî hessas û tenik gihane, ew bi îzdîrabên dîgeran mûzderib û bi hizûra wan jî hizûrmend dibin. Ew mirovên bextiyar in, fehm kirine ku xilasîya wan di karkirina ji bo xilasîya dîgeran de derbas dibe. Ji bo vê têgihiştina wan e ku "**JI BER XALIQ BI NÊRÎNA REHMÊ MEYZANDINA LI MEXLÛQATAN**" ji wan re adeta bûye elametê farîqe û tebîetê eslîye. Ji bo rojê çawa germ nebûn ne mûmkin be, aynî wilo ji bo mûmînên salih jî li hemberî jan û îzdîrabên mexlûqatan bêhest bûn, pê neêşîn û merhemet nekirin ne mûmkin e. Lewra alema dilî ya wan ya ku ji mehebbeta Xuda tije ye; bi pişkdarbûna di jan û çîleya mûzderiban de kûr bûye, bi gerîna li hawîrdora şîn û matemên wan gihane emalê, bi revîn û çûna bi hewara hewcedaran ve wijdana wan bi hizûrê bilind bûye, bi seadeta karîna dewrkirina îmkanên di dest xwe de ji bo mirovên ji xwe hewcedartir gihane zengînîya rastî..

Ji bo tehsîlkirina van û fezîletên wekî van bi awayê sipehîtirîn jî lazim dike ku em bi qelbê xwe bi mûmînên salih re bibin. Lewra însan heyberek e ku ji tesîrê re vekirî ye û bivê-nevê ew ji keyfîyeta mirovên ku bi wan re dibe mûsbet yan jî menfî para xwe ji wan her werdigre. Çawa ew însanê ku di nav bexçê gulan de digere bêhna gulan li wî dikeve, ew kesê ku diçe dîwana salihan jî ji wan mirovên sipehî feyz û rûhanîyet, her xwe di dilên wan de dide xuyakirin.

Ji lewma yek ji rêyên bi feyztirîn ku mirov ji wî exlaqê xweş re bibe xwedî, ew exlaqê ku Rebbê me jê razî ye ev e; heta mûmkin bibe mirov di daîreya tesîra evdên salih û sadiq de bibe û mirov manen bi heyecana îstîfade-kirina ji wan, bijî. Ev îstîfade jî dema mirov bi "**HEVALTÎYA BI SALIHAN RE BI UFÛQÊ TEBER-**

**RUKÊ**” bigihe, hingê mirov wê lezûbez û keyfîyeteke mezintir qezenc bike. Çawa hevaltîya bi salihan re ji bo bi bîranîna Xuda dibe wesîle û manewîyata mûmînî teqwîye dike, aynî wisan ew tiştên ku salihan dibîr dixin jî îrtîbata qelbî ya bi wan zatên salih re temîn dike, rehma îlahî celb dike û rehmê bi ser mirov de tîne. Ji bo vê teberruk, di rêya gihiştin û kemala qelbî de terbîya mehebbeteke zirav e ku mirov serî lê dixe.

Li alîyê din mehebbeteke rastî, dide îcabkirin ku hezker, ji bo gihiştina hezkirîyê xwe her firsendê binirxîne û serî li her rêyan bide. Evîndarekî Heq jî ku dilê wî ji mehebbeta îmanê tije ye, ewê ji bo her wesîleya ku wî ji riza'ya Heq nêzîk bike û pê bigihîne “**TEWESSUL**” bike. Yanî, ewê bi eşq û şewqeke mezin xwe pê bigre. Lewra Rebbê me bi xwe ferman dike, dibêje:

“**Gelî yên ku îman anîne! Ji Xuda bitirsin û li wesîleyên ku we ji wî nêzîk dikin, bigerin!**..” [7]

Rêyên ku diçin digihin Cenabê Heq jî -bi tabîra meşhûr- bi qasî hijmara nefesên mexlûqatan zehf in. Ya giring ev e; mirov bikeve ferqa van wesîleyên ku însanî digihînin Heq Teala û bibe xwedî ji bo qiwameke dilî ya ku karibe bi awayekî layiq ji wan îstîfade bike.

Yek ji giringtirîn heqîqetên ku divê em zehf zêde di bîra xwe bînin ev e; em hemû di vê mekteba cîhanê de ku warê îmtîhana îlahî ye, xwendekar in. Tehsîla me evdînî, wê bi tesdîqnameya ecel bi dawî bibe û emê bi amelên xwe re di sîne û singa axê de werin veşartin. Heyata dinyaya fanî; ji mohleteke ku bi însanî hatiye dayîn îbaret e, ji bo karibin paşeroja ebedî ya xwe ji felaketeke ğemnak derxîne û bi seadeteke bêdawîn wergerîne.

7. Maîde, 5/35.

Li ser vî esasî mûmînekî aqilmend, ew kes e ku li dinyayê xwe ji ğefleta edaya xwecihî diparêze (yanî nabêje; ez li dinyayê ehlê cih im, ezê li vir her bimînim), hîç ti zemanî mirinê ji bîra xwe dernaxe û ji bo axreta xwe jî di nav ğeyreta hazirîya zadê wê de dibe.. Bi tesîrtirîn usûla zindî-girtina vê ğeyretê jî heta mûmkin be mirov di teşyî/rakirina cenazeyan de pişkdar bibe û mirov qebristanan jî zîyaret bike. Çawa Mezinê me dem bi dem ji eshabên xwe pirs dikir, ji wan re digot: "*Îro ti kes ji we di teşyîa/rakirina cenaze de pişkdar bûye?*"[8] û "*îro wê (mirina) ku wekî devê kêrê hemû zewqên dinyayî qut dike, zehf di bîra xwe bînin!*"[9]

Eshabê kîram û dostên Heq jî ku li ser rêç û şopa wan çûne, ji xwe re hazirîya ji bo mirinê, zîyaretkirina qebran, dem bi dem di bîra xwe anîna mirinê û adeta jîyîna di nav mirinê de wek destûra heyata jîyanê bikar dianîn.

Ji lewma ji bo "**HAZIRÎYA JI BO AXRETÊ Û ZÎYARETÊN QEBRAN**" cihek (zehf mûhîm) heye ku mûmînekî heqîqî nikare wan di dinyaya dilî ya xwe de îhmal bike. Lewra goristan, wekî ayneyekê ne ku ji bo her însanî paşwexta wî şanî didin. Heke însan karibe dem bi dem û bi nêrîna îbretê li wan meyzîne, ewê heyata xwe ji zîyankirina wê li dûv arzû û hewesên nefsanî rizgar bike. Yanî zîyareta goristanan, sipehîtirîn wesîle ye ji bo hewldana hazirîya ji axretê re. Jîyaneke ku bi tefekkura mirinê nehatibe rohnîkirin, ti ferqa wê ji mûsîbeteke di şeva tarî de nîn e. Taveroja seadeta ebedî, ji ufûqa wan kesan diwelide ku dilê xwe bi beyanatên îlahî didin, li gorî wan dijîn û dizanin bi wijdaneke aram û mûsterîh bimrin.

8. Mûslim, Fedaîlus-Sehabe, 12.
9. Tirmizî, Zuhd, 4; Nesaî, Cenaîz, 3.

Xwendevanên rêzdar ên me!

Di kitêba li ber destê we de bi kurtî mijarên ku me xistine ber behsê ji van îbaret in. Bêşiwar di bara van mijaran de helbet gellek peyvên din jî hene ku li ser wan werin gotin. Lêbelê ya giring, em bi awayekî layiqê wan li ser van heqîqetan tefekkur bikin û em halê xwe li ber halê dostên Heq biwezinînin, mîzan bikin û em hewl bidin ku -bi qasî derfetên xwe- sipehîtîyên wan di hal û hereketên xwe de bidin xuyakirin.

**Cenabê Heq, ji me tevan re bi nesîb û mûyesser bike ku em li çi rast werin karibin wî bi nezara îbretê bixwînin, karibin ji bo dinyaya dilî ya xwe dersên hikmetê jê derînin û karibin bi mûqtezaya wan amel bikin!**

**Amîn...**

**Osman Nûrî TOPBAŞ**
Berfenbar 2010
Uskudar




# *Ji Hezretê Pêğember Re Îtaeta Bi Mehebbet*

*Wî, tim û daîm ji ummeta xwe re mehebbet tewzî û belav kiriye. Ew ji derdmendan re bûye şirîkê derdên wan. Wî cihê xwe li kêleka matem û şînan û li ber serê hewcedaran girtıye. Bi vî awayî wî -bi lutfa Xuda- civaka sehabîyan perwerde kir, gihand ku wan ji canên xwe, ji malên xwe, welhasil ji her tiştên xwe hê bêhtir ji wî hez dikirin.*

*Hezretê Pêğember çawa ji bo îslaha serdemeke dîn û har ya cahilîyetê bûbe wesîle û ew bi esrê seadetê wergerandibe, îro jî dîsa nefesa wî ya rehmê ye ku însanîyetê bigihîne hizûrê û wê xilas bike.*

# JI HEZRETÊ PÊĞEMBER RE ÎTAETA BI MEHEBBET

Ji bo jîyîna dîn bi eşq, wecd, hizûr û lezzetê, belavkirina Qur'an û Sunnetê li ser her sefha jîyanê zerûrî ye. Ji bo tekamuleke manewî ya wiha jî giringtirîn wesîle mûzeyyenbûna qelbî ya bi "**mehebbet**"ê ye. Lewra mehebbet; îtaet û fedakarîyê bi xwe re tîne. Xeta cereyana manewî di navbera dilan de jî bes dikare bi xêra mehebbetê were tesîskirin.

Ji eshabê kîram **Enes bin Malik** vedibêje:

Zilamek hate dev **Mezinê me Resûlûllah**, jê pirs kir, jê re got:

"-Ya Resûlellah! Qiyamet kengê ye?" Çi dema Mezinê me jê re got:

"-*Te ji bo qiyametê çi hazir kiriye?*" Wî jî wiha bersiv da, jê re got:

"-Mehebbeta Xuda û Resûlê wî..."

Vêca Mezinê me Resûlûllah jê re got:

"-*Naxwe tu yê bi hezkirîyên xwe re bî*."

Enes di berdewamîya vê rîwayetê de wiha got:

"Ji ketina Îslamê pê ve tiştekî din bi qasî vê peyva pêğemberê Xuda: *"Naxwe tu yê bi hezkirîyên xwe re bî."* ez keyfxweş nekiribûm. Ha ez jî ji Xuda, ji Pêğemberê wî, ji Ebûbekr û ji Ûmer hez dikim. Heke çi qeder min amelê wan nekiribe jî ez hevaltiya bi wan re hêvî dikim." [10]

Em çi qeder hest bi eşqa xwe ji wî bikin û em çi qeder karibin ji wî nêzîk bibin, ew qeder em dişên Mezinê xwe Resûlê Ekrem nas bikin. Lewra bi qasî sewîya eşqê, di navbera aşiq û maşûqî de hissîyateke wekî hev tê jîyîn. Hedîsa "*însan ji kê hez bike wê pê re be*."[11] vê pevrebûna qelbî îfade dike. Yanî hezker bi qasî hezkirina xwe, xwe dişibihîne hezkirîyê xwe û destpê dike para xwe ji şexsîyeta wî werdigre. Giringtirîn tehsîla manewî ya ku em ji Mezinê xwe Resûlûllah bidest bixin jî ev e; em karibin dinyaya dilî ya xwe bi hissîyata tevna dilî ya wî re bikin hevpişk.

## BI ÇAVÊ DILÎ YÊ HZ. EBÛBEKR..

Di netîca bi zirwebûna mehebbetê de dostanîya rastîn tê meydanê. Di nav însanîyetê de hîç guman nîn e ku **Ebûbekr** bi Mezinê me re di zirweya dostanîya rastîn de cih digre. Ji ber ku pêrebûna qelbî ya Hezretê Siddîq bi Mezinê me Pêğember re di sewîya zirwê de dijîya, wî malê xwe, canê xwe û her tiştê xwe ji bo wî feda kiriye. Ji ber ku Ebûbekr kariye di oğira Hezretê Pêğember de ji dil û can fedakarîyê bîke, ev ji bo wî bûye mezintirîn wesîla seadetê. Çawa ku wî bî xwe bi sebeb vê ufuqa xwe ya mehebbetê wiha gotiye:

"Ji dinyayê sê tişt bi min hatine hezkirin:

10. Mûslim, Birr, 163.
11. Buxarî, Edeb, 96.

-Meyzana li rûyê Mezinê me Resûlûllah,

-Ku keça min ji bo Wî bûye jîn, û

-Xerckirina malê min di rêya Wî de."

Yanî her tiştê xwe fedakirina Hezretê Ebûbekr di oğira Xuda û Resûlê wî de, lezzeta îmana wî bi zirwe kir. Dîsa Ebûbekr bi Mezinê me Pêğember re di halê rabîtayeke wilo de bû ku di piştî wefata wî de jî ew her gav û demê di dilê xwe de dida jîyandin, adeta nefesa wî his dikir û ew dida hiskirin jî. Mîsaleke vî halî **Ebûhûreyre** wiha vediguhêze, dibêje:

"Rojekê Ebûbekr derket ser minberê û got:

«-Hûn pê dizanin parsal Resûlûllah di navbera me de wekî ez vêga rawestîyame wilo rawestabû...» Piştre rondikan êrîş anîne ser çavên wî. Piştre wî ev peyva xwe dubare kir, lêbelê dîsa îskeîsk di qirika wî de man. Cara sisêyan jî dema wî ew peyva xwe dubare kir dîsa nekarî xwe bigre û girî." [12]

Ha dilên arif ên ku halê vê pêrebûna qelbî ya vî sehabîyê aşiq bi Mezinê me re zanîne, di her firsendê de hewl dane ku ji wî îstîfade bikin; bi awayê guhdarî-kirina li bîranên Mezinê me çendan hindik be jî bi vî awayî hewl dane hesreta xwe ya ji wî re teskîn bikin..

Ji eshabê kîran **Berâ bin Âzib** jî îştiyaqa bavê xwe ya di her firsendê de ji bo karibe li bîranîneke Resûlê Xuda guhdarî bike, wiha vedibêje:

"Ebûbekr kortanek ji bavê min kirrî û rica kir ku ez wî heta bi mala wan bibim. Bavê min jî got:

12. Li Tirmizî, Deawat, 105.

«-Na! Nabe, heta tu nebêjî ka dema mûşrik bi pey we diketin û we bi Resûlûllah re çawa ji Mekkê hicret kir û çûne Medînê.» Ebûbekr jî rêwîtîya hicretê vegot."[13]

Dîsa ev peyva Hezretê Ebûbekr, ufûqê pêrebûna qelbî ya wî bi Mezinê me Pêğember re çi xweş dide xuyakirin:

"Hezkirina ji Mezinê me Resûlûllah, ji riyazat û mûcahedê, ji hejandina şûr di rêya Xuda de hê çêtir e." [14]

Çawa mîsalên bêjimar ên vê, di Ğezweyên Bedr, Uhud û Xendeqê de hatine dîtin.

## MEHEBBETA JI CAN EZÎZTIR...

Eshabê kîram di hezkirina ji Mezinê me Resûlê Ekrem de wisan bi zirwe bûbûn ku fedakirina hemû hebûna xwe di rêya wî de li canê xwe minnet zanîbûn. Çend nimûneyên mûşexxestirîn ji bo vê, roja Uhudê di jihevketina demkurt a ku di sipaya Îslamê de hatî meydanê de jîyabû. Komeke mûşrikên bedbext ku teşqala hatî meydanê ji xwe re bi firsend zanîbûn, sirf Resûlê Xuda ji bo xwe kiribûne hedef û êrîşeke dijwar dabûne destpêkirin. Hinek sehabî ji Mûhacir û Ensarîyan xwe li hawîrdora Resûlê Xuda pêçan ji bo wî biparêzin; ji hev re soz dan ku heke di vê oğirê de pêwîst bike emê şehîd bikevin û ji Mezinê me re gotin:

"-Rûyê min li pêşîya rûyê te sîper e; bedena min ji bedena Te re feda ye! Silavên Xuda tim li ser Te bin! Em hîç ti zemanî ji cem Te naveqetin û naçin." Bi vî awayî peyman dane hev. Bi hêza xwe ya heyî heta bi nefesa dawîya xwe jî şerr kirin. [15]

---

13. Li Buxarî, Eshabû'n-Nebî, 2; Ehmed, I, 2'yan binêrin.
14. Beğdadî, Tarîxû Beğdad, VII, 161.
15. Îbnû Sa'd, II, 46; Waqidî, I, 240.

**Ebû Telha** tîravêjekî wisan bûye ku zehf dijwar kevanê xwe dikişand. Roja Uhudê dema wî di nav heyecana îmanê de herb dikir, di dest wî de du-sê kevan şikestibûn. Resûlê Xuda, kî bi torbê tîran di ber re dibûrî her jê re digot:

“-Torbên xwe yên tîran bibe li cem Ebû Telha vala bike!” bi vî awayî ferman lê dikir. Mezinê me çi qeder li pişt wî serê xwe radikir da ku li mûşrikan binêre, Ebû Telha her jê re digot:

“-Dê-bavên min bi gorî Te bin, ya Resûlellah! Serê xwe raneke! Belkû tîrek ji tîrên mûşrikan li we bikeve. Bila singa min li ber singa te bibe sîper. Ya ku li te bikeve, bila ew li min bikeve!”[16]

**Sa‘d bin Ebûweqqas** jî li cem Mezinê me Fexrê Kaînatê bênavber tîr li mûşrikan dibarandin, Nûra Hebûnê Mezinê me jî li hemberî vê fedakarîya wî ya ji dil û can ji Sa‘d re digot:

*“-Bavêje, Sa‘d! Bavê min û dêya min bi gorî te bin!”*

**Hezretê Elî** ji vê îltîfata mezin re bû şahid û di nav ğibteyê de wiha gotiye:

“Min, ji bilî Sa‘d wekî din nebihîstiye ku Mezinê me Pêğember ji kesekî din re gotibe: *«-Bavêje, bila bavê min û dêya min bi gorî te bin!»”* [17]

Mezinê me Pêğember di dawîya Ğezweya Uhudê de bi awayekî taybet rewşa Sa‘d bin Rebî ku ji navbera sehabîyên xwe zehf jê hez dikir, meraq kiribû. Ji mirovekî ji sehabîyên xwe re gotibe; here meydana herbê û li wî bigere. Heke çi qeder ew sehabî li Hezretê Sa‘d geriyabe jî lêbelê ew nedît. Êdî ew vedigerîya lê bi umîdeke dawîn gazî kir, got:

16. Buxarî, Meğazî, 18.
17. Tirmizî, Edeb, 61, Menaqib 26; Ehmed, I, 92.

“-Ey Sa‘d! Resûlûllah ez şandim. Wî emr li min kir ji bo xeberê bidimê ka tu sağ î, yan jî tu şehîd ketî!”

Di wê anê de Sa‘d midetên xwe yên dawîyê dijîya û wî mecal nebû ku bersiva wî bide. Lêbelê çi dema bihîst ku Resûlê Xuda wî meraq dike, wî hemû hêza xwe berhev kir û (bi hezar zehmetîyan) karî bibêje:

“-Ez, êdî di navbera mirîyan de me!” Ew sehabî derhal çû ber serê Hezretê Sa‘d, meyzand ku wa ye bedena wî bi derbên şûran qulo-pilo bûye. Û êdî bi awayê pistepistê bes li van peyvên dawîn ên wî guhdarî kir:

“-Wellahî, heta çavên we bilebitin, heke hûn Mezinê me Resûlûllah ji dijminên wî neparêzin û hûn cih bidin ku mûsîbetek were serê wî, ji bo we li cem Xuda wê mazeretek nebe ku hûn ji xwe re bikin behane!” [18]

Dema Mezinê me Siltanê Pêğemberan li heyatê bû, hinek êrîşên ku li dijî wî hatibûne kirin, di roja me de jî car caran destên qirêjgirtî yên kufrê û zimanê wê yên ku divereşin û jehrê diavêjin derve dikevin şekl û kisweyên cuda cuda û wan êrîşan didin dewamkirin. Di wextê xwe de nifşa sehabîyan ku bihayê wê canê wan bû jî dîsa xwe ji Resûlê Xuda re dikir sîper, îro ji bo me wê hessasîyetê îfade dike ku divê em li mîrasa qudsî ya Mezinê xwe xwedîtîyê bikin û jê re hessasîyetê şanî bidin. Ev hessasîyet, wek ummeta Mûhemmed di stûyê me de deyn e.

Divê ji bîra me neçe ku pêğember, li dûv xwe mîraseke dinyewî nahêlin. Ji Mezinê me Pêğember jî ji bo ummeta wî esl mîras, şexsîyeta wî, nasnameya wî û teqwaya wî ye. Mezintirîn emanetê wî jî Qur’ana Pîroz û Sunneta Senîyye ye. Xwedîtî-kirina

18. Mûwetta, Cîhad, 41; Hakim, III, 221/4906; Îbnû Hîşam, III, 47.

li vê mîras û vî emanetî; exlaqê wî ji xwe re bi exlaq-kirin e, jîyîna heyata teqwayê ye, di her zeman û her mekanî de bi weqareke ji wî re layiq, bi temsîlkirina wî mûmkin e. Divê em jibîr nekin ku ev wezîyet, ji bo me îmtîhaneke teqwayê ye..

Di rûhê Mezinê me Resûlûllah de bi derdê ummeta wî adeta mehşerek kelîbûye. Ew, di dirêjahîya jîyana xwe de tim ji bo xilasîya însanîyetê diperpitî, ewê di piştî wefata xwe de jî di qebra xwe de heta di Sûrê de were pifkirin her ji bo ummeta xwe lavlavê ji Rebbê xwe bike. Li hemberî vê wezîyeta wî mirov nikare wijdanekê bihizire ku bi hisa şukrana ji wî re tije nebe..

Wî, tim û daîm ji ummeta xwe re mûhebbet tewzî û belav kiriye. Ew ji derdmendan re bûye şirîkê derdê wan. Ew çûye kêleka matem û şînan û li ber serê hewcedaran. Bi vî awayî wî -bi lutfa Xuda- civata sehabîyan perwerde kir û gihand ku wan ji canê xwe jî hê bêhtir ji wî hez dikirin.

Ji bo me peyama ku ji vî halê nezîhê wî tê ev e: "Ew însanê ku me problema wî çareser kiribe û ew civaka ku me mehebbet di navê de tewzî kiribe, ya me ye."

Ha eshabê kîram di keş û hewaya mehebbeteke wiha de perwerde bûn û gihan, vêca wan jî ji Mezinê me re got: "Bila dê-bavê min, canê min bi qurbana Te bin, ya Resûlellah!" Bi vî awayî ji bo wan, gîyanê xwe bi gorî wî kirin bûbû lezzeta ji hemû lezzetan mezintir. Mîsalek ji nimûneyên bê jimar ên vî halî jî di Weqaeta Recî'ê de hatibû jîyîn:

Resûlê Xuda ji bo Îslamê hîn bikin mûallim ji qebîleyên hawîrdoran re dişandin. Qebîleyên Adel û Qare jî mûallim xwestibûn û heyeteke ji diwazdeh kesan pêkhatî derketibû ser rê. Lêbelê çi dema karwan giha devera Recîyê, ketin kemînê, heşt mûallim hatin şehîdkirin û du ji wan jî esîr hatin girtin. **Hezretê Zeyd** û **Hezretê**

**Xubeyb** esîr ketibûn ew jî bi mûşrikên Mekkê hatibûn teslîmkirin û ji terefê wan ve bi şenkencê hatibûn şehîdkirin. Berî wan şehîd bikin ji Hezretê Xubeyb re hatibû gotin:

“-Ma te dixwest ku Pêğember di cihê te de bûye û di hemberî vê de jî heyata te xilas bibûya?”

Xubeyb bi ber pirskerî Ebûsufyan ket, lê meyzand û jê re got:

“-Ne ku ez bixwazim di nav zar û zêçên xwe de bim û pêğemberê min jî li vir be, ez di hemberî xilasbûna xwe ji mirinê de bi dilê min ne xweş e ku li cihê ew vêga lê ye strîyek jî bikeve lingê wî.”

Ebûsufyan li hemberî vê menzara mehebbeta bêhempa adeta sar bû û got:

“-Bi rastî sosret e! Min li dinyayê bi qasî ku eshabê Mûhemmed jê hez dikin du kesên din nedîtine ku ew qas ji hev hez bikin.” [19]

Gellek ji ğeyrê mûsliman jî ku bi nezara însafê heyata Mezinê me Resûlûllah tedqîq û tehlîl kirine, heyran-mayina we ya ku jê re his kirine neveşartine. Nivîskarê rojavayî **Thomas Cariyle**, ev heqîqet wiha îtîraf kiriye:

“Hîç ti împaratorê ku tac dabe serê xwe bi qasî Hezretê Mûhemmed ê ku hirqaya wî bi destê xwe pînekirî daye serê xwe hezkirin û hurmet nedîtiye.”

Lewra tekane şertê ku mirov bi maneyeke rastî Mezinê me nas bike û bi awayekî layiq jê îstîfade bike, ji wî re şanîdana mehebbet û hurmetê ye. Ji vê hêlê di dilê eshabê kîram de ti hezkirinek neketiye pêşîya hezkirina ji Xuda û Resûlê wî. Ne hezkirina mal û milk, ne hezkirina zar û zêçan, ne jî hezkirina rûh û can... Lewra ev

19. Waqidî, I, 360; Îbnû Sa‘d, II, 56.

hemû jî wê li dinyayê bimînin, hezkirina Xuda û Resûlê wî jî wê bibe fêkîyê seadeta ebedî ya dilî.

## HEKE HÛN JI XUDA HEZ DIKIN...

Hezretê **Hesenê Besrî** vediguhêze:

“Eshabê kîram ji Mezinê me Resûlûllah re gotin:

“-Ey Resûlê Xuda! Em zehf ji Ellah Teala hez dikin. Lêbelê elametê hezkirina rastî ji zatê Xuda ji me re bide zanîn ka ew çi ye?”

Vêca Ellah Teala ev ayeta pîroz nazil kir[20]: «(Resûlê min!) **Bibêje: Heke hûn ji Xuda hez dikin li pey min bên ku Xuda jî ji we hez bike û gunehên we efû bike. Xuda, heta bi dereca dawîn efûkar û dilovîn**.»” [21]

Wate, ewê ku însanî bi mehebbeta Xuda bigihîne, Mezinê me Hezretê Pêğember e. Lewra mehebbeta ji Hezretê Pêğember, hezkirina ji Xuda ye, îtaeta ji wî re îtaeta ji Xuda re ye, îsyana li hemberî wî jî îsyana li hemberî Xuda ye.

**Hezretê Elaeddîn Konevî**, ji bo li pey çûna Mezinê me Resûlûllah û di hurmeta wî de qusûr nekirin li ber şagirtên xwe ev mijarên ha şert danîne:

1. Çi dema navên mûbarek ên Resûlûllah derbas bibin selat û selam li ser wî anîn e.

2. Dema ew qebra şerîfa wî zîyaret bikin, li hizûra wî deng bilind nekirin û mûhafezekirina edebê ye.

20. Li Teberî, Camîû’l- Beyan, jimar, 6845-6846 binêrin.
21. Alî îmran, /31.

3. Tazîm û hurmet şanîdana ji bo Medîna Mûnewwera ku herema Resûlûllah û îkram-kirina li ehlê Medîna Mûnewwer e.

4. Ew tişta ku ji peyv û karên mûbarek ên Mezinê me Resûlûllah hatibin ragihandin, xwe parastina ji mûqabelekirina wan ya bi awayê sivik wergirtina şanê wî ye. Mesela dema were gotin: Resûlûllah ji filan tiştî hez dikir, divê di qelbê me de jî derhal li hemberî hezkirina wî tiştî hissa sipehîtî û xweşbûna wî şîyar bibe.

5. Nedanîna çi tiştekî û çi kitêbekê li ser kitêbên ku li ser Qur'ana Pîroz û hedîsên şerîf hatibin nivîsîn e.

6. Ne avêtin û neqetandina kağezekê ye ku têde navên Ellah Teala, yan jî navên Mezinê me Resûlûllah hebin. Heta divê hurmet ji hemû kitêbên Îslamî re were şanîdan. Heke ev kitêb, êdî hew bêne bikaranîn, yan divê ew li cihekî ku nayên perçiqandin di nav axê de werin binaxkirin, yan jî ew bêne şewitandin.

## SELEWATÊN ŞERÎF

Hezker, bi qasî hezkirina xwe ji hezkirîyê xwe wî teqlîd dike; wî ji dilê xwe naderîne û wî ji ser zimanê xwe jî hîç naxe xwarê. Mûhîmtirîn elametê peywendîyeke qelbî ya wiha bi Mezinê me re; bi selewatên şerîf, zehf di bîra xwe anîna wî ye. Lewra ziddê vê, sebebê xusraneke manewî ye.

Çawa Mezinê me Resûlûllah wiha ferman kiriye, gotiye:

"*Ew kesê ku ez li cemê werim bibîrxistin û tam selat û selamê li ser min neyêne ew ne ji min e, ez jî ne ji wî me. Xudayê min! Kî têkilîya xwe bi min re bide dewamkirin tu jî têkilîya xwe bi wî re*

*bide dewamkirin. Kî têkilîya xwe ji min qut bike, tu jî têkilîya xwe ji wî qut bike.*" [22]

Mezinê me di hedîsên şerîfên dîgerên xwe de jî wiha gotiye:

"*Bexîl ew kes e ku navê min li cem wî were bibîrxistin û ew jî selat û selamê li ser min neyêne.*" [23]

"*Kî, selat û selam anîna li ser min jibîr bike rêya cennetê şaş dike.*" [24]

Ha selewatên şerîf ev qeder mûhîm in. Heta dema em nimêj bikin jî di her Tehîyyatê de ferman li me hatiye kirin ku em silavê li Mezinê xwe Resûlûllah bikin û jê re bibêjin:

«اَلسَّلاَمُ عَلَيْكَ أَيُّهَا النَّبِيُّ وَرَحْمَةُ اللّٰهِ وَبَرَكَاتُهُ»

Digel ku di nav nimêjê de silav-kirina li beşerekî halek wisa ye ku nimêjê xirab dike jî, lêbelê dîsa Ellah Teala, silav-kirina li Pêğemberê xwe ji bo nimêjê kiriye ruknekî wacib.

**Hezretê Îmam Ğezalî** dibêje:

"Di teşehhuda nimêjê de sûretê Mezinê me û şexsê kerîmê wî di dilê xwe de hazir bike! Û

« اَلسَّلاَمُ عَلَيْكَ أَيُّهَا النَّبِيُّ وَرَحْمَةُ اللّٰهِ وَبَرَكَاتُهُ »

bibêje! Emîn bibe ku selama te bi Resûlê Xuda digihe û Ew, bi cewabeke hê sipehîtir hemberîya te dide." [25]

**Hezretê Xalidê Beğdadî**, ji **Şîhab bin Hecer el-Mekkî** wiha diguhêze, dibêje:

22. Deylemî, el-Firdews, III, 634.
23. Tirmizî, Deawat, 100
24. Îbnûmace, Îqamet, 25.
25. Îhyaû Ulûmi'd-Dîn, I, 224.

“Di hevoka Tehîyyatê de: «اَلسَّلَامُ عَلَيْكَ» ku di nimêjê de tê xwendin bi Mezinê me Pêğember re tê axaftin. Her wekî ev, îşaretê pê dide; Ellah Teala Mezinê me ji wê nimêja ku ummeta wî dike, xeberdar dike. Bi vî awayî Mezinê me li cem însanên ku nimêj dikin hazir dibe û roja qiyametê ewê di lehê wan de ji bo amelên bi fezîlet ê wan şahidîyê bide. Ji bilî vê jî di bîra xwe anîna ku manen ew hazir e, di dil de ji bo zêdebûna halê xuşû û hudûê (aramîyê) dibe wesîle.” [26]

## DI MEHEBBETA PÊĞEMBER DE ZARAFETA OSMANÎYAN

Bav û bapîrên mûbarek ên me Osmanîyan, di bara Qur’an û Sunnetê de bi mehebbet û îtaeteke kûr temayuz kirine. Wan tam şeş sedsalan alahilgirîya Îslamê kiriye û rûkenîya Îslamê ji dinyayê re şanî daye. Ew bi wê şerefê gihane ku heq û hiqûq tewzî û belav kirine. Hessasîyeta dilî ya wan li hemberî Mezinê me, ji wê medenîyeta bilinda ku anîbûne meydanê hê mûhteşemtir e.

Siltanê Memlûkîyan **Kayitbay** qubbeya pêşî li ser qebra şerîfa Mezinê me daye avakirin ku her evîndarê Pêğember ji bo ji nêzîk ve dîtina wê lavlavê dike. Tamîra deverên herifî yên Mizgeftê û şerefa avakirina qubbeya kesk ya îro jî ji Siltanên Osmanîyan **II. Mehmûd** re bûye nesîb.

Dema nûjenkirina qubbê bû mijara axaftinê, II. Mehmûd ji Îstanbûlê avasaz û hostayên pispor dişîne. Ev avasaz û hosta, di xusûsa ka divê em qubbeya li ser meqamê Mezinê me Pêğember çawa tamîr bikin de pêşî kûr kûr dihizirin. Lewra ewê derketana ser qubbeya mewcûd, wê ew tuğla bihatana hilkirin û wê ew ji nû ve

26. Mektûbata Mewlana Xalid, rûp. 118; Rîsaletu’r-Rabîta, (Mewlana Safîyuddîn, Reşahat hamîşîn de) rûp. 225-226.

bihata avakirin. Wan dê bê qerebaliğeke biçûk bikin ku rûhanîyeta Siltanê pêğemberan Mezinê me nerehet bike, yan jî bêyî cih bidin hereketeke ji edebê re mûğayir, wê ev wezîfa nazik bihata bicihanîn. Di netîca îstîşareya ku pevre kirin de, ew bi vê qerarê gihan:

“Em di mideta vê avasazîyê de hîç bi kelamê dinyayî napeyvin. Mesela, dema em tuğla bixwazin emê «ألله/**Ellah!**» bibêjin, dema em misînê avê bixwazin emê «بسم الله/**Bismillah!**» bibêjin, dema em çakûç bixwazin emê «لااله الا الله/**La îlahe îllellah!**» bibêjin...”

Ha Qubbeya Xedra/Qubbeya Kesk, di nav rûhanîyeta dîwaneke zikrê ya wiha de bi tazîmeke mezin û hurmetê hate avakirin. Ji bilî vê hostayên ku di tamîra Mescida Nebewî de wezîfe wergirtine, bi desmêj rahiştine her kevirê wê û bi besmele li cihê wî danîne. Heta dema îcab dikir ku bizmarekê li cihekî bixin, kulav li çakûçê xwe pêçabûn ji bo ew deng dernexe û teqteqê neke.

**Derwîş Ehmed Pêşkarîzade** di dawîya sedsala 18. de bi navê “**Tayyîbetu’l-Ezkar**” bîranên xwe li qelem dane, têde mîsaleke edeb, hurmet û nezaketa ku di Rewza’ya Mûtehhera de li ber çavan hatiye girtin wiha diguhêze:

“Piştî cemaetê nimêja eşayê dikir û diçû, ağayên ku wezîfedarên Rewzê bûn, her yekî ji wan çirayek bi destê xwe digirt, goşe bi goşe li Herema Şerîf digerîyan, dihatin Babu’s-Selam û derî digirtin. Heke kesek li hundurê hatibe dîtin, «بسم الله/ **Bismillah!**» digotin û jê re îşaret dikirin ji bo derkeve derve. Lewra **li Herema Şerîf kelamê dinyayî nabe**. Heke ti kes li Hucra Şerîf hebû, bang li wî dikirin, jê re jî digotin: «لااله الا الله/**La îlahe îllellah!**»

Berî derketina tavê bi sê saetan (yanî dema wextê teheccudan dihat) reîsê mûezzinan li derveyî derî carekê bang dikir, digot: «/لااله الا الله**La îlahe îllellah!**» Dema pasevanên li hundur ev deng

dibihîstin, wan jî digot: «محمد رسول الله/**Mûhemmedur-Resûlûllah!**» Piştre derî vedikirin.”

Bêguman dersin hene ku divê em ji van hemû zarafet û nezaketa bapîrên xwe bistînin. Yek ji van jî nemaze ewên ku diçin Hec û Ûmrê û Mezinê me Pêğember zîyaret dikin divê li wir axaftinên dinyayî nekin û peyvên pûç nebêjin. Divê ew zimanên xwe û dilên xwe bi zikrûllah bişon, divê ew di nav sikûnet û edebê de bi selewatên şerîf rûyê xwe li hizûra Resûlûllah bixin (û rûyê xwe pê teberruk bikin).

Yek ji şêxên Qadirîyan ê serdema nêzîk û ji ehlê Medîna Mûnewwer **Ziyauddîn Efendî**, ev şîretên ha li mirovên ku dihatin wî meqamê mûbarek, dikirin, ji wan re digot:

“Ew kesê ku were vir, divê li serê pêyê xwe meyzîne û wilo here Rewzê û divê ew li serê pêyê xwe meyzîne û wilo vegere mala xwe û îstîraheta xwe.”

Wate divê zîyareteçîyê vî meqamê mûbarek li bazar û çarçîyan wek bi telaşa dinyayê meşğûl rûhanîyeta di dilê xwe de xirab neke û divê ew hîç ji dilê xwe dernexe ku ew ne li meqamekî normal e.

Mîsaleke dîger ji bo hurmet û tazîma bav û kalên me ji bo Mezinê me Pêğember, wiha ye:

**II. Ebdûlhemîd Xan**, rêyeke trênê ku ji Îstanbûlê dirêj dibe û diçe heta bi Medîna Mûnewwer daye çêkirin û îstasyonên wê jî li wan deveran çêkirine ku Mezinê me Pêğember di rêwengîyên xwe de li wan barê xwe danîye û îstîrahet kiriye. Ji bilî vê jî îstasyona trênê ya Medîna Mûnewwer jî ji bo rûhanîyeta Mezinê me Nebîyê Mûhterem reht û aciz neke tam 2.km‘an ji Rewzê dûr daye çêkirin û hemû rayên li nava Medînê jî bi kulavan kiras kirine da ku dema vagon li ser wan herin dengê teqûreqê dernexin..

**Şair Nabî** dibêje:

*Xwe ji terka edebê biparêze, ev bajarê Mehbûbê Xuda ye;*

*Ev nezargeha îlahî ye, meqamê Mûstefa ye!..*

“Xwe ji terka edebê biparêze! Lewra ev dever, nezargeha Cenabê Heq e, meqam û bajarê Resûlê Hezkirîyê wî Mûhemmed Mûstefa ye!..” Di vê na'tnameya xwe de ku bi îqazê destpê dike û însanan ji bo edeb, hurmet, mehebbet û hessasîyetê gazî dike. Ji xwe xizmetên ku Osmanîyan ji van bajarên pîroz re kirine, adeta ji bo wê edeb, hurmet, mehebbbet û hessasîyetê (ya Medîna Mûnewwer) adeta di mahîyeta îfadeyeke mûşexxesa wan de ye.

Bav û kalên me li bajarên mûqeddes ji Resûlê Xuda re mûstesnatirîn nimûneyên hurmet û mehebbetê raxistine ber çavan. Wekî bahorê ku rûhanîyeta Heremeynê bi xwe re hildigrin gellek sipehîtahîyên wir li memleketê xwe jî kirine urf.

Bi emanca zinde girtina hezkirina ji Resûlê Xuda, yanî zinde girtina heyecana îmanê li mizgeftan ji terefê kesên îcazetdar ve xwendina sê kitêban ji cemaetê re bûbû urfek. Ji bo hurmetê ji van hersê kitêban re jî sifetê “**şerîf**” hate dayîn. Ev kitêb jî: **Buxarî-ya Şerîf**, **Şîfa-ya Şerîf** û **Mesnewî-ya Şerîf** bûn.

Di bingeha Osmanîyan de hurmet û tazîma Qur’anê hebû, ji bo xwe sertac kirina wan ya “**Emanetên Mûqeddes**” jî nimûneyeke bêhempa ya mehebbetê ye. Dîsa Osmanîyan navê “**Mehmetçik**” li her serbazê xwe kirine ku di rêya Xuda de şerr dikir. Bi vî awayî jê re telqîn kirine ku her yek ji wan bi qasî îmkan û amadekarîya xwe bûna “**Mûhemmed**”-ek ji xwe re bike îdeal.

Ji bilî van jî di nav Osmanîyan de qendîlên Mewlûdê di nav îhtîşameke cipûcuda de hatine pîrozkirin. Riha Şerîfa Mezinê me, xurme ji Medîna Mûnewwer û Zemzem ji Mekka Mûkerrem dihate

anîn. Di nav coş û xuroşa teberrukê ji bîranên Mezinê me de ew qendîl dihatin îhyakirin. Dema di behra weladetê de Mewlûda Şerîf dihat teswîrkirin, ji bo hurmetê cemaet hemû radibû ser xwe, adeta wekî ku Mezinê me di wê anê de şeref bide dinyayê di nav wecdekê de pevre selat û selam dihatin xwendin..

Çi îbretdar e ku Osmanîyan, pirr îtîna şanî dane ji bo li mizgeftên selatîn (siltanan) tim û daîm "**mûezzinekî âmâ**" peyda bibe. Çawa ku heta bi zemanekî nêzîk jî mirov li mizgeftên wekî Suleymanîye û Fatîhê li nimûneyên wisan rast dihat. Ev mijar, bi ekserîyet tesadufeke ji rêzê tê zenkirin û zehf li serê nayê ranawestin. Haleveku bingehên vê digihan heta bi Esrê Seadetê. Lewra li Mescida Nebewî, digel **Bilalê Hebeşî** mûezzinekî dîtir ê Mezinê me Resûlê Ekrem hebû, ew jî sehabîyê âmâ (nebîn) **Ebdûllah îbnû Ummû Mektûm** bû.

Ha bav û kalên me, bi emanca dan jîyandina vê bîranîna ezîza Resûlê Xuda û îhyakirina sunneta wî heta bi zemanekî nêzîk jî ew nezaket şanî dane ku li mizgeftên selatîn ên mezin mûezzinekî âmâ (nebîn) mewcûd be, peyda bibe.

Bêşiwar ev edeb û ziravî hemû, ji wan esasên manewî ne ku bûne sebeb Osmanî şeş sedsalan bi îhtîşameke wilo payidar bibin ku ev ji ti milletekî din re nebûye nesîb.

**Cenabê Heq, nezaket û tenikîya dilê bav û kalên me ji me re jî bike nesîb! Îrtîbata qelbî ya me bi Mezinê me re daîm bike! Sunneta Wî ji heyata me re bixe mihwer! Ji bo hurmeta Hebîbê xwe, me bi ef û merhemeta xwe naîl bike!**

**Amîn..**

بسم الله الرحمن الرحيم

اقرأ باسم ربك الذي خلق

"**Bi navê Rebbê xwe yê aferîner** (Qur'anê, xwe û kaînatê) **bixwîne! Wî, însan ji eleqekekê** (ji hêka ku hatî fetrîmkirin) **aferandiye**." (Eleq, 96/1-2)

# *Bûna Ehlê Qur'anê*

*Ayetên Qur'anê welatê mûcîzan e; ronahîyê li ber tarîtîyên tarîxê digrin, mûammayên asê vedikin, hem li heyata dinyayê, hem jî li heyata axretê bihara hizûr û seadetê didin jîyandin.*

*Qur'an, esl bi qelb tê xwendin. Wezîfa çavan, ew e ku karibin ji qelb re bibin cure berçavkek. Ewam-xewas hemû mûmîn li ber aynî rehlê li ser çokên xwe dirûnin, Qur'anê dixwînin, feqet herkes ji bo xwe li gorî rewşa qelbî ya xwe netîcekekê ji wê digre.*

# BÛNA EHLÊ QUR'ANÊ

Ayetên Qur'anê, bi awayê peyamên îlahî yên ku xelek bi xelek 23 salên heyata nebewî hûnandin, peyapey nazil bûne. Her dema ew nazil bûye jî Mezinê me Resûlê Xuda, rêhevalên wî yên ji dilûcan eshabê guzîn, carina ji bo sirûreke (keyfxweşîyeke) bêtarîf û carina ji bo dehşetê û di her hal û karî de jî ew ji bo teqwayê sewq kirine, ajotine. Bi van peyamên ku ji Ellah Teala dihatin, manewîyatên mûmînan hatine teqwîyekirin, azmên wan zêde bûne û mehebbet û heyecana îmanê yên di dilên wan de jî bi zirwe bûne.

Hatina wehyê ji bo Mezinê me, ji sehabîyan re wekî sifra zîyafeteke îlahî bû, ji asîmanî dihat xwarê ku mirov ji tama wê têr nabe. Çi dema dibihîstin ku ayetek nazil bûye, derhal bi îştiyaq baz didan, diçûne ser wê zîyafetê, di nav coş û heyecaneke mezin de hewl didan vê sûalê bikin; "gelo riza'ya Cenabê Heq li kuderê ye?" û bersiva wê jî ji talîmatên ku nû hatibû, hîn bibin.

Mûfessir **Ebdûlhemîd Keşk** dibêje:

"Dema sehabîyek (êvarê) dihat mala xwe, xanima wî berî her tiştî ev herdu sûal jê dipirsîn:

«-Îro çend ayet ji Qur'anê nazil bûn?»

«-Te ji hedîsên Mezinê me pêğemberê Xuda çi jiber kirin?..»” [27]

## SEWDADARÊN WEHYÊ

Eshabê kîram ew qeder bi wehya îlahî re hevhal bûn ku di piştî îrtîhal-kirina Mezinê me Pêğember ji bo ebedîyetê de jî yek ji kederên wan yên ji hemû kederan mezintir qutbûna wehyê bû. Ev hadîse, mîsaleke zehf manedara vê heqîqetê ye:

**Ummû Eymen**, dayîna Mezinê me Pêğember bû. Mezinê me bi sebeb hesta wefaya bilinda xwe ya li hemberî wê diçû serdana wê, pirsa hal û xatirê wê dikir û qîmet didayê. Di piştî wefata Mezinê me de **Hezretê Ebûbekr** ji **Hezretê Ûmer** re got:

“-Rabe ser xwe, em herin cem Ummû Eymen a lêzima Resûlê Xuda, wekî ku Resûlûllah ew zîyaret kir, em jî wilo wê zîyaret bikin.”

Dema ew gihane cemê, Ummû Eymenê dest bi girî kir. Ew hizirîn ku Ummû Eymenê bi sebeb vê zîyareta wan Resûlê Xuda hate bîra wê, êşa wê dubare bû ji lewma ew girî. Piştre wan jê re got:

“-Tu çima digrî? Ma tu nizanî ku nîmetên li cem Xuda ji Mezinê me re hê bi xêrtir in?” Ummû Eymenê ji wan re got:

“-Ez ji bo wê nagirîm. Helbet ez dizanim ku nîmetên li cem Xuda hene ji bo Mezinê me Nebîyê Ekrem bi xêrtir in. Ez, esl ji ber qutbûna wehyê digrîm.”

Wê bi van peyvên xwe yên ji hesreta wehya îlahî tije, Hezretê Ebûbekr û Hezretê Ûmer jî kelegirî kirin. Ew jî bi Ummû Eymenê re girîn.

27. Fî Rîhabi’t- Tefsîr, I, 26.

Hezkirina eshabê kîram ji Qur'ana pîroz, wiha cihêwaz û mûstesna bûye. Wan, qîmetê Qur'anê, çawa divê ew were xwendin û çawa divê hurmet jê re were girtin bizzat ji Mezinê me dîtibûn û wilo hîn bûbûn. Bi vê sebebê jî ew di îstîfadekirina ji Qur'anê de di rewşeke cipûcuda de bûn. Wan Qur'ana Pîroz pirr dixwend; wan rojeke tenê nedixwest ku têde Qur'an nexwendibin û lê nemeyzandibin. Wan bi Qur'anê dest bi roja xwe dikir, ji nav sehabîyan yên ku ji çavên xwe reht bûn jî şîret li wan dihatkirin ku ew li Mûshefa Şerîf binêrin. [28]

**Hezretê Ûmer** şevekê Qur'ana Pîroz nexwendibû. Roja paştir Resûlê Xuda û jê re got:

"-*Ey Kurê Xettab, Ellah Teala di bara te de ayetek nazil kir*." Û ew ayeta pîroz lê îlawe kir:

«**Ew e, yê ji bo mirovên ku dixwazin** (tefekkur dikin) **îbret bigrin, yan jî şukr bikin şev û rojê li pey hev tîne**.»" [29] Piştre jî wiha got:

"-*Îbadetên nafîle yên ku bi şevê li te diçin bi rojê, yên ku bi rojê li te diçin jî bi şevê wan bîne cih*." [30]

28. Li Heysemî, VII, 165'an binêrin.
29. Furqan, 25/62.
30. Razî, XXIV, 93, di tefsîra el-Furqan, 62 de.

## QUR'AN EZÎZ E, ÎZZETÊ DIBEXŞÎNE

**Nafî bin Ebdi'l-Haris**, li Usfanê li Hezretê Ûmer rast hatibû. Ji ber ku Ûmer ew ji Mekkê re wek walî tayîn kiribû, jê pirs kir:

"-Te kî li ser serê Mekkîyan (ji bo xwe wekîl) hişt?"

Wî jê re got:

"**-Îbnû Ebza**!"

Dema Hezretê Ûmer jê pirs kir:

"-Îbnû Ebza kî ye?" Nafî jê re got:

"- Koleyek e, ji koleyên ku me ew azad kirine."

Dema Hezretê Ûmer jê pirs kir:

"-Ma te li şûna xwe azadkirîyek hişt?" Wî li hemberî vê pirsa Hezretê Ûmer ev bersiva bi îbret da:

"-Ew kitêba Xuda dixwîne, (wê dijî, wê tetbîq dike) û ferzên wê jî baş dizane."

Vêca Hezretê Ûmer bi heyret jê re wiha got:

"-Resûlûllah gotiye; «**Xuda bi vê Qur'anê qîmetê hinek mirovan bilind dike; hinekan jî nizm dike**.»

Seadeta mûmînî û civaka wî; bûrandina Qur'anê û tetbîqata wê sunnetê ji bo nav her sefhe û qunağa heyatê bicih tê. Qur'an nûr e, hizûrê ji dinyaya hundurîn û derveyî ya mûmînî re dibexşîne. Ew nesîhet û mewaz'îkeke ji hikmet, îbret û dersan tije ye. Ew tekane rêber e ku mirovî dibe, digihîne Heq Teala. Ayetên Qur'anê, welatê mûcîzan e; ronahîyê li ber tarîtîyên tarîxê digrin, mûammayên asê vedikin, hem li heyata dinyayê, hem jî li heyata axretê bihara hizûr û seadetê didin jîyandin.

Dîsa Qur’ana Pîroz, dema ji me re zemanên berê, weqaetên bi îbret ên milletên ku derbas bûne, vedibêje, hikmetan dibarîne, çendîn dersên heyatî û îctîmaî li ser paşeroja me dide. Ew dermangeheke hikmetên îlahî ye ku ji bo rûhên li heyata fanî bêzar bûne asoya xilasîyê şanî dide û ji bo bêçareyan jî receteyên şîfayê dide.

Dîsa Qur’anê, pirtûka mûcîzewî ya Rebbê me ye. Ew ji tecellîyên esma yên li kaînatê tezahura di kelamî de ye. Lêbelê bes ew mûmînên ku bi qelbekî temîz nesîbê xwe ji marîfetûllah wergirtibin karin ji hikmetên wê fehm bikin û ji heqîqetên wê feydê bibînin.

Kîjan qelb bêhtir bi nûra Qur’anê rohnî bûbin, ew li cem Heq Teala mûtebertir in. Mezinê me Pêğember jî di her xusûsê de ehlê Qur’anê tercîh dikirin, rêza pêşîyê û çêtirî dida wan. Çawa dema ew derdiket sefera Tebûkê, alaya Kurên Neccar dabû **Ûmare bin Hazm**. Lêbelê dema wî **Zeyd bin Sabit** dît, ala ji Ûmare sitand û da wî. Ûmare jî pirs jê kir, jê re got:

“-Ya Resûlellah, ma hûn ji min qeherîn? (Ma min qusûrek kir ji lewma we ala ji min sitand?) Mezinê me Pêğember jê re got:

“-*Na! Qesem bi Xuda ye ez ji te neqeherîme! Lêbelê hûn jî Qur’anê tercîh bikin! Zeyd ji te zehftir Qur’an jiber kiriye. (Ew ji te zehftir jê re aşna û çavnas e.) Heke çi qeder koleyekî çermreş û bêhvil-jêkirî be jî ew kesê ku Qur’an zehf jiber kiribe (Qur’aneke zindî be), ew li ser dîgerên xwe tê tercîhkirin!*” [31]

**Osman Ebû’l-‘As** jî wiha vedibêje:

Em wek temsîlçîyê qebîla xwe hatibûn cem **Mezinê me Resûlûllah**. Ez di nav hevalên xwe de di xusûsa hînbûna Qur’anê de ji tevan bi ezmtir û bi ğeyrettir bûn. Min Beqere jiber kiribû û

31. Waqidî, Meğazî, Beyrut 1989, III,1003.

li hemberî wan serkeftin bidest xistibû. Bi vê sebebê Resûlûllah, ji min re wiha got:

“*-Digel ku tu ji tevan biçûktir î jî min tu li ser serê hevalên te wek serdar tayînkirî. Heta tu temîz nebî destê xwe nede Qur’anê!*” [32]

Li Uhudê Ensarîyan pirs kir, got:

“-Ya Resûlellah! Şehîdên me zehf in. Fermana we ji me re çi ye, bila em çi bikin? Mezinê me Resûlê Ekrem ferman kir, ji wan re got; tirbên kûr û fereh bikolin, di her yekê ji wan de jî du kesan di wan de binax bikin. Heta çêbû ku sê kes jî di wan de binax kirin. Dema sehabîyan pirs kir; em pêşî kîjanî bixin tirbê? Ji wan re got:

“*-Kî ji wan bêhtir Qur’an zanîbe wî pêşî bixin tirbê!*” [33]

Mûmkin e, mirov mîsalên ku nîşan didin Mezinê me Resûlê Xuda çi qeder îhtîmam bi ehlê Qur’anê daye, zêdetir jî bike. Em wek ummeta Mûhemmed jî çawa mecbûr bin ku Qur’ana Pîroz ezîz bigrin, em wê li ser kursî û rehleyan deynin û ji bo edebê jî em wê ji navikê bi jortir hilgirin; dîsa aynî wisan em mecbûr in ku yên Qur’anê di qelbê xwe de hildigrin, yanî ew hafizên rastî û ehlê Qur’anê yên ku Qur’ana zindî ne jî ezîz bigrin û wan bixin taca serê xwe.. Lewra ew, li herdu cîhanan jî wesîleya rehma îlahî ne.

## EWÊN JI XUDA NÊZÎK IN: EHLÊ QUR’ANÊ NE

Resûlûllah gotiye:

“*-Bêşiwar ji însanan hinek hene ku ew ji Xuda nêzîk in!*”

Dema Eshabê kîram pirs kirin, jê re gotin:

32. Heysemî, I, 277.
33. Nesaî, Cenaiz, 86, 87, 90, 91.

“-Ya Resûlê Xuda! Ew kî ne?” Mezinê me ji wan re ev bersiv da wan, ji wan re got:

“*-Ew ehlê Qur’anê ne, ehlê Xuda ne, evdên taybet ên Xuda ne!*” [34]

Bêşiwar şeref û bextiyarîyeke ji nêzîkbûna ji Xuda Teala yê Xaliq û aferînerê kaînatê mezintir nîn e. Ji bo karîna layiqbûna ji vê bextiyarîyê re jî, bi ehlbûna ji bo Qur’anê ve bend e. Yanî ev jî bi zanîna rast xwendina Qur’anê, bi ketina keş û hewaya maneya wê û di nav kûrahîya tefekkur û tehessusa wê de wergirtina îbretan ji wê û bi rêveçûna di îstîqameta wê de mûmkin dibe. Ji bo mûmînên ku bi kemalateke wiha karîne bibin ji ehlê Qur’anê, lutf û îhsanên cihêwaz û mûstesna yên Cenabê Heq hene.

Çawa dostê Heq **Mehmûd Samî Remezanoğlu** -quddîse siruh- bizzat neql kiriye, guhastiye: Hafizek xwedî vî sifetî li Adanê wefat kiribû. Piştî 30 salan bi sebeb derbasbûna rê zerûret hasil bû ku ew ji wir ji bo cihekî din were guhastin. Vêca qebra wî hate vekirin, lêbelê hate dîtin ku wa ye cesedî wî hafizî hîç xirab nebûye, kefenê wî jî hê pak û sipî ye.

Çawa di hedîsa şerîf de hatiye gotin; *"Çenabê Heq ji erdê re wehî şandiye, jê re gotiye; cesedê ehlê Qur’anê nexwe.* [35]*"*

Ha ew çawa di ziman û dilê mirovên ku li gorî talîmatên Qur’ana Pîroz dijîn de letafet, zarafet, ziravî, sipehîtî û feyzên cipûcuda dide tecellîkirin, di qebrê de, li mehşerê û di mîzanê de jî ji wan re hizûr û seadetê bexş dike.

**Mûhyeddînê Erebî** -quddîse siruh- wiha nesîhet dike, dibêje:

34. Îbnûmace, Mûqeddîme, 16.
35. Li Deylemî, I, 284/1112; Elî el-Mûtteqî, I, 555/2488’êyan binêrin.

“*Divê tu Qur’anê zehf bixwînî û maneya wê bihizirî. Dema tu wê bixwînî jî li sifetên sipehî yên evdên ku Xuda ji wan hez dike pê wesfê wan dide, diqqet bike û wan ji xwe re bike wesf! Wan sifet û xuyên mezmûm ên ku di Qur’anê de zemma wan hatiye kirin û pê wesfê mirovên ku ğezeb li wan barîye, daye, bibîne û ji wan bireve! Lewra Ellah, ev (wesf) di kitêba xwe de nazil kirine û zikr kirine ji bo tu bi wan amel bikî û pêwîstîya wan bînî cih. Bi vê sebebê dema Qur’an were xwendin, ji bo tu mûhtewaya wê baş fehm bikî bi Qur’anê re bibe!*”

Wate ji bo tehsîlkirina feyz û rûhanîyeta pêwîst ji Qur’anê, dema tu wê bixwînî divê qelbê te ne ğafil be. Qur’an, esl bi qelb tê xwendin. Wezîfa çavan, ew e ku karibin ji qelb re bibin cure berçavkek. Ewam-xewas hemû mûmîn li ber aynî rehlê li ser çokên xwe dirûnin, Qur’anê dixwînin, feqet herkes ji bo xwe li gorî rewşa qelbî ya xwe nesîbê ji wê digre.

Cenabê Heq, di xusûsa Qur’ana Pîroz de mirovên ku katine ğefletê û mirovên ku bi awayekî sipehî ji feyzên wê îstîfade dikin wiha eşkere dike, dibêje:

“**Paşê me kitêb, daye yên ku me, ew ji navbera bendeyên xwe bijardine. Vêca, ji wan hinek hene ku neheqiyê li xwe dikin, ji wan hinek hene di navê de ne û ji wan hinek jî hene ku bi destûra Xuda di qenciyan de pêşbaziyê dikin ji bo bikevin pêşîyê. Ha ev e, fezîleta mezin**.”[36]

Wate hinek însan hene digel ku Qur’anê dixwînin jî, ew ayetên ku wan dixwînin xwe ji qirika wan û berjêrtir bernadin, naçin, xwe di qelbê wan de nadin xuyakirin û ew xwe di amelên wan de nîşan nadin. Bi vî awayî ew zulmê li nefsa xwe dikin û nîmeta ji hemû nîmetan mezintir jidest didin. Hinek însan jî hene ku ew di rêya

36. Fatir, 35/32.

navîn de ne; geh amel dikin, geh jî îhmal dikin. Hinek însan jî hene ku bi feyz û rûhanîyeta Qur’anê di bîr û xatirê xwe de mesafê qut dikin, bipêşve diçin.

Ji bo mirov karibe bi awayekî layiq ji Qur’ana Pîroz feyz-yab bibe, divê mirov bi qasî temîzîya bedenî, temîzîya qelbî jî rîayet bike. Di rewşeke berevajî de nexweşîyên qelbî, hevdîtina însanî ya rast bi Qur’ana Pîroz re asteng dikin. Bi vê sebebê **Hezretê Osman** gotiye:

“*Heke dil ji qirêjên manewî (ji mûsîbetên nefsanî û merezên qelbî) temîz bûne, bi ti awayan ew ji zewqa Qur’anê têr nedibûn.*”

Dostê Heq **Hezretê Mewlana** jî wiha dibêje:

“*Maneyên Qur’anê bes ew kes fehm dikin ku hewa û hewesên xwe avêtibin nav êgir, ew kiribin xwelî, bi vî awayî li ber Qur’anê helîyabin, bûbin qurban û rûhê wan bûbin Qur’an.*”

Wate Qur’ana Pîroz, bi dilekî ku ji kesafet û gemarê temîz bûbe û nûranîyet li xwe kiribe, sirrên xwe eşkere dike. Ji lewma lazim e, mirov bi pîvana teqwayê qelbê xwe zarîf bike û bi wê hissîyatê berê xwe bide ser Qur’anê. Lewra Cenabê Heq gotiye:

“**..Ji Xuda bitirsin** (li ser teqwayê bibin!) **Xuda, yê** (tiştên ku hûn nizanin) **li we bide hînkirin!.**.” [37]

Divê em jibîr nekin ku Qur’ana Pîroz ne berhema mirovekî fanî ye, lêbelê ew rêbera hîdayetê ye, Xaliqê kaînatê ew lutf kiriye ji bo pê bendeyên xwe bi seadeta dinya û axretê bigihîne. Ji lewma ji bo bi awayekî layiq îstîfadekirina ji Qur’ana Pîroz, divê mirov bi hestên hurmet, tazîm û edebê devgirtekên Mûshefa Şerîf veke. Divê mirov wê bi hesta ku wî Cenabê Heq yê ku ji însanan re

37. Beqere, 2/282.

Rehman e, ew daye hînkirin û bi şewq û îştiyaqeke wisan her wekî ku taze nazil bûye, bixwîne..

## HER WEKÎ KU BI XUDA RE DIAXIVE

Qur'ana Pîroz bi feyztirîn rê ye, ji bo beşerîyet deng û pêjnên Rehmanî bibihîze, nefheya (bêhna) îlahî di rûhê xwe de his bike û hê li vê dinyayê bi Xuda re mûkaleme (hevpeyvînê) bike. Bi tefekkur, tertîl û edeb xwendina Qur'anê wekî axaftina bi Xuda re ye. Çawa **Mezinê me Pêğember** ferman dike, wiha dibêje:

"*Heke yek ji we hez bike ku bi Rebbê xwe re mûnacat û mûkalemê (li ber wî bigere û bi wî re biaxive) bike, bila bi hazirîya qelbî Qur'anê bixwîne.*" [38]

Ji bo mirov karibe bi awayê layiq ji Qur'anê îstîfade bike, îcab dike ku mirov dilê xwe jê re veke. Di rewşeke berevajî de çawa feyda barana bi bereketa Nîsanê ya ku bi ser zinaran de diherike û diçe ji wan re çênabe, ji bo qelbên ku derîyên îstîfadekirina wan hatibin radan û girtin jî hîç feydeyek ji Qur'anê ji bo wan jî hasil nabe. Belkû Qur'an, xusran û dalaleta yên wiha hê zêdetir dike. Lewra ewên ku bi rehm û hîdayeta Qur'anê re pevnegihin, tam berevajî vê ewê ji bo xusraneke mezin dûçar bibin. Çawa mufessirê meşhûrê tabîîyan **Qetade** dibêje:

"Ewên ku Qur'anê dixwînin ya bi kar, yan jî bi zirarê radibin. Di ayeta pîroz de wiha hatiye gotin:

**«Em ji Qur'anê hinek ayetan nazil dikin ku ew ji bo yên îman anîne serkehnîya şîfa û rehmê ne. Ew bes xusrana zaliman zêde dike.**»"[39]

38. Suyûtî, I, 13/360.
39. Îsra, 17/82.

Bi vê sebebê dema mirov Qur’anê dixwîne divê mirov li hemberî wê kor û kerr hereket neke. Halê dostên Heq ên ku para xwe ji tevna rûhanîya Qur’anê wergirtine, di vê ayeta pîroz de wiha hatiye îfadekirin:

“**Mûmîn bes ew kes in ku dema Ellah tê zikrkirin dilê wan ditirse, dema ayetên Xuda ji wan re tên xwendin jî ew îmana wan zêde dike û ew bi Rebbê xwe bawer dibin û pişta xwe dispêrinê**.” [40]

Wezîfa her mûmînî ye ku heyateke di îstîqameta Qur’anê de bijî. Di rewşeke berevajî de ewê wiha bibe; di demeke ku ew li axretê çavnêrîya şefaeta uzma’ya Mezinê me Resûlê Ekrem dike de îhtîmal heye ku ew ji me bibe gilehdar. Çawa di bara mirovên ku heyateke bi xîlafa Qur’ana Pîroz dijîn de Mezinê me Pêğember wê li axretê li cem Rebbê xwe gilehê wan bike. Ev heqîqet, di ayeta pîroz de wiha tê ragihandin:

“**Pêğember dibêje: Ya Rebbê min! Qewmê min ev Qur’an bi temamî terk kiriye**.” [41]

Ha ji bo mirov li axretê ji vê îtaba nebewî re dûçar nebe, divê mirov wek pêwîstiya ummetbûna ji wî re layiq Qur’anê digel rîayetkirina mexrecên wê û tecwîda wê zehf zêde bixwîne û her hewl bide ji bo maneyên di derûna wê de çavnas û aşna bibe û di nav kûrahîya hestan de bi hessasîyet û mehebbet wê tetbîq bike.. Wate, bi tabîra **Hezretê Ğezalî**; “divê dil wê bixwîne, aqil bi fîraset wê tercume û tefekkur bike, qelb jî wê hezm bike û jê dersan wergire.” [42]

40. Enfal, 8/2.
41. Furqan, 25/30.
42. Îhya, I, 816’an binêrin.

Mezinê me Pêğember endîşe dikir ka ummeta wî dê çawa û çi qeder bi Qur'ana Pîroz re elaqedar bibe? Wî pêxav dikir ku di vê xusûsê de lêpirsîn ji wî were kirin. Bi vê sebebê ew zehf zêde bi Eshabê Suffe re mijûl dibû ku ew telebe û xwendekarên Qur'anê bûn. Wî di zemanê birçîbûn û ğelayê de jî kevir li ser zikê xwe girêdida û Qur'an li wan talîm dikir.

**Ebdûllah bin Mesûd** telebek ji şagirtên Eshabê Suffe bû. Ew bi rehle'ya tedrîsa li navê ya Mezinê me Resûlûllah giha. Wî digot:

"Ji Resûlê Xuda di me de halên wisan xuya bûn ku me zikrê wan luqmeyên di qirika me re diçûn xwerê, dibihîstin." [43]

Nifşa sehabîyan jî ğeyreta Mezinê me Pêğember di xusûsa talîma Qur'anê de ji xwe re nimûne werdigirtin. Wan jî Medîna Mûnewwer ji seydayên Qur'anê tije kir.

## MES'ÛLÎYETA ME LI HEMBERÎ QUR'ANÊ

Qur'ana Pîroz dawîna her çar kitêbên semawî ye ku jêdera wan Cenabê Heq e. Ew bangewazîya dawîn û peyama dawîna Rebbê me ye ji bo wê însanîyeta ku ruşda xwe îkmal kiriye. Heq Teala, ji navbera kitêbên xwe yên ku şandine bes ji bo Qur'ana Pîroz tenê teahhud kiriye ku ewê heta roja qiyametê wê (ji tehrîfat û berzebûnê) her biparêze. Bi vê sebebê Qur'ana Pîroz, tekane kitêba îlahî ye ku herfeke tenê ya wê jî nehatiye guhertin û eslê wê hatiye parastin. Di vê nuqtê de esl mesela me, gelo em ji bo vê teahhuda Cenabê Heq çi qeder dibin wesîle. Divê em rewşa xwe di ber çavan re derbas bikin:

Gelo unsîyeta (demsazîya) me bi Qur'ana Pîroz re çi qeder heye? Gelo em çi qeder karin wê di nav kûrahîya hestan de bix-

43. Buxarî, Menaqib, 25.

wînin? Ew heyecana ku eshabê Mezinê me Pêğember li hemberî Qur’ana Pîroz hestpê dikirin, gelo em çi qeder hest bi wê heyecanê dikin?

Gelo em dikarin Qur’ana Pîroz ji bo her sefha heyata xwe bidin întîqal-kirin? Gelo em wê çi qeder di heyata aîlewî ya xwe de, di cîranetî û mafên mirovan de di heqê evdan de di heyata ticarî ya xwe de ji bo xwe dikin qistas û pîvan? Gelo em çi qeder xwe ji herka zeman û civakê berpirs digrin?

Gelo em karin tehsîla heqîqî ku tehsîla naskirina Cenabê Heq e, bidin zarokên xwe? Gelo em çi qeder ğeyret dikin Qur’anê ji bo dilan biguhêzin û pê îstîqameta wan rast bikin?

Divê em jibîr nekin ku seadeta herdu cîhanan, bi nesîbdar-kirina ewladên xwe yên ku emanetekî îlahî ne, bi kultura Qur’anê mûmkin e. Bi merhemettirîn dê-bav, ew dê-bav in ku ewladên xwe bi terbîya Qur’anê ji bo îstiqbala eslî, yanî ji bo axretê hazir dikin. Mezintirîn yadîgara ku însan dikare bide zarokên xwe, terbîyekeke sipehî ye.

Ew dê-bavên ku ji ber wan bi xwe ta‘m û çêj ji kewsera maneyên kûr ên Qur’anê nexwarine ew bi zarokên xwe jî nadin ta‘mkirin, ketine bin webalekî mezin. Lewra ew zarokên ku di mijara tehsîla manewî de cahil hatibin hiştin, ew zarokên ku bi rûhanîyeta Qur’an û Sunnetê nehatibin terbîyekirin, ewê roja qiyametê li dê-bavên xwe bibin dawedar.

**Îbnû Ûmer** dibêje:

“Zarokên xwe baş terbîye bike. Lewra tu ji van berpirs î. Hesab dê ji te were pirsîn, wê ji te re were gotin: «Te di bara terbîya wan de çi kir, te çi li wan da hînkirin?»”

Di hedîsa şerîf de wiha hatiye gotin:

*"Zarokên xwe di sê mijaran de bigihînin: Hezkirina ji Pêğember, hezkirina ji ehlê Beytê û qîraetê Qur'anê.. Lewra hamilêyên Qur'anê (ewên ku Qur'anê hîn dibin, wê didin hînkirin û di vê rê de xizmetê dikin), di roja qiyametê de ku têde hîç ti sihek nîn e, ew digel pêğemberan û dostên Heq di bin siha Erş de ne."* [44]

Naxwe ji bo mûmînên salih yek ji meseleyên mûhîmtirîn ev e ku karibe bi rûhanîyeta Qur'anê terbîyekeke sipehî bide zarokên xwe. Çawa Xelîfê Ebbasîyan **Ebûcafer Mensûr** ku ji Emewîyên di nav lerzeyên sîyasî yên serdemê de ketibûne zindanê da pirskirin, ji wan re dibêjin:

"-Di zindanê de tişta ku zehf li zora we diçe, çi ye?" Wan jî ev bersiv dabûnê, gotibûn:

"-Em ji terbîyekirina zarokên xwe mehrûm man." [45]

Naxwe hê firsend ji dest me neçûyî heke em zarokên xwe bi feyz û rûhanîyeta Qur'anê perwerde nekin, wan negihînin, divê em jibîr nekin ku emê sibê di qebrên xwe de bi nedameteke giran re rûbirû bimînin. Ji lewma divê em di wextê wê de bi zarokên xwe re sipehî elaqedar bibin. Divê em hezkirina Xuda û Pêğemberê wî û kultura Qur'an û Sunnetê di dilên tertemîz ên wan de fetrîm bikin, biçînin. Divê em ji vî qaîdeyê ku dibêje; marîfet bi îltîfatê re bend e, hereket bikin û ji bo sipehîtîyên manewî di zarokên me de neşw û nema bibin ji divê em wan bi hedîgar û îltîfatan teşwîq bikin.

**Hezretê Îmam Malik** dibêje:

"Dema min her hedîsek jiber dikir, bavê min hedîyekek dida min. Zemanekî wilo hat ku bavê min hedîye nedabe jî jiberkirina hedîsan hatibû haletekî wilo ku di min de lezzeteke bêtarîf çêdikir."

44. Mûnawî, Feyzû'l-Qedîr, I, 226.
45. Îbrahîm Canan, Kutubên Sitte, I, 381.

**Îmam Ebûhenîfe** jî dema kurê wî **Hemmad** sûretê Fatîhê hîn bûbû, pênsed dirhem dabûne seydayê wî. Wê demê beranek bi dirhemekê dihate kirrîn. Seydayê wî ev comerdî zêde dît. Lewra zarokî sûretê Fatîhê tenê hîn bûbû. Vêca Hezretê Ebûhenîfe jê re wiha got:

“-Sûretê ku li kurê min hîn kiriye, biçûk nebîne! Heke ji van zehftir li dev min hebûna, ji bo karibin bi awayekî layiq hurmetê ji Qur’anê re bigrim min ew jî ji te re hedîye dikirin.” [46]

**Selaheddînê Eyyûbî** jî dema di qişlayê de digerîya li zarokekî rast hatibû ku li cem bavê xwe Qur’an dixwend. Wî xwendina zarokî eciband, ji wî nêzîk bû û perçekek ji xwarina xwe dayê. Ji bilî vê jî wî pişkek ji zevîya xwe jî ji bo wî zarokî û bavê wî kir weqf.[47]

Ev hemû, ji bo dê-bavan nimûneyên sipehî ne, ku divê ew ji xwe re wan di terbîya zarokên xwe de mînak bigrin.

Ji bo perwerda Qur’anê divê mirov bi taybetî tatîlên havînê baş binirxîne. Divê mirov zarokên xwe bi şandina fêrgehên Qur’anê, yan jî mizgeftan tenê bes neke. Divê em wek dê-bav rewşa wan bi diqqet bişopînin. Divê em dem bi dem kontrol bikin ka kultura Qur’anê li cem wan di çi astê de ye, zanîna wan ji îtîqad û fiqhê di çi rewşê de ye. Divê em bi elaqa xwe ya ku ji wan re şanî didin tim û daîm wan teşwîq bikin.

Xwezîya me bi wan dê-bavan be ku zarokên xwe di nav feyz û rûhanîyeta Qur’anê de perwerde dikin, digihînin û ji bo şefaeta Qur’anê û Mezinê me Resûlûllah naîl dibin!..

46. Ebû Ğudde, Fethu Babi’l-Înaye, rûp. 19; Mûhemmed Nûr Suweyd, Pegamberîmîzîn Sunnetînde Cocuk Eğitim, rûp. 119-120.
47. Bûndarî, Ebû’l-Feth Elî, en,Newadiru’s-Sultanîye (Sîretû Selaahuddîn), rûp. 9; Mûhemmed Nûr Suweyd, ag.e, rûp. 120.

**Rebbê me, me ji wan dilên sitûr ên ku bi sebeb bênesîbbûna ji Qur'anê wêran bûne û barê giran hildigrin mûhafeze bike. Me tevan bike ji wan bendeyên bextiyar ên xwe ku bi şîfa, hîdayet û rehma Qur'anê gihandine û ew di nav hizûrê de bi wusleta îlahî ve dibezin!**

**Amîn...**



# *Hîçîtî*

*Ewên ku dikarin bi awayekî layiq ezamet û qudreta Heq îdrak dikin di wan de ne ji bo doza hebûnê, ne jî ji bo îddîaya duretî û ezperestîyê mecal dimîne. Tam berevajî vê, ew bi hesta eczîyet û hîçîtîyê adeta bi mûmekî ku dihele, werdigerin. Ew bi amadekarî û îstîdadên wiha bala, di hizûra Heq de îksîrê eczîyetê diçêjin, bi zirwa hîçîtîyê digihin û dibin dostên Heq.*

*Dîsa mûmînên kamil di nav hissîyata; "ya Rebbî! Hemû nîmet lutfa te ne." Di nav ğeyret û hewldana gihiştina zirweya "hîçîtî"yê de dijîn.*

# HÎÇÎTÎ / هيچ

"Dema tu derkevî ji navberê,
Aferînerê te dimîne!"

Însan, wekî hemû mexlûqatan dema ew hîç ne tiştek bû û hê navê wî nedihat gotin jî, ew bi lutf û kerema Xuda ji bo fermana îlahî ya "**kun!**/**çêbibe!**" bûye mezher û xuyageh. Bi vî awayî ew ji "**hîçîtî**"yê yanî ji "**tinebûn**"ê ji bo alema "**hebûn**"ê hatiye derxistin..

Dîsa însan, ji bo bibe "**heye**" hîç ti bedelek nedaye, yanî mecanen, ew sirf bi lutfa îlahî hatiye hebûnê.

Ji vê jî zêdetir ew bi "**ehsenê teqwîm**/**bi qiwama sipehîtirîn**" hatiye aferandin, bi îstîdadên mûstesna hatiye xemilandin û ew bi "**eşrefê mexlûqatan**" yanî bi "**şereftirînê heyberên**" bêjimar hatiye kirin. Naxwe însan li hemberî Xaliqê xwe deyndar e ku şukrekî bêdawîn jê re bike.

Di vê mijarê de mesela ji hemû meselan mûhîmtir û dijwartir ev e; mirov karibe bedela nîmeta "**îman**"ê eda bike. Lewra xwe, xwedî îddîa-kirina ji bo tiştekî ku bedelê wê nedabe îştîğala bi ebesî ye. Cennet û ji wê biwêdetir mezherîyeta ji bo Cemalûllah jî; wek

hemberê sedaqet, dostanî û jîyîna di halê hîçîtîyê de lutf û îkrameke mûstesna ya wî Xuda yê ku merhemeta wî bê nîhayet e.

Pêğemberan jî di xusûsa edakirina şukrê bi awayekî layiq ji bo Cenabê Heq de heyateke evdînîya di rewşa îtîrafkirina bi eczîyeta xwe de jîyane.

Çawa **Mezinê** me bi şev, dirêj dirêj nimêj kirine heta ku lingên wî werimîne; cilên xwe, riha şerîfa xwe û cihê ku lê çûye sicûdê bi hêstirên mûbarek ên çavên xwe şûştine. Dema jê re dihate gotin:

"-Ya Resûlellah! Xuda Teala gunehên we yên ku bûrîne û yên ku hê werin jî efû kirine, çima tu ev qeder digrî?" Mezinê me wiha bersiva wan dida, digot:

"-*Ma bila ez nebim evdekî ku zehf şukr ji Xuda re dike?..*" [48]

Ewê ku saiqê aferandina kaînatê ye...

Ewê ku hebîbê Xuda ye, hezkirîtirîn evdê wî ye, zirweya evdînîyê ye.

Wî jî, çi qeder îbadet kiribe bila kiribe ew di nav vê îdrakê de bû ku ewê nikaribe bi awayekî layiq ji Cenabê Heq re şukr bike, ew dilê ummana (pehnava-deryaya) merhemetê bû, ku alem di nav xwe de dihewand, li hizûra Heq bi hesta hîçîtîyê dilerizî. Bi vê sebebê wî amelên ku dikirin tim û daîm ne-têr û heta di hukmê "**hîç**"ê de didît û heta ku jê dihat taet û niyazên xwe her zêde dikirin.

Wî çi qeder halê evdînîya xwe ya ku di navê de bû û çi qeder nuqsanî û bêkîfayetîya xwe li hemberî şanê ulûhîyeta Rebbê xwe didît jî, di her firsendê de tobe û îstiğfar dikir. Çawa wî di hedîsên şerîf ên xwe de wiha gotiye:

48. Li Îbnû Hibban, II, 386'an binêrin.

“*Qesem bi Xuda ye, ez her rojê ji heftê caran zêdetir efûya xwe ji Xuda dixwazim û tobe dikim*.” [49]

“*Carina çêdibe ku dilê min tê perdekirin. Lêbelê ez rojê sed carî îstiğfarê ji Xuda dikim*.”[50]

Tabîî ye ku ev tobe û îstiğfara Mezinê me Hezretê Pêğember di pirranîya caran de ne ji bo xeta û qusûrekê bûye. Li alîyekî wî endîşe dikir ku nikaribe deynê xwe yê şukrê tam eda bike. Li alîyê din jî wî reğbet û arzûyeke zehf zêde hebû ji bo, bi riza’ya Heq Teala naîl bibe, bigihe û hê bêhtir ji wî nêzîk bibe. Lewra ji ber ku Mezinê me daîm di nav teraqqîyeke manewî de bû, li gorî hal û meqamê wî yê paştir ew hal û meqamê wî yê berê di sewîyekeke berjêrtir de bû, wî ji bo wî hal û meqamê berê îstiğfar dikir.

**Hezreta Aîşe**, yekî ji wan dîmenên ulwî yên zarezarkirina wî ji Rebbê wî ya di nav vî ufûqê dilî de wiha diguhêze, dibêje:

“Dema ez şevekê şîyar bûm, min pêğemberê Xuda li cem xwe nedît. Ev îhtîmal hate aqilê min ku dibe ew çûbe dev yekê ji hevserên xwe yên din. Min destê xwe bi hostahî li terefên xwe paland. Destê min li lingên wî ket. Min ew dem fehm kir ku ew di sicûdê de ye. Min guhê xwe da ser wî, ew bi îskeîsk digrî û wî ev mûnacat dikir:

اَللّٰهُمَّ أَعُوذُ بِرِضَاكَ مِنْ سَخَطِكَ.
وَبِمُعَافَاتِكَ مِنْ عُقُوبَتِكَ وَأَعُوذُ بِكَ مِنْكَ.
لَا أُحْصِى ثَنَاءً عَلَيْكَ أَنْتَ كَمَا أَثْنَيْتَ عَلٰى نَفْسِكَ.

“«*Xudayê min! Ez bi rizaya Te xwe ji hêrsa Te, bi lêbûrîna Te jî xwe ji cezakirina Te diparêzim! Xudayê min! Ez ji Te, ne ji bo*

49. Buxarî, Deawat, 3; Tirmizî, Tefsîr, 47.
50. Mûslim, Zikr, 41; Ebûdawud, Witr, 26.

*dîgerê Te, lêbelê dîsa xwe diavêjim ber penaha Te. Ez nikarim wekî ku layiqê te medh û pesnê te bidim! Te çawa medh û pesnê xwe dabe, Tu wilo yî!»”* [51]

## KAKILA EVDÎNÎYA XALIS

Em wek însan mezintirîn wezîfa me, em hewl bidin deynê şukrê xwe yê ji Rebbê xwe re ji stûyê xwe eda bikin. Heta çêbûna ji nebûnê jî nîmeteke wilo ye ku însan ji şukrê wê bêçare ye. Digel ku rewş ev e jî; em ji navbera heyberan însan in, em ji navbera însanan jî ji ehlê îmanê ne, -li gorî rîwayetê- em ji navbera 124 hezar pêğemberan jî bûne ji ummeta Mezinê xwe Hezretê Mûhemmed Mûstefa, (ev hemû) çi meziyetên mûezzam in!..

Heke em li hemberî van nîmetan ji Rebbê xwe re biçin sicûda şukrê û emrekî temam serê xwe ji sicûdê ranekin jî, dîsa hindik e, dîsa kêm e, dîsa di hukmê “hîç”ê de ye...

Ev hedîsa şerîf, vê heqîqetê çi qeder bi awayekî net îzah dike:

“*Zilamek, heke ji roja ku ji dêya xwe bûye heta bi roja ku yextiyar bûye, hewl bide ji bo riza'ya Xuda û bi nîyeta taetê enîya xwe ji sicûdê raneke, ew zilam dîsa jî (bi hizra ku ew ji edakirina şukrê wan nîmetên ku Rebbê wî jê re lutf kirine, bêçare ye), roja qiyametê amelên xwe kêm dibîne..*” [52]

Wate heyateke îbadetê ya wiha jî ji bo rizgarîya ebedî ya me, ne kafî ye. Lewra Cenabê Heq, bi amelên me re esl wê li qelbên me meyzîne. Rebbê me, qelbekî selîm ji me dixwaze. Qelbê selîm jî bi qiwama dilekî ve bend e ku li hemberî Heq bi hestên “**hîçîtî û eczîyet**”ê tije be..

51. Mûslim, Selat, 222; Tirmizî, Deawat, 75/3493.
52. Ehmed, IV, 185.

Li cem Heq, tekane qîmetê me jî, bi vê ve bend e;

-Heke em karibin bi qiwama vî dilî ji Heq re heyateke li ser îtaet, hemd, şukr û dûa’yê bijîn,

-Divê haya me jê hebe ku heke rehma îlahî tecellî neke em nikarin hîç bi ti amelekî salih ê xwe rizgar bibin,

-Divê em jibîr nekin ku wekî îbadetên me, îhtiyaca dûayên me jî bi qebûla îlahî heye,

-Divê em bawerîya xwe bi amelên xwe neyênin; lêbelê divê em kirasê hîçîtîyê li xwe bikin û wilo lêbûrîna Rebbê xwe hêvî bikin.

Ha ev e, qiwama dilî ya ku kakila evdînîyeke xalis pêktîne...

## HER IŞ DI PIŞTÎ HÎÇÎTÎYÊ DE DESTPÊ DIKE

Heyateke îbadetê ya ku bi qiwama dilekî ya wiha tê jîyîn, evdî ji bo Heq bi keş û hewaya dostanîyê bilind dike. Lewra pencerên qelb navebin heta mesafe di hîçîtîyê de neyê standin.

Ji lewma yek ji meseleyên mûhîmtirîn ên tesewwufê heta mûmkin bibe berterefkirina “ezperestî”yê ye ku ew jî hevdij û dijmina hîçîtîyê ye. Çawa bi vê xusûsê re elaqedar, lewhên xeta husnê aneneyeke sipehî ku ji sedsalan û bi vir ve tê û dîwarên dergehan dixemilînin jî bi xwe re îqaz û peyaman hildigrin.

Di lewhekekî ji van lewhan de îfadeya “**hîç**/ هيچ” cih digre ku ew jî vê dide telqîn û hînkirin; ji bo mirov karibe nesîbê xwe ji sirrên îlahî wergire, pêşî divê mirov nefsanîyeta xwe berteref bike. Yanî heta mirov xwe ji ezperestîyê xilas neke û negihîje hîçîtîyê, mirov nikare ji tekamula manewî biaxive.

Alema hundurîna her însanî, çûn-hatina di navbera temayulên **ficûr** û **teqwa**'yê de taqîb dike. Heyata nefsanî, di her weqaetê de tim û daîm "**ezperestî**"yê; heyata rûhanî jî "**hîç**"îtîyê, yanî vê telqînê dide; her nîmet lutfa Xuda ye.

Pevçûna di nava me de jî, pevçûna ezperestî û hîçîtîyê ye. Heke em karibin arzûyên nefsanî û ficûrê berteref bikin, naxwe emê karibin "**ez**"ê, wate kibr, ğurûr, ezperestî, enanîyetê bi "**hîç**"ê wergerînin. Di rêya kamilbûna manewî de her tişt jî piştî bi serxistina "**hîç**"ê li ser "**ez**"ê destpê dike. Sirrê مَنْ عَرَفَ نَفْسَهُ فَقَدْ عَرَفَ رَبَّهُ /*kî xwe nas bike, ewê Rebbê xwe jî nas bike»* di piştî vê nuqtê de tê îdrak-kirin, wate "marîfetûllah/karîna bi qelbê xwe Rebbê xwe naskirin" jê re dibe nesîb.

Ew mûmînê ku bi halê hîçîtîyê gihabe û nesîbê xwe ji marîfetûllahê wergirtibe, ewê destpê bike li vê cîhana fanî sirr û hikmetên îlahî di alema dilî ya xwe de bixwîne. Di bara wî evdê bextiyar de, hikmeta wê sirra ku siltanê arifan **Hezretê Ebdûlqadirê Geylanî** li cem Heq manen bihîstî:

*"Ez sirrê însanî me.."*[53] tecellî dibe.

Ji lewma dostên Heq di dirêjahîya emrê xwe de -heke tabîr caiz be- di nav hewldanê de bûne ji bo karibin demğa îbtalê li "**ezperestî**"ya xwe bidin û gotine:

"Heke di kesekî de harfeke ezperestîyê bimîne, ew neşê ji Xuda re bibe dost."

Lewra ji bo mirov karibe rêya dergehê îzzeta Heq bibîne, pêşî divê mirov perda ezperestîyê ji navberê rake. Ji lewma dilên arif gotine; *"dema tu ji navberê derkevî, Aferînerê te dimîne."*

53. Fusûsû'l-Hikem, terc. Ve Şerhî, I, 48'an binêrin.

Ji ber ku dostê Heq **Hezretê Mewlana** kariye di Heq de fanî /tine bibe û ezperestîya xwe bi hîçîtîyê wergerîne, ew ketiye wî hewzê ku cuzzamdar têde bûn û wî bi teserrufeke manewî ew dilên mûzderib îhya kirine.

**Hezretê Behauddîn Naqşîbend**, ji bo karibe ji astenga ezperestîyê bibûre xizmet ji heywanan re jî kiriye û rê bi mexlûqatên ku di rê de diçûn, daye û wî bi hessasîyeta "*Yê ku ez û ew aferandine cenabê Heq e..*" nefsa xwe bi wan re hevkêş dîtiye.

Qazîyê Bûrsa'yê **Hezretê Hudayî**, ji bo karibe dîwarê hebûn û ezperestîyê yê di dilê xwe de hilweşîne, bi fermana seydayê xwe li çarçîya Bûrsayê bi xeftanê xwe yê bisîm ceger firotine û bi sedaqet wezîfa temîzîya destavxaneya dergehê îcra kiriye. Bi vî awayî piştî wî ezperestîya xwe sifr û tine kiriye, di keş û hewaya maneyê de dest bi wergirtina mesafê kiriye.

Ha di yên ku dikarin bi awayekî layiq ezamet û qudreta Heq îdrak dikin di wan de ne ji bo doza hebûnê, ne jî ji bo îddîaya quretî û ezperestîyê mecal dimîne. Tam berevajî vê, ew bi hesta eczîyet û hîçîtîyê adeta bi mûmekî ku dihele, werdigerin. Ew bi amadekarî û îstîdadên wiha bala, di hizûra Heq de îksîrê eczîyetê diçênin, bi zirwa hîçîtîyê digihin û dibin dostên Heq.

## BIBE HÎÇ KU TU BIBÎ TAVA TAVEROJAN...

**Hezretê Xalidê Beğdadî** dostê mezin ê Heq jî, digel şohreta wî ya ku alema Îslamê tev dabû ber xwe û îlmê ferehê wî yê wekî deryayê jî, li gorî rîwayetê ew di piştî rêwîtîya salekê de li pêşberî **Hezretê Ebdûllahê Dehlewî** bi edeb li ser çokên xwe rûniştiye. Wî hemû mesnedên ğurûr û kibrê ji dilê xwe hilkirin, avêtin û wî hemû îtîraz û îğwayên nefsa xwe dane huşkirin û bi sedaqet ew wezîfa temîzîya destavxanê ya ku pê hatibû sipartin, anîye cih. Bi vî awayî

wî taca tewazû, tinetî û hîçîtîyê daye serê xwe û di encama tehsîla manewî ya ku dîtî de ji bo îltîfatên seydayê xwe û îkramên manewî yên wî bûye mezher.

Çawa dema veqetîna wî ji dergehê Hezretê Dehlewî hatiye jî di çavê herdu siltanên maneyê de jî dilopên mehebbetê hebûn. Ferq di navbera hatin û çûna Hezretê Xalidê Beğdadî de zehf mezin bû. Lewra di hatina wî de ji bo karibe dersa hîçîtîyê bidiyê Hezretê Ebdûllah Dehlewî nederketiye pêşwazîya wî jî lêbelê vêga wî ew bi îhtîrameke mezin û îzzet birê dikir. Digel hemû şermokî û mehcûbîyeta Hezretê Xalidê Beğdadî, Hezretê Pîr, bi zengûyên hespî girt û ev şagirtê ezîzê xwe bi destê mûbarekê xwe li hespî siwar kir. Heta bi mesafa çar mîlan jî bi oğir kir. Piştre ji mirovên li cem xwe re di bara wî şagirtê xwe de got:

*"-Xalid, rahişte her tiştî û bi xwe re bir."*

Naxwe heke însan, di îlmê de bi mertebeyeke bêhempa bigihe jî dîsa mecbûr e ku îlmê xwe bi manewîyatê tezyîn bike. Ji bo vê jî terbîya manewî şert e. Di rewşeke berevajî de însan, wê bikeve teqana ğurûr û kibra nefsa xwe û ewê nikaribe xwe ji çûna helakê xilas bike. Ewê ku nikaribe nefsa xwe bavêje nav lingan, ew nikaribe bi zirweyên kemalata manewî ve hilgere.

Hezretê Xalidê Beğdadî bi îlawe li ser îlmên zahirî yên xwe ji ber ku di îlmên batinî de jî bi ziwe bûbû, jê re "**tava taverojan**" dihate gotin. Telebên wî zehf bûn, çi qeder helqeya îrşada manewîya wî fereh dibû heta tu bibêjî bes fereh bû. Îro jî gellek ji ummeta Mûhemmed bi bereketa manewîya wî di rewşa perwerdê de ne.

Dostekî Heq yê ev qeder mezin Hezretê Xalidê Beğdadî nameyên ku ji ewladên manewî yên xwe û ji birayên xwe re nivîsandine ji bo me çi derseke mûdhişa "hîçîtî"yê dide. Çawa ew

di nameyeke ku ji birayê xwe yê ji dê-bav re nivîsandiye de halê xwe wiha xulase dike, dibêje:

“.. Ez bi Ellah Teala sûnd dixwim; ji roja ku dêya min ez welidandime û heta bi vêga ez bawer nakim min yek amelê xêrê kiribe ku li cem Xuda meqbûl û mûteber be û hesabê wî jî neyê pirsîn.”

Bêşiwar tişta ku ew siltanê maneyê, dostê Heq ji bo vê hissîyatê ajotiye jî ew halê hîçîtî”yê yê wî bûye ku wî ew li hizûra Heq jîyaye.

Naxwe evdekî, çi qeder amelên salih kiribin bila kirin dîsa divê ew bi wan bawer nebe, xwe kêm bibîne û tim û daîm xwe bavêje ber penaha rehma Xuda.

Hezretê Xalidê Beğdadî wiha got, piştre wiha dibêje:

“Heke tu nefsa xwe di hemû karên xêrê de wek îflaskirî nabînî, ev, nuqta dawîna cehaletê ye. Heke tu wê wek îflaskirî dizanî, ji rehma Xuda jî bêhêvî nebe. Lewra fezl û kerema Ellah Teala ji bo evdî ji (hemû) amelên (salih ên) însan û cinan bi xêrtir in.

Cenabê Heq wiha ferman dike, dibêje:

**"Bibêje: Ew bes bila bi lutfa Xuda, bi rehma wî keyfxweş bibin. Ev ji tişta ku wan li ser hev kom kiriye û berhev kiriye, bi xêrtir e."** [54]

Îbnû Ebbas di bara tefsîra vê ayetê de dibêje; peyva «tişta ku wan kom kiriye» bi maneya «tişta ku wan kesb kiriye, qezenc kiriye» hatiye.

Wekî wan kesên ku şeytan bi aqilê wan leyistiye pişta xwse nesipêre fezla Xuda û di îbadetan de bi ti awayan îhmalkarîyê şanî

54. Yûnus, 10/58.

nede! Bi zikrê qelbî li ser mûraqebê dewam bike! Dema tu di rê de birêve biçî jî ji wî veneqete..” [55]

**Welhasil** her wekî dûayên me, îhtiyaca hemû amelên me jî bi qebûla îlahî heye. Bi vê sebebê divê di dilê mûmînî de bi sebeb ti amelekî salihê wî halê ucb û ezperestîyê nekeve dilê wî.

Li alîyê din divê mûmîn, di vê xusûsê de bi îfratê ve nereve û nekeve ye’sê yanî hêvînemanê. Qisseya **Hezretê Yûnus** di xusûsa ku divê mirov nekeve ye’sê de mîsaleke zehf bi îbret e:

Yûnus bi mûcibê talîmata îlahî li cihê ku wî yê çil rojan teblîğ bikira, di dawîya roja bîst û heftan de qewmê xwe yê ku hê jî nehatibû îmanê, terk kir. Haleveku ew mohleta Cenabê Heq ji wan re nas kiribû hê sê roj jê re mabûn ku ew biqede. Lêbelê hêvîya Yûnus ji wan nema û ew ji nav wan veqetîya, çû. Ew ji gemîya ku lê siwar bûbû hate avêtin û wî di nav nedameta ji xetaya xwe de xwe şermezar kir û li wir masîyekî ew daqurpand.

Yûnus di zikê masîyî de tobe-îstiğfar kir û bi zikr û tesbîhan meşğûl bû. Xuda di ayetê de ferman dike, dibêje:

“**Heke ew ne ji tesbîhkeran bûya, heta roja ku ewê dîsa werin sağkirin ew di zikê masîyî de dima**.” [56]

Di ayeteke din de jî Rebbê me, di xusûsa ku divê ew nekeve bêhêvîyê de ji Mezinê me Hezretê Pêğember re wiha gotiye:

“**Tu bi sebr çavnêrîya hukmê Rebbê xwe bike. Wekî xwediyê masî** (Yûnus) **nebe. Dema wî bi derd bi derd nîyaz ji Rebbê xwe kiribû. Heke ji Xudayê wî nîmetek bi wî ve negihaba,**

55. Mektûbatê Mewlana Xalid, 28. Mektûb.
56. Saffat, 37/143-144.

**bêşiwar ewê, di halekî şermezarkirî de bi warekî şemirandî hatiba avêtin**."[57]

Naxwe evd, tim û daîm îhtiyaca wî bi nîmet û rehma Rebbê wî heye. Bi vê sebebê, divê ew hîç ti zemanekî bi amelên xwe bawer nebe, tam berevajî vê divê ew amelên xwe kêm bibîne û nekeve ye'sê. Divê ew heta bi nefesa dawîna xwe di nav mehwîyeteke mezin de wezîfa xwe ya evdînîyê îfa bike. Divê ew tim û daîm di qiwameke qelbî ya navbera tirs û hêvîyê de xwe bavêje ber penaha rehma Rebbê xwe.

Çawa dîsa **Hezretê Xalidê Beğdadî** di nameyeke dîtira xwe de ji şagirtekî xwe yê ku bi îrşadê wezîfedarkirî re ev nesîhet kiriye. Ev nesîheta wî ji bo halê hîçîtîyê îfadeyeke zehf bi îbret e:

"*...Ez şîretan li we dikim; hûn bi wan tiştan ve meşğûl bibin ku ewê di nefesa dawîn de ji we re lazim bibin, li dûv sunneta senîyye herin, ji sipehîtîyên zahirî yên dinyayî re îltîfat nekin; ew dinyaya ku cihê xapînê ye, çi hindik be çi zehf be li adetên ewaman nenêrin (xwe ji meylkirina adetên li dijî fermanên Xuda biparêzin) û ji bo mûweffeqîyet û husna xatîme ya vî evdê feqîr min ji dûayên xwe jibîr nekin*.." [58]

Wate ew dostê mezinê Heq, di nav endîşeya gelo ezê karibim nefesa dawîna xwe li ser îmanê bidim de ji şagirtê xwe dûa teleb dikir.

## DILÊN DERGEHÊ HÎÇÎTÎYÊ

**Mûsa Efendî** yê ku me ew di piştî heyateke nezîha bi sedaqet, xizmet û wefayê mûzeyyen ji bo ebedîyetê bi oğir kirî jî bi halê

57. Qelem, 68/48-49.
58. Mektûbatê Mewlana Xalid, 25. Name.

xwe yê mehwîyetê û tewazûya bilind ku ji wan re xwedî bû, ji bo di xwe de hisnekirina hebûnekê û hesta hîçîtîyê mîsaleke zindî bû.. Di vê xusûsê de di piştî wefata xwe de jî ji bo hezkirîyên xwe xatirayeke (bîranîneke) manedar hiştiye û li ser îrşadên xwe yên di dilên wan de dewam kiriye.

Wiha ye: Dema wesîyetnameya wî hate vekirin, hê di paragrafên pêşî de em li van satrên wî rast hatin ku hîçîtîya hesta wî ya li hizûra Heq îfade dikin:

"*Her ewê ku hatibe dinyayê wê piştî temambûna wextê xwe, saeta xwe û nefesên bi jimarên xwe ji bo alema ebedî koç dike. Xwezîya me bi wî kesî be ku heyata xwe di rêya Heq de îfna (tine) kiribe û bi rû-sipîtîya xwe bi axretê koç kiribe!...*

*Feqîr jî di vê xusûsê de digel ku min karîbûye nesîbê xwe wergirim jî min bi awayekî layiq evdînî nekiriye. Digel ku ez pîrê fanî (yextiyarê mirok im) me, min nekarîye ser û saman bi xwe bidim. Min heyata mezin ên bişiûr û şerefmend ên Îslamê xwend, lêbelê min nekarîye wê di nefsa xwe de tetbîq bikim. Ez di piştî emrekî ji xetayan tije de bi hizûra Hezretê Ellah Teala bes bi hêvîya meğfîreta wî têm. Lewra ew, Rehman e, Ğeffar e.*"

Heke ew dostê Heq ê ku emrê xwe temam di rêya Xuda de ji bo xizmet û ğeyretê weqf kiribû, wiha bibêje, vêca em divê halê xwe çawa îfade bikin? Cenabê Heq, bi merhemeta xwe bi me tevan mûamele bike!

Dîsa **Sersed Bedrî Beg ê** ku bi arzûya dilê xwe singa xwe li hemberî fitneya terorê ya ku çaryeka sedsalekê ye ku welatê ezîzê me wêran dike û dişewitîne kiriye sîper û canê xwe feda kirriye, berî şehadeta xwe bi mideheke kurt nameyek ji dêya xwe re nivîsandibû, ev satirên wî jî hessasîyeta dilê mûmînekî ku di Heq de fanî bûye çi qeder bi sûretekî berraq teswîr dike:

“*...Heke ez bimrim bi destûra Xuda wê ev mirineke bi qehremanî be. Zinhar negrî! Zanibe ku di singa min de Qur’an heye! Wê di qelbê min de îman û di lêvên min de jî wek dawî zikrê Xuda bibe... Bila dilê te mûsterîh be!*

*Min îbadetên xwe û zikrên xwe tev bexş kirine. Tiştek di destê min de nema. Ez virt û vala diçim hizûra Rebbê xwe. Lêbelê ez hêvîdar im ku ğufrana wî min bi şidihayî û asê hemêz bike.*

*Piştre ma ez ji vê pê ve çi binivîsim, silav li wan be ku pêşî herin!..*”

Sersed Bedrî Beg, di vê mektûba xwe de bi esaleteke ku qehremanên dilan bibijîne xwe, çi xweş îfade dike ku ew li ezperestîya xwe bûrîye, ew di rêya Xuda de ji destkeftîyên xwe jî bûrîye û wî ew jî ji bo dîgerên xwe bexş kirine, wî bawerîya xwe bi amelên xwe neanîye, lêbelê ew bi dilekî ku kirasê hîçîtîyê li xwe dike, dibêje min xwe sirf sipartiye Rebbê xwe û min berê xwe daye wî..

## ÎSYANA PÊŞÎNA LI HEMBERÎ HEQ: EZPERESTÎ

Rebbê me ferman dike, dibêje:

“**Ma însan nabîne ku me ew ji nutfeyekê xuliqandiye. Vêca tu dinêrî ku wa ye, ew ji nişkave bûye dijminekî eşkere!**” [59]

Ew ğafilên ku jibîr kirine eslê wan “**hîçîtî**” û “**tinetî**” ye, ew xwe ji ketina gera xwedbînî, ezperestî û kibra ku mezintirîn felaketên manewî ne, xilas nabin.

Çawa **Îblîs** ji bo ezperestîya xwe bi Ellah Teala re rabû kete cîdalê. Wî di bara Adem de got; **“ez ji wî çêtir im.”** Qehr lê bû û ew (qehra xwe) çû.

59. Yasîn, 36/77.

**Qarûn** jî bi mûcibê îmtîhana îlahî di xezînan de ğerq bû, li hemberî Hezretê Mûsa, ku zekata wî hesab û tehsîl dikir, derket, helwest li hemberî wî danî, xwe mezin kir û got:

**"-Min ev xezîne bi zanîna xwe qezenc kirine."** Wî jibîr kiribû ku ew xezîne ji lutf û îmtîhana Rebbê wî ne. Ew digel xezîneyên xwe yên ku bi wan bawer dibû di bin erdê de hate veşartin.

**Bel'am bin Baûra** ew mezherîyetên ku ji bo wan naîl bûbû kirin aîdê xwe û bi awayekî serxweveçû û meğrûrane meyla hewesa xwe kir. Vêca Cenabê Heq jî ew kire wekî seyekî ku zimanê xwe derxistî û nefesê dide, ehmeq kir û bire helakê.

Dema gemîya dêwane ya ku jê re **Tîtanic** dihate gotin, yekem car di sala 1912'an de derket sefera xwe ya pêşî di nav şaşomaşobûna ğurûr û kibrê de hate gotin; "hîç ti hêz nikare vê gemîyê noqav bike." Ew gemî, di sefera pêşîna xwe de li çiyayê qeşayê ket û tevlî mirovên di nava xwe de di kûrahîyên pehnavê (okyanûsê) de winda bû.

Di 18ê Adara 19152an de gemîya dêwane ya cengê ya Fransizan "**Inflexible**" ya ku bi maneya "xwehr nabe, natewe, rikdar" tê, li Çanaqqale'yê bi giranî birîndar bû û li derveyî sefê ma. Di aynî rojê de gemîya dêwane ya cengê ya Îngilîzan "**Irresistible**" jî ku bi maneya "tişt nikare li pêşberî wê raweste, xwe li berê bigre" pêl mayînê kir û ew jî binav bû.

Dîsa gemîya dêwane ya cengê ya ku hêza deryayî ya hevpeymanan bû, navê "**Golîat**" lê kiribûn. Ew ji Calûtê zalim dihat ku di wextê xwe de wek dêwekî artêşa kufrê ya ku hîç nabeze û naşike meşhûr bûbû. Lêbelê ew jî di 13ê Gulana 1915'an de ji terefê "firqeteyna mûaweneta millîye" ve di ava hînika tengavê de hate binavkirin. Firqeteyna mûaweneta millîye li hemberî wê ew qeder biçûk û lawaz bû ku pê re hîç nayê qiyaskirin jî.

Di sala 1986'an de mekûka fezayî ya bi navê **Challenger** a ku bi maneya "meydan dixwîne" tê piştî hate berdan bi 73ê sanîyeyan peqî û taqimê wê hemû mirin.

Wekî van tarîx bi mîsalên bêjimar şahid e ku ewê rabin bi sifetên ezamet û kibrîya yê Cenabê Heq re bikevin pêşbirkê, ew zalimên ku li hemberî Heq bibêjin "**ez**" û xwe qure bikin wê biçin helakê. Rewşa wan jî dê aynî wekî rewşa qewmên xurt û biqewet ên Ad û Semûdîyan be ku wiha pesnê xwe didan; "**ma ji me xurttir kî heye?**" û bi wan wasîteyên ku bi qabilîyetên zêhnî ku Xuda dabûne wan îcad kiribûn bawerîya xwe dianîn û xwe bi ğurûr û kibrê girtine, wek mîsalên bi îbrettirînê qehr û întîqama îlahî di bin qamçîyên ezabê de helak bûne..

**Welhasil** mûmîn, dema bi nîmetekê bigihe daîm dibêje: **"ev ji fedl û kerema Rebbê min e."** nîmetê dike aîdê xwediyê wê yê rasteqîne û jê re şukr dike. Di şûna ku mirov ji bo hovîtî û dinya-nedîtîya nefsê ya nefsanî ya ku di nav şemûsî û serxweveçûnî de dibêje; "min bi hêza xwe qezenc kir, min bi zanîn û qabilîyeta xwe bidestxist." dûçar bibe de bila mûmîn di nav hissîyata; "ya Rebbî! Hemû nîmet ji kerema te ne." de gihiştina zirweya "**hîçîtî**"yê ji xwe re bike hedef.

Tam berevajî vê dema ew li tengasîyekê rast bên jî di şûna ku îsyan bike, yan jî gileh bike de, bila bi vê hizrê; "hemû qusûr ji nefsa min in. Gelo kîjan qusûra min ji bo vê tengasîyê bûye sebeb?" rewşa manewî ya xwe di ber çavan re derbas bike û bila ew ji bo telafî û îslaha kêmasîyên xwe her kar û xebat bike.

**Cenabê Heq, van hessasîyetan ji bo dilên me bike xureka manewî. Me tevan bike ji bendeyên kamil ên xwe ku bi heqîqeta hîçîtîyê gihane. Me di piştî heyata evdînîyeke ku ew jê razî be de bigihîne zumreya arifan, salihan û sadiqan ku ew ji bo rehm û meğfîreta xwe naîl kirine!**

**Amîn...**



لا تَحْزَنْ إِنَّ اللّٰهَ مَعَنَا

**"Ğemgîn nebe, lewra Xuda bi me re ye.."** (Tewbe, 9/40.)

# *Maîyyet* (معية)

*Mûmînê ku li vê dinyayê dilê wî bi Xuda re be; temenê xwe di hovîtîya nefsanîyetê de zîyan nake, di sefahet û rezaletan de xirab nake, bi dûv macerayên nelazim nakeve, xwe di abesîyan, batilan, harbûnîyan de noq nake, xwe bi sewdayên pûç naxapîne, teqwîma temenê xwe bi gotegotan nalewitîne, lêbelê ew di nav hewldan û ğeyreta dostanîya bi Cenabê Heq re dijî..*

*Dostê Heq Hezretê Mewlana ferman dike, dibêje:*

*"Dema mirov bi Xuda re be, emr (heyat) xweş e, mirin jî. Lêbeblê ew kesê bê Xuda, ewê ku Xuda nabîne jî ava heyatê jî jê re agir e."*

*Ewên ku bi bayê ecel ji hev dikevin û di bêndera temen de ji Heq ğafil bin, ne ew dinyaya ku li pey xwe hiştine li ser wan digrî, ne jî ew axreta ku li pêşîya wan hatiye çikandin, ji wan re dikene..*

## Maîyyet (معية)
## DIGEL XUDA BÛN

Maîyyet ev e; mirov di qelbê xwe de di halê pêhis û îdrakeke bilind de bi Xuda re bûnê bijî, mirov di her dem û gavên xwe de Heq Teala bi we re zanibe, wî bi xwe re bifikre û wî bi xwe re hiss bike û hereketên xwe jî li gorî wê bi xwe re bûnê tenzîm bike..

Ev pêhis û îdrak, mezintirîn lutfa Cenabê Heq e, ji evdê wî re. Lewra ev hal, dostbûna evdî bi Rebbê wî re ye. Dostanî, serkehnîya wê ew e ku hezker dixwaze hinek taybetmendîyên xwe di jêhezkerî de jî bibîne. Ji bo mirov karibe bigihîje dostanîya bi Xuda re jî divê mirov dilê xwe ji tiştên ku însên ji wî dûr dikin paqij bike û îcab dike mirov xwe bi sifetên cemalî yên her wekî Rahman, Rahîm, Efuw, Ğafûr wesfdar bike.

Bûna dil bi Xuda re, ji bo serkeftina di îmtîhana dinyayê de bawername ye. Tam berevajî vê jî netîca jîyaneke ku ji Heq ğafil hatibe jîyîn jî, ji xusraneke ebedî û nedametê îbaret e.

Ev qisse, heqîqeta bûna bi Cenabê Heq re çi qeder bi awayekî wecîz îfade dike:

## TU BI KÊ RE BÛYÎ?

Waizekî li ser kursîyê weizê, ehwalên axretê vedigot. Di nav cemaetê de **Hezretê Şêx Şiblî** jî hebûye.

Waiz efendî di behsa sûalên ku Cenabê Heq wê li axretê (ji însanan) bipirse de wiha got:

“-Ewê bipirse: Te îlmê xwe li kuderê bikaranî! Ewê bipirse; te mal û milkê xwe ji kuderê qezenc kir û ew li kuderê xerc kirin! Ewê bipirse; te emrê xwe çawa derbas kir! Ewê bipirse; îbadetên te di çi rewşê de bûn! Ewê bipirse; ma te li helal û heramîyê diqqet dikir!..

Wî dirêj dirêj got, ewê van xusûsan û wan xusûsan jî bipirse!..”

Hezretê Şiblî jî li waizî guhdarî dikir, bi îfadeyeke nerm û nazik wiha bang kir:

“-Ey waiz efendî! Te sûalek ji pirsên zehf mûhîm jibîr kir! Ellah Teala bi kurtî wê vê bipirse:

«Hey Evdê min! Ez bi te re bûm, ez ji şahraya te ji te nêzîktir bûm; lêbelê tu bi kê re bûyî?!»”

Ha di evdînîya ji bo Heq de hemû mesele, ev e ku mirov, ji bo pêhis, îdrak, îz‘an û qiwameke qelbî ya wiha bibe xwedî!..

Bi rastî însan bi qasî bûna bi Rebbê xwe re di rêya heq de li ser îstîqametê ye. Naxwe bi qasî ku ji Rebbê xwe ğafil bûbe û ew jibîr kiribe jî ji bo hovîtî û dinya-nedîtîya nefsanîyetê û îdlala (jirêbirina) şeytanî dûçar bûye. Cenabê Heq di bara şîyarkirina ji vî halî de wiha dibêje:

“**Nebin wekî wan kesên ku Xuda jibîr kirine ji lewma Xuda jî nefsa wan bi wan daye jibîrkirin. Ha ew ji rêderketî bi xwe ne**.” [60]

60. Haşir, 59/19.

Rûhê însanî, bi ğayeya îmtîhanê li vê dinyaya fanî wekî çûkekî mûzderib e ku di rekiha (qefesa) wî de hatibe hebskirin. Di derûna wî de jana dûrketin û cuda-mayina ji welatê eslî heye. Yê ku vê jana wî bide rawestandin û wî bi hizûr û îtmî’nanê bigihîne jî bi Xuda re bûn e. Ji lewma di nezara aşiqên Heq de halê tirsnakê mirinê berze û winda dibe û mirin, wek rêwîtîya wusleta bi Rebb tê îdrak-kirin. Çawa eshabê kîram jî ji ber ku gihiştina wan ji Xuda û Resûlê wî nêzîk bûye, li nexweşên li ser nivîna mirinê bi ğibte meyzandine û bi wan re silavên xwe ji Sultanê Dilan Mezinê me re şandine.

Bêşiwar rêwîtîya mirinê wê di kîjan keyfîyetê de tecellî bibe, yanî ewê bi hizûra cennetê, yan jî bi ezabê cehennemê bi encam bibe, ev bi vê ve bend e; ka rûh di vê alemê de çi qeder bi Rebbê xwe re ye. Ji lewma divê însan, li vê dinyayê bi Rebbê xwe re be da ku li axretê ji bo wan nîmetên nadîde û ji wan jî biwêdetir ji bo mûşahedekirina rûmet û şerefa cemalûllah naîl bibe ku ew îkrama dostanîya Xuda ne.

Ew mûmînê ku li vê dinyayê dilê wî bi Xuda re be; temenê xwe di hovîtîya nefsanîyetê de zîyan nake; di sefahet û rezaletan de xirab nake; bi dûv serpêhatî û macerayên nelazim nakeve; xwe di abesîyan, batilan, harbûnîyan de noq nake, xwe bi sewdayên pûç naxapîne; dema cahil dev bavêjinê jî, bi wan re nabe mûxateb; teqwîma temenê xwe bi gotegotan nalewitîne, lêbelê ew her di nav hewldan û ğeyreta dostanîya bi Cenabê Heq re dijî..

Dîsa mûmîn, temenê xwe bi xêr û hesenatan mûzeyyen dike, Qur’an û Sunnetê ji xwe re dike rêber û rêzan, bi karên li ser riza’ya Xuda matûf meşğûl dibe, xwediyê heqîqî yê mal û milk nas dike û dizane ka ewê malê xwe û canê xwe çawa bikarbîne. Ew rûhê xwe ji şer û cihên ku sihê bînin ser qîmetên wî yên dînî û exlaqî, diparêze. Ew reğbeta xwe ji bo îbadetan, xêr û hesenatan û dîwanên

sohbetan zêde dike. Di nîhayetê de ew wek şahidekî Rebbê xwe li ser erdê, li pey xwe xatirat û bîranînên ji fezîletan tije, dihêle.

## TE EZ BI KÊ RE GUMAN DIKIRIM?

**Yavûz Sultan Selîm**ê ku hema bibêje temamê salên hukmdarîya xwe di seferan de bûrandine û hezar û yek êş û eleman jî hîç ti zemanekî bêzarî û westin nedanê, demên xwe yên dawîyê ji nedîmê (hevalê) xwe **Hesen Can** re wiha vedibêje:

“Di pişta Yavûz de bi navê şêrpence kwînêrek derketibû. Kwînêr di zemanekî kurt de mezin bû û cihê wê qul bû. Kwênêr ew qeder mezin bû ku me tê re kezeba Yavûzî didît. Ew bi xwe zehf mûzderib bû. Adeta wekî şêrekî birîndar bû. Wî nikarîbû bêçarertîyê qebûl bike, bi berdewamî tektîk û talîmat didan leşkerên cengewarên xwe. Ez ji cem wî ve nêzîk bûm. Wî rewşa xwe qesd kir û ji min re got:

«-Hesen Can, ev çi hal e?»

Min jî hestpê kir ku êdî ew tê dawîya rêwîtîya mirok, digihîje serê heyata xwe ya baqî, min bi ğemgînî jê re got:

«-Padîşahê min, dibe ku wextê bi Xuda re bûna we hatibe!»

Siltanê nehîtî li min fetilî, bi heyret li rûyê min meyzand û ji min re wiha got:

«-Hesen, Hesen! Ma te heta bi vêga ez bi kê re guman dikirim?! Ma te di teweccuha min ya bi alîyê Cenabê Heq de kêmasîyek mûşahede kiriye?»..

Êdî siltan di alemên cipûcuda de noq bûbû, wek fermana dawî ji min re got; sûretê Yasînê li ser min bixwîne. (Min jî sûretê Yasînê

li serê xwend) çi dema ez gihame ayeta «selam»ê jî wî rûhê xwe ji Rebbê xwe re teslîm kir.”

Ew mirovên ku di heyata xwe de bi Xuda re bin, ewê di nefesa dawîna xwe de jî ji bo vê nîmetê bibin mezher. Ha **maîyyet** jî di vê ufûqa îrfanê de dijî. Naxwe maîyyet ev e ku mirov karibe sewdayên berwext ên dinyaya fanî û cazîbeyên nefsanî berteref bike, qelbê xwe ji bo yê jê re layiq be yanî ji Xaliqê xwe re texsîs bike. Lewra qelbekî ku bi Xuda re meşğûl nebe, masîwa dê wî îşğal bike.

Mîsaleke dîger jî:

Di selteneta dinyayê de hîç ti beşerek negihaye sewîya Suleyman (e.s). Lêbelê dinyayê dilê Hezretê Suleyman meşğûl nekiriye û ji ‘bi Xuda re bûna’ wî re nebûye asteng.

Li gorî rîwayetê; roja qiyametê evdekî zengîn tê anîn. Ellah Teala jê dipirse, jê re dibêje:

*“-Tişta ku nedihişt tu evdînîyê ji min re bikî çi bû?”* Ew zengîn dibêje:

“-Ya Rebbî! Pirranîya malê min ez meşğûl kiribûm.”

Cenabê Heq mîsalê ji Hezretê Suleyman tîne û dibêje:

*“-Ma tu ji evdê min Suleyman jî zengîntir bûyî? Naxwe çima ew qeder milkê wî ew meşğûl nekir?”* [61]

Dîsa di nuqta îmtîhana di mal, can û ewladan de ku ew bi qîmettirîn hebûnên însanî ne, di her hal û karî de heyata Eyyûb, ji bo sebr û şukrê ku hesta bi Xuda re bûnê ew dane qezenckirin, nimûneyeke mûstesna ye.

61. Li Bûrsewî, Rûhû’l-Beyan, IV, 258; Beyheqî, Şûebû’l-Îman, V, 202-20333’êyan binêrin.

Ellah Teala Eyyûb di îmtîhanên giran re derbas kir. Pêşî malê wî ji dest wî bir. Piştre bi zelzelekeke dijwar zarokên wî ji dest wî birin. Paştir jî êş û nexweşîyeke giran da bedena wî. Eyyûb di dirêjahîya vê nexweşîya xwe de ku wê bi salan berdewam kir, wî hîç ti gileh û feryadek nekir. Xanima wî **Rahîme Xatûn**ê jê re got:

"-Tu pêğember î; dûayên te meqbûl in. Dûa bike da ku tu ji bo şîfayê naîl bibî!"

Eyyûb jî jê re got:

"*-Ellah, heştê salan sihhet da min. Nexweşîya min jî hê heştê sal çênebûne. Lêbelê ev çend sal in ez mûzderib im. Ez edeb dikim ji Cenabê Heq sihhetê bixwazim!*"

Çi dema nexweşîya wî destpê kir, jê re bû asteng û nehişt ku ew êdî bi hizûra dilî wezîfa xwe ya evdînîyê bîne cih, ew dem wî ji Cenabê Heq nîyaz kir. Li gorî rîwayetê, Mezinê me ev heqîqet wiha îfade kiriye, gotiye:

"*Ez bi Ellah Teala sûnd dixwim ku Eyyûb ji belayê nenalîya û neêşîya. Lêbelê ew îbtîla heft salan, heft mehan, heft rojan û heft şevan li ser wî ma. Wî xwest jipêya nimêj bike; lê nekarî xwe li ser xwe bigre, ew kete erdê. Dema wî di xizmetên xwe yên di rêya Heq de kêmasî dît jî (wî nîyaz ji Rebbê xwe kir) jê re got: «Bi rastî nexweşî li min ketiye.»*"[62]

Di netîca vê destana wî ya sebrê û teslîmîyeta wî de Ellah Teala di wî de wek derd û diltengî çi hebûye tev ji ser wî birin û heyata wî ya berê dîsa wekî wê dayê.

Eyyûb ji nexweşîyê bi efîyetê giha, di sibeha şeva pêşîna ku wek sağlem derbaskirî de «axîneke!» kûr kişand. Dema sebebê wê jê re hate pirskirin, wî got:

62. Li Qurtûbî, Tefsîr, XI, 323, 327'an binêrin.

“-Her şev di wextê seherê de min dengekî ku digot: «Hey nexweşê me, tu çawa yî?» dibihîst. Vêga dîsa ew wext hat, lêbelê min dengê «hey evdê sağlemê me, tu çawa yî?» nebihîst. Ez ji lewma ğemgîn bûm.”

## NEXWEŞÎYA JI HEMÛ NEXWEŞÎYAN ÊŞDARTIR

Li gorî rîwayetê Îsa li şexsekî rast hat, di çermê wî de çalebelekî hebû û ji nexweşîyê herdu ceynikê wî jî herifîbûn. Wî şexsî, di rewşeke adeta ji nexweşîyên li ser xwe bêxeber de, ji xwe bi xwe re digot:

“-Hemd û senayên bêjimar ji Te re bin ku te ez ji wê nexweşîyê xilas kerime; ewa ku te gellek ji mirovan pê mûbtela kirine!..”

Îsa bi mebesta ku sewîya mûxatebê xwe fehm bike û kemala manewî ya wî di ber çavan re derbas bike, jê re got:

“Hey filan kes! Ma kîjan derd hebû ku Xuda tu jê xilaskirî?!”

Nexweşî wiha bersiv da, got:

“-Ya Rûhûllah! Nexweşîya ji hemû nexweşîyan êşdartir ew e ku qelbê mirov ji Heq ğafil û mehrûm be. Şukr jê re bin ku ez di zewq, lezzet û fiyûzata digel Cenabê Heqe de me. Her wekî ku xebera min ji nexweşîyên di bedena min de nîn e..”

Ha Cenabê Heq jî di ayetên pîroz de tîne bîra me ku ew me ji nexweşîya ji hemû nexweşîyan êşdartir ji ğafilbûna ji Heq dide dûrkirin û dide zanîn ku di her dem û gavê de ew bi evdên xwe re ye. Xuda di vê xusûsê de dibêje:

وَهُوَ مَعَكُمْ اَيْنَ مَا كُنْتُمْ

“**Hûn li kuderê dibin bibin, Ew bi we re ye**.” [63]

وَنَحْنُ أَقْرَبُ اِلَيْهِ مِنْ حَبْلِ الْوَرِيدِ

“**Em ji şah-raya wî** (însanî) **jî ji wî nêzîktir in**.” [64]

وَاعْلَمُوا اَنَّ اللّٰهَ يَحُولُ بَيْنَ الْمَرْءِ وَقَلْبِهِ

“..**Vê baş zanibin ku Ellah, dikeve navbera însanî û dilê wî**..” [65]

وَ لِلّٰهِ الْمَشْرِقُ وَالْمَغْرِبُ فَأَيْنَمَا تُوَلُّوا فَثَمَّ وَجْهُ اللّٰهِ

“**Rojhilat, ya Xuda ye û rojava jî. Hûn berê xwe bidin kuderê, rûyê** (zatê) **Xuda li wir e**..” [66]

Wek bi vê xusûsê re têkildar di hedîsa şerîf de hatiye gotin:

“*Bilindtirîn merteba îmanê ew e; tu li kuderê dibî bibe, her zanibe ku Xuda bi te re ye*.” [67]

## LI HIZÛRA YARÊ BILIND

Cenabê Heq her demê û li her cih û deverê bi me re ye. Ya mûhîm; em jî karibin her demê û li her cih û deverê bi wî re bibin. Amelekî biçûçik ê ku bi vê pêhisê were kirin jî wekî çîyayan mezin dibe. Di tiştekî ku ji Xuda ğafil were kirin de xêr nîn e. Nimêja ku bi dilekî wiha ğafil hatibe kirin bêrûh e, sedeqa ku hatibe dayin pûç e, dûaya ku hatibe kirin bêhember e û toba ku hatibe kirin jî îhtiyaca wê bi xwe jî bi tobê heye.

Ev qisse, vê heqîqetê çi xweş îzah dike:

63. Hedîd, 57/4.
64. Qaf, 50/16.
65. Enfal, 8/24.
66. Beqere, 2/115.
67. Heysemî, I, 60.

**Mecnûn** bi evîna Leylayê bi çol û çîyan ketibû, haya wê jê çênebûbû û ew wilo di ber nimêja nimêjkerî de derbas bûbû. Ew kesê ku nimêj dikir silav dabû û piştî ji nimêjê derketibû, bi hiddet bang dike, dibêje:

“-Ma tu nizanî ku mirov di pêşîya yê nimêj dike de derbas nabe?!”

Mecnûn jî vê bersivê didiyê:

“-Min ji ber evîna Leylayê tu nedîtî! Vêca te, ji evîna wî Xudayê ku tu li hizûra wî nimêj dikî, çawa ez dîtim?!”

Naxwe ew dilê ku ji bo fanîyekê jî sewdadar be, di bara kesê ku jê re evîndar bûbe hissîyat wî dinixumîne. Çavê wî tiştekî din nabîne. Aynî wekî vê, îbadetên evîndarên Heq jî di keş û hewaya bi Xuda re bûna di maneya kamil de tê edakirin. Dilek, çi qeder di zirweya bi Xuda re bûnê de nêzîk bibe, îbadetên wî jî ew qeder sewîyê qezenc dikin.

Dêya me **Hezreta Aîşe** dibêje:

“Dema Resûlûllah radibû nimêjê, car caran ji nava wî wekî kela beroşê dengek dihat.” [68]

**Hezretê Elî** jî di heyata xwe ya îbadetê de dikete keş û hewaya hizûr û xuşû‘ake mûstesna. Di mûharebekekê de tîrek li lingê wî ketibû. Ji ber dijwarîya êşa wê tîr ji lingê wî nederanîn. Hezretê Elî got:

“-Naxwe ez rabim ser nimêjê û hûn jî wilo wê jê derînin!”

Wan wekî wî gotî, kir jî. Hîç ti zehmetîyek nekişand û wan jî bi hêsanî ew jê deranîn. Dema Hezretê Elî silav da û ji wan pirs kir, ji wan re got; “we çi kir?” Mirovên li wir gotin; “me ew jê deranî!”

68. Ebûdawud, Selat, 157; Nesaî, Sehw, 18.

Ha xuşû û şîranîya manewî ya di îbadetê wî mirovî de ku qelbê wî bi Xuda re be cipcuda ye.

Li alîyê din jî maîyyet, yanî hesta bûna bi Cenabê Heq re sade ne bi demên îbadetê tenê re taybet e. Ew qiwameke dilî ya wilo ye ku heyata mûmînî tevî tertîb dike. Ew hessasîyeteke manewî ya welê ye ku bi qasî îbadetên mûmînî, heyata malbatî ya wî, heyata îctîmaî ya wî, qezenca wî, welhasil hemû kirinên beşerî yên wî tenzîm dike...

## DEST DI KAR DE DIL DI YAR DE...

**Hezretê Mûhemmed Parîsa** ku ji terefê **Hezretê Şahê Neqşebend** ve hatibû gihandin û perwerdekirin, dema ew diçû hecê, rêya xwe bi bajarê Beğdadê xistibû. Li bajarê Beğdadê li ser-rafekî ciwanê rû-nûranî rast tê. Ew difikre ku ev ciwan bê rawestin bi gellek mûşterîyan re di halê kirrîn-firotinê de zemanê xwe bi meşğûlîyetên zêde yên dinyewî re derbas dike û ew ji bo wî ğemgîn dibe. Ew di dilê xwe de dibêje:

"-Heyf! Tam di demeke ku ew bi awayekî sipehî îbadetê bike de xwe bi dest meşğûlîyetên dinyayê ve berdaye!" Dema ew ji nişka ve bi mûraqebê digihe jî bi heyret mûşahede dike ku qelbê vî ciwanê zêran dijimêre û difiroşe bi Ellah Teala re ye. Vêca dibêje:

"-Maşaellah! Dest di kar de dil di yar de ye!.." û wî ciwanî teqdîr dike.

Dema Hezretê Mûhemmed Parîsa digihîje Hicazê jî li kalemêrekî rih-sipî rast hat ku wî xwe bi perda Ka'bê girtibû û wekî jinan digrî. Pêşî wî li dîmena zahirî ya şekl û şemalê wî kalemêrî meyzand ku ew çi xweş li ber Cenabê Heq digere û bi ğibte got:

“-Xwezî min jî karîba wiha bigrîm û xwe bavêjim ber penaha Heq.” Paşê dema wî li qelbê wî meyzand, dît ku hemû dûa û girîyên wî ji bo teleba tiştekî dinyayî yê fanî ye. Ji lewma qelbê reqîqê wî ğemgîn dibe.

Ha piştî dil bi Xuda re bûbin ti zirara karên dinyayî çênabe. Lêbelê mehzûrên îbadet-kirina bi dilekî ku telaşên dinyayê ew ji Heq ğafil kiribe jî zehf in!.

Ji bo însanî sermayê ji hemû sermayeyan bi qîmettir zeman e. Zeman nayê kirrîn, bi deyn nayê dayîn û bi deyn nayê standin jî. Giringtirîn beşa nîmeta zemanî jî dema vêga ya di navbera dema bûrî û dema hêtê de ye. Lewra dosyayên aîdê dema bûrî hatine girtin û mohrkirin. Êdî di wan dosyayan de tadîlat-kirin ne mûmkin e. Gelo dema hêtê jî ji kîjan surprîzan avis e, ew jî mechûl e.. Ji lewma bila mûmîn, vî sermayê xwe yê ji hemû sermayeyan bi qîmettir jî dîsa ji bo tişta bi qîmettirîn hesr û weqf bike û zemanê xwe jî di nav bûna digel Xuda de binirxîne.

**Hezretê Ehmed Rîfaî** dibêje:

“Ji bo evd bereketa demê ew e ku têde nêzîkbûna ji Cenabê Heq pêkwere.”

**Hezretê Ebdûllah bin Zeyd** jî gellek peyv û nesîhetên wî yên tije hikmet hene. Wî rojekê got:

“Xwezî bi wî kesî ku hem li dinyayê, hem jî li axretê dijî!”

Dema yekî jê pirs kir, jê re got:

“-Ewê çawa hem li dinyayê, hem jî li axretê bijî?”

Wî ev bersiv da, got:

“-Li dinyayê Ellah Teala ji dilê xwe dernaxe. (Ew di tefekkura herkên qudreta îlahî de kûr dibe) daîm di halê dûayan de dijî, bi xêra vê jî li axretê ji bo merhemeta wî dibe mezher.”

Rojekê, **Îbrahîm bin Edhem** ku yek ji dostên Heq e, rêya xwe bi **Hezretê Îmamê Ezam Ebûhenîfe** xistibû. Şagirtên li hawîrdora Ebûhenîfe jî bi çavê biçûkdîtinê, ğerîb-dîtinê li Îbrahîm bin Edhem meyzandin. Hezretê Îmamê Ezam ev rewşa wan his kir û wiha Îbrahîm bin Edhem bang kir, jê re got:

“-Mezinê me kerem bike, we şeref da dîwana me!”

Îbrahîm bin Edhem bi îfadeyeke mehcûbane silav da û ji wir çû.

Şagirt, li hemberî vê îhtîram û îltîfata ku Ebûhenîfê hiqûqnas ê ku li çaralîyên dinyayê di zirwê de bû ji bo derwêşekî şanî-dayî şaş û metel man.

Piştî Îbrahîm bin Edhem ji wir çû, şagirtên wî ji Îmamê Ezam pirs kirin, jê re gotin:

“-Dema ev zat, bi we were qiyaskirin, ji bo sifetê efendîtî û mezinatîyê ne layiq e? Gelo zatekî wekî we çawa jê re dibêje; «mezinê me»?

Hezretê Îmamê Ezam ev bersiva mûhteşem da wan ku di aynî demê de ew tewazûya bilinda wî jî îfade dike:

“-Ew, tim û daîm bi Xuda ve meşğûl e, em jî bi zahirê kar ve meşğûl in ...”

Dema **Hezretê Ebûbekr Şiblî** jî tesewwuf tarîf dikir, wiha digot:

“Li herdu dinyayan bi Xuda re bûn e, ji wî pê ve tiştekî din nedîtin e.”

Ha qiwama dilî ya ku terbîya tesewwufî dixwaze însanî bigihênîyê, ufûqê pevrebûneke wiha ye.

## FECAETA ĞEFLETA JI HEQ

Ew dilê ku di şûna divê li hemberî med-cezîrên heyatê hemd, riza, teslîmîyet û şukrê şanî bide de nankorî, geleh, îtîraz û nezanîyê şanî dide, naxwe wî hessasîyeta 'bi Xuda re bûnê' winda kiriye.

Lewra evdek, çi qeder bi Xuda re be, Rebbê wî, bi fedl û kerema şanê ulûhîyeta xwe hê bêhtir ji wî nêzîk dibe. Lewra hedîseke şerîfa ku mîsaleke hezkirina Cenabê Heq ji bo evdê wî ji îdraka beşerî re pêşkêş kiriye, wiha îfade dike, dibêje: Heke evdek bostekî ji Rebbê xwe nêzîk bibe, Rebbê wî zendekî jê nêzîk dibe. Heke evd bi rêveçûn ber bi Rebbê xwe ve here, Rebbê wî bi çargavkî ber bi wî ve tê. Ew li kuderê zikrê wî bike, wê pê re bibe, rehm û arîkarîya xwe ji ber wî nagire.[69]

Ev jî heqîqetek e ku ew dilê di nav hizûr û refaha maddî-manewî de Rebbê xwe jibîr nake û pê re dibe, dema diltengî bigihîje wî, ewê Rebbê xwe li cem xwe bibîne. Heke evd, di zor û tengasîyên ku bi wan tê îmtîhankirin de sebr bike, ji bo ecra wan bibe telebkar, Xuda wê ji wî re sebr û sebatê hêsan bike. Heke ew xilasbûnê bixwaze, Xuda bi nusret (arîkarî) û rehma xwe ji wî re kafî dibe.

Ellah Teala failê mûxtar e, yanî ew di fiêla xwe de serbest e. Ew, evdê xwe bi nîmetê jî û bi mehrûmîyetê jî îmtîhan dike. Heke di îmtîhanên giran de jî evd bi Rebbê xwe re bibe, ew di îmana wî de tescîla sedaqeta wî ye. Ji lewma Cenab Heq mezintirîn îmtîhanên xwe dane evdên xwe yên ku zehf ji wan hez dike.

69. Li Buxarî, Tewhîd,5,35, 55; Mûslim, Tewbe, I, Zikr 2, 19'an binêrin.

Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

“**Ma ji we were hûnê herin bihiştê hê tişta hatî serê qewmên berî we nehatî serê we jî? Wisan xizanî û tengasî bi ser wan de hat û ew wisan rahejiyan heta paşê pêğember û yên ku pê re îman anîbûn, digotin: «Dê kengê arîkariya Xuda were?» Bêguman arîkariya Xuda nêzîk e**.” [70]

Bi vê sebebê hîç ji mislimanekî re ne heq e ku dema li meşeqqetekê, yan jî zehmetiyekê rast were bi bêumîdî biêşe û van cure îfadeyên îsyanê yên ku serê wan digihîje heta bi kufrê bikarbîne û bibêje; “çima ew Xudayê ku ez evdê wî me, di zemanên zor ên min de ne li cem min e?” Lewra di vê alema îmtîhanê de Ellah evdê xwe îmtîhan dike, -haşa- ne ku evd Rebbê xwe îmtîhan dike!

Bi vê sebebê dema mûmînek li zehmetîyên heyatê rast were, çawa di ayetê de jî hatiye:

“..**Ğemgîn nebe, Xuda bi me re ye**..” [71] bila ew vê telqîna maîyyeta di vê ayetê de bîne bîra xwe û bila ew hizûra pevrebûn û dostanîya bi Cenabê Heq re bijî. Di îmtîhana dinyayê de ew pêğember û evdên salih ên ku ji her kesên din bêhtir di çembera çîle û êşan re derbas bûne tim û daîm ev hizûr jîyane û ew tewzî (belav) kirine.

Divê em jibîr nekin; ji bo mûmînên kamil ên ku dilên wan bi Xuda re ne, hem li dinyayê, hem jî li axretê ji wan re ğemgînî û tirs nîn e. Cenabê Heq ji bo wan, îkramên xwe yên di nefesa dawîna wan de û mizgînîyên xwe yên uxrewî wiha dide zanîn:

“**Bêguman ewên ku dibêjin: Rebbê me Ellah e, piştre xwe rast û durust dikin ferîşte têne cem wan û ji wan re dibêjin;**

---

70. Beqere, 214.
71. Tewbe, 9/40.

**«netirsin, ğemgîn nebin û bi wê cenneta ku peymana wê ji we re hatiye dayîn dilşad bibin.»**”[72]

Xwezî bi wan dilan be! Li hemberî bablîsokên nefsanî û medcezîrên heyatê ku wê bi awayê naîlîyeta ji bo mizgînîyên îlahî bi encam bibe, tim daîm karîne di hizûra Heq de sabit bimînin.

**Rebbê me, di her zeman û her mekanî de hesta bi Xuda re bûnê bixe gencîneya aramîya dilên me! Rebbê me, me tevan bixe nav wan bendeyên mesûd û bextiyar ên ku li vê dinyayê di keş û hewaya maîyyetê de jîyandine û li uqbayê jî bi nîmeta mûşahedekirina cemala xwe şerefmend kirine!**

**Amîn...**

72. Fussîlet, 41/30.




# *Zikrûllah -1*

*Ew însanê ku xwedî dilekî hestyar û çavê qelbê wî vekirî be, îdrak dike ku hemû alem ji tecellîyatên qudret û ezameta îlahî îbaret e, ew di her tiştî de nexşên bi raz û sirrên hunerê îlahî temaşe dike. Her zerre li kaînatê, jê re neşweyeke îlahî xeber dide. Ew neğmeyên feryadê ku ji dilopek dilê çûkekî biçûçik dirijin jî, ji bo dilên ji Heq re tî, tesbîhên ji hemû tesbîhan hestyartir in..*

*Hz. Dawud xwe wiha diavêt ber penaha Cenabê Heq:*

*"Îlahî! Min ji dîwana kesên ku te di bîra xwe tînin û zikr dikin, cuda neke! Heke ez bixwazim herim dîwana ğafilan, hê ez neçûme wir lingên min bişikîne! Lewra wiha kirina te, ji bo min lutfeke mezin e."*

# ZIKRÛLLAH -1

**Hezretê Uftade** ku yek ji dostên Heq e, rojekê bi mirîdên xwe re derdikeve, diçe sohbeteke deştê. Bi fermana wî hemû derwêş, li deverên rengereng ên bi çîçekan hatine xemilandin, gerîyan û her yekî ji wan baqek çîçek ji xwecê xwe re anîn. Lêbelê bes di destê **Ezîz Mehmûd Efendî** de çîçekeke qermiçî û destîşikestî hebû..

Piştî mirîdên dîgerên wî çîçekên di destê xwe de bi keyfxweşî jê re pêşkêş kirin, Ezîz Mehmûd Efendî jî stûyê xwe xwehr dike û vê çîçeka şikestî û qermiçî ji seydayê xwe re teqdîm dike.

Hezretê Uftade, bi meqseda îrşadê di navbera awirên meraqdar ên mirîdên dîger ên xwe de her wekî ku ji sirr û hikmeta wê bê-agah be jê dipirse:

“-Ewladê min Mehmûd! Her kesî baq bi baq çîçek anîne, te çima çîçekeke destîşikestî û qermiçî anîye?”

Qazî Mehmûd bi edeb serê xwe di ber xwe de ditewîne û bersiva wî dide:

“-Seydayê min! Ez çi ji we re teqdîm bike ji xwe hindik e. Lêbelê min destê xwe avêtibe kîjan çîçekê ji bo wê biqurêfim, min ew her dît ku digot: «Ellah, Ellah!» û wê wilo Rebbê xwe zikr dikir. Bi dilê min xweş nehat ku ez ji zikrê wan re bibim asteng. Vêca ez

jî bêgav û mecbûr mam ku vê çîçeka bêçareya qermiçîya di destê xwe de ku nikare li ser zikrê xwe dewam bike, bînim..”

## DEMA ÇÎYA Û KEVIR ZIKR DIKIN...

Cenabê Heq, xwe bi hemû mexlûqatên xwe yên ku wî ew aferandine çi candar bin û çi necandar bin her daye naskirin û bi awayekî daîmî ew bi zikrê dane wezîfedarkirin. Bi vê sebebê hemû mexlûqat, li derveyî îdraka me û bi mûcibê zimanên xwe û taybetmendîyên xwe di halê zikrekî tebîî û peryodîk de ne. Wate keyfîyeta naskirina Xuda û îtaeta ji wî re, ne rewşeke ji bo însanî tenê taybet e. Heta hatiye îfadekirin ku heyberên din çendan bi awayekî ğeyrê îradî be jî di vê xusûsê de di sewîyekekê de ye ku ji ya gellek însanan bilindir e.

Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

“.. **Me çûk û çîyayên ku tesbîh dikirin jî ji Dawud re dane stûxwehrkirin. Em** (van) **dikin.**.” [73]

Rebbê me; daye zanîn ku çîya, kevir û çûk zikrê wî dikin û hemû beyanên wî yên wekî van, ji bo însanan ku ew ji hemû mexlûqatên xwe bi şereftir kirine, di mahîyeta îqazekê de ne da ku ew di xusûsa zikrê de ji cemadat û heywanatan ğafiltir nemînin.

Ev mîsal jî, di vê xusûsê de çi qeder manedar e:

Dema Mezinê me Pêğember bi rê de diçû, li komeke mirovan rast hat. Ew li ser pişta heywanên xwe yên siwarbûnê rawestîyabûn (û ji xwe re sohbet dikirin). Mezinê me ji wan re wiha got:

“Bi awayekî sipehî li heywanên xwe siwar bibin û wan newestînin (û dema hûn wan bikar neyînin jî) bi awayekî sipehî wan

73. Enbîya, 21/79.

berdin, wan bidin îstîrahetkirin. Wan ji bo sohbetên xwe yên li ser rêyan û kolanan nekin kursî. (Lewra) **Gellek heywan hene ku însan li ser pişta wan siwar dibin, lêbelê ew ji siwarên xwe bi xêrtir in û ew ji wî bêhtir zikrê Ellah Teala dikin**.” [74]

Ha bi sebeb vê hessasîyetê ye ku mûmînên arif, ji ber ku Xuda zikr dikin ji zerreyê heta bi kurreyê bi nezareke ulwî li hemû heyberan dinêrin. **Yûnus Emre** di hesbahala hestgerma xwe de ku bi çîçeka zer re dike, dibêje: “*Nêrîneke bilinda min li mîroyê heye...*” ev îfadeyeke wecîza vê hikmetê ye.

Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

“**Ma tu nabînî ku çi li asîmanan û çi li erdê hebin; roj, heyv, stêr, çîya, dar, heywan û pirranîya însanan ji Xuda re diçin sicûdê. Lêbelê** (bi sebeb ğefleta wan) **li ser gellekan jî ezab heq bûye.**.” [75]

Xuda di ayeteke pîroza din de jî dibêje:

“**Heft asîman, erd û her kesên ku di van de hebin Wî pak didêrin, tesbîh dikin. Hîç tiştek nîn e ku bi hemdê wî tesbîh nake. Lêbelê çi heye, hûn tesbîhê wan fehm nakin**..” [76]

Lêbelê li kaînatê sade ğafilên însan û cinan ji vê programa zikrê îlahî mehrûm in. Lewra însan û cin ji ber ku heyberên tabiê îmtîhanê ne û ew xwedî îrade ne, di wan de îstîdad û amadekarîya hem ji bo kirina xêrê û hem jî kirina şerrê jî hatiye aferandin. Bi vê sebebê, naxwe xwe ji evdînîya ji bo Xuda dana paş û bedbextîya mûxalefet-kirina ji bo fermana wî, di nav hemû mexlkûqatan de bes rewşeke bi ğafilên jirêketîyên van herdu zumreyan taybet e.

74. Ehmed, III, 439.
75. Hec, 22/18.
76. Îsra, 17/44.

Beyankirina Rebbê me di ayetên pîroz de ku mexlûqatên wî jî ji wî re di rewşa zikrê de ne, ew ji bo ğafilên ku Xuda jibîr dikin û di dinyayê de noq dibin adeta vê peyamê dide; “ma hûn nabînin ew dinyaya ku hûn di oğira wê de terka min dikin jî di eslê xwe de zikrê min dike û bi teslîmîyeteke temam ji hukmranîya îlahî ya min re stûxwehr dibe..”

Naxwe li hemberî vê programa mûhteşema zikr, tesbîh û îbadetê di heyberan de ku ew kaînatê tije dikin, his wernegirtina însanê ku Xuda ew mûkerrem kiriye û di rewşeke fehmkor û abûs de ji zikrê dûr-mana wî, çi xwe xapîneke ğemnak e!..

Lêbelê wekî ku di ayetên pîroz de jî hatiye gotin, îdraka însanî -dîsa li ser esasê sirrê îmtîhana îlahî- li hemberî rasteqîneya zikrkirina mexlûqatan bi zimanekî taybetî yê xwe di rewşeke bi perde de ye. Ji bo mirov karibe zikrê mexlûqatan bibihîze jî; divê mirov xwe bixe rewşeke wisan ku di bin rûhanîyeta zikr û tesbîhan de, heyateke evdînîya xalis li ser teqwayê bijî, bi dilekî safî ji heqîqeta alemê waqif bibe û ev jî bes bi qasî ku Rebbê me lutf bike, dibe ku mûmkin bibe.. Çawa ku di mîsala **Hezretê Hudayî** de jî wisa ye, hinek dostên Heq ên ku di Cenabê Heq de fanî bûne û bi heqîqeta zikr gihane, -heke Xuda bixwaze- çendan biçek be jî ewê karibin ji bo cudakirina perda vê ğefleta umûmî serfiraz bibin.

Çawa **Ebdûllah bin Mes‘ûd** dibêje ku ew bi xwe yek ji sehabîyên guzîde ye û di bin perwerda nebewî de gihaye; “em gihabûn rewşeke wilo, me tesbîhê parîyên ku di qirika me re diçûn dibihîst!” ev jî mîsaleke eşkere ya vê heqîqetê ye. [77]

Li gorî di berhema bi navê **Hilyetû’l-Ewlîya** de hatiye ragihandin; dema herkesî çavên xwe digirtin û di xewê de noq dibûn

77. Binêrin; Buxarî, Menaqib, 25.

**Mûğîre bin Hakim es-San'anî** xwe diberda behrê û bi candarên li wir re dest bi zikrê Xuda dikir. [78]

Dîsa **Hezretê Şahê Neqşîbend** jî ku yek ji dostên Heq e, xizmet ji nexweşan, bêkesan û heta heywanan re jî kiriye û dilê wî bi zikrê Xuda ketibû rewşeke ew qeder nazik û reqîq ku destpê kiribû êdî wî ji nalîna heywanan û derxistina wan ya dengên hezîn û ğemnak jî xwe avêtina wan ya ber penaha Heq, hiss dikir..

**Welhasil**, ew însanê ku çavê dilê wî bel û vekirîbe, ewê îdrak bike ku alem hemû ji tecellîyatên îlahî îbaret e, û ewê di her tiştî de hunerê îlahî temaşe bike. Her zerreyeke li kaînatê jê re ji neşweyeke îlahî xeber dide. Heta neğmeyên feryadê ku ji dilê biçûçikê wekî dilopekî yê çûkên biçûçik jî dirijin ji bo dilên ji Heq re teşne û têhn, tesbîhên ji hemû tesbîhan hestyartir in..

## KILÎLÊN/MEFTEHÊN ZIKRÊ

Dema dostên Heq tim û daîm bi Xuda re dibin û digihîjin heqîqeta zikrê, ew bi her hal, hereket û peyvên xwe Ellah di bîra xwe tîne. Çawa ku pêğemberê Xuda di hedîsa şerîf de dibêje:

"*Di nav însanan de kilîlên (meftehên) zikrê Xuda hene. Dema însan wan bibînin derhal Xuda di bîra xwe tînin*." [79]

"*(Evdên Xuda welî) ew kes in ku dema li rûyên wan tê meyzandin ew Ellah Teala di bîra mirovî tînin*." [80]

Divê mirov kesên wiha lutfeke Heq zanibe û hewl bide ku ji hêla maneyî ve ji wan îstîfade bike. Lewra ew, ji bo belde û bajarên ku lê hebin rehmeke îlahî ne.

78. Ebû Nûeym, Hilye, 10/141.
79. Heysemî, X, 78.
80. Îbnûmace, Zuhd, 4.

Ew tişta ku dostên Heq bi mezherîyeteke wiha bilind digihîne jî ev e ku ew zikrûllahê bi keyfîyeteke qelbî ya bilinda wiha dijîn. **Hezretê Eşrefoğlû'yê Rûmî** bi îşaret-kirina vê heqîqetê, zikr li sê merteban vediqetîne:

"**Ya yekê;** dema ziman zikr dike dil jê ğafil dibe. Ev zikrê ewama ye.

**Ya duduyan;** ew hem bi zimanê xwe, hem jî bi dilê xwe zikr dike ku ev jî zikrê xewasa ye.

**Ya sisêyan;** ew hem bi zimanê xwe, hem bi dilê xwe, hem jî bi temamê azayên xwe zikr dike. Ev jî zikrê xasû'l-xewasa ye.

Yekî ku li çolê ji têhna aqilê wî ji serê wî çûbe, heke ew bigihîje ser avê û jê nevexwe, ew ji tîbûna xwe xilas nabe. Ew sade bi nalîna xwe ku bibêje; «av, av!» nikare tîbûna xwe ji xwe bibe.. Dilê şagirt jî pêşî divê bi hezkirina Xuda bişewite. Di piştî wê de wê tîbûna wusletê li ser wî ğalib bibe û ewê bi şewq û îzdîrabê were. Heta wuslet jî hasil nebe, qelb bi îtmî'nanê nagihe.." [81]

Naxwe divê zikrê zimanî bi zikrê qelbî re ahengekê pêkbîne. Heke na, wê bibe ku dema ziman zikr dike, rûh li cihên din digere; heke qelb ne bi Xuda re be, heke ew bi masîwa re be, ji wî zikrî hêvî-kirina feydekekê beyhûde ye.

Dostê Heq **Hezretê Mewlana** dibêje:

"*Ew zikrê ku bi dev, bi zimanî, bêyî mirov wî bibihîze û bifikre ku (wekî totîyê/papağanê) tê kirin, xeyaleke nuqsan e. Ew zikrê ku bi padîşahî yanî ji dil û can, bi jê re heyran hiskirinê tê kirin jî ji peyvan jî, ji kelîman jî azade ye.. Hey ew kesê ku bêyî wî bibîne, sade dîtina navê wî tenê kafî dibîne! Hê te ji qedeha «Hû»yê nevexwarî, çawa dibe ku tu bikarî ji arzûya ez û ezî-ya xwe xilas bibî?*"

81. Binêrin; Mûzekki'n-Nufûs, rûp. 351-352, weşanên Însan, Îst. 1996.

Wate zikr-kirina Xuda, sirf ji tekrarkirina lefzê “Ellah” tenê ne îbaret e. Lêbelê dema zikr cihê xwe di qelbî de bibîne ku ew merkeza îstîdada texessusê ye, hingê dibe wesîle ji bo nîyet û amel rast bibin û sewîyê qezenc bikin. Ji bo vê hatiye gotin:

“Serê zikr, **tewhîd** (yek-kirina Heq) e;

Nîvê wî, **tecrîd** e (paqijkirina dil ji heyberên ji bilî Heq in);

Dawiya wî jî **tefrîd** e (bi tena serê xwe bi Xuda re bûn û di her an û demê de gera li rizaya Xuda ye).”

Mezinê me Pêğember jî di bara ehlê tefrîdê de wiha gotiye:

“*Mûferridan pêşbazî qezenc kiriye*.” Dema eshaban jê pirsîn, jê re gotin:

“-Mûferrid kî ne, ya Resûlellah?”

Pêğemberê Xuda ji wan re got:

“-*Ew mêr û jin in ku zehf zikrê Xuda dikin*.” [82]

**Hezretê Elî** jî halê zikrê eshabê kîram wiha tewsîf kiriye, gotiye:

“Dema navê Xuda dihat zikrkirin, çawa ba di rojeke bagerî de bandorê li daran dike ew jî wilo jê dihejîyan, hêstirên çavên wan bi ser cilên wan de dipalîyan.” [83]

Naxwe zikr; ne faîlîyeta dubare-kirineke rijî û ziwa ye. Bi berevajî zikrekî rasteqîne, tefekkur-kirina ezameta Heq e, kûrkirina hestan li hemberî herkên qudreta îlahî ye, paqijkirina dil ji masîwa ye, di heq de tinebûn e, temînkirina daîmî bi Xuda re bûnê ye û zikrkirina wî ye. Bes zikrekî wiha dikare li hemberî belayên maddî-

82. Mûslim, Zikr, 4.
83. Ebû Nûeym, Hilye, 1/76.

manewî bibe zirxek. Ji bo vê, ev beyankirina hedîsa nebewî ku dibêje: "*Heta li sererdê were gotin: «Ellah Ellah» qiyamet ranabe*" [84] jî mûmkin e mirov jê fehm bike ku heta mirovên wiha bi vê riqqeta qelbî zikr bikin wê qiyamet ranebe.

Rebbê me, ji me re dide zanîn ka divê em çawa zikrê wî bikin:

"**Di dilê xwe bi xwe de, bi zara-zar, bi tirs û bi dengekî nebilind, sibeh û êvarê Xudayê xwe di bîra xwe bîne. Nebe ji ğafilan!**"[85]

"**Navê Rebbê xwe di bîra xwe bîne û bi her hebûna xwe berê xwe bide wî.**"[86]

Wate divê em di esnaya zikr de bi her hebûna xwe berê xwe bidin Xuda. Tişta ku ji zikrê tê qesdkirin jî zehftir zikrê qelb e. Îhtiyac bi feyz û rûhanîyeta wî zikrî heye ku ew di maneyeke kamil de tê îfakirin. Ew jî ev zikr e ku pê qelb şîyar bibe, ji toza ğefletê were daweşandin, bi xeşîyet bilerize û bitirse û bi nûra Xuda nûrdar bibe.

Çawa ku dema ji dostê Heq **Ebdûllah bin Hûbeyk** pirs kirin:

"-Emê çawa bikarin însanê salih ji însanên nesalih veqetînin?" Wî ev bersiv da wan:

"-Yek ji adetên sipehî yên însanê salih, bi şev û bi roj Ellah Teala di bîra xwe tînin. Di bîra xwe anîna wî, bi qelb û zimanî dibe. Lêbelê zikrê qelb hê çêtir e..

Dilên xwe, bi bîra xwe anîna Ellah Teala vejînin, sağ bikin. Dilê xwe bi tirsa wî tije bikin. Dilê xwe bi hezkirina ji wî nûrdar û rohnî bikin. Dilê xwe bi arzûkirina gihiştina wî, keyfxweş bikin û zanibin; hûn bes dikarin bi qasî hezkirina xwe ji wî, bilind dibin, bi

84. Binêrin; Mûslim, Îman, 234.
85. E'raf, 7/205.
86. Mûzzemmil, 73/8.

rastîya nîyeta xwe nefsa xwe biqeherînin, şehwetên xwe têkbibin, bibezînin û amelên xwe temîz bikin..”

Li alîyê din, qelbê dostên Heq ku ji bo zikrûllah kilîl in, mefteh in, dikarin bi zikr îhya bibin, heqîyê ji batil, rastîyê ji xwehrîyê veqetînin, ji ber ku ew bi nûreke wisan gihane, di rewşeke wilo de ne ku ji bo heq û xêrê pûsûlaya şaşnebar in. Bi vê sebebê di çareserkirina îxtîlaf û tereddudan de divê mirov li zewatên wiha bigere, bibîne û îtîbar û giringîyê bi dîtin-nêrînên wan bide. Çawa Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

“**Heke hûn nizanin ji ehlê zikrê bipirsin!**” [87]

## MECLISÊN/DÎWANÊN ZIKR

Seadeteke mezin e ku mirov ehlê zikrê nîmet zanibe, bi wan unsîyet bike/hedana xwe bi wan bîne, berdewam biçe dîwanên wan û di helqeyên zikrê yên wan de beşdar bibe. Bi berevajî vê, berê xwe dana dîwanên ğafilan jî, ew qeder felaketeke mezin e. Çawa Rebbê me, bi ehlê zikrê mûmînên salih re bûnê, li hemberî vê jî xwe dûrkirina ji ğafilên ku ji zikrê bênesîb in, wiha ferman dike, dibêje:

“**Sebra xwe digel yên ku sibeh û êvarê li ber Xudeyê xwe digerin û rizaya wî dixwazin, bîne û ji bo tu xemla jiyana dinyayê bixwazî çavên xwe ji wan neguherîne. Bi xebera wî neke; ewê ku me dilê wî ji bîranîna xwe ğafil kiriye û ewê ku daye pey hewesa xwe û karê wî sînorbuhêrî ye.** ” [88]

Dîsa di vê xusûsê de ev mûnacata **Hezretê Dawud** jî zehf bi îbret e:

87. Nehl, 16/ 43; Enbîya, 21/7.
88. Kehf, 18/28.

“*Îlahî! Min ji dîwana wan kesan cuda neke; ewên ku Te di bîra xwe tînin û zikr dikin. Heke ez bixwazim herim dîwana ğafîlan, hê ez neçûme wir, lingên min bişikîne! Lewra wiha kirina te, ji bo min lutfeke mezin e.*” [89]

Li alîyê din, li cem Heq ji bo wan dîwanên ku navê Xuda di wan de tê zikrkirin qîmetekî mûstesna heye. **Mezinê me Pêğember** ev heqîqet wiha îfade kiriye, gotiye:

“*Heke civakek were cem hev ji bo zikrê Xuda bike, melaîket xwe li hawîrdorên wan dipêçin; rehma Xuda wan dinixumîne; sikûnet li ser wan tê xwarê û Ellah Teala ji yên li cem xwe re pesnê wan dide.*” [90]

Dîsa rojekê resûlûllah gotibû:

“-*Ellah Teala roja qiyametê civakekê sağ dike ku rûyê wan ji nûrê diberiqîne, li ser minberên ku ji durran hatine çêkirin dirûnin û hemû însan ğibte ji wan dikin (dibêjin; xwezî em li cihê wan bûne). Ev, ne pêğember in, ne jî şehîd in.*”

Bedewîyek rabû ser çokên xwe û jê re got:

“-Ya Resûlellah! Ji kerema xwe, wan ji me re vebêje, bila em bizanin ka ew kî ne!”

Mezinê me Fexrê Kaînatê wiha îzah kir, got:

“-*Ew ji êlên curecur û welatên cuda cuda ne, ji bo Xuda ji hev hez dikin, ji bo kirina zikrê Xuda kom dibin û wî di bîra xwe tînin.*” [91]

Dîsa Mezinê me rojekê ji bo fezîleta helqeyên zikr ji eshabê xwe re beyan bike, wiha got:

---

89. Îhya, I, 852.
90. Mûslim, Zikr, 38-39.
91. Heysemî, X, 77.

"-*Dema hûn herin nav bexçên cennetê bi heqîyê ji wan îstîfade bikin*." Eshabê kîram jê re gotin:

"-Ya Resûlellah, hûn ji bexçên cennetê çi qesd dikin?"

Mezinê me wiha bersiva wan da, ji wan re got:

*"-Ew helqeyên zikrê ne."* [92]

Ji sehabîyan **Ebûhûreyre** dibêje:

"*Xelkê erdê çawa stêrên li asîmanî berraq dibînin, xelkê asîmanî jî li sererdê malên ku zikrê Xuda di wan de tê kirin wisan berraq dibînin*." [93]

## ZIKRÛLLAH, ÇI ÎBADETEKÎ MEZIN E

Bav û kalên me gotine: "Hafiza beşer, bi nîsyanê malûl e." Naxwe îcab dike ku însanîyet li hemberî îlletên nîsyan û ğefletê, yanî li hemberî zeîftîya jibîrkirin û nexweşîya qesweta qelbî, hebûna manewî ya Ellah di dilên xwe de û mewqîîya ulwî ya wî tim û daîm nû bikin, wî tim li bîra xwe bihêlin û qelbên xwe bi wî zindî bikin.. Zikr jî xurttirîn rabîte ye ku evdî ji Rebbê wî nêzîk dike; rawestina di tefekkurê de û temara di mix de dibe û wesîla feyz û teqwîyekeke manewî ye ku reğbeta di xusûsa îfakirina hukmên dînî de zêde dike.

Di vê meyanê de tiştên wekî tîlaweta Qur'anê, nimêj, rojî, hec, tesbîh, tehmîd, tewhîd, tehlîl, tekbîr û îstiğfaran, hemû îbadetên ku ji bo di bîra xwe anîna Ellah dibin wesîle, di mahîyeta "zikr" de ne. Çawa mûfessir **Bûrsewî** bi beyan-kirina xwe:

92. Tirmizî, Deawat, 82/3510.
93. Îhya, I, 8552.

"Ellah Teala nimêj di ayeta; «**bibezin zikrê Xuda**» [94] de wek "zikr" bi nav kiriye û daye zanîn ku fermana wî ya «**min zikr bikin**» hemû taet û îbadetan di nav xwe de digre." [95]

Çawa ji **Hezretê Ebdûlwehhab Mûtteqî** pirs kirine, jê re gotine;

"-Dibêjin; lazim e talib tim di zikr de be. Ev çawa dibe?" Hezret, vê bersivê dide wan:

"Ewê ku bi amelên xêrê re meşğûl be, daîm di zikr de ye. Nimêj kirin zikr e. Qur'an xwendin zikr e. Hînkirin û hînbûna îlman zikr e. Her amelê bi xêr zikr e."

Li alîyê din hemû îbadet, bi qasî ku însan karibe bi dilekî şîyar Xuda zikr bike, qîmet qezenc dikin. Ew îbadetên ku bi qelbekî ji Xuda ğafil tên kirin jî ji feyza zikrê nuqsan in, hem jî ji şertê xuşûê re jî rîayet nehatiye kirin.

Wate zikr, yek ji şertên zerûrî ye ku divê di nav îbadetan de hebe. Mezinê me Pêğember di hedîsên şerîf ên xwe de vê wiha îfade dike, dibêje:

"*Tewaf-kirina Beytûllahê, se'yîkirina di navbera Sefa û Merwê de û kevir avêtina şeytên hatine fermankirin ji bo zikrê Xuda were îqamekirin.*" [96]

"*Kî îtaeta Hezretê Ellah bike, bi heqîyê ji ferman û qedeğeyên wî re rîayet bike, naxwe wî zikrê Wî kiriye; welew ku nimêjên (nafîleyên) wî, rojîyên wî û Qur'an xwendina wî kêm be jî!*

---

94. Cumûa, 62/9.
95. Rûhû'l-Beyan, II, 95-96.
96. Ebûdawud, Menasik, 50/1888.

*Kî jî li hemberî Ellah di halê îsyanê de be (terka gunehan neke), naxwe wî zikrê Cenabê Heq nekiriye; welew ku nimêjên (nafîleyên) wî, rojîyên wî û Qur'an xwendinên wî zehf bin!*" [97]

Sehabîyek hate cem Mezinê me Resûlûllah, jê pirs kir, jê re got:

"-Kîjan cîhad ecra wê mezintir e?" Mezinê me jê re got:

"-*Cîhada wî kesê ku ji her kesî bêhtir zikrê Ellah Teala dike!*" wî zilamî jê pirs kir, jê re got:

"-Ecra kîjan rojîgirî mezintir e?" Mezinê me jê re got:

"-*Rojîya wî kesê ku ji her kesî bêhtir zikrê Ellah Teala dike!*"

Di piştî vê de wî zilamî aynî pirsa xwe ji bo nimêjkeran, zekat-dayan, heckeran û sedeqe-bexşan jî dubare kir. Mezinê me Fexrê Kaînatê di van tevan de jî her got:

"*Ew kesê ku ji her kesî bêhtir zikrê Ellah Teala dike!*"

Vêca **Hezretê Ebûbekr** ji **Hezretê Ûmer** re got:

"-Ya Ûmer! Naxwe ewên ku zikrê Xuda dikin xêr hemû ji xwe re girtine û birine!" Mezinê Kaînatê jî ev gotina wî bihîst, berê xwe rast da wan û ji wan re got:

*"-Erê, wilo ye!"* [98]

Dîsa piştî Resûlûllah, behsa fezîlet û sewaba tesbîhatên ku piştî nimêjê û ketina nav nivînê tên kirin, kir, wiha got:

"*Şeytan, dema yek ji we li ser nimêjê be tê cemê û jê re dibêje; «wê di bîra xwe bîne, vê di bîra xwe bîne!» Heta ew ji nav nimêjê derdikeve û diçe jî ew her li ser vê berdewam dibe. Di encamê de*

97. Heysemî, II 258.
98. Ehmed, III,, 438; Heysemî,X, 74.

*şexs vê tesbîhatê jî terk dike. Dema şexs dikeve nav nivîna xwe jî şeytan tê cem wî, hewl dide ku (hê wî ev tesbîhat nexwendin) wî bi xew ve bibe û wî dixe xewê jî.*” [99]

Wate yek ji şertên meqbûlîyeta îbadetan ev e; mirov Ellah Teala di bîra xwe bîne, zêhnê xwe û qelbê xwe bi wî ve girêbide û wî bîne bîra xwe. Çawa Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

“(Resûlê min!) **Wê kitêba ku peyğama wê ji te re hatiye, bixwîne û nimêj bike. Bêguman nimêj, ji bêheyatîyan û bêtoretiyan re dibe asteng. Zikr-kirina Ellah, hemin îbadetê mezintirîn e. Ellah, ya ku hûn dikin dizane**.” [100]

Ha ew îbadetê nimêjê ku sitûna dîn hatiye jimartin jî wek “**zikr**” hatiye gotin, ev jî teyîd dike ku adeta zikr, ji bo îbadetan di mewqî û cihê raya can de ye. Zikr ew qeder mûhîm e ku îbadetekî bêzikr li cem Heq kêm û qusûrdar e.

**Îbnû Ebbas** beyana di vê ayetê: “..**Zikr-kirina Ellah, hemin îbadetê mezintirîn e..**” bi du awayan tefsîr kiriye:

“1) Ellah Teala we di bîra xwe tîne, ev ji di bîra xwe anîna we ya wî mezintir e.

2) Zikrkirina Xuda, ji her îbadetê bêzikr çêtir e.” [101]

**Welhasil** ji îbadetê meqsed, di bîra xwe anîna Xuda ye, tazîmkirina wî ye û bi awayê erzkirina evdînîya me zikrkirina wî ye. Lêbelê bi te’wîleke nefsanî û şeytanî wergerandina vê heqîqetê bi îfratê û telaqqî û wergirtina wê bi awayê sivik girtina îbadetan jî heta tu bibêjî bes, mehzûrdar e.

---

99. Tirmizî, Deawat, 25/3410; Ebûdawud, Edeb, 99-100/5065.
100. Enkebût, 29/45.
101. Îhya, I, 847.

Zikrê di halê eşq û cezbê de ji bo xwe kafî zenkirin û giringî nedana bi îbadetên din; cudabûna ji sîrata mûsteqîm e, ketina rêyeke nefsanî ye, fehmnekirina kakila îbadeta ye. Lewra zikr, aynî wekî dûayan wek yek ji xusûsîyetên eslî yên îbadetê di nav hemû îbadetan de heye. Naxwe ji îbadetan cuda hizr pê kirin, yan jî îqame-kirina wî di şûna îbadetan de, nabe mijara axaftinê.

Ew wilo ye ku heta **Mezinê me Hebîbê Xuda** jî digel ku ew di evdînîyê de di zirweya însanîyetê de bû jî dîsa wî bi îlawe li ser îbadetên ferz ên xwe radibû bi şev nimêjên nafîle dikirin heta ku lingên wî diwerimîn. Naxwe di saya zikrê de kî bigihîje kîjan derecê bila bigihîjîyê, hîç ti zemanekî ew nikare xwe ji berpirsîyên evdînî yên dîtir mûaf bibîne. Bi berevajî vê, feyz û rûhanîyeta zikr, hest û ğeyreta mûmînî ya evdînîyê de hîn zêdetir dike.

Digel vê jî, bi îfakirina îbadetên wekî nimêj û rojîyê hizr pê kirina ku mirov êdî bi awayekî temam wezîfa xwe ya zikrê jî anîye cih û lizûm bi ezkar û ewradekî li derveyî wan nedîtin jî cahiltîyeke mezin e.. Lewra Rebbê me, ji me dixwaze ku em zehf zêde zikrê wî bikin.. Ev jî telqîneke (dan-hînkirineke) eşkere ye ku di piştî îbadetan de jî divê rûhanîyeta zikr di her halên me de, heta di her nefesa me de, hebe. Bi vê sebebê mûmînên kamil, di tevahîya emrê xwe de hewl didin ku di halê îtaetkirina vê fermana Rebbê xwe de:

“**Rebbê xwe bi hemdê zikr bike, ji secdebiran bibe û heta mirinê jî her ji Rebbê xwe re evdînîyê bike**.”[102] bijîn.

**Rebbê me, hemû îbadetên ku me eda kirine ji bo riza'ya xwe miwafiq bike. Ji bo me tevan bi nesîb û mûyesser bike ku em Zatê bilind ê wî di nav ahenga qelb û bedenê de zikr bikin û em karibin dilên xwe bi rûhanîyeta zikrûllah tije bikin!**

**Amîn...**

---

102. Hicr, 15/98-99.




# *Zikrûllah -2*

*Ji bo bendeyên ku gihabin heqîqeta zikrê û tam ji lezzeta mehebbeta îlahî xwaribin hemû zewqên dinyewî qîmetê xwe winda dikin. Çawa Hezretê Îbrahîm bin Edhem ê ku selteneta dinyayî li kenarekê hiştiye û di îşqa îlahî de noq bûye jî, wiha gotiye:*

*"Heke wecd û îstiğraqa me di mehebbeta îlahî de tişteke mûşexxes bûya; ji bo karibin wê (ji me) wergirin wê padîşahan hemû xezîneyên xwe û padîşahîtîyên xwe jî feda bikirana."*

*Ew wextên ku di heyata dinyayê de wek ji zikrê mehrûm hatibin derbaskirin; yanî ew nefesên ku mirovî Xuda jibîr kiribe û ew wilo xilas kiribin, rûpelên zîyan bûyî yên teqwîma emr in.*

# ZIKRÛLLAH -2

Însan, ji bo kîjan heyberê hest bi mehebbetê bike, jê re ram û teslîm dibe. Her demê wê di mûtenatirîn cihê dilê xwe de hildigre û diguhêze. Ramana wî, xeyala wî, fikra wî û zikrê wî bi wê re ye. Çendan di zahirê xwe de jê cuda be jî ev ji bo wî zêde tiştekî îfade nake. Lewra ew bi rûhê xwe daîm pê re dijî. Çawa di eşkerekirina vê heqîqetê de hatiye gotin: “**Yê li cem min, li Yemenê ye, yê li Yemenê jî li cem min e**..”

Mesela ew kesê ku zehf zêde hest bi mehebbeta zarokê xwe bike, di her firsendê de ji zarokê xwe behs dike û xwe wilo tetmîn dike. Kesekî ku dilê wî zehf bi meslekê wî ve be jî, çi xeberdan bi karê wî re elaqedar be zewqê jê distîne. Çi qeder ew tiştên ku ji wan hez dike vebêje, hezkirin û dilpêvehîya wî ji wan re hê zêdetir dibe.

Dilê mûmînî jî dema bi mehebbeta îmaneke kamil tije bibe, navê Rebbê wî di wî de dibe zikrekî daîmî. Zikr, ji bo wî adeta dibe ava heyatê, ava can û jîyanê. Çawa masîyek nikare ji avê cuda bijîye, ew jî bê zikr aramî û hizûrê nabîne. Naxwe di nezara wî de zikr; bi qasî xwarin, vexwarin û teneffus-kirinê îhtiyaceke jêneger e.

Çawa **Resûlê Xuda** gotiye:

"*Mîsala kesê ku zikrê Xuda dike û kesê ku zikrê Xuda nake, her wekî yê sağ û yê mirî ye.*"[103]

Naxwe mûmînê ku heyata qelbî ya xwe bi mehebbeta îmanê zindî digre, wek tebîîtirîn tezahureke vê jî navê Rebbê xwe dike wirda dilê xwe. Êdî xeberdana ji ezameta îlahî ya Heq Teala, mijûlîya ji qudreta bêdawîya wî, şiteğalîya ji hukmranîya wî ya di mûkemmelîyeta ji îdrakê biwêdetir de û behskirina ji hikmetên di tazîma îlahî û teqdîra wî de, di rûh û gîyanê wî de lezzet û zewqeke bêtarîf tîne hisûlê. Ji ber vê, ew di her hal û karî de Heq bibîr tîne, ji hêla maneyî ve jî qelbê xwe û zimanê xwe bi bîranîna wî tamdar dike. Lewra Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

"**Bila xebera we jê hebe ku dil, bes bi bîranîna Xuda hizûrê dibînin**." [104]

Feyz û rûhanîyeta zikrî, her wekî mercekekê ye ku ji rojê tîrêjan bi ser xwe de kom dike, hemû arzûyên nefsanî yên di bin xwe de ku di hukmê qirş û qalan de ne, dişewitîne û dixe xwelî.

Ew wisa ye ku çi qeder ev rewş bipêşkeve, di nezara mûmînî de tiştekî ji zikrê Heq bi lezzettir namîne. Ev lezzet çi qeder xwe li rûh û gîyanê wî bipêçe, nêzîkbûna evdî ji Heq hê zêdetir dibe; çi qeder nêzîkbûna wî ji Heq zêdetir bibe jî îştîyaq û bêrîkirina wî ji bo Heq hê zehftir dibe.

**Hezretê Ebû Saîd el-Herraz**, di sohbeteke xwe ya ku ji halên dostên Heq behs dike de wiha gotiye:

"*Cenabê Heq, dema taca welayetê (welîtîyê) bide serê evdekî ji evdên xwe, pêşî derîyê zikr li ber wî vedike. Tama zikr bi qelbê*

103. Buxarî, Deawat, 66.
104. Re'ad, 13/28.

*wî dide. Piştî evd tamê jê werdigre, derîyê nêzîkbûna ji Zatê xwe li berê vedike. Wî li meqamê unsîyet, nêzîkatî û ulfetê dide rûniştandin. Piştî vê wî derdixe ser kursîyê tewhîdê. Ha çêbûnên eslî, êdî destpê dikin di piştî vê de çêdibin.*"

## AMELÊ JI SELTENETA DINYAYÊ BI QÎMETTIR

Ji bo bendeyên ku gihabin heqîqeta zikrê û tam ji lezzeta mehebbeta îlahî xwaribin hemû zewqên dinyewî qîmetê xwe winda dikin. Çawa Hezretê Îbrahîm bin Edhem ê ku selteneta dinyayî li kenarekê hiştiye û di îşqa îlahî de noq bûye jî, wiha gotiye:

*"Heke wecd û îstiğraqa me di mehebbeta îlahî de tişteke mûşexxes bûya; ji bo karibin wê (ji me) wergirin wê padîşahan hemû xezîneyên xwe û padîşahîtîyên xwe jî feda bikirana."*

**Dawud** (Eleyhisselam) digel seltenet û milkekî mezinê ku jê re hatibû lutfkirin jî dîsa wî bi qelbê xwe meyla dinyayê nedikir. Ew bi Rebbê xwe re di keş û hewayeke hizûr û nêzîkatîyê ya wilo de dijî ku dema wî dest bi zikr dikir pê re çîya, kevir û heta heywanên kovî jî halê wecd û îstiğraqê li xwe dikirin.

Ji bo **Suleymanê** kurê **Dawud** jî selteneteke mûhteşema wisan hatibû lutfkirin ku ew hîç ji ti kesekî din re nabe nesîb. Li gorî rîwayetê, rojekê Suleyman di siha çûkan de, însan, cin û heywanên kedî û kovî jî li rexên rast û çepê wî bûn ew di nav îhtîşameke mezin de bi sipaya (ordîya) xwe re diçû. Wî bi vî halê xwe, rêya xwe bi cem abidekî ji abidên zaroyên Îsraîl xist. Abidî jê re got:

*"-Ya kurê Dawud, Xuda çi selteneteke mezin daye te lo!"*

Dema Suleyman ev jê bihîst, ev bersiv dayê:

*"-Tesbîheke (peyva subhanellah) tenê ku di deftera amelê bendeyekî mûmîn de heye ji her tiştê ku ji kurê Dawud re hatiye*

*dayîn hê bi xêrtir e. Lewra tişta ku ji kurê Dawud re hatiye dayîn fanî ye. Haleveku selteneta tesbîh bide qezenckirin baqî (mayende) ye.”* [105]

Ellah Teala ew qeder zêde terş û kerîyên mêşinan ji bo **Hezretê Îbrahîm** jî îhsan û bexş kiribûn ku neyên hijmartin. Rojekê **Cebraîl** di sûretê însanî de hate cemê, jê pirs kiribû, jê re gotibû:

*“-Ev kerî, yê kê ne? Ma tu kerîyekî ji van nafiroşî min?”* **Hezretê Îbrahîm** jê re got:

*“-Ev kerî, yê Rebbê min in. Ew vêga wek emanet li dev min in. Heke tu carekê zikr bikî, sêyeka wan; heke tu sê caran zikr bikî, raje tevan û wan ji xwe re bibe!”*

Çi dema Cebraîl jî sê caran ev zikr kir û got:

سُبُّوحٌ قُدُّوسٌ رَبُّنَا وَ رَبُّ الْمَلَائِكَةِ وَالرُّوحِ

“*Rebbê me, Rebbê Rûh û melaîketê kîram, ji hemû qusûran mûnezzeh e, ji hemû kêmasîyan pak û bilind e*.” Îbrahîm jê re got:

*“-Raje wan bila tev ji te re bin, raje wan û wan ji xwe re bibe!”* Cebraîl jê re got:

*“-Ez ne însan im, ez Cebraîl im, ez neşêm rajim wan.”* Vêca Îbrahîm jî ev bersiv dayê:

*“- Heke tu Cebraîl bî, ez jî Xelîl im (dostê Xuda me) ji min re çênabe ku malê min dabe ez dîsa vegerînim û rajimê.”*

Di dawîyê de Îbrahîm hemû terş û kerîyên mêşinên xwe firotin; bi pereyên wan milk kirrî û ew kir weqf. Bi vî awayî wî bi awayekî kiryarî teblîğ kir ku hemû pertalên dinyayê li hemberî

105. Rûhû’l-Beyan, VII, 150.

zikrê Xuda di hukmê “hîç”ê de ne, û lîyaqeta xwe jî ji bo sifetê “Xelîlûllah/dostê Xuda” da tescîlkirin.

Rojekê **Resûlûllah** di mijara îfadekirina qîmetê zikr li cem Heq de ji eshabê xwe pirs kir, wiha got:

“*Ma ez ji we re wî amelî bibêjim ka ew çi ye?; ewê ku ji bo we (ji her amelên din) bi xêrtir e, li cem Ellah (ji her amelên din) bi qîmettir e, ewê (ji her amelekî din) bêhtir dereca we bilind bike, ew ji bo we wek sedeqe ji belavkirina zêr û zîv hê bi qezenctir e, ewê ji bo we ji hatina hemberî dijminan ku êdî hûn li stûyê wan bidin û ew jî we bikujin hê bêhtir sewabê bîne!*” Eshaban jî jê re gotin:

“-Erê, wî ji me re bibêje ka ew çi ye!” Vêca Resûlê Ekrem jî ji wan re got:

*“-Zikr-kirina Ellah Teala ye.”* [106]

Dîsa Hezretê Pêğember yekîneyek bi terefê Necdê ve şandibû. Wan jî miqdarek ğenîmet wergirtibû û vegerîyabûn. Zilamekî got:

“-Me yekîneyeke din nedîtiye ku ji vê yekîneyê zûtir vegerîyabe û zehftir ğenîmet bidest xistibe.” Vêca Mezinê me Pêğember jî wiha got:

“-*Ma ez civakeke ku ji van zengîntîr bin û bêhtir ğenîmet wergirtibin ji we re bidim zanîn? Ew kes in ku di nimêja sibehê de hazir dibin, piştî nimêjê dirûnin û heta derketina taverojê zikrê Xuda dikin.*” [107]

*"Li cem Xuda ji bo dinyayê bi qasî perê mêşekê jî qîmet nîn e."*[108] Ji lewma digel cazîbeyên xapîner ên dinyayê jî ev amelê mirovên ku karibin zimanê xwe û dilê xwe bi zikrê Heq meşğûl bikin ew

106. Tirmizî, Deawat, 6.
107. Tirmizî, Deawat, 198.
108. Binêrin; Tirmizî, Zuhd, 13.

qeder giranbiha ye ku li cem Xuda bi mal û milkê dinyayê nayê guherandin..

**Mezinê** me ev heqîqet wiha îfade kiriye, gotiye:

“*Dinya û tiştên ku têde hene ne hêja ne. Sade zikr-kirina Xuda û tiştên ku mirovî ji Wî nêzîk dikin, alimê ku îlmê (marîfetê) hîn dike û ew xwendekarê ku (ji bo bi heqî ji Heq re bibe evd) tehsîlê dibîne, ji van mûstesna ne*.” [109]

Ji eshaban **Sewban** wiha vedibêje:

Dema ayeta: “**Mizgînîya ezabekî ğemnak bide wan kesên ku zêr û zîv kom dikin û van di rêya Xuda de sarf nakin!**” [110] nazil bû, em bi Mezinê xwe Pêğember re li seferê bûn. Hinekan ji eshaban gotin:

“-Di bara zêr û zîv de tişta ku dihate xwarê, hate xwarê. (Êdî em careke din wan kom nakin. Emê zêr û zîvên ji îhtiyaca xwe zêdetir înfaq bikin.) Xwezî me bizanîya ka çi tişt bi xêrtir e, da ku me hinek ji wî bixista ber milkên xwe.”

Vêca Resûlûllah ev bersiv da wan:

“-*Bi fezîlettirîn tiştê di ber milkê mirovî de;*

- *Ew ziman e ku zikr dike (û di ti sefheyeke heyatê de Xuda jibîr nake),*
- *Ew qelb e ku şukr dike (û di nav wê îdrakê de ye ku hemû nîmet ji terefê Heq ve hatine lutfkirin),*
- *Ew jina salîhe ye ku ji bo îmana mêrê xwe dibe arîkar*.” [111]

---

109. Tirmizî, Zuhd, 14.
110. Tewbe, 9/34.
111. Tirmizî, Tefsîr, 9/9.

## EWLÎYAYÊN KU JI ZIKRÊ QUT NABIN

Ew mûmê kamil ê ku bi heqî têdigihîje zikr, ji hemû pertalên dinyayê û selteneta wê bi qîmettir e, hîç ti tiştek nikare wî ji zikrê Xuda asteng bike û jê re bibe kelem.

Nîmetên dinyayê wekî kêreke du-dev in; ji bo dilên arif ên ku zanibin wan bikarbînin zînet in, lêbelê ew ji bo mirovên ku bi wê dereca Xuda û axretê jibîr bikin xwe bi dest cazîbeya wê ve berdabin û ketibin ğefleta serxweşîyê jî, sebebê fitne û xusraneke mezin in.. Ji bo vê, mîsala mirovên ku dilên xwe bi dinyayê dabin, wekî gemîyekê ye ku di nîvê okyanûsê de dumena (badek û dîreksîyona) wê şikestibe û mechûl e, nayê zanîn ka ewê di kîjan girdab û gerê de helak bibe, here.

Ew mehebbeta zêde ya ku li hemberî menfîetên dinyewî û arzûyên nefsanî hestpê tê kirin; mûnasebetên însanî bi Xuda re îfsad dike, heyata wî ya îbadetê bi geometrîyeke rijî û ziwa û bi halekî bêgîyan tîne û jehrê li feyz û rûhanîyeta dilan direşîne. Rebbê me, me ji temen û emrê xwe xilaskirina di bidûvketina xewnên pûç û xwe xapandina bi efsûnên ku rûhên dinyayê narkoze dikin de wiha şîyar dike, dibêje:

“**Bizanin ku jiyana dinyayê, bes ji leyistik, keyf-bûrandin, xişr û di navbera we de ji daxwazkirina we ya îftîxar û zêdexwedîbûna mal û zarokan îbaret e. Her wekî baranê ye ku giyayê wê li xweşiya cotkaran diçe. Piştre hişk dibe tu wî dibînî ku wa ye zipûzer e; piştre jî dibe qirşûqal. Li axretê, ji bo yê ku xwe di şirk û gunehan de noq bike ezabekî dijwar heye; ji bo yê ku xwe ji şirk û gunehan paqij bike jî meğfîret û rizaya ji Ellah heye. Jiyana dinyayê ji pertalê xapandinê pê ve ne tişteke din e**.” [112]

112. Hedîd, 57/20.

“**Gelî yên ku îman anîne! Bila malên we û zaroyên we, we ji kirina zikrê Xuda asteng nekin! Kî vê bike ha yên ku li ziyanê ketine, ew bi xwe ne**.”[113]

Nîmetên dinyayê tim ji nefsê re cazib tên. Ew, ew qeder cazib in ku ew kesên sirf di plana nefsê de dijîn, sade manfîet û zewqên dinyewî difikrin, ew wek daîmî û seraqetî meşğûlên bi wê ve, êdî ew bûne ku hikmeta hebûnê li dinyayê û emanca xulqbûna xwe nahizirin. Yanî ew wasîtê ji bo xwe dixin ğaye û di nav tarîtîya ğefleteke kesîf û himbiz de temen û emrê xwe xilas dikin.

Hinek însan jî digel ku dizanin nîmetên dinyayî wasîte ne, û divê mirov wan nexe dilê xwe jî lêbelê ji bo vê bi awayekî temam serfiraz û muweffeq nabin, lewra ew nikarin peyva xwe di nefsa xwe de derbas bikin. Bi vê sebebê ew lezzetê ji îbadetên xwe nastînin û nikarin halê xuşû û hizûrê bidest bixin. Cenabê Heq bi îşaretkirina van cure kesan, wiha dibêje: وَلا أُقْسِمُ بِالنَّفْسِ اللَّوَّامَةِ “**Ez bi wê nefsê sûnd dixwim ku lewmê** (hest bi poşmanîyê dike) **li xwe dike** (hûnê dîsa werin sağkirin û wê hesab ji we were pirskirin!).”[114]

**Nefsa lewwame**; ew nefs e ku ji ber xirabîyên wê kirine, û ji ber îhmalkarî û qusûrên ku wê li hemberî ferman û qedeğeyên Xuda şanî dane wijdana wê mûezzeb e, bi vê sebebê zehf bi dijwarî lewme li xwe dike. Wate, ewên ku hêza berxwedana wan li hemberî hezkirina dinyayê û gunehan lawaz e.

Ew bendeyên arif jî ku bi awayê layiq têdigihin; nîmetên dinyayê emanetekî îlahî ne û wesîla îmtîhanê ne, bes bi qeder lizûmiya wan îtîbarê bi wan didin. Ew dişên vê meharetê şanî bidin ku textê dilê xwe ji Heq re texsîs bikin. Ha ew qehremanê rastîn ê dilî ne. Cenabê Heq ji wan razî ye, ew jî ji ber teqdîr û nirxê ku wî daye

113. Mûnafîqûn, 63/9.
114. Qiyame,75/2.

wan ji Heq razî ne. Ji lewma ew tam di nav hizûra dilî de ne. Rebbê me ji wan re wiha diaxive:

**“Ey însanê ku bi hizûrê gihayî! Wek ew ji te razî û tu jî ji wî razî li Rebbê xwe vegere. Bikeve nav bendeyên** (bijarteyên) **min û biçe cenneta min!”** [115]

Dostê Heq **Hezretê Mewlana** di *Mesnewî*’ya xwe de hîkayeteke bi hikmet vediguhêze, dibêje:

**Mecnûn**, ji îşqa **Leyla**yê bi çolan ketibû, rojekê xeber pê digihe ku Leyla derketiye rêwîtîyê. Vêca ew jî li ser hêştira xwe siwar dibe û hewl dide bi lezûbez ber bi wî gundî ve rê qut bike ku wê Leyla biçîyê. Çavê hêştira wî ku ji bo dalağekê taze bûbû xwedî jî li ser dalağa wê bû ku (ne pê re bû) li pey wê mabû. Dema Mecnûn destpê kir li ser hêştira xwe raze, hêştira wî derhal bi îstîqameta dalağa xwe ve vedigere. Dema Mecnûn ferqê dixîyê, di nav telaşê de dîsa berê hêştira xwe bi alîyê gundê Leylayê ve vedigerîne. Ev hal, bi caran dubare dibe.

Lewra Mecnûn, ji bo gihiştina Leylayê sewdamend bû, hêştira wî jî ji bo bi lez çûna cem dalağa xwe arzûmend bû.

Mecnûn di dawîya rojê de, li hawîrdoran dimeyzîne, meraq dike ka ew hatiye kuderê. Li pêşîya xwe û li pişt xwe dimeyzîne, bi van hereketên xwe, dibîne ku ew hê li cihê sibehê derketibû ser rê ye û wî hê fersexek mesafe jî rê qut nekiriye û neçûye. Ew dem Mecnûn deng li hêştira xwe dike, jê re dibêje:

“-O hêştirê! Tu ji bo dalağa xwe evîndar î, ez jî ji bo Leyla’ya xwe! Ji lewma rêyên me herduyan jî ferq in. Tu rêya min qut dikî, ez jî rêya te qut dikim! Di vê rewşê de em neşên bi hev re rêhe-

115. Fecr, 89/27-30.

valtîyê bikin. Tu ji bo çermekî fanî evîndar î, ez jî ji bo canekî ebedî evîndar im... Ji lewma divê em ji hev cuda bibin!”

Mecnûn di vê hîkayetê de; “rûhanîyet”ê, û hêştir jî “nefsanîyet”ê temsîl dike. Rûh, ji bo Ellah ê husna mûtleq evîndar e, “nefs” jî ji bo hewa û hewesên dinyewî evîndar e...

Halê însanekî ğafil di wezîfa evdînîya xwe ya li hemberî Rebbê xwe de bi ekserîyet wekî di vê mîsalê de ye. Lewra rûhê însanî adeta perên xwe li hev dixe ji bo bi zirweyên manewî ve bilind bibe, nefsa wî jî-aynî wekî mîsala kevirekî nehîtî yê bi lingê wî ve girêdayî- wî bi jêr û nizmîyan ve dikişkişîne. Ji lewma ji bo evdekî ku dixwaze bi Rebbê xwe wasil bibe, mecbûr e xwe ji pêvemanên nefsanî yên ku benê lingên wî ne, derbas bibe û dilê xwe ji her tiştên ku wî ji Xuda dûr dixin jî xwerû û temîz bike.

Bêşiwar wesîla ji hemû wesîleyan mûhîmtir ji bo nêzîkbûna ji Xuda; ew îbadet e ku di nav îşq û wecdê de bi xuşûê tê îfakirin. Dema mûmîn, îbadetê xwe bi taybetî zikrê xwe bi vê hest û şiûrê bike, ew ji bo nêzîkbûna ji Heq nail dibe. Lêbelê dema arzûyên nefsanî dilê wî îşğal bikin û wî ji hizûra Heq ğafil bikin, zimanê wî çi qeder navê Heq zikr bike bila bike, rûhê wî ji qutkirina gavek mesafe jî bêçare dimîne.

Naxwe ji bo mirov karibe di maneyeke kamil de zikr bike, îcab dike mirov ji hêla maneyî ve Cenabê Heq di dilê xwe de his bike û ji ğeyrî wî tiştekî nefikre. Ji bo vê jî, pêşî divê mirov nefsê ji heramî û bi şubheyan xwerû bike, piştre jî qelbê xwe ji mehebbetên fanî û hizrên masîwa vala bike. Lewra **nûra zikrî, di pîvana halê zakirî de** ye.

Bendeyên salih ên ku bi avezêrîyên heyata fanî naxapin û dikarin nefsên xwe bi zikrê îhya bikin, Rebbê me wisan agahîyan dide, dibêje:

**“Ji bo bîranîna navê Xuda di mabedên ku bi îradeya wî hatine lêkirin de hinek zilam hene ku sibeh-êvarê Cenabê Heq tesbîh dikin. Di wan de hinek zilamên wisa hene ku ne bazirganî, ne jî danûstandin wan ji bîranîna Ellah, ji kirina nimêjê û ji dana zekatê meşğûl dike. Ew ji rojeke wisa ditirsin ku têde dil û çav dilivin, diqulibin. Lewra** (di wê rojê de) **da ku Ellah, bi sipehîtirînê ya ku kirine, wan xelat bike û hê zêdetir jî ji ciwanmêriya xwe bide wan. Hemin Ellah kê bivê bêhesab rizq dide wî**.”[116]

Dîsa Rebbê me, îqazeke mezin dike ji bo em xwe di dinyayê de noq nekin û bi vî awayî hessasîyeta îmana xwe û riqqeta qelbî ya xwe ji dest nedin:

**“Ma ji bo mirovên ku îman anîne hê jî ew zeman nehatiye ku bi zikrkirina Xuda û bi sebab Qur’ana ku ji wî hatiye xwarê qelbên wan bilerizin?..”[117]**

Çi îbretdar e ku ev ayeta pîroz nazil bûye ji bo hinek eshabê kîram şîyar bike ku wan li Mekkê di nav hezar û yek êş û janan de digel ku ji bo (serkeftina) îmanê mûcadelekeke mezin dabûn jî lêbelê di piştî hicretê de ji bo ew piçekê bi rehetîyê gihabûn, ğeyret, zuhd û teqwaya wan sist bûbû..

Li gorî ku ev şîyarî ji nifşa sehabîyan bi xwe re jî hatine, naxwe divê di mijara gihiştina zindîtiyeke manewî ya wisan de ku ti îhtîrasên dinyewî û menfîetên fanî bandorê lê nekin de divê em (ji wan) hîn bêhtir di nav ğeyret û hewldanan de bin. Ji bo vê jî divê em hem di desttengîyê de hem jî di destferehîyê de zehf zêde Rebbê xwe zikr bikin, wî bînin bîra xwe û em ti caran wî ji bîra xwe nederînin.

116. Nûr, 24/36-38.
117. Hedîd, 57/16.

Li alîyê din însan, dema di bin mihnet/azar û meşeqqetê de be ji ber ku nefsa wî bi xwe jî zeîf e, ew hê zehftir berê xwe dide Rebbê xwe û xwe divêje ber penaha wî. Haleveku di zemanên destferehî û rehetîyê de nefsa însên dinepixe û destpê dike xwe nehewcedar û mezin dibîne. Ji bo vê ew destpê dike hindik hindik Rebbê xwe tîne bîra xwe û heta meyl dike ku wî jibîr jî bike. Haleveku bi taybetî divê em di wextên destferehî û rehetîyê de hê bêhtir Xudayê xwe bînin bîra xwe. Ji bo vê rewşê mîsala ji hemû mîsalan sipehîtir Suleyman e ku hîç ti zemanî wî qelbê xwe ji bo nîmetên berzewal û fanî nekiriye qase. Rebbê me, di bara wî de ev îltîfat kiriye, gotiye: «نعم العبد/**çi xweş bende bû**». Naxwe divê em jî di wextên destferehî û rehetîyê de dilê xwe ji bo Rebbê xwe texsîs bikin da ku rehm û înayeta îlahî di wextên me yên zor de bi hewara me ve werin, bi destên me bigrin û ew metanet û hizûrê ji qelbên me re lutf bike..

Çawa ku dema li heyata dinyayê ew çendîn dengên îrşadê dibihîzin ku wan ji bo bîranîna Xuda gazî dikin jî lêbelê dîsa mirovên ğafil wan dengên îrşagê piştguh dikin û Rebbê xwe nayênin bîra xwe, ev îqaza Rebbê me ji bo wan çi qeder dijwar e:

“**Kî jî, berê xwe ji bîranîna min vegerîne, bêguman jê re jiyaneke bi tengî heye û emê wî roja qiyametê wek kor heşir bikin. Ew dibêje: Xudayê min! Çima te ez wek kor heşir kirim? Haleveku bi rastî ez, li dinyayê bi çav bûm!** (Xuda jê re) **Dibêje: Rewş wisa ye, lewra ayetên me ji te re hatin; lêbelê te ew jibîr kirin. Îro jî eynî wisa tu têyî jibîrkirin!**” [118]

Bêşiwar Ellah Teala ji zeîftîyên wekî “jibîrkirin”ê mûnezzeh e. Lêbelê jibîrkirina wî ya evdê xwe bes îfadeyeke ğezeba îlahî ye. Bi vê sebebê ew kesê ku nexwaze di wê roja dijwara qiyametê de ji terefê Xuda ve were jibîrkirin, yan jî li derveyî rehma îlahî were

118. Taha, 20/124-126.

hiştin, divê ew jî li heyata dinyayê Xudayê xwe jibîr neke. Îro em li dinyayê çi qeder zehf Rebbê xwe zikr bikin, sibê li uqbayê jî ew qeder emê bi wusleta îlahî bigihin. Çawa Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

"**Hûn min zikr bikin ku ez jî we zikr bikim**.." [119]

Li hemberî îzzet û şerefa mezina ku mirov karibe bibe evdekî ku ji terefê Xuda ve were zikrkirin, îsrafkirina sermayê emr û jîyê xwe di nav serxweşîya ğefleta cazîbeyên fanî de, çi xapîneke ğemnak e! Ew însanên ku Xuda jibîr dikin hem jî ew Xuda yê ku ji me bendeyên xwe re daye zanîn ku ew ji şah-raya me jî hê ji me nêzîktir e û ewên ku wî di nava xwe de winda dikin, ew şaştirîn rêwîyên heyatê ne!..

Ji lewma ew kesên ku bi rastî ji bo fîraseta îmaneke rastîn xwedî bin, bi nîmetên dinyayî ji rasterê nakevin, hîç ti zemanekî rizqê xwe li ber Rezzaqê xwe nakin perde. Heke çi qeder ew di zahirê xwe de li pey rizqê xwe jî herin, ew tim û daîm dilê xwe bi zikrê Rezzaqê xwe nerm û reqîq digrin. Bêzikrî, ji bo wan diltengîyeke hundurîna mezin dide wan.

Ev diltengîya hundurîn, îqazeke îlahî ye. Ji bo mirov karibe vê îqazê bibihîze jî di esl û esasê xwe de nîmeteke dîtir e ku şukrê gerek dike. Lewra ev jî şanîdêreke dide xuyakirin ku hê jî çîka hêvîyekê heye ji bo mirov halê xwe îslah û xetayê xwe telafî bike. Ew ğafilên ku dilê wan hişk û hola bûye û mohr lê hatiye xistin ji lewma ew ji ber vê bêzikrîya xwe diltengîya hundurîn his nakin ev jî tê wê maneyê ku wan ti nesîb û par di rehma îlahî de nîn e. Êdî ew di halê wî kerîyî de ne ku sefaleta xwe seadet zen dikin û wilo temen û emrê xwe xilas dikin..

119. Beqere, 2/152.

**Hezretê Mewlana** vê heqîqetê wiha îfade dike, dibêje:

“*Dema tu wirda ku di rêya Heq de dixwînî û tesbîha ku dikişînî terk bikî, tu dikevî zehmetî û diltengîyê, diltengîyeke hundurîna ku sebebê wê nayê zanîn tê û li te dikeve.*

*Bi vê sebebê ğemgînî, ev diltengîya hundurîn cure pêşagahîyek e. Cure terbîyekek e. Dibêje: «Wirda xwe ya ku te li serê dewam dikir, terk neke, ehda xwe ya berê xirab neke!».*

*Berî ev diltengîya hundurîn, şeklê tengasîyekê, zincîrekê bigre; berî ew tiştê ku dilê te girêdide, te diguvêşe hê ji te re nebûyî benê girêdana lingê te, li ser wirdê xwe berdewam bike...*”

## JI BO ÎHMALA ZIKRÎ MAZERET NÎN E!

Îbnû Ebbas di tefsîra vê ayeta pîroz: “**Gelî yên ku îman anîne! Xuda zehf zikr bikin!**”[120] de wiha gotiye:

“Ellah Teala di her îbadetê ku li ser bendeyên xwe ferz-kirî de sînorekî diyar tayîn kiriye. Di vê xusûsê de ji bo xwedî uzran jî mazereta wan qebûl kiriye. Lêbelê zikr, li derveyî vê ye. (Lewra di Qur’ana pîroz de bi peyv û qalibên muxtelif û cuda cuda di sedan ayetên pîroz de telqînên îlahî cih digrin ku zikrê teşwîq dikin). Ellah Teala di bara zikr de sînorek tayîn nekiriye ku mirov pê bi nîhayeta wî bigihîje. Ji mirovê ku aqilê xwe winda kiribe pê ve wekî din di terka zikr de hîç ji bo ti kesî mazeretê qebûl nake. Cenabê Heq di her halûkarî de ferman li însanan kiriye ku ew di halê zikrê de bin.” [121]

---

120. Ehzab, 33/41.
121. Taberî, Camîu’l-Beyan ‘an Te’wîlî Ayi’l-Qur’an, Beyrût 1995, XXII, 22; Qurtûbî, XIV, 197.

Çi qeder îbretdar e ku Cenabê Heq dema **Hezretê Mûsa** û **Hezretê Harûn** ji bo teblîğê dişandin cem Firewn ji wan re gotiye: "**Tu û birayê xwe pevre herin ayetên min bibin û bîranîna min îhmal nekin**." [122] Bi vî awayî wî herdu bendeyên xwe yên pêğember jî di xusûsa îhmala zikrê xwe de şîyar kirine, esas di şexsîyeta herduyan de însanîyet hemû îqaz kiriye.

Çawa ji ber ku ğafilbûna ji zikrûllahê tehlûka wê mezin e, çendan bîstikekê tenê be jî **Mezinê me Pêğember** jî nîyaz kiriye, wiha gotiye; "*Ya Rebbî! Çendan bi qasî çav miçkirin û çav belkirinekê be jî min bi nefsa min nespêre!..*"[123]

Divê mirov jibîr neke ku di heyata dinyayê de ew demên ji zikrê wek mehrûm hatibin derbaskirin; wate nefesên ku mirovî Xuda jibîr kiribe û ew wilo xilas kiribin, ew rûpelên emr û temen in ku zîyan bûne. Bi vê sebebê di hedîsên şerîf de hatiye gotin:

"*Heke însan li meclisekê rûnin û li wir navê Xuda neyînin ser zimanê xwe, wan karekî kêm kiriye, wan gunehek kiriye. Kî bi rêyekê ve here û zikrê Xuda neke, wî karekî kêm kiriye, wî gunehek kiriye. Kî here ser nivîna xwe û li wir zikrê Xuda neke dîsa wî karekî kêm kiriye, wî guneh kiriye.*" [124]

"*Kîjan civak li cihekî kom bibe û li wir navê Xuda zikr neke, selewatan li ser pêğemberên wî neyînin, ev civîn ji bo wan (li axretê) dibe sersebebê hesret û poşmanîyê. Heke Xuda bixwaze dê wan bixe ezabê, heke bixwaze jî wê wan efû bike.*" [125]

---

122. Taha, 20/42.
123. Camîu's-Seğîr
124. Ehmed, II, 432.
125. Tirmizî, Dûa, 8/3380.

"*Ehlê cennetê, ne ji bo tiştekî din, sade ji bo wan wextên ku bêyî zikrê Xuda bikin li dinyayê bûrandine hest bi hesret û nedametê dikin!*" [126]

**Welhasil** bi tabîra **Necîb Fazilê rehmetî**; wekî wan ğafilên ku "ji asîmanî bêxeber babadekê difirînin" ew nefesên ku bi awayekî ji zikrê Xaliq dûr têne xilaskirin wê bibin mezintirîn poşmanîya ebedîyetê. Ji bo mirov vê poşmanîyê his neke, dema hê firsend di dest mirov de ye, îhyakirina wextê xwe bi zikrê, ji bo mûmînan fîraseteke zerûrî ya îmanê ye. Ewên **Îbnû'l-weqt**, yanî ew mûmînên kamil ên ku bi besîret û vê pêşebîyê dijîn ku karibin wextê xwe ji bo yê layiqê wî hesr bikin, jî; Bi hissîyata ku ev kelamê kubar îfade dike; "**saetên me yên ku bêyî te bûrîne, me fehm ku ew zayî bûne.**" tim û daîm di halê bi ber dergehê îlahî ve îltîcakirinê de dibin.

**Rebbê me, dilên me ji ğeflet û qesawetê mûhafeze bike. Me tevan di keş û hewaya mehebbetûllah de bide jîyandin û me bigihîne wê zumreya salihan ku qelbê wan bi zikr îhya dibe. Bila ew, me bendeyên xwe bi qasî dema nefeseke tenê jî ji Zatê Bilindê xwe ğafil neke! Bila şev û rojên me bi feyz û rûhanîyeta zikrûllah tije bike!**

**Amîn..**

126. Heysemî, X, 73-74.



# Tefekkur

*Li kaînatê herk û darêjên qudretê, adeta şiêrên îlahî yên bêdeng û bêpeyv in. Karîna xwendina van şiêran jî, bi qasî bihîstin û guhdîkîyên kûr ên di qelban de mûmkin e. Dostên Heq ku ji bo alema qelbekî fereh xwedî ne, ne bi nezareke sethî (seresere) ya li berhemên hunerê îlahî yên li kaînatê, lêbelê wekî ku li deryayeke fereh binêrin wilo nezar dikin, deryayên veşartî di dilopê de dibînin û wilo di keş û hewaya maneyê de merheleyan qut dikin.*

*Li vê alemê her zerre, bi însanê xwedî dilekî zindî re dipeyive. Hemû heyber bi lîsanê halê xwe di rewşa beyanê (eşkerekirinê) de ne. Li kaînatê, hîç ti zerreyek nîn e ku Xaliqê xwe nede naskirin. Her mexlûqat, mohra Xaliq Teala hildigre ku wî ew ji ademê anîye wicûdê. Tişta ku dikeve ser milê însanî jî ev e; di tefekkura darêj û herkên qudreta îlahî de kûr bibe û karibe bi nezara îbretê van mohrên îlahî bibîne.*

## BILA DIL LAŞGIRAN NEBIN!..

Hinek mirov hatin cem **Hezretê Hesenê Besrî** û jê re gotin:

"-Ya Şêx! Dilê me di xewa ğefletê de ye; wilo bûye ku êdî hîç ti peyvek bandora wê çênabe. Bi xêra xwe, ji bo şîyarkirina me, hûn şîretekê li me bikin…"

Hezretê Hesenê Besrî ji wan re got:

"-Xwezî dilên we ketibûna xewê.. Lewra kesê razayî zû şîyar dibe. Lêbelê ez ditirsim ku dilê we miribin! Lewra çi dema dixwazim wan şîyar bikim ew hîç ji cihê xwe nalebitin!"

Ew şexs li hemberî van îfadeyan ketin dehşetê û gotin:

"-Ya Şêx! Hûn bi vî hukmê xwe me ditirsînin."

Hezretê Hesenê Besrî ji wan re got:

"-Heke hûn îro bitirsin, hûnê sibê roja qiyametê emîn bibin. Xwelî li halê wî kesî be ku îro îcab dike ew li vir bitirse; lêbelê ew (ji ferman û qedeğeyan) natirse!.." [127]

---

127. Binêrin. Ferîdûddîn Attar, Tezkîyetû'l-Ewlîya, rûp. 29-30, Weşanên Erqam,

Cenabê Heq, ew “qelb”ê ku merkeza hissîyatê ye ji bo me wek nîmeteke mûstesna lutf kiriye, ev arzû dike ku di alema îmtîhana îlahî de daîm di nav heyrantîya têrnebûna ji sirr û hikmetên îlahî de be. Bi vî awayî ji me dixwaze ku em di nav riqqet û hessasîyeta nêzîkbûna ji Heq û dostanîya wî de li ser teqwayê heyateke evdînîyê bijîn. Ew ji me dixwaze ku em ji bo dilekî şîyar bibin xwedî ku îdraka fanîtîyê ew (bi me) dabe qezenckirin.

Ğeflet, yanî ji bo xwe çêkirina hazirîyên dinyewî û nefsanî; ji bo zeîfbûna îdrakê, kuhbûna hessasîyetê û laşgiranbûna qelbî dibe sersebeb. Ji bo dermankirina vê nexweşîyê jî “**tefekkur**” di serê rêyên bi tesîrtirîn de tê. Lewra tefekkur, mûhîmtirîn wesîle ye ji bo mirov bikeve ferqa wan xeta û nîsyanên ku di pirranîya caran de însan bêşiûra xwe bi nav wan ve tê kişkişandin vêca ew berê xwe bide ser telafîkirina wan.

## EM DI TEFEKKURA ÇI DE NE?

Ji tefekkurê meqsed; ne faîlîyeta fikirîneke nefsanî ya bêğaye û bêşiûr e. Ğayet tabîî ye ku însan bi awayekî ji awayan di fikran de noq bibe. Lêbelê ew nuqta ku herkes wê bi tefekkurê bigihîyê li gorî rewşa qelbî ya wan ferq bi ferq e. Lewra wekî gellek nîmetan, nîmeta tefekkurê jî wekî kêreke du-dev e.. Li gorî cihê ku têde tê bikaranîn ji bo xêrê dibe wesîle û ew ji bo şerrê jî dibe wesîle. Bi vê sebebê hinek mirov hene ku bi fikrên xwe perên xwe li ber ufûqên rûhanîyetê vedikin, hinek mirov jî hene ku temen û emrê xwe di nav hovîtî û dinyanedîtîya nefsanîyetê de zîyan û berehewa dikin.

Ev mîsala **Hezretê Mewlana** ji bo me çi ufûqeke sipehî vedike:

Îstanbûl 1984.

"*Rêvebir dişibihin hewzekî; xelk jî dişibihe wan lûleyên (borîyên) ku wî hewzî tije dikin. Heke ji lûleyan ava pîs were, wê hewz ji ava pîs tije bibe; heke ava temîz ji wan were, hewz wê bi ava temîz tije bibe.*"

"Qelb" di bedena însanî de merkeza tefekkur û texessusê ye. Ew jî wekî hewzekî ye. Bi tabîra **Necîb Fazilê rehmetî** jî şirikên ku vî hewzî tije dikin cot (çîft) in; nûr ji yekê dikişe, ji ya din jî zengar.. Wate, heke ji van şirikan seraqetî îştîhayên nefsanî, îhtîras û ğeflet werin, wê alema hundurîna me bibe zibilgeh. Lêbelê heke ev şirik bi ser kehnîyên feyz û rûhanîyetê ve biherikin, dil dibin deryaya hikmetê.

Cenabê Heq, ji me **tefekkura rûhanî** dixwaze. Di rewşeke berevajî de îstîdada tefekkurê, wê di gerîneka arzûyên nefsanî de helak bibe here. Lewra ew qelbê ku bi heq ve ne meşğûl be, wê batil wî îşğal bike.

Li kaînatê her tişt, vîtrînek e qelb lê temaşe dike. Qelb ji her vîtrînî bêşiwar bandorekê werdigre. Naxwe divê mirov lê miqate be ka qelb li vîtrînên Rahmanî temaşe dike, yan jî li vîtrînên şeytanî. Lewra şopa telîyê çawa nasnameyeke maddî be, ew vîtrînên ku însan li wan temaşe dike û meyla xwe bi tefekkura wan dide jî nasnameya manewî ya însanî tînin meydanê.

Li alîyê din, qabilîyeta tefekkura rûhanî, xusûsîyeteke wisa ye ku însanî ji mexlûqatên din vediqetîne û wî cuda û çêtir dike. **Hezretê Mewlana** çi xweş dibêje:

"*Hey bira! Beden wek goşt û hestî (yanî ji hêla maddî ve) bi heywanan re aynî ye. Tu, esl divê bi tefekkurê heyatê bibînî. Heke tefekkura te gul be, tu ji bexçeyekî gula yî. Heke, tu wekî strî difikrî (yanî heke tu ji arzûyên nefsanî re meğlûb bûbî hingê) tu qurmikekî, wê di êgir de bişewitî!*"

Ha însan, dema tefekkura xwe rast bikarbîne, bi rûhê xwe bilind dibe û ji bo mertebeyeke ji ya melaîketan çêtir jî, nail dibe. Lêbelê dema ew ji nefsa xwe re meğlûb bibe, ew vî wesfê xwe zayî bike, ew dem ti ferqa wî ji mexlûqatên dîger namîne. Ew dikeve nav mûhtewaya vê ayeta pîroz: ".. **Ha ew wekî heywanan e, heta ew bi rêya xwe ji wan jî hê rêşaştir in**." [128]

**Hezretê Mewlana** halê şaşomaşo yê wan ğafilên ji tefekkura rûhanî dûr, ku ketinê bi vê teşbîhê îzah dike:

"Gakek, tê Beğdadê û ji vî serî heta bi serê din li nav bajêr digere. Ew li bajarê Beğdadê (ku ji gellek şehristanîyan re malevanî kiriye, çemê Dîclê bi şireşir di nîvê wî re dikişe û ew pêşangeheke cihêwaza hunerê îlahî ye) wek nîmetên ku li xweşîya wî herin sade qaşilên şebeş û gundoran (petîxan) dibîne.. Ji xwe tiştê ji bo temaşeya ga û keran layiq jî, yan ew ka ye ku li ser rê tê rijandin û belavkirin, yan jî ew gîya û zûrçik e ku li ber kevîyên rêyan şîn dibin!"

Zatekî arif çi xweş dibêje:

"*Ev cîhan, ji bo aqilmendan seyra beday'î (ji bo ehlê aqil bi qelbê xwe karîna temaşekirina sirr, hikmet û hunerê îlahî) ye, ji bo ehmeqan jî xwarin û şehwet e.*"

Ramkirina nîmeta tefekkurê ji arzûyên nefsanî re û dûr-mana ji tefekkura rûhanî; qelbî kor û kerr dike û wî li hemberî heqîqetên îlahî bêhis û hest dike. Ew kesên ku bi çehreyeke qermiçî û abûs di dersxaneya îmtîhana îlahî ya ku têde dijîn de digerin û ew leyistika korepiskê ku ğafîlane pê dileyizin jî wê li axretê bibe korîtîyeke ebedî. Çawa Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

---

128. Furqan, 25/44.

“**Ewê ku li vê dinyayê** (bi sebeb noqbûna di ğefletê de) **dilê wî kor be**, (ewê ji heqîqetên îlahî dûr be), **ewê li axretê jî kor û hê şaştir be**.” [129]

## KEŞ Û HEWAYA TEFEKKURA RASTÎN...

Çawa ku çav, ji bo dîtinê îhtiyaca wî bi ronahîyê heye; qelb jî ji bo karibe di tefekkurê de kûrîtîyeke rûhanî temîn bike, wilo îhtiyaca wî pê heye ku bi nûra “**Qur’an** û **Sûnnet**ê” rohnî bibe. Lewra aqilê însanî bi awayekî wisan program jê re hatiye danîn ku bes di ronahîya Qur’an û Sunnetê de bigihe heq û xêrê. Bi vê sebebê heke ew ufûqê tefekkurê ku Qur’an û Sunnetê vekiriye, nebûya, me yê sirf bi aqilê xwe tenê gellek heqîqet hem fehm nekirina, hem jî me fehm nedikir. Em jî di kolanên ku fîlozof tûşî wan bûne de helak dibûn.

Însan wek kasêteke vala tê vê dinyayê. Ev kasêt bi qasî ku bi Qur’anê were dagirtin, însan kemalê dibîne. Qur’ana Pîroz bi îfadeyên mûxtelif û cuda cuda tam di 137 (sed û sih û heft) cihan de mûmînî ji bo seferberîya tefekkurê ya li ser hikmet û heqîqetên îlahî bang dike, dawet dike.

Li kaînatê herk û darêjên qudretê, adeta şiêrên îlahî yên bêdeng û bêpeyv in. Karîna xwendina van şiêran jî, bi qasî bihîstin û guhdîkîyên kûr ên di qelban de mûmkin e. Dostên Heq ku wan alema qelbekî fereh heye, ne bi nezareke sethî (seresereyî) ya li berhemên hunerê îlahî yên li kaînatê, lêbelê wekî ku li deryayeke fereh binêrin wilo nezar dikin, deryayên veşartî di dilopê de dibînin û wilo di keş û hewaya maneyê de rêyan qut dikin. Ehlê tesewwufê jî ku bi qelbê xwe gihiştina Xuda ji bo xwe kirine ğaye, Qur’an û Sunnet ji bo jîyana xwe kirine tewere (mihwer) ku ji bo gihiştina vê

129. Îsra, 17/72.

emancê jî ew tekane rê ye. Çendîn ayetên Qur'anê ji xwe re kirine ewrad ku ferman hatiye kirin mirov li ser wan kûr û zehf kûr tefekkur bike. Wan bawer kiriye ku divê qelbê xwe bigihînin safîyetê ji bo karibin maneyên hûr ên Qur'anê fehm bikin.

Şair **Necîb Fazil**, kûrahîya tefekkurê ya ku ew rûhên bilind pê gihane û ka wan çawa xwe ji bo tewazû û hesta hîçîtîyê sewq kirine, wiha teswîr dike, dibêje:

*Ew camêrên ku di fezaya dil de ne,*
*Di ezîyeta ajotina axê de ne..*
*Stêran tesbîh tesbîh dikişînin,*
*Di nimêjê de li dehma paşîya sefê de ne..*

## KITÊBA KAÎNATÊ BIXWÎNE!

Aynî wekî Qur'ana Pîroz kaînat jî, kitêbeke hikmeta ye ku ew bi tecellîyatên qudret û ezameta îlahî tije ye, naxwe hem jîyîna di nav wê de û hem jî tefekkur nekirina li ser wê bi heysîyeta însanîyetê re lihevhatî û layiq nabe. Lewra li vê alemê her zerre, bi însanê xwedî dilekî zindî re dipeyive. Hemû heyber bi lîsanê halê xwe di rewşa beyanê (eşkerekirinê) de ne. Li kaînatê, hîç ti zerreyek nîn e ku Xaliqê xwe nede naskirin. Her mexlûqat, mohra Xaliq Teala hildigre ku wî ew ji ademê anîye wicûdê. Tişta ku dikeve ser milê însanî jî ev e; ew di tefekkura darêj û herkên qudreta îlahî de kûr bibe û karibe bi nezara îbretê van mohrên îlahî bibîne.

Kesekî nebîn (kor) jî, heke çi qeder derketina taverojê nebîne jî lêbelê (hilatin û derketina wê) ji herareta wê fehm dike. Dema hal ev be, çi ğemnak e ku însanekî xwedî aqil û îdrak, li hemberî xarîqeyên ku qelema qudreta îlahî ew di kitêba kaînatê de xîjk kirine, bêserûpê, abûs bimîne û bi zihnê xwe û qelbê xwe întîqal neke, ji eserê neçe mûessirî û ji hunerê neçe, negihe hunermendî..

Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

“**Bêşiwar li cem Xuda xirabtirîn candarên ku li sererdê birêve diçin, ew kerr û lal in ku nahizirin**.” [130]

Ji bo wî însanê li alemekê dijî ku ew bi heqîqetên îlahî hatiye xemilandin û dagirtin fehm nekirina hebûn û yekbûna Cenabê Heq abes e. Lewra wekî çawa dostekî Heq gotiye:

“Cenabê Heq ew qeder zahir e ku ji zehf zêde zahirbûna xwe berze ye.”

Ev qisse, vê heqîqetê çi xweş îfade dike:

Yek ji ewlîyaûllah ên mezin Hezretê Cuneydê Beğdadî rojekê dibîne ku wa ye gellek însan di nav telaş û meraqê de rast ber bi cihekî ve diçin. Ew ji wan dipirse, ji wan re dibêje:

“Hûn wiha bi telaş û heyecan bi kuderê ve diçin?” Ew jî jê re dibêjin:

“Alimek ji filan derê hatiye! Dibêjin: Xebero ew hebûn û yekbûna Xuda bi hezar û yek delîlan îzah dike! Em diçin ji bo ji wî îstîfade bikin. Heke hûn bixwazin, kerem bikin, hûn jî werin!”

Vêca Hezretê Cuneyd bi bevkenîyeke (tebessumeke) dilşikestî ji wan re wiha dibêje:

“-Ji bo çavên ku dibînin, guhên ku dibihîzin û dilên ku seh dikin li kaînatê bêjimar şehadetên îlahî, terennum û delîl hene. Bizzat Cenabê Heq, di bara xwe de çendîn şehadetên wî hene. Hey millet! Digel van hemûyan jî heke hê jî şubha kesekî hebe, bila kerem bike, here! Di dilê me de firdika (kirinti) şubhê jî nîn e.”

---

130. Enfal, 8/22.

Ew însanê ku karibe kitêba kaînatê bixwîne, ewê (bi hêsanî) bibîne ku kaînat pêkve, heta tu bibêjî bes di nav hesabekî hessas û hûr de xwe ji tenzîma îlahî re stûxwehr dike; ew têdigihe ku însan çêtirîn heybera alemê ye û bêhesab, bi rasthatinî û wek ji nefsanîyetê re meğlûb hereket kirina wî çi qeder li derveyî aqil, însaf û îz'anê ye.. Ewê maneya heyat û kaînatê îdrak bike û têbigihe ka li vê cîhanê wezîfa wî çi ye.

**Welhasil,** failîyeta tefekkureke ku Heq jê razî bibe, bes di şûv û qada zêhn û qelbekî wilo de neşw û nema dibe ku ew ji rûhanîyeta Qur'an û Sunnetê xurek werdigre. Hedefa nîhaî ya tefekkureke wiha jî;

-Waqifbûna bi hebûna Xaliqê kaînatê Cenabê Wacibû'l-Wicûd e,

-Fehmkirina hîçîtî û bêçaretîya xwe li hemberî qudret û ezameta Wî ye û

-Gihiştina bi vê hestê ye ku însan ji kirina şukrê nîmetên Wî yên ku nayên hijmartin bêçare û nekare ye. Bi qelbekî wiha reqîq jîyîna heyateke evdînîyê ya li ser teqwayê ye.

## TEFEKKUR DI HEYATA ÎBADETÊ DE

Tefekkureke rûhanî, ji bo gihiştina îmana tehqîqî wesîle ye. Ji bo îlm bi îrfanê wergere, zerûrî ye ku ew di ufûqa tefekkurê de bizenzile û li ser qelb were neqşkirin.

**Wehb bin Mûnebbih** -rahmetûllahî eleyh- dibêje:

"*Ewê ku zehf tefekkur bike bi awayekî mûtleq zana dibe. Ewê ku bi maneya rastîn zana bibe jî mûtleq e ku ew amelên salih dike.*" [131]

131. Îhya, IV, 764.

Îbadet, bes dema bi xuşûê werin edakirin sewiyê qezenc dikin. Tefekkur, di îbadetan de halê xuşûê temîn dike. Lewra tefekkur; vê şiûr û diqqetê bi mûmînî dide qezenckirin ka ew di esnaya îbadetê de li hizûra kê ye. Bi vê sebebê di navbera wan îbadetên ku di nav kûrahîya tefekkurê de têne edakirin û îbadetên ku bi awayekî ğafîlane têne edakirin de ferqa sewîyekeke mûezzam heye.

Çawa **Hezretê Elî** jî gotiye:

*"Di îbadetê bê-îlm de, di tîlawetê bê tefekkur ê Qur'anê de feyde û feyz kêm dibe."* Îşaret pê kiriye ku ji bo heyateke meqbûla îbadetê tefekkur lazim hebe.

**Mezinê me Pêğember** bi vê:

*"Wekî tefekkurê îbadet nîn e."*[132] gotina xwe eşkere kiriye ku wî feyz wergirtina qelb ji tefekkurê adeta di sewîya îbadetê de dîtiye. Wate ji bo mirov ji îhtîrasên nefsanî xilas bibe, qelb zirav û zarîf bike, îmanê bi qewwet bike, endîşeyên ne lazim terk bike û di heyatê de hizûrê bibîne pêwîst e tefekkur hebe, hem jî tefekkur ji bo qebûlbûna îbadetan jî şert e..

## HALÊ TEFEKKURA MEZINÊ ME PÊĞEMBER

Di nav însanîyetê de di warê kûrahîya tefekkur û texessusê de tekane şexsîyetê ku ji bo tecellîyatên bi zirwetirîn hatî mezherkirin hîç şubhe nîn e ku ew **Mezinê me Resûlûllah** e. Yek ji dostên Heq **Hezretê Ehmed er-Rîfaî** dibêje:

"*Tefekkur, amelê pêşî yê Mezinê me Hezretê Pêğember e. Lewra di berîya hemû ferzan de îbadetê wî, ji hizirîna mexlûqatên*

132. Elî el-Mûtteqî, Kenzû'l-Ûmmal, XVI, 121.

*Xuda û nîmetên Wî îbaret e. Naxwe hûn jî xwe bi tefekkurê ve berdin û wê ji bo îbretê bixin wesîle.*"

Bi rastî **Resûlê Xuda**, di demên ji wezîfedarbûna bi pêğembertîyê nêzîk de xwe bi zehfî dabû ser tefekkurê. Bi taybetî di **Şikefta Hîra**'yê de bi rojan ketiye înzîwayê ew jî wekî kalê xwe **Îbrahîm** bi awayê îbret girtina ji mexlûqatên erd û asîmanan û temaşekirina Ka'bê ketibû keş û hewaya tefekkureke kûr.

Mezinê me di heyata xwe ya piştre jî de -çendan di rûyê wî de tebessum hebû jî- ew bi qelbê xwe mehzûn û bi fikar bû. Heke zerûret nebûya ew nediaxivî û halê huşbûna wî dirêj dewam dikir. Wî di her firsendê de ummeta xwe jî ji bo tefekkur-kirina li ser mexlûqatên Xuda bang dikir[133] û dida hînkirin ku îhtiyaca însanî bi tefekkurê heye.

Pêğemberê Xuda di hedîseke şerîfa xwe de dibêje:

"*Rebbê min ferman li min kir ku huşbûna min tefekkur be.*" [134]

Heke însan biaxive, bila hikmetên ji huşbûnê bi qîmettir, bibêje. Heke na, bila ew huş bibe. Ğayet hindik axaftina Mezinê me û dirêj dewamkirina huşbûna wî jî ji bo me di mahîyeta îqazê de ye. Bi vî awayî ji me re gotiye; nebin wekî wan ğafilên ku ji ber zehf xeber didin firsendê nabînin tefekkurê bikin.

**Hezretê Hesenê Besrî** dibêje:

"*Axaftina yê ku peyva wî ne hikmet be, ne di cihê wê de ye, huşbûna yê ku tefekkur nake, pûç e, nêrîna yê ku bi awira îbretê nanêre, xeta ye.*" [135]

---

133. Binêrin. Deylemî, II, 56.
134. Binêrin. Îbrahîm Canan, Ansîklopedîya Hedîsê, XVI, 252, hijmara hedîsê: 5838.
135. Îhya, IV, 764.

Dîsa Hezretê Hesenê Besrî di bara tefsîra vê ayetê: “**Ezê kesên ku li erdê bi neheqîyê xwe li mezinatiyê datînin ji ayetên xwe vegerînim.**” [136] de gotiye: “*Cenabê Heq dilê mirovên wiha ji tefekkur-kirina li ser ezameta îlahî asteng dike*.” [137]

Dêya me **Hezreta Aîşe** di bara bîranîneke heyata tefekkurê ya Mezinê me **Pêğember** de wiha dibêje:

“Şevekê Resûlûllah ji min re got:

«-*Ya Aîşe! Heke tu destûrê bidî, ezê vê şevê bi Rebbê xwe re bi îbadetê bibûrînim*.» Min jî jê re got:

«-Wellahî, ez zehf hez dikim bi Te re bim. Lêbelê çi tiştê ku keyfa te tîne, ez ji wê jî hez dikim.»

Piştre ew rabû, rind destmêj girt û nîyeta xwe li nimêjê anî. Ew digrî. Ew qeder ew girî ku cilên wî, riha mûbareka wî, heta cihê sicûda wî şilûpil bûn. Dema ew di vê rewşê de bû, Bilal hat ji bo banga nimêjê bide. Dema wî dît ku wa ye Mezinê me digrî, jê re got:

«-Ya Resûlellah! Çima hûn digrin, ji xwe Xudê Teala gunehên we yên ku derbas bûne û yên ku hê tên jî efû kirine?» Vêca Resûlê Xuda jê re got:

«-*Ma bila ez nebim evdekî ku ji Rebbê xwe re zehf şukr dike? Wellahî îşev ayetên wilo ji min re hatin xwarê, xwelî li serê wan kesan be ku wan bixwînin û li ser wan tefekkur nekin!*» û wî ev ayetên ha xwendin:

“**Bi rastî di aferandina erd û asîmanan de û di peyapey hatina şev û rojê de ji bo xwedî aqilê selîm hemin nîşanên**

136. Eraf, 7/146.
137. Îhya, IV, 764.

**qet'î hene** (yekbûna Xuda şanî didin)**. ha ew in, yên ku rabûyî û rûniştî û li ser teniştên xwe gêrkirî** (her dem) **Ellah zikr dikin** (di bîra xwe tînin, navê wî her dibêjin); **di bara aferandina erd û asîmanan de kûr kûr difikirin û dibêjin: Perwerdegarê me! Te eva ha pûç neaferandiye! Em Te ji nuqsanîyan pak didêrin! Me ji ezabê cehennemê biparêze!**" [138]" [139]

Ha Resûlê Xuda di nav tefekkura li ser tecellîyatên ezameta îlahî de heta sibehê hêstirên çavan barandibûn. Em jî wek ummeta Mûhemmed ji bo ziravbûna qelbê xwe divê li ser tefekkura herk û darêjên qudreta îlahî himbiz bibin.

## ESL MARÎFET...

Di Qur'ana pîroz de her sûnda îlahî, dan-hînkirina tefekkurekê ye ku maneya wê dibe ev; "ezameta îlahî bibîne, nas bike û jibîr neke ku tu li hemberî vê ezametê «**hîç**»î.. Ji xwe evdînîyeke meqbûl jî pêwîst dike bende, li hemberî qudret û ezameta bêdawîya Rebbê xwe her demê "hîç"îtîya xwe û zeîftîya xwe îtîraf bike.

Bi rastî em wek beşer di şertên dinyayê de îmkanên îdraka me sînordar in, heqîqetên îlahî jî bêsînor in. Aqil, adeta di qeweta terazîyeke destan de ye; lêbelê heqîqeta ku tê kişandin, ew qeder giran e ku çîya jî nikarin wan bikişînin. Ew heqîqetên ku Cenabê Heq ji îdraka însanî re dane zanîn, ji heqîqetên îlah bes qismekî cuz'î ne. Heta ev qismê cuz'î jî gelo em çi qeder ji kunha (heqîqeta) wî waqif in?

Ev heqîqeteke zehf eşkere ye ku heke em bi maneya tam ji heqîqetên îlahî bi qasî ku îdraka me karibe bigre jî waqif bibin, em ji marîfetûllah, mehebbetûllah û xeşîyetûllah'îyê du-ta dibûn, me enîya xwe ji secdê ranedikir û emê li hêvîya nefesa dawîn bimana.

---

138. Alî Îmran, 3/190-191.
139. Îbnû Hibban, II, 386.

Bi mûcibê ayeta pîroz “**...Di nav bendeyên wî de bes alim** (bi awayekî pêwîst) **ji Xuda ditirsin..**” [140] Bi qasî ku em Heq nas bikin, hestên me yên teqwayê li hemberî wî înkîşaf (xuya) dibin.

Çawa **Hezretê Bişr-ê Hafî** wiha dibêje:

“*Heke însan (bi awayekî layiq) di bara ezameta Ellah Teala de tefekkur bikin, ew nikarin li hemberî wî îsyanê bikin, nedikarîn gunehan bikin.*” [141]

Dostê Heq **Hezretê Hatemê Esam** jî gotiye:

“*Îlm ji meyzandina bi îbretê zêde dibe, ji zikrê mehebbet pirr dibe, ji tefekkurê jî di teqwayê de merhele têne qutkirin.*” [142]

Em çi qeder întîbayan ji dinyayê bigrin ew qeder emê heqîqetên ku Cenabê Heq ji me re dane zanîn jî, fehm bikin. Kî dizane ka di navbera maneya ku ev eşkerekirinên îlahî di îdraka sînordara me de tînin meydanê û rastîya wê de çi ferqa mahîyeteke mûezzam heye?! Li derveyî heqîqetên îlahî yên ku me kariye ji wan waqif bibin jî kî dizane ka çi qeder sirrên mûhteşem hene lêbelê ji ber ku însan nikare wan fehm bike, ew ji beşerîyetê re nehatine teklîf û teblîğkirin!.. Em, ên ku çavên wan bi perda ğeybê hatine girtin, adeta wekî zarokên ku pîrepiskê dileyizin bi melekeya destê xwe karîne heqîqetan bibînin, li ber îlmê îlahî çi qeder jî cuz’î ne!..

Mezinê me Pêğemberê ku wek rehm ji aleman re hatiye şandin jî gotiye:

“*Heke tiştên ku dizanim we jî zanîbûna; hûnê hindik kenîbûna û zehf girîbûna.*” [143]

140. Fatir, 35/28.
141. Îbnû Kesîr, I, 448.
142. Îhya, IV, 765.
143. Buxarî, Kusûf, 2; Mûslim, Selat, 112.

Digel ku Mezinê me Pêğember di nav beşerîyetê de di mijara marîfetûllah'îyê de zirweyê pêkyîne jî dîsa zûbizû nîyaz û îstiğfar ji Cenabê Heq kiriye û gotiye:

"*Ya Rebbî! (Em Te tenzîh û teqdîs dikin.) Me bi marîfeteke layiqê Te, Tu nas nekirî..*"[144]

Dîsa Mezinê me Pêğember di hinek dûayan de wiha gotiye:

"*Xudayê min! Ez ji ğezeba te xwe diavêjim ber rizaya te, ez ji ezabê te xwe davêjim ber efûya te û ez ji te, dîsa xwe diavêjim ber penaha te! Bi awayê ku tu jê re layiq î nikarim medh û senayên te bikim! Te çawa medh û senayên xwe kiribin tu wisa yî!*" [145]

Em jî divê xwe li hemberî bêdawînîya qudret û ezameta îlahî adeta di rewşa "**hîç**"ê de tefekkur bikin, em di nav kûrahîya vê hestê de berê xwe bidin ser hemd, şukr, zikr û îstiğfaran. Divê em jibîr nekin ku Rebbê me mûteal e, di mûkemmelîyeteke wilo de ye ku em çi qeder wî nas dikin ew ji wê hê bêhtir bilindtir e, ku îdraka beşerî nikare wê bilindahiya wî fehm bike. Ew ji her cure nuqsanîyan mûnezzeh e, bi her cure sifetên kemalê jî mûttesif e. Ha şert e ku em di nav ufûqê vê tefekkurê de jê re evdînîyê bikin.

**Welhasil** tefekkura rûhanî, mektebeke perwerde û terbîyê ye. Em wek mûmîn, divê bibin xwendekarekî zîrek ê vê mektebê û em hewl bidin para xwe ji mûhtewaya vê fermana pîroz "**bixwîne bi navê Rebbê xwe yê ku aferandiye!**"[146] wergirin.

**Rebbê me, me ji tefekkura nefsanî û ji ğefleta bêtefekkurê mûhafeze bike! Qelbê me, aqilê me, hest û hizrên me bi rizaya îlahî ya xwe te'lîf bike** (bide hezkirin) **û jîyîna di keş û hewaya tefekkureke rûhanî de bi nesîbê me bike!**

**Amîn..**

---

144. Mûnawî, Feyzû'l-Qedîr, II, 520.
145. Mûslim, Selat, 222.
146. Elaq, 96/1.



# *Bi Nêrîna Îbretê Xwendin*

*Esl qelb e, ewê ku aynî wekî Qur’ana Pîroz kaînat û hadîsatê jî dixwîne û hikmetê keşîf dike. Bi tefekkurê nûra îmana di qelban de çîk dide. Li ser vî esasî, ji bo em karibin rûpelên heyat û kaînatê bi îbretê wergerînin û bi tefekkurê bixwînin, em bêgav û mecbûr in ku bi qelbê xwe tehsîlê bikin.*

*Mirovê xwedî şexsîyeteke nepixî, nefseke dinyanedîtî û hov û ez-ezîyeke dijwar çavê dilê wî kor e. Ji lewra bi taybetî heke em arzû bikin ku nêrîna me ya îbretê bi qewwet bibe û nûra besîreta me zêde bibe, şert e ku em nefsa xwe bi rîyazat û mûcadelê terbîye bikin..*

# BI NÊRÎNA ÎBRETÊ XWENDIN

Cenabê Heq di Qur'ana Pîroz de yekem fermana xwe ji însanî re; "اقْرَأْ /**bixwîne!**" bûye. Li kaînatê her heyber û her hadîse/bûyer ji bo dilên arif derseke hikmetê ye ku divê were xwendin û fehmkirin. Di evdînîyê de jî esil mesele, bi mûqteza'ya fermana îlahî ya "**bixwîne bi navê Rebbê xwe yê ku aferandiye!**"[147] karîna qezenckirina îstîdada vê xwendinê ye. Esas tehsîl ev e. Wate, di her tiştî de karîna bidestxistina mezîyeta xwendina hikmetên îlahî ye.

Wekî Qur'ana Pîroz, kaînat jî mûcîzeya beyaneke îlahî ye ji bo beşerîyetê hatiye teqdîmkirin da ku bi çavê dilî were xwendin. Her zerreyeke wê di hukmê cure zarfeke hikmet û heqîqeta de ye. Wezîfa mûmînekî kamil û arif ev e; van zarfan veke û mezrûfî, wate karibe peyamên îlahî, sirr û hikmetên di navê de bixwîne û bi awayekî layiq wan îdrak bike.

Gellek ayetên di Qur'ana Pîroz de jî bang li me dikin ji bo em dersên hikmetê yên di nav van zarfan de bixwînin. Xuda di yekê ji van ayetan de wiha dibêje:

"**Bêguman li erd û asîmanan ji bawermendan re pirr ayet hene. Bêguman di aferandina we mirovan û wan rûhberên ku**

147. Elaq, 96/1.

**Xuda wan li sererdê belav dike de, ji bo qewmekî ku ji dil û can îman tînin pirr nîşan û îbret hene. Bêguman di peyapey anîn û guhertina şev û rojê de, di wî rizqê ku Ellah ew ji asîmanî anîye xwarê** (baranê) **de û bi wê erdê, di piştî mirina wê de sağ û hêşîn dike de û di guherandin û anîna bayê ya ji hemû aliyan de ji bo qewmekî ku fêhm dikin pirr ders hene!**." [148]

Di gellek ayetên şubhê vê de jî Rebbê me bi gotinên xwe;

-Bal kişandiye ser mexlûqatan; "**ma ew li hêştirê nanêrin?**[149]"[150]

-Balê dikişîne ser bûyer û hadîseyên coğrafîk; "ma ew li ewran, baranê, çîyayan, gîyayên şîn ku zivistanê dimrin û di biharê de jî sağ dibin, nanêrin?"

-Balê dikişîne ser tarîxê; "ma ew li encama qewmên ku bûrîne nanêrin?" bi vî awayî vê banga xwe dubare dike.

## ESIL QELB DIXWÎNE

Divê em jibîr nekin ku wekî Qur'ana Pîroz, kaînat û hadîsat jî, esil yê ku wan bixwîne û hikmetê keşf bike, qelb e. Çavê serî, ji bo çavê dilî di mesaba cure berçavkekê de ye. Lewra çav, li gorî nîyet û mahîyeta qelb, dinêre û dixwîne.

---

148. Casîye, 45/3-5.
149. Ğaşiye, 88/17.
150. Sifetên Cenabê Heq el-Barî û el-Mûsewwir îfade dikin ku wî mexlûqat di şekl û sûretên ji hev cuda de aferandine, li gorî şert û wezîfên ku wê bi wan rabin jî her heyber bi qabilîyetên ji erk û wezîfa wê re mûnasib techîz kiriye. Di nav heywanatan de xusûsîyetên ku ji hêştirê re hatine dayîn ji bo vê mîsaleke tîpîk e. Ji ber ku ew di keş û hewayeke çolî de dijî ku gîya û av lê kêm e, di piştpolên (hörgüçên) xwe de bi şeklekî wisan zehf avê depo dike ku ji bo zemanekî dirêj têra wê bike û ew bi awayekî wisan hatiye aferandin ku muddeteke dirêj gîyayên dixwe di nava xwe de wan taze bigre. Bêşiwar ev, sade yek e ji tezahurên bêjimar ên îlm, qudret û hunerê îlahî ku mirovî dixin heyret û dehşetê.

Dostê Heq **Hezretê Mewlana** vê wiha îzah dike, dibêje:

"*Çavên me, awirên me di îstîqameta rota'ya dil de ne. Heke dil bixwaze wê çav li mar meyzîne, yanî wê li jehrê binêre; heke dil bixwaze wê çav li wan tiştan meyzîne ku îbretê ji wan bigre, dersê ji wan bigre.*

*Heke dil bixwaze wê çav, li dinyayê û nîmetên dinyayê (ku nefs wan arzû dike) binêre; heke dil bixwaze wê çav, li maneyê (binêre, hikmetan berhev bike û) ji sirrên îlahî re aşna bibe..*

*Heke dil bixwaze wê dest bi telîyên xwe hesab bike, heke bixwaze ew telî (wê meharetê qezenc bike) kitêb û berheman te'lîf bike.*

*Diqqet bikin, destê bi huner ê ku van tevan dike, di esilê xwe de destekî bi dizî yê di navê de (yanî qelbê te) çawa dixwaze wilo hereket dike. Ew destê veşartî (yanî ew qelbê ku merkeza tefekkur û tehessusê ye) vî destê xuyayî yê bedena me wekî maşikê bikartîne û karên (musbet û menfî) dide kirin.*"

Ji lewma îcab dike ku mirov qelbê xwe ji hêla maneyê ve bi awayekî wisan amade bike ku wî ji îbret û hikmetê re aşna û çavnas bike.

**Yûsuf Hemedanî** -quddîse siruh- dibêje:

"*Qelb û zikr wekî darê û avê ne. Qelb û tefekkur jî wekî darê û fêkî ne. Av bi darê nedan û şînbûnî jê hêvîkirin; nemana li hêvîya pel û çîçek vekirina wê, û fêkî jê xwestin xeta ye. Heke ew jê werin xwestin jî ew bi ti awayan fêkî nade. Lewra ew dem, ne wextê fêkî ye, lêbelê wextê xwedîkirina darê û îmar-kirina wê ye. Gerek e mirov avê bidiyê û wê ji gîyayên biyanî, darheblênek û her tiştên nejê paqij bike, piştre jî li hêvîya germahîya taverojê bimîne. Dema ev bicih werin dar wê taze û geş bibe û wê bi pelên kesk bixemile.*

*Piştî dar bi vê gihanê bigihe, hingê hêvîkirina fêkî ji çiqilên wê rast dibe. Êdî ev wext, zemanê fêkî ye*." [151]

Heke ronahî nebe çawa çav tiştekî nabîne; nûra îmanê jî heke rûhanîyeta Qur'an û Sunnetê nebe, çavê dil jî hîç ti heqîqetê nabîne. Nûra îmanê ya di qelban de jî bi tefekkurê çîk jê diçe, dibe-riqîne. Li ser vî esasî, em bêgav û mecbûr in li qelbên xwe bidin hînkirin ku ew heyat û kaînatê bi îbret û tefekkurê bixwîne. Çawa ehlê hikmetê jî gotine:

"*Kî bê îbret standin li dinyayê meyzîne, di çavê dilê wî de jî bi qasî vê ğefletê kuhbûn hasil dibe*." [152]

Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

"**..Bibêje: Ma ewê ku çavê** (dilê wî) **kor û ewê** (çavê dilê) **dibîne hîç wekhev dibin? Ma hûn hîç tefekkur nakin?**" [153]

Halê bêtefekkurîyê ku Rebbê me ew bi korîtîyê teşbîh kiriye, hatin perdekirina dilî bi ğefletê ye. Gellek însan hene ku çavê serê wan dibîne; lêbelê dilê wan hişk û hola bûye, li ber hikmet û heqîqetan hatiye girtin. Xuda di ayeteke dî de di bara mirovên wiha de gotiye:

"**..Rastî ev e ku çav kor nabin; lêbelê dilên di singan de kor dibin**." [154] ji xwe esil korîtî jî ev e.

Ew însanê ku çavê dilê wî kor be, ya xweşik kirh û ya kirh jî xweşik dibîne. Halê **Ebûcehl** ê ku di tarîtîyên şirk û cehaletê de hatî veşartin û çûyî jî ji bo vê (rastîyê) mîsaleke eşkere ye. Çawa wî bedbextî, di halê heyata xwe de bi gellek caran gihabû dîtina

151. Rutbetû'l-Heyat, rûp. 71.
152. Îbnû Kesîr, I, 448.
153. En'am, 6/50.
154. Hec, 22/46.

wî Mezinê me Fexrê Cîhanê ku bêhijmar evîndarên Pêğember ji bo careke tenê dîtina wî lavlav dikirin. Lêbelê ew mûşrikê har di menfîetên nefsanî de noq bûbû, wijdana wî bi bizmar (kevir) bûbû, ji ber tarîtîya ripûreşa di qelbê xwe de çavê wî li hemberî wê nûra cennetê ya li ber çavê xwe jî kor û hetim bûbûn. Aynî wekî çelexwehrîtîya di nêrîna Îblîs ya li Hezretê Adem de..

**Hezretê Mewlana** dibêje:

"*Şeytanî herîya Adem (pêkhatina bedena wî ya ji axê hatî aferandin) dît; lêbelê bilindahîya wî nedît. Wî li harîya aîdê vê dinyayê temaşe kir. Lêbelê ew li hemberî manewîyata aîdê wê alema dîtir kor bû. Ew terefê ku şeytan nikare bizane, xelîfebûna însanî ya ji bo Heq e.*"

"*Ey însan, ji dinyayê du dengên ji hev re zid tên. Gelo dilê te ji bo wergirtina kîjanî amade ye?*

*Ji wan herdu dengan yek halê mirovên (ehlê teqwayê ye) ku ji Xuda nêzîk dibine, ya din jî halê mirovên ku (bi fisq û ficûrê) têne xapandine. Dema te dengek ji van qebûl kir, êdî tu nikarî yê dîtir bibihîzî! Lewra ew kesê ku hez bike, ew li hemberî her tiştên ji hezkirina xwe re zid, adeta kor û kerr dibe.*"

Ha ew însanê ku qerar dabe li heyatê ji pencera nefsanîyetê li her tiştî binêre û xwe li ser wî alîyî pêş-amade kiribe, daîm di qalikê de pêvemayî dimîne û ew nikare nifûzê hîç li kakil û heqîqeta tiştekî bike.

**Îbnû Etaûllah Îskenderî** dibêje:

"*Derveya alemê xweşik e, nava wê îbret e. Qelb (-ekî ku bi rûhanîyetê hatibe tezyînkirin) jî li nefsê, li derveya sipehîtîya wê (li şekl û şemalê wê), li îbretên nava wê dinêre.*"

Bi vê sebebê zehf mûhîm e ka em li çi û çawa dinêrin. **Hezretê Ebû Elî Rûzbarî** dibêje:

“*..Ew kesê ku careke tenê jî ji layiqbûna wê bêhtir qîmet bide nefsa xwe û lê binêre (ew kesê ku ji kibr û quretîya xwe re bûbe yexsîr) nikare li kaînatê bi nezara îbretê hîç li tiştekî binêre.*”

Naxwe mirovê xwedî şexsîyeteke nepixî, nefseke dinyanedîtî û hov û ez-ezîyeke dijwar çavê dilê wî kor e. Ji lewra bi taybetî heke em arzû bikin ku nêrîna me ya îbretê bi qewwet bibe û nûra besîreta me zêde bibe, şert e ku em nefsa xwe bi rîyazat û mûcadelê terbîye bikin..

Pêğemberê Xuda di hedîsa şerîf de dibêje:

“*Li dinyayê wekî mêhvan bin! Mizgeftan ji xwe re bikin mal! Dilên xwe li riqqetê (dilovanî, zarafet û hessasîyetê) hîn bikin! (Darêj û herkên ezamet û qudreta îlahî) zehf tefekkur bikin û (bi endîşeya şukr nekirina bi awayê layiq ji bo nîmetên îlahî) zehf bigrîn! Bila arzûyên nefsanî yên we, we neguherînin!*” [155]

**Ebûbekr**ê dil reqîq jî Mezinê me Nûra Hebûnê dît. Ew jê re bû evîndarekî sadiq û dost. Ebûbekr li cem Mezinê me Pêğember jî bi hesreta wî bû, wî her wext û dema heyata xwe di nav mehebbet û heyrantîyeke destan-warî de jîyaye.

Bi vê sebebê divê mirov wekî şeytan ji pişt pencera bi qesaweta nefsanîyetê hîç li tiştekî nemeyzîne, tam berevajî vê divê mirov karibe wekî Ebûbekr û mûmînên kamilê wekî wî bi nûra rûhanîyetê li her tiştî binêre û di nav vê ğeyretê de bibe...

155. Ebû Nûeym, Hilye, I, 358.

Çawa şairî gotiye:

"*Ew tiştê ku bi eşqê nûr tê dîtinê*
*Bi kînê dibe nar (agir).*
*Ji bo ğeleta ru'yetê dibe mîsalek,*
*Ebûcehl û Îmamê Elî!..*" [156]

## NEZARÊN ÎBRETÊ

**Ebû Suleyman Daranî** dibêje:

"*Ez ji mala xwe dertêm, çavê min bi çi tiştî bikeve ez têde nîmeteke Xuda li ser xwe dibînim. Ez îbretekê ji wî dibînim û ji xwe re dersekê jê dertînim.*"[157]

**Sufyan bin Uyeyne** jî di xusûsa îzaha vî halî de dem bi dem ev peyva şairekî dubare dikir, digot:

"*Heke însan bibe xwedî fikr, wê ji her tiştî dersekê bigre.*" [158]

Her dem û ana heyatê bi weqaetên bênîhayet û menzaran tije ye ku ew qudret û ezameta îlahî bibîr dixin û ji bo wergirtina hikmet û îbretê wesîle ne. Cenabê Heq di gellek ayetan de însanan bang dike ji bo ji van weqaet û menzaran îbret bigrin. Cenabê Heq, di ayetekê de jî wiha dibêje:

"**Ew e, yê ku ayetên** (cazîbeyên) **xwe** (yên ku hebûn û yekbûna wî şanî didin) **ji we re şanî dide û ji asîmanî rizq ji we re tîne xwarê. Ji bilî yê ku berê xwe dide Xuda kesekî din** (ji van ayetan) **îbret nagire**." [159]

---

156. Qadir Misrlîoğlû, Cemre, rûp. 76. Îstanbûl, 2007.
157. Îbnû Kesîr, I, 447.
158. Îhya, IV, 764.
159. Mûmîn, 40/13.

Bi rastî ji roja ku dinya hatiye avakirin û heta bi îro hîç rizqê ti candarekî nehatiye îhmalkirin, bêhijmar sifrên îlahî hatine danîn û heta vêga jî ew her berdewam têne danîn. Heke em bifikrin; ji çar parên dinyayê sê parên wê di bin avê de ne. Ji çaryeka wê jî pişkeke mezin ji zinar û çolan pêktê û ji bo şînbûna zad û gîyayan bikêrnayê. Ji pişka mayî jî beşeke hindik ax e. Lêbelê ew çi qudreteke bilind e ku vê axê bi îstîhaleyeke bêdawîn yanî bi guherîn û dagerînê kiriye serkehnîya xurekan ku ew hemû candaran têr-xwarin bike.

**Mezinê me Pêğember** wiha dibêje:

"*Xuda gotiye:* **«Tu înfaq bike da ku ez jî li ser te înfaq bikim.»** *Xezîneyên Xuda fereh in. Rizqên ku ew dide hemû mexlûqatan jî hîç tiştekî ji xezîneyên wî kêm nakin. Ew bi şev û rojê bênavber înfaqê dike. Ji roja ku wî erd û asîman aferandine ve înfaqên ku Xuda ew kirine, bifikrin! Van hîç tiştek ji milkê wî kêm nekiriye*." [160]

Dîsa çi îbretdar e ku dema berf dibare û her der di bin berfê de dimîne jî bêjimar candar xwe dixin singa axê û mideteke dirêj bi mûhafeza Xaliq li wir sağ û salim dimînin. Rebbê me axê ji bo wan adeta dike pêçek. Ji lewma dema berf dihele û em li meydanê komên cendekên wan candaran nabînin. Ew mexlûqat hemû, dîsa derdikevin ser axê û heyata xwe berdewam dikin.

Ha ji bo mirovên ku karin bi nezara îbretê binêrin sade ev heqîqet tenê jî kafî ne, ku şanî bidin ka li cîhana em têde dijîn aheng û nîzama îlahî çi qeder mûhteşem e û ji lewma îlm û qudreta bêdawîya Rebbê me û hikmeta wî îfade bikin.

Dîsa Rebbê me di ayeta pîroz de dibêje:

---

160. Buxarî, Tefsîr, 11/2, Tewhîd 22.

“**Çendîn candar hene ku rizqê xwe** (bi xwe re) **hilnagirin. Ellah e, ewê ku hem rizqê wan hem jî rizqê we dide. Ew, her tiştî dibihîze û dizane.**” [161] bi vî awayî bi kirp îfade dike ku hirs û endîşeya însanî di xusûsa rizqê wî de li hemberî vî halê tewekkul, teslîmîyet û qenaeta mexlûqatan di xusûsa rizq de, çi qeder ne cihê xwe de ye.

**Hafizê Şîrazî** jî di şiêreke xwe de wiha dibêje:

“يك قطره خونست، هزار انديشه”

(Yek qatre-ê xonest, hezar endîşe) Yanî bi awayê “**dilopek xwîn, bi hezaran fikar**” tarîf kiriye.

Dîsa dema em li derdorên xwe bi nezara îbretê li vîtrînên îlahî temaşe dikin, em dibînin ku reng, bêhn û pelên ku ji çîçekên curecurên di axê de xuya dibin û her yek ji wan wekî gîyayekî besît dixuyên di keyfîyeteke ew qeder xarîqûade de ne, ku hîç ti kîmyagerek nikare yeka wekî wan çêke!.

Heywan, dema ji gîya goşt û şîr çêdike, însan ku ji hemû heyberan mûkemmeltir e, di roja me de di laboratuvareke bi teknolojîya pêşketirîn hatî xemilandin de jî nikare ji çend ton gîya tuxtek (gramek) goşt, yan jî şîr îmal bike.

Di bedena însanî de di hundurê programeke îlahî de organ bi ahengeke mûdhiş kar dikin, yan jî sade di nav şane/hucreya tevneke tenê de bi sedan cure reaksîyonên bîyokîmyewî hene. Heke ji bo rojeke tenê îdare û kontrola wan ji me re hatibûya hiştin, belkû me nedikarî çend hûredeman wan ragirin, kî dizane dibe ku me çend ariza bi wan dida kirin?

Çi îbretdar e ku em li alîyekî fîlekî deh tonî -bi stûxwehrkirina Cenabê Heq- dibînin ku wa ye ew ji bo zarokekî deh-salî hatiye

161. Enkebût, 29/60.

peywendkirin; li alîyê din jî em -wek îfadeyeke bêçaretîya însanî- dibînin ku vîrûseke ew qeder biçûçika ku bi çavan nayê dîtin çendîn cusseyên xurt û bi qewwet li erdê dixe!..

Naxwe divê însan hîç ti zemanî wê şîyan û qudreta ku Cenabê Heq jê re lutf kiriye, ji nefsa xwe re neke mal, divê ew hîç xwe mezin neke, divê ew esil xwediyê nîmetê jibîr neke, divê ew tim di nav hesta şukrê de bibe, divê ew fehm bike ku ew li hemberî qudreta îlahî ne zerreyeke tozê ye jî û divê ew daîm xwe bavêje ber penaha Heq.. Lewra divê ew zanibe ku heta ew nefes û hilma ew dide û distîne jî nîmeteke mezina îlahî ye.

Bi rastî dema em li firokeke ku bi teknojîya pêşketîtirîn hatiye îmalkirin jî siwar dibin, tê anoskirin û wiha tê gotin; “heke dema em li bilindahîya bilind bin û cewisandin bikeve, hingê maskên oksîjenê yên ku wek otomatîk têne pêşîya we bidin ber devê xwe!”

Haleveku hîç ti kes nakeve vê endîşê û nabêje; “gelo sibê li hewayê miqdarê oksîjenê ji 21ê bi 25’an derkeve, yan jî ewê dakeve 18’an, ma ez tupekî oksîjenê ji xwe re bikirrim?” Lewra bawermend nebawermend her kes,  di halê îtîmadeke bi nîzama îlahî pêbend de heyata xwe berdewam dike... Di rewşeke berevajî de însan, heke ferq bixesta temamê xeter û tehlûkên heyatî yên ku bi wan re rûbirû ye, hingê wê bibûya ku heyat neheta kişandin.

Ew însanê ku karibe bi awayekî layiq wekî van bêjimar heqîqetan tefekkur bike, ewê zû, ne dereng fehm bike ku ji bo hemû candarên li ser dinyayê sağ bimînin jî çawa îhtîyaca wî bi arîkarî û hîmaya îlm û qudreteke mezin heye. Ewê têbigihe ku bi tena serê xwe qet‘îyen ew adeta di alema xarîqeyên îlahî de wek esera mûcîzewî di nav şertên mûsaîd ên ku hêza wî ji bo tehqîqkirina wan têrê bike de, dijî. Hîç ti aqil, mentiq, îz‘an û wijdana ku vê fehm dike jî nikare li hemberî Ellah Teala yê Xaliq (aferîner) û Nazimê (rêxerê) Aleman nankorî û bêrûtîya îsyan û serhildanê bike.

## KARÎNA DÎTINA ÎBRETA DI HADÎSEYAN DE

Wekî van dîmen û menzarên di kitêba kaînatê de îcab dike însan hadîse û rûdanên ku di heyatê de bi wan re rûbirû tê jî bi nezara îbretê bixwîne. Lewra her hebûn, peyamên hûr dide însanê xwedî dilekî hessas û tenik.

Mesela dema em nexweşekî bibînin, divê em wiha bifikrin; “çêdibû ez jî di wezîyeta wî de bûme. Ev nexweş însan e, vêga îhtiyaca wî bi şefqet, merhemet û elaqe-dîtina derdorên xwe heye. Naxwe divê ez ji wî nêzîk bibim û hewl bidim kul û kederên wî jê bibim. Divê ez kêmasîyên wî telafî bikim û hedana dilê bi jan ê wî bînim. Lewra Mezinê me Pêğember dem bi dem pirs dikir, digot: «*Kesek heye ku çûbe serdana nexweşekî?*»”

Dîsa dema em rûdaneke trafîkê bibînin, divê em wiha bihizirin, bibêjin; “çêdibû ku ez jî di nav vê rûdana trafîkê de bûme. Yan jî çêdibû însanê ji her kesî bêhtir ji min nêzîk jî di navê de bûya.” Û em ji bo nîmetên li ser xwe yên heyat, sihhet û efîyetê şukr bikin.

Dema em sêwîyekî bibînin, divê ew yetîm hissên me heta bi Mezinê me Pêğember bibe, divê were bîra me ku Mezinê me jî wek sêwîyekî hatibû dinyayê û em erk û wezîfa xwe li hemberî wan bihizirin. Divê rewşa me di vê xusûsê de me ji bo mûhaseba nefsê sewq bike..

Li alîyê din, divê em ji bîra xwe dernexin ku li heyatê wekî her nîmetê mehrûmîyet jî cilwe û nazîyên îmtîhanê ne. Heke Xuda tiştek nekiribe nesîb, divê mirov vê jî bi çavê dil bixwîne û bibêje; “di vê de jî xêrek heye.” û divê em karibin di her halûkarî de şukr bikin.

Mesela heke Xuda zarokek nekiribe nesîb, divê di vê hadîseya ku wek qehrê dixuyê de jî em bifikrin ku têde belkû çendîn lutfên veşartî hebin. Lewra gellek dê-bav hene ku ji ber dema zarokên

wan bi nav rezaletên wekî cînayet, fihûş, narkotîk, bêbawerîyê ve têne kişkişandin ew ğemgînîya dijwar û poşmanîyên ku dijîn bi ti awayan bi keyfxweşîya wan ya dema dibin xwedî zarok re nayê qiyaskirin. Ji ber ku em nikarin bizanin ka heyat bi kîjan surprîzan avis e, divê em hewl bidin ji bo her halê ku em têde ne, fîraset û dîrayeta şukrkirinê şanî bidin. Lewra carina qehra Xuda di nav lutfê de veşartî ye, carina jî dibe ku lutf jî di nav qehrê de veşartî be.

Divê em jibîr nekin ku em li alemeke fanî ya îmtîhanê ne. Li vir esil mesele jî ev e; em karibin evdînîyeke sipehî ji Cenabê Heq re bikin. Ji lewma divê em nekevin astengên besît ên heyatê û em hizûra dilê xwe mûhafeze bikin.

Li heyatê giringtirîn wesîleya îbretê jî menzarên cenazeyan e ku em li wan rast tên. Çawa dema ji **Hezretê Hatemê Esam** pirs kirin, jê re gotin:

“-Emê, çawa û kengê karibin bibin ji kesên ku bi çavê îbretê li dinyayê dinêrin?” Hezret, ev bersiv da wan:

“-Dema hûn bibînin ku dawîya her tiştî xirab e, her cihê ku her kes biçîyê jî ax e! Heke ji mala mirovekî, yan jî ji nêzîkî wî cenazeyek derkeve û ew kes jê îbret negre, ji wî re ne feyda îlmê, ne feyda hikmetê, ne feyda we'zan û ne jî feyda nesîhetê çêdibe..”

Bi vê sebebê em jî dema cenazekekî bibînin, divê em bibêjin; “dibû ku îro ez jî di wê tabûtê de bûme.” û em li ser heyata xwe mûhaseba nefsê bikin. Divê em bihizirin ku emê ji nav malê dinyayê bi kefenê xwe biçin qebrê, piştre kefenê me jî û cesedê me jî wê li esilê xwe yanî wê li axê vegerin û bibin ax û ji wan tevan sade wê îman û amelên me bimînin. Divê were bîra me ku mûamela em bi cenazê me dîtî re dikin, bêşiwar rojekê wê ew were serê me û wê ew mûamele bi me re jî were kirin.

Ev halê **Hezretê Hesenê Besrî** di vê xusûsê de ji bo me çi nimûna îrşadeke sipehî ye:

Ew di (merasima) cenazekekî de pişkdar dibe, piştî karê definkirinê xilas bû, Hezretê Hesenê Besrî ji zatekî li cem xwe pirs kir:

"-Vî zatê wefatkirî, gelo difikire ku ew vêga dîsa vegere dinyayê, amelên salih ên xwe, zikrên xwe zêde bike û ji gunehên xwe jî hê bêhtir îstiğfar bike?"

Wî zatî jî jê re got:

"-Belê, tebîî ye ku difikire." Vêca Hezretê Hesenê Besrî wiha got:

"-Naxwe çi li me qewimiye ku em wekî vî zatê wefatkirî nafikirin?" [162]

Naxwe em jî heyata xwe ya mayî, wek mohleteke Rebbê me ku ji me re nas kiriye îdrak bikin, vêca em jî wextê xwe li gorî wê binirxînin û em bi awayekî sipehî xwe ji bo rastîya mirinê amade bikin.

**Welhasil** ji zerreyê heta bi kurreyê kaînatek hemû û her cure hadîseya ku têde tê meydanê, ji bo dilên ku karibin bixwînin, dîwaneke mûezzama îbret û hikmetê ye. Esil tehsîla ku li vê heyatê dersxaneya îmtîhaneke îlahî ye jî ev e ku mirov karibe bi çavê dilî vê dîwanê bixwîne. Lewra çawa **Şêx Sadî-yê Şîrazî** gotî:


"*Di nezara xwedî aqilan de her peleke darên şîn ji bo marîfetûllah'îyê dîwanek e. Ji bo ğafilan jî hemû dar ne pelek in jî.*"

**Cenabê Heq, qelbên me ji laşgiranbûna di nav hovîtîya nefsanîyetê de mûhafeze bike. Bi mûqteza'ya fermana celîle**

162. Îbnû'l-Cewzî, el-Hesenû'l-Besrî.

**ya xwe "bixwîne"yê, qiwama dilekî wisan hessas ji me re bike nesîb ku em karibin pê ji zerreyê heta bi kurreyê her tiştî bixwînin. Ji dersên sirr û hikmetê yên mekteba kaînat û hadîsatê hisse û pişkên ulwî ji bo dilên me lutf bike!**

**Amîn...**




لَئِنْ شَكَرْتُمْ لأَزِيدَنَّكُمْ

**"Sûnd be, heke hûn şukir bikin helbet ezê nîmetê xwe ji we re zêde bikim."**
Îbrahîm, 14/7

# *Şukir*

*Her însanê xwedî însaf û îz'an, teşekkura ji bo mirovê ku şûşeke avê jê re îkram kiribe jî deynekî wijdanî dijmêre. Dema firsend bi dest dikeve jî ew bi qencîyeke ji qencîya wî şexsî re mûadil, hemberîya wî dide. Dema hal ev be, vêca qermiçî û abûs mana însanî li hemberî Rebbê wî yê ku esil wî hemû nîmet jê re îkram kirine; bizaveke li derveyî îz'an û wijdanê ye.*

*Bila em jibîr nekin ku em hemû, kasêta temenekî dadigrin û ewê li mehşerê were vekirin û seyrkirin. Dema em bimrin jî emê bi amelê xwe re werin veşartin û definkirin. Di roja hesabê îlahî de çavên me, guhên me, çermê me, welhasil hamû aza û endamên me wê bi ziman werin û ji amelên me yê ku me li heyata dinyayê kirî xeber bidin.*

# ŞUKIR

**Hezretên Şeqîqê Belxî û Îbrahîm bin Edhem** ji bo Xuda dostên hev bûn. Ji bo îrşada hev bikin, bi hev re sohbeteke dilî dikirin. Hezretê Şeqîqê Belxî di esnaya sohbetê de jê pirs kir:

“-Tu di xusûsa abûrîyê de çi dikî?”

Îbrahîm bin Edhem jê re dibêje:

“-Dema bi dest min dikeve şukir dikim, dema bi dest min nekeve jî sebr dikim!..”

Dema Hezretê Şeqîqê Belxî jê re got:

“-Seyên Xurasanê jî vê dikin!” Vêca Îbrahîm bin Edhem jê pirs dike:

“-Ma hûn çi dikin?”

Hezretê Şeqîqê Belxî vê bersivê dide:

“-Heke bi dest me bikeve em şukir dikin û înfaq dikin, heke bi dest me nekeve jî dîsa em şukir dikin û sebr dikin.”

Dostên Heq, li hemberî nîmetên Cenabê Heq ku nayên hijmartin çi qeder şukir bikin bi hesta ku ew hindik e, di her halûkarî de hewl dane ku şukirê xwe zêde bikin. Lewra şukir ev e ku bende;

li hemberî nîmetên ku bi wan gihaye, ji Rebbê xwe yê ku ew jê re îhsan kirine re bi kakila xwe, bi peyvên xwe û bi tevgerên xwe bi awayekî xalîsane heyateke evdînîyê bijî.

## NÎMETA KU ŞUKIRÊ LAZIM DIKE; KARÎNA ŞUKIR-KIRINÊ

Li hemberî nîmetên bêjimar ên Cenabê Heq, em çi qeder jê re şukir bikin dîsa em nikarin bi awayekî temam deynê xwe yê şukirê ji stûyê xwe eda bikin. Çawa yek ji dostên Heq **Mehmed Emîn Efendî** di nameyeke xwe ya ku ji şagirtekî xwe re nivîsandî de wiha gotiye:

"*...Di nefesekê de du nîmet hene (ya yekê nefes-standin e, ya duduyan nefes-dayîn e). Ji lewma ji bo her nefesekê du şukir lazim in. Her saetê hezar nefes e, ji bo her nefesê jî du şukir hene, di 24 saetan de çil û heşt hezar şukir lazim dikin. Heke însanek dest ji hemû karên xwe berde û «şukir şukir» bibêje, tim û daîm ji Ellah Teala re hemd û şukir bike, dîsa ew nikare heqê şukirê bide. Malûm bûye ku ew nikare ji hezarî yek şukirê Ellah Teala ji stûyê xwe eda bike.*"

Ji ber vê bêçaretîya mûtleqa evdî di xusûsa şukirê de ye ku li gorî rîwayetê **Mûsa** ji Cenabê Heq re got:

"-Ya Rebbî! Şukirê min ji te re, nîmeteke dîtir e ku te ew daye min, ew jî şukirekî dîtir dixwaze. (Ew dem, naxwe çawa ezê karibim bi awayekî layiq ji te şukir bikim?)"

Ellah Teala wiha wehî ji Mûsa re şand:

*“-Te kengê zanî ku her nîmet ji min e, ezê jî vê pêzanîna te wek şukir qebûl bikim.”* [163]

Digel pêzanîna ku hemû nîmet ji Heq in jî şanîdana nezaketa teşekkur-kirinê ji bo mirovên ku di gihiştina me ji bo vê nîmetê de bûne wesîle jî şertekî giring ê şukirê Heq Teala ye. Çawa Mezinê me Pêğember di hedîsa şerîf de gotiye:

“*Ewê ku ji însanan re teşekkur nake, wî ji Xuda re jî şukir nekiriye*.” [164]

Şukir, ayneya însanîyetê ye. Teşekkura ji însanan re bi qasî ku mesela nezaket û exlaqî ye, hîndekarîyeke derbasbûna ji mecazê ji bo heqîqetê ye jî. Lewra bi şertê jibîr-nekirina Xaliq teşekkura ji însanan re, di netîcê de dîsa li Heq Teala vedigere.

Ji bo evdekî ehlê şukirê, sade pêzanîna qedrê nîmetê tenê têrê nake. Şukir ew e ku mirov esil xwediyê nîmetê nas bike û jê re evdînîyê bike. Wate divê nîmet, ufûqa tefekkurê fereh bikin û evdî bajoyê cem Rebbê wî, bi vê wesîlê divê mirov qelban jî li ser mehebbet û marîfetûllah’îyê siwar bike.

Heke em zatê ku hedîye ji me şandiye jibîr bikin, sade bi teşekkur-kirina ji kesê ku ew anîye re bes bikin çi qeder ğerîb, pêkenok û şaş be; pêbendbûna me bi sebebê ku nîmet ji me re gihandine û jibîrkirina sersebebê eslî, yanî bi rizq ve man û jibîrkirina Rezzaqî jî ew qeder nankorîyeke mezin e. Ji bo însanî, bi qasî jibîrkirina xwediyê nîmetan yanî jibîrkirina Ellah Teala eybeke mezin û jidestdaneke gewre nayê tesewwirkirin..

163. Îhya, IV, 163.
164. Ebûdawud, Edeb, 11/4811; Tirmizî, Birr, 31.

## QISMÊN ŞUKIRÊ

Şukirekî meqbûl, bes ne ew şukir e ku bi peyvê tenê tê îfadekirin. Şukirekî rastî, ji sê regez û unsurên bi hev û din ve bend, pêktê. Ev hersê unsur jî; **îlm**, **hal** û **amel** in.

-**Îlm**; pêzanîna ku hemû nîmet ji Heq hatine.

-**Hal**; ji xwediyê heqîqî yê nîmetan re hest bi tazîm, hurmet û mehebbetê kirin e.

-**Amel** jî; jîyîna li ser minwala ku ev hest pêwîst dikin, bi gotin û kirinê îfadekirina şukirê, bi karanîna nîmeta bi awayekî ji rizaya Heq re guncaw û xwe ji îsyana li hemberî Wî parastin e.

**Hezretê Cuneydê Beğdadî**, di heft salîya wî de **Serîyyê Seqtî** wî dibe hecê. Di sohbetekê de ku ew li Herema Şerîf tê kirin di bara şukirê de axaftin tê kirin. Arifek ji arifên li wir, dîtin-nêrînên xwe eşkere dike, piştre Hezretê Seriyyê Seqtî li Cuneyd vedigere û jê dixwaze ew bipeyve. Cuneyd ew dem hê di temenê zarokîtîyê de bû, demekê hizirî, piştre ew van peyvên mûhteşem dibêje:

“*-Şukir, mirov bi nîmetên ku Ellah Teala lutf kirine li ber wî îsyankar nebe û wê nîmetê ji masîyetê re neke sermaye*.” [165]

Naxwe bi karanîna nîmetên ku Ellah Teala lutf kirine di şeklê ku ew pê razî be de jî ji bo şukirê xusûseke temamker e. Wate şukirê zimanî jî pêwîst e, lêbelê ne kafî ye. Divê şukir, bi kirina amelên salih û xwe parastina ji heramîyan jî were îsbatkirin.

Ji bilî vê jî her endamê ku Xuda ji me re îhsan kiriye, şukirê wî jî heye. Ev jî bi îstîmalkirina wan di şeklê ku Heq jê razî bibe de û bi parastina wan ji heramî û tiştên bi şubhe, çêdibe.

165. Ferîduddîn Attar, Tezkîretû’l-Ewlîya, rûp. 452, Weşanên Îlm ve Kulturê, Bûrsa 1984.

**Hezretê Bişrê Xafî** vê xusûsê wiha îzah dike, dibêje:

“*Ew kesê ku ji nav endamên (azayên) xwe bes bi zimanê xwe tenê şukir bike, şukirê wî hindik dibe. Lewra şukirê çavan ev e; dema mirov xêrekê bibîne, wê wergire, dema şerê jî bibîne wê binixumîne. Şukirê guhan ev e; dema mirov xêrekê bibihîze wê jiber bike, dema mirov şerê bibihîze wê jibîr bike. Şukirê destan ev e; mirov bi wan ji heqê xwe pê ve negire. Şukirê mîde’yê ev e; mirov xureka xwe ji helalîyê wergire, Şukirê aqil û qelb jî ev e; mirov xwe bi îlm û hilmê dagire. Şukirê lingan ev e; mirov ji qencîyê pê ve neçe cem yên din. Kî wiha bike, bi rastî ew ji şukirdaran dibe.*”

Bila em jibîr nekin ku em hemû, kasêta temenekî dadigrin û ewê li mehşerê were vekirin û seyrkirin. Dema em bimrin jî emê bi amelê xwe re werin veşartin û definkirin. Di roja hesabê îlahî de çavên me, guhên me, çermê me, welhasil hamû aza û endamên me wê bi ziman werin û ji amelên me yê ku me li heyata dinyayê kirî xeber bidin. Ev ayeta pîroz wiha eşkere dike, dibêje:

“**Paşê, dema ew têne wê derê, guhên wan, çavên wan û çermên wan li dijî wan li ser tiştê ku kirine, dibin şahid!**”[166]

Naxwe divê em bihizirin ka me bi çavên xwe bi awayekî hestyar li herk û darêjên qudreta îlahî temaşe kiriye û şukirê wan kiriye, me çi qeder jî menzarayên nefsanî yên mekroh temaşe kirine û em pê gunehkar bûne? Me bi guhên xwe çi qeder li dengê wehyê, sunnetê, heqî û xêrê guhdarî kiriye, me çi qeder jî li tiştên pûç û malayanî guhdarî kiriye û me ev nîmet ziyan kiriye? Me enerjîya bedena xwe li çi sarf kiriye? Me ew di nav sînorên îlahî de ji bo xêrê amade kiriye, yan jî em bi wê di heramî û kerahetan de noq bûne? Ha îcab dike em jibîr nekin ku emê di ekranên îlahî de senaryoya heyata xwe temaşe bikin.

166. Fussîlet, 41/20.

Li alîyê din tendurust bûn jî nîmeteke mezin e ku şukirê pêwîst dike.

Di vê malika **Qanûnî Sultan Suleyman** de bi awayekî wecîz hatiye îfadekirin ku nefesek sihhet jî nîmeteke ew qeder hêja ye ku şukirê lazim dike;

*Di nav xelkê de wekî dewletê tişteke mûteber nîn e,*
*Li cîhanê bûna dewletê jî ne wekî nefesek sihhet e...*

## NÎVÊ DÎN..

Mezinê me Pêğember dibêje:

"*Îman du qism e. Nîvekî wê sebr e. Nîvê din jî şukir e*." [167]

**Sebr**, xirab-nekirina mûwazeneya xwe di bin şertên guhêrber de ye, gileh-nekirina ji mûsîbetên ku tên serî ye û ji wan re tehemmul şanîdan e, mecbûr-kirina nefsê ji bo bicihanîna wezîfa evdînîyê û xwe parastina wê ji heramîyan e.

**Şukir** jî, li hemberî lutf û îhsanên bêjimar ên Cenabê Heq, bi temamê tezahurên evdînîyê berê xwe dana Wî ye ku ew jî îfadeya minnetbarîya xwe ji wî re ye.

Li ser esasê vî mewqîyê mûstesna'yê ku heyata dînî xulase dike, **Ebdûllahê Ensarî** jî ehemmîyeta şukirê di Îslamê de wiha îfade kiriye, gotiye:

"*Şukir; navê pêzanîna nîmetê ye. Lewra şukir, însên dibe, digihîne nîmetbexşî. Ji lewma di Qur'ana Pîroz de navê «**şukir**»ê li Îslam û Îmanê hatiye kirin*."

167. Beyheqî, Şûebû'l-Îman, VII, rûp. 127.

Şukir, ev pêzanîn e ku esil xwediyê nîmetê Ellah e, ziddê şukirê jî **kufr** e, yanî veşartina vê heqîqeta ku temamê nîmetan ji Xuda ne. Yanî ziddê şukrana nîmetê, kufrana nîmetê ye. Ew jî sebebê xusraneke ebedî ye.

Çawa di wan ayetên ku axaftina Cenabê Heq, ya bi Îblîs re eşkere dikin de bi eşkerehî îfade dikin ka di dînê me de çi qeder cihekî mûhîmê şukirê heye.

**Îblîs**, çi dema li ber fermana Xuda rabû û ew ji hizûra îlahî hate qewitandin, wî mohlet xwest. -Li ser esasê hikmeta îmtîhana ku wê li dinyayê bi însanî were jîyandin- heta qiyametê mohlet jê re hate dayin. Ew dem Îblîs ji Heq Teala re wiha got:

“**..Sûnd be ezê li ser sîrata mûsteqîma (rast û durusta) te rûnim ji bo wan (însanan) ji rê bixim**.” [168]

Mûfessir îfade dikin, dibêjin; ji “**sîrata mûsteqîma te/rêya rast û durusta te**” di vê ayeta pîroz de meqsed, “**rêya şukirê**” ye. Lewra di ayetên li pey vê ayeta pîroz de dîsa şeytan encama îdlal û îğwa’ya ku wê bike ji Cenabê Heq re wiha îfade kiriye, gotiye;

“**..Tu dê pirranîya wan ji şukirdaran nebînî!**” [169] ”[170]

Nuqta dawîya ku şeytan dixwaze însanî bikişkişînîyê, bê-îmanî ye, yanî kufr e. Naxwe daîmî di halê şukirê ji bo Xuda de bûn, îtîrafkirina ku hemû nîmet lutf û îhsana wî ne, zanîna qedrê nîmetên ku wî lutf kirine û bi karanîna wan ji bo xêrê, tezahureke evdînîyê ye ku Cenabê Heq razî û şeytan jî qehr dikin..

Dawîyeke dîyarkirî ya şukirê nîn e. Pêğember û dostên Heq jî ku bendeyên hezkirî yên Xuda ne, digel dereca bilinda fezîleta

168. E‘raf, 7/16.
169. E‘raf, 7/17.
170. Binêrin. Îhya, IV, 153.

evdînîya wan ku ti kes nikare xwe bigihîne gwîzeka wan jî daîmî di nav endîşê de bûn ku dibe ez nikaribin bi awayê layiq şukirê bikim.

Çawa **Mezinê me Pêğember** bi şev nimêj dikirin heta ku lingên wî diwerimîn û ji girînê jî cilên xwe û cihê sicûda xwe şil û pil dikirin. Dema jê re dihate gotin jî:

"-Ya Resûlellah! Madem gunehên te yên ku bûrîne û yên ku hê werin jî tev hatine efûkirin, vêca çima tu ev qeder xwe diwestînî?" Wî jî wiha digot:

"-*Ma bila ez nebim evdekî ku zehf şukir dike?..*" [171]

## MİN JI HINDIKAN BIGERÎNE!..

**Hezretê Ûmer** li mûmînekî rast hatibû ku wî berdewam dûa dikir, wiha digot:

"-Xudayê min, min ji hindikan bigerîne!"

Hezretê Ûmer fehm nekiribû ka ew zat bi vê dûaya xwe çi qesd dike. Jê pirs dike, jê re dibêje:

"-Çima tu wiha dûa dikî?" Wî mûmînî ev bersiv dayê:

"-Ellah Teala dibêje: «**Ji bendeyên min ên şukirdar pirr hindik in**.» [172] Ez jî dixwazim yek ji wan hindikahîyên mesûd bim."

Hezretê Ûmer ji vê fikra sipehî re heyran ma û heyfa xwe jê anî, got:

"-Heyf li min, herkes ji Ûmer biaqiltir û zanatir e!"[173]

---

171. Binêrin. Îbnû Hibban, II, 386.
172. Seb'e, 34/13.
173. Îbnû Ebû-Şeybe, Mûsannef, VII, 81.

Ha va ye Hezretê Ûmer, ku di serdema xîlafeta wî de gellek welat hatibûne fetihkirin, gencîneyên dewlemend ên Bîzans û Îranê bi ser Beytû'l-Malê de hatibûne herikandin û asta refaha gel jî bilind bûbû. Lêbelê Xelîfe Ûmer wekî ku berê jî wilo bû, bi miqdarê texsîsateke zerûretî îktîfa dikir û bi cilên pînekirî yên xwe xutbe dixwend. Lêzimên wî yên ku nikarîbûn xwe li hemberî vê rewşa wî ragirin, keça wî dêya me Hefse wek qasid şandin cemê, jê re dane zanîn ku em arzû dikin ew hinekê îmkanên xwe zêde bike û (heyata xwe) rehet bike. Wî jî ev bersiv da wan:

"*Du dost (Hezretê Pêğember û Ebûbekr) û ez, dişibihin sê rêwîyên ku bi aynî rê ve diçin. Yekemê me giha meqamê xwe. Duyemê me jî bi aynî rêyê ve çû, giha yê yekem. Ez jî wek yê sêyem dixwazim bigihîjim hevalên xwe. Heke ez bi barê zêde herim, ez nikarim bigihim wan! Yan jî ma hûn naxwazim ez bibim yê sisiyan?*" [174]

Dîsa **Ebdûrrahman bin Ewf** ku zengînek ji ehlê şukirê bû, rojekê bi rojî bû, çend çeşît xwarin li berê hatibûn danîn ji bo îftara xwe bi wan bike. Ew sehabîyê mûbarek hêstir ji çavên wî barîn û ew wilo ji ser sifrê rabû û wiha got:

"***Mûs'eb bin Ûmeyr**, li Uhudê hate şehîdkirin. Ew ji min çêtir bû. Lêbelê wek kefen ji xirqeyekê pê ve tiştekî din nebû. Bi wê xirqê ku serê wî dihat nixumandin lingên wî vekirî diman, ku lingên wî dihatin nixumandin jî serê wî vekirî dima. Vêga jî ji malê dinyayê her tişt ji me re hatiye dayîn. Bi rastî ez ditirsim ku hemberê xêrên me li dinyayê ji me re hatibin dayîn. (Gelo ecrên ku me qezenc kirine wê li axretê werin tenqîskirin û ew li vê dinyayê ji me re hatine dayîn?!)*" [175]

---

174. Binêrin. Ehmed, Zuhd, rûp. 125; Şehbenderzade Ahmed Hilmî, Tarîx-î Îslam, I, 367.
175. Buxarî, Cenaîz, 27.

Wekî ku hate dîtin wan, bi endîşeya ku ewê nikaribin şukirê wê îfa bikin nîmetên helal jî bi îhtiyateke mezin pêşwazî dikir. Wan ji bo xwe nîmeteke biçûka ku karibin li hizûra Heq bi hêsanî hesabê wê bidin kafî didît.

Ewên ku ji van hessasîyetan mehrûm bin jî li hemberî nîmetên Xuda bi pirranî di nav ğefletê de ne. Ew nafikirin ka ewê karibin şukirê wan bikin yan nekin, lêbelê bi hirs li ser xwestina nîmetên dinyayê dewam dikin. Li ser vî esasî, ehlê şukirê yê rastî pirr hindik in.

## EXLAQÊ ÎLAHÎ

Her însanê xwedî însaf û îz'an, teşekkura ji bo mirovê ku şûşeke avê jê re îkram kiribe jî deynekî wijdanî dijmêre. Dema firsend bi dest dikeve jî ew bi qencîyeke ji qencîya wî şexsî re mûadil, hemberîya wî dide. Dema hal ev be, vêca qermiçî û abûs mana însanî li hemberî Rebbê wî yê ku esil wî hemû nîmet jê re îkram kirine; bizaveke li derveyî îz'an û wijdanê ye.

Li alîyê din ji bo mirov karibe bi qencîyeke ji nîmetên Cenabê Heq re mûadil hemberîyê bide jî, ji bo însanî ku hemû sermayê wî "hîç"îtî ye, ne mûmkin e. Lêbelê Cenabê Heq, bi lutf û merhemeta bêdawîya xwe ji bo xêreke me ya ji hemû xêran biçûçiktir jî -bi qasî îxlasa me- ji deh sewabên wekî wê heta bi heftsedan hê bêhtir jî mûkafatê dide.. Ev mûqteza'ya sifetê wî yê "**Şekûr**" e.[176]

---

176. Cenabê Heq, ji bo taeteke hindik wek îcaba şanê ulûhîyeta xwe qat bi qat zêde ecrê lutf dike. "Çîroka Sewîlek Av" ya Hz. Mewlana bi awayekî kurt û belîğ wê merdîya Cenabê Heq îzah dike. Ji bo Tefsîlatê, li Osman Nûrî Topbaş "Sewîlek Av Ji Bexçê Mesnewî"yê rûp. 41, Weşanên Erqam, Îstanbûl, 2008'ê binêrin.

Xuda di ayetên pîroz de dibêje:

وَاللّٰهُ شَكُورٌ حَلِيمٌ "**..Ellah zehf mûkafatbexş e, di cezakirinê de lezê nake**." [177]

فَإِنَّ اللّٰهَ شَاكِرٌ عَلِيمٌ "**..Bêşiwar Ellah** (xêra ku tê kirin) **qebûl dike** (mûkafata wê zehf dide) **û** (wê xêrê) **bi heqî dizane**." [178]

Cenabê Heq, ji bendeyên xwe amelên salih ên wan û heyata evdînîya wan ya ku li ser hemd, sebr, şukir, îxlas û teqwayê dijîn qebûl dike û qat bi qat zêdetir mûkafatê dide wan û navê xwe yê "**Şekûr**" dide tecellîkirin. Ha ji bo mirov karibe ji vî exlaqê îlahî para xwe wergire jî xwe bi şukirê girtin, di nêrîna mûmînên kamil de ufûqeke mûstesna'ya dilî ye.

Çawa di bara **Nûh** de di ayeta pîroz de wiha tê gotin:

إِنَّهُ كَانَ عَبْداً شَكُوراً "..**Vê zanibin ku ew, bendeyekî zehf şukirdar bû**." [179]

**Nûh** ji xwarin û vexwarina tiştekî bigre heta bi lixwe-kirina cilên xwe jî di her hal û hereketa xwe de ji Cenabê Heq re hemd dikir. Dema wî li xwe dikir, dixwar, vedixwar her "**besmele**" digot. Dema xwarina xwe xilas dikir, yan jî cilên xwe ji xwe dikirin jî her digot; "**elhemdûlillah**". Ji ber vê Cenabê Heq navê "عَبْداً شَكُوراً **bendeyekî şukirdar**" daye wî û ji bo teşwîqkirina şukirê jî ev fezîleta wî ji bo temamê însanîyetê şanî daye. [180]

177. Teğabun,64/17.
178. Beqere, 2/158.
179. Îsra, 17/3.
180. Binêrin. Îbnû Henbel, ez-Zuhd, rûp. 50.

## DI HER HALÛKARÎ DE ŞUKIR!

Gihiştina rizaya Heq, razîbûna bi teqdîra wî û sade ne di dewlemendîyê tenê de lêbelê di tengasîyê de jî şukirkirinê pêwîst dike. Yanî şukir, heke çi qeder şert û mercên jîyanê biguherin jî ew xesleteke qelbî ya guhêrnebar û neheja mûmînî ye.

Rewşa **Eyyûb**, di vê mijarê de mîsaleke zehf îbretdar e:

Xanima wî Rahîme xatûn ji Hezretê Eyyûb re got:

"-Tu pêğember î. Dûayên te meqbûl in. Tu di rewşeke mûzderib de yî. Dûa bike û ji bo şîfayê nail bibe."

Eyyûb jî ev bersiva manedar dayê:

*"-Rebbê min heştê salan sihhet da min. Nexweşîya min jî hê heştê sal çênebûne. Bes ev çend sal in ez mûzderib im. Madem rewş ev e naxwe ez teeddub dikim ji Cenabê Heq sihhetê bixwazim."*

Eyyûb di nav mehcûbîyeta ji stûyê xwe eda nekirina şukirê wî temen û jîyê ku bi sihhet bûrandî de teeddub dikir ku ji Rebbê xwe şîfayê bixwaze. Li hemberî şukir û sebra wî Cenabê Heq ê ku "**Şekûr**" e, wate Rebbê me yê ku qat bi qat zêde ecr û mûkafatê lutf dike, sihhet, destferehî û bereketeke di dereca ji berê hê bilindtir de jê re îhsan kir.

Ev mîsal wê tezahura bilinda şukirê di wan bendeyên xas de çi xweş îfade dike, dibêje:

Ji **Hezreta Rabîa**'yê pirs kirin:

"-Ellah kengê ji evdê xwe razî dibe?"

Wê wiha got:

"-Dema ew di nav îzdîrab û mihnetê (êş û janê) de be jî wekî ku di nav nîmetê de be wilo şukir bike..."

Ha va ye mûmînên kamil, yeqînen zanin ku şukir bes ne îbadetekî xasê zemanê rehetîyê tenê ye. Çi qeder îbtîlayên giran werin serê wan jî dîsa şukir-kirina ji Heq re di wan de bûye tebîetê eslî. Ji lewma ew, wek mûqteza'ya îmtîhana îlahî di şûna gilehkirina ji diltengîyên ku dertên pêşîya wan de, ji ber ku ew ji îbtîlayên girantir parastine fezîleta şukirkirina ji Rebbê xwe re şanî didin.

## NÎMETA RASTÎN..

Xuda di ayetên pîroz de dibêje:

"**Hûn min zikr bikin; ez jî dê we zikr bikim! Ji min re şukir bikin; zinhar kufrana nîmetê nekin ha!**" [181]

"**..Heke hûn şukir bikin, bêşiwar ezê** (nîmetên xwe yên) **li ser we zêdetir bikim. Heke hûn nankorîyê bikin, hîç şubhe nîn e ku ezabê min zehf dijwar e!**"[182]

Şukirkirin, ji bo bereket-ketina nav nîmetan wesîle ye. Şukirnekirin jî kufrana nîmetê ye, nankorî ye, ji bo bêbesîretî, bi şûn de standina nîmetan û lê barîna ğezeba Xuda sebeb e. Di vê mijarê de **Fûdeyl bin Iyaz** -rahmetûllahî eleyh- wiha gotiye:

"*Li ser şukirê dewam bikin. Lewra zehf hindik lê rast tê ku nîmeta carekê ji dest çûbe ew dîsa bi şûn de vegerîyabe.*" [183]

Rewşa evîndarên Heq di behsa şukirê de jî, ji zêdebûna nîmetan, yan jî ji endîşeya kêmbûna wan azade ye. Ji bo wan ya mûhîm ev e ku bi wesîleya wan nîmetan karibin ji Cenabê Heq re şukir bikin û pê nêzîkbûna xwe ji wî zêdetir bikin.

181. Beqere, 2/152.
182. Îbrahîm, 14/7.
183. Îhya, IV, 232.

**Hezretê Mewlana** vê heqîqetê çi xweş îzah dike, dibêje:

"*Şukirkirina ji bo nîmetê, ji nîmetê xweştir e. Kesê ku ji şukirê hez bike, qey ew dev ji şukirê berdide û hîç diçe terefê nîmetê?.. Bes şukir tenê te dibe ber derîyê dostê te. Nîmet, dikare ziddê şîyarîyê ğefletê jî bide însanî. Şukirkirin jî daîm şîyarîyê tîne. Tu aqilê xwe bide serê xwe û bi şukirê nîmetê, nîmeta rastîn nêçîr bike!*"

## WELHASIL

Heke fanî hemû serweta xwe bidin me, di dawîya dawîn de ev, wê menfîeteke bi qasî ku di nav temen û jîyanê însanî de were bikaranîn be. Mirin, wê tevan ji dest me bistîne û serweta dinyayê, dîsa wê li dinyayê bimîne. Nîmeta îmanê ku Xuda ew lutf kiriye jî wê mirovî bibe bigihîne seadeteke bêdawîn. Bi vê sebebê mûhîmtirîn wezîfa me ev e; em karibin bedelê îmana ku Xuda lutf kiriye, bi şukirê û bi minnetan ji Xuda re eda bikin. Mûhîmtirîn mesela me jî ev e ku me karîbe deynê xwe yê şukirê eda kiribin û em karibin bi dilekî selîm û mûsterîh bigihin hizûra îlahî.

Divê em tim û daîm bihizirin ku heke em bedelekî bidin sirf bi lutfa îlahî, em wek însan, wek mûmîn, wek ummeta Mûhemmed hatine dinyayê û em ji bo Qur'ana Pîroz bi peyvber û mûxateb hatine kirin. Ev hemû nîmetên wilo ne ku mirov nikaribe şukirê wan eda bike.

Di pirranîya nîmetên maddî de hevşirîkatîyek û hevpişkîyek di navbera me û heywanan de heye, ferqa me ji hev jî zehf hindik e. Esil nîmetên ku me ji heywanan cuda dikin û me ji bo fezîleta însanîyetê bilind dikin, ev nîmetên manewî ne. Lêbelê gelo em çi qeder di nav şukirê van nîmetan de ne? Gelo em çi qeder bi tiştekî dinyewî keyfxweş dibin; gelo em ji bo nîmeta îmanê û bûna umme-

ta Mûhemmed ku dê me bibin, bigihînin seadeta ebedî çi qeder di nav minnetbarî, keyfxweşî û şukirê de ne?

Dostê Heq **Hezretê Mewlana** dibêje:

“*Dema tu ji bo nîmetên wî, îhsanên wî nail bibî, ji Xuda re şukir bike; ji bo kesê ku tu ji wî lutfê bibînî jî teşekkur bike, wî di bîra xwe bîne! Ha ji bo vê ye ku Cenabê Heq gotiye;* **«selewatan li ser Pêğember bidin!»** *Lewra Hezretê Mûhemmed heybereke mûstesna û bêemsal e ku mûmîn lê vedigerin û serî lê didin!*”

**Ya Rebbî! Ji bo me tevan vê bike nesîb ku em karibin bi awayekî layiq şukirê şerefa bûna xwe wek ummet ji bo Mezinê xwe Sultanê Pêğemberan eda bikin! Nîmetên xwe yên li ser me zêdetir bike! Şukirê me jî hê bêhtir zêde bike! Halê şukirekî ku me bigihîne meqamê ehlê şukirê yê rastîn ji bo dilê me îlham bike!**

**Amîn...**



# *Jîyîna Bi Wecda Îbadetê*

*Hezretê Bişrê Xafî xwe wiha mûhasebe dikir:*

*"Resûlûllah digel ku hemû gunehên wî yên bûrîn û yên hê werin tev hatibûne efûkirin jî dîsa wî bi şevê nimêj dikirin heta ku lingên wî diwerimîn vêca bila ez çawa razim?! Lewra ez nizanim ka gunehekî min yê tenê jî hatiye efûkirin!.."*

*Heyat, nîmeteke sînordar e ku ji bo qezenckirina seadeta uxrewî ji me re hatiye lutfkirin. Ne tekrara wê heye, ne jî telafîya wê heye.. Divê mirov jibîr neke ku mislimantî, ne merasimeke xasê bi hinek zemanên dîyarkirî ye, lêbelê heyata emrekî temam li ser teqwayê ye. Xwezîya me bi wan kesan be ku karîne temenê xwe tim û daîm bikine Remezan û nefesên dawînê xwe jî bikine sibeha cejnê..*

# JÎYÎNA BI WECDA ÎBADETÊ

Cenabê Heq, rojên mûbarek bi taybetî Remezana şerîf wek firsendên xusûsî ji me re lutf kirine ji bo em di wan de heyata evdînîya xwe di ber çavan re derbas bikin, em kêmasîyên xwe telafî bikin û em qencîyên xwe jî hê zêdetir bikin. Di demên van firsendên rûhanî de soza ecrên mezin ji me re hatine dayîn ku em bi rojên wan bi rojîyê, bi tîlaweta Qur'anê, bi xêr û hesenatan; bi şevên wan jî bi teheccudan, tefekkur, zikr, şukir, dûa û îstiğfaran îhya bikin.

Di esilê xwe de teşwîqên îlahî ku ji bo zemanên wekî van hatine dayîn di wê mahîyetê de ne ku bingeha wê heyata meqbûla îbadetê pêkbînin; ewa ku Heq Teala di dirêjahîya emrê me tevî de ferman li me kiriye ku em wê bijînin. Di wan zemanên mûbarek de ew wecda îbadetê û qiwama bilinda evdînîyê yên ku têne qezenckirin terbîye û perwerdeyeke manewî ye ji bo em karibin wan li temamê salê belav bikin.

## FÊKÎYÊN ÎBADETÊ

Di Remezana şerîf de ew keş û hewa'ya himbiza îbadetê ku mirov dikevîyê û ew qiwama mûstesna'ya evdînîyê ku mirov pê digihê wekî tovekî hatî çandî ne. Gelo vî tovî girtiye, yan negirtiye,

wê di heyvên dîtir ên salê de bi zîğdanê, bi peldanê, bi çîçekdanê û bi fêkî-danê, xwe şanî bide. Wate ew xesletên sipehî û kemal û gihana dilî ya ku me di Remezanê de qezenc kirine, di piştî Remezanê de jî em çi qeder karibin wan bidin dewamkirin, ew sewîya meqbûlîyeta wan îbadetên me li cem Heq şanî dide.

Li ser vî esasî, rojîyên ku me girtine, terawîhên ku me kirine, fitre, zekat û sedeqeyên ku me dane, mûqabeleyên ku me xwendine, ji bo em fehm bikin ka ew li cem Heq meqbûl in, yan ne meqbûl in, divê em bi diqqet binêrin ka di piştî Remezanê de jî em wan di halê xwe de didin xuyakirin:

**Rojî û sedeqe**; divê ew me bi teqwa, şefqet, merhemet û hessasîyeta wijdanê bigihînin, heke ev his bi awayekî têr û tije di qelbê me de înkîşaf nebûbin, rûhê me zirav nebûbin, naxwe me bi maneya kamil rojî negirtiye, me sedeqe bi rîayeta edebên wê nedane, me ew dersên ku divê ji van îbadetan bigirtana, negirtine.

**Nimêj**a meqbûl, însanî ji xirabîyan asteng dike. Ew pênc wext nimêjên ferz û bi îlawe li ser wan ew nimêjên nafîleyên ku kirine, heke em bixwazin fehm bikin ka ew qebûl bûne yan jî qebûl nebûne, ji bo fehmkirina vê têrê dike ku em di jîyîna xwe de binêrin ka karin çi qeder xwe ji gunehan dûr bigrin..

Ji bo mirovên ku karin bi wechê layiq Cenabê Heq zikr bikin, îğwayên nefs û şeytên nikarin zirarê bidin wan. Lewra **zikrûllah**, wekî keleheke sağlem însanî ji van herdu dijminan diparêze. Di ayeta pîroz de hatiye eşkerekirin; şeytan nefsanîyetê tehrîk dike, însanan diajoyê ğefletê û ew di malê wan û zarokên wan de dibe şirîk. Naxwe ji bo em fehm bikin ka me çi qeder kariye xwe ji teselluta nefs û şeytên biparêze, divê em hal û hereketên xwe, mûnasebetên beşerî yên xwe, heyata malbatî ya xwe, gelo me terbîyekeke çawa daye ewladên xwe, em heyata xwe ya îqtîsadî û yên wekî van

daîm di ber çavên xwe re derbas bikin.. Divê em tefekkur bikin ka pareke nefs û şeytanî li ser van heye, yan na.

## JI SEHERAN FEYZ STANDIN...

Dîsa di dirêjahîya Remezana şerîf de bi wesîla sehûr û paşîvan em dibin wekî ku ji seheran cure talîma wergirtina feyzê dîtibin. Di şevên piştî Remezanê de jî ew wextên giranbiha ku wesîla nêzîkbûneke xusûsî ya ji Rebb Teala ne, bi hezkirin, mehebbet û tirsa ji Xuda di wan de hêstirên çavan têne barandin, efû di wan de tê qebûlkirin û gihan û tekamula rûhanî di wan de zêde dibe; vêca îcab dike mirov hewl bide ku wan bi teheccudan, zikr, îstiğfar û dûayan îhya bike.

**Îhya-kirina seheran**; di nêrîna dostên Heq û mûmînên salih de ku dilên wan bi wecda îbadetê tije ye, lezzeteke manewî ya jênetêr e. Çawa ku ev halê **Hezretê Şêx Seyfeddîn**, ji bo vê, yek ji mîsalên sipehîtirîn e;

Hezretê Şêx Seyfeddîn ku nevîyê Îmamê Rebbanî ye, di hinek şevan de di du reketan de Qur'an xetim dikir, di wê mûlaqata xusûsî de ya bi Rebbê wî re, bi îştiyaqa ku ew çêj hîç xilas nebe, îltîca dikir, digot:

"*Xudayê min têr nabim, şev çi qeder kurt in!..*"

**Elî el-Masîsî** -rahmetûllahî eleyh- jî li cem dawîya heyata xwe gotiye:

"*Ev çil sal e tekane tişta ku min ğemgîn dike, bûna sibehê ye.*" Ew jî yek ji wan bendeyên bextiyar bû ku di nav lezzetên jênetêr de lê dibû sibeh.

Dîsa dostek ji dostên Heq **Hezretê Bişrê Xafî** jî ev mîsala ku ğeyreta wî ya îbadetê dide xuyakirin, çi qeder îbretdar e:

Kesek tê cem Bişrê Xafî, jê re dibêje:

“-Bila di saeteke şevê de hûn îstîrahet bikin.” Wî jî ev bersiv dayê:

“-Ellah Teala digel ku gunehên wî yên bûrîn û yên ku hê tên tev efû kiribûn jî dîsa Resûlûllah bi şev radibû îbadet dikir heta ku lingên mûbarek ên wî diwerimîn, vêca ezê çawa karibim razim? Lewra ez nizanim ka gunehekî min ê tenê jî ji terefê Ellah Teala ve hatiye efûkirin!..”

Ha dostên Heq, warisên Mezinê me Pêğember bûn, wî bi îştiyaqa ku ez bibim bendeyekî zehf şukirdar bi şev heta sibehê çawa di nav wecda îbadetê de derbas dikir, wan jî bi vê hestê daîm ğeyret şanî didan ji bo karibin ji rewşa Mezinê me nêzîk bibin.

Mezinê me Resûlûllah, di zemanê ji hemû zemanan bi meşeqqettir de û heta di seferan de jî nimêja teheccudan îhmal nekiriye û bi îtînayeke mezin li ser wan dewam kiriye. Naxwe em jî wek ummeta Mûhemmed ew elaqa ku emê ji bo seherên piştî Remezanê jî şanî bidin, bi mûqteza’ya vê hedîsa şerîf; “*mirov bi hezkirîyê xwe re ye*.” [184] wê bibe yek ji îfadeyên sipehî yên hezkirina me ji Mezinê me Resûlê Ekrem.

**Welhasil** Remezana Şerîf, însanî ji bo exlaqê xweş, amelên salih û heyateke tije fezîlet, hazir dike. Delîla ku bi rastî em karin ji Remezanê îstîfade bikin jî ev e; ku jîyîna me ya piştî Remezanê ji bo (bidestxistina) rizaya îlahî li gorî ya berî Remezanê serfiraztir be.

## REXAWET DI ÎBADETÊ DE NÎN E!..

Divê mirov jibîr neke ku mislimantî, ne merasimeke xasê bi hinek zemanên dîyarkirî ye, lêbelê ew heyata emrekî temam li ser

184. Buxarî, Edeb, 96.

teqwayê ye. Divê em di heyata îbadetî ya xwe ya piştî Remezana şerîf de jî bi ber payê rexawetê nekevin, divê em xesletên sipehî û bîranên manewî yên ku di wê heyvê de qezenc kirine jibîr nekin, em nîyet û amelên xalîsane terk nekin, bi vî awayî em rûhanîyeta Remezanê mûhafeze bikin û divê em bi aynî feyza dilî bigihin Remezana ku peyre were jî.. Bi vî awayî divê em temamê emrê xwe di nav rûhanîyeta Remezanê de derbas bikin.

Çawa dema cejna Remezanê xilas bibe xilas nebe mûsteheb-kirina rojîya şeş rojên Şewwalê, li alîyekî dibe wesîle ji bo gav bi gav bedenê li nîzama wê ya normal hîn bike, esil ew telqîneke (dan-hînkirineke) ji bo rûhanîyeta rojîyê ya di Remezanê de bi rojîyên nafîle bide dewamkirin. Ji bo mirovên ku rewşa wan mûsaid be rojî-girtina rojên sêzdeh, çardeh, pazdeh ên her heyvên Qemerî û rojî-girtina rojên Duşem û Pênşemê jî wiha ye.

Dîsa divê mirov jibîr neke ku rehma îlahî, her gav û anê di halê tecellîyê de ye. Ya mûhîm ev e; mirov karibe di lêgerîna wan wesî-leyan de be ku wê mirovî bigihînin wê rehmê. Wek ji vê mijarê, li kêleka dewamkirina li ser rojîyên nafîle, divê mirov bi heyecana înfaqeke fereh dilê feqîr û fuqera'yan xweş bike, hestên merhemetê yên di qelbê xwe de zindî bigre; mirov bi sedeqe, zekat û xêr û hesenatan li ber serê ğerîban, sêwîyan û hewcedaran bibe, mirov here serdana nexweşekî û êş û jana wî sivik bike, mirov di teşyîa cenazeyekî de beşdar bibe, bi derdên ummetê re hevderd bibe, ji bo Xuda fedakarî û xizmetê bike, ev sipehîtîyên mûstesna ne, ku tim rehma îlahî boş dikin û difûrînin.

Çawa **Mezinê** me jî dem bi dem pirs dikir, digot:

"*Gelî eshabê min! Îro we destê xwe bi ser serê sêwîyekî de bir û anî? Hûn çûne serdana nexweşekî? Hûn çûne teşyîa cenazeyekî?..*"

Li kêleka îbadetên îctîmaî yên wekî van, divê mirov daîmî bi desmêj be û hewl bide rûhanîyeta îbadetê mûhafeze bike. Heke çi qeder zerûret nebe jî ji ber ku her wextê nimêjê tazekirina desmêjê “nûra li ser nûrê” ye, ji bo (bidestxistina) riza û mehebbeta Rebbê me wesîle ye.

Mezinê me Pêğember jî heta bi roja fetha Mekkê di her wextê nimêjê de desmêj nû dikir. Wê rojê jî her pênc wext nimêj jî bi desmêjeke tenê kirin, bi vî awayî hereket kir, meqseda wî jê ev bû; bi fiêlî teblîğ bike, bide zanîn ku heta desmêj xirab nebe, neşike kirina hemû nimêjan pê caiz e.

**Hezretê Samî Efendî** jî ku yek ji warisên Pêğember e, bi tesîra hissîyata mûraqebe û îhsana bilinda ku ji wan re xwedî bû bi titizî hewl dida bêdesmêj nemîne û ji bo her nimêjê jî desmêj taze dikir. Divê em jî hewl bidin van halên xweş bijîn.

Dîsa heke di nav lêgerîna li riza’ya îlahî de be, ji bo mêran bi taybetî **dewamkirina bi cemaetî li ser edakirina nimêjê,** wesîleya rehmeke mûstesna ye. Çi wextî dibe bila bibe, ew îbadetên ku di nav ahenga qelb û bedenê de hatibin îcrakirin, ew dem û anên bi Cenabê Heq re bûnê ne. **Meclis û dîwanên îlm, îrfan, zikr û sohbetan** ku ji bo marîfetûllah’îyê wesîle ne, ew na, ew dem û an in ku dil bi hizûra îlahî tije dibin.

Ha, heke em serfiraz û mûweffeq bibin ku wecda îbadetê di Remezanê de di dirêjahîya heyata xwe tevî de bi sebr û îstiqrar bidin dewamkirin û Qur’an û Sunnetê jî li ser her sefhe û pêvajoya heyata xwe bidin xuyakirin, hingê Cenabê Heq wê ketina nav mûhtewayê vê hedîsa qudsî -înşaellah- ji bo me jî lutf bike:

“..*Evdê min, ji wan amelên ku min li serê ferz kirine hezkirîtir, bi tiştekî din nikare nêzîkbûna ji min, qezenc bike. Evdê min, (bi îlawe li ser ferzan) bi îbadetên nafîle her xwe ji min nêzîk dike,*

*heta paşê ez jê hez bikim. Dema ez ji evdê xwe hez bikim jî (adeta) ez dibim ew guhê wî yê ku pê dibihîze, dibim ew çavê wî yê ku pê dibîne, dibim ew destê wî yê ku pê digre û dibim ew lingê wî yê ku pê birêve diçe..*" [185]

**Welhasil** di xusûsa wezîfeyên evdînîyê de îcab dike sirf ne di hinek pêvajo û werçerxên dîyarkirî de lêbelê însan daîmî bi ğeyret be. Îcab dike însan xwe ji sistahî, rexawet, tenbelî, îhmalkarî û jidestdana wecda îbadetê ku hatî qezenckirin, biparêze. Çawa **Resûlûllah** ev şîret li **Ebdûllah bin Emr bin 'As** kiriye, jê re gotiye:

"-*Ebdûllah! Wekî filan keso nebe! Lewra wî, li ser kirina nimêjên bi şevê dewam dikir lêbelê êdî ew ranabe nimêjê şevê.*" [186]

Dîsa îbadetê ku ji hemû îbadetan bêhtir Mezinê me Resûlê Ekrem jê hez dikir, ew îbadet bû ku xwediyê wî li serê berdewam dikir." [187]

Naxwe em mecbûr in ku di heyata îbadetî ya xwe de li vê talîmata îfadeya Qur'anê: "**Nebin wekî wê ya ku piştî rîsê xwe sağlem dirêst dîsa bi paş ve difetiland û xirab dikir**.." [188] diqqet bikin.

Çawa mûfessir **Fexreddîn er-Razî** daîm lizûma bûna di nav wecda evdînîyê de wiha îzah dike:

"*Heq Teala, ji bo reğbetê bixe nava hemû îbadetan veşartiye ka wî rizaya xwe xistiye kîjan îbadetî.*

185. Buxarî, Rîqaq, 38.
186. Buxarî, Teheccud, 19.
187. Buxarî, Îman, 32, Teheccud 18; Mûslim, Mûsafirîn, 221.
188. Nehl, 16/92.

*Ji bo însan xwe ji gunehan biparêzin jî veşartiye ka wî ğezeba xwe xistiye kîjan îsyanê.*

*Wî dostên xwe di nav însanan de veşartine da ku hurmet ji hemû mirovan re were şanîdan.*

*Dûaya ku ew qebûl dike di nav dûayan de veşartiye da ku îtîbar ji hemû dûayan re were kirin.*

*Navê Ezamê xwe di nav îsmên xwe de veşartiye da ku hemû navên wî werin tazîmkirin (divê mûmîn ğeyret bike ji bo hemû sifetên cemalî bibe mezher).*

*Di nav nimêjan de selata wusta (nimêja navîn ku di ayetê de bi awayekî xusûsî û mûsteqil ew zikr kiriye û sirr û şeref pê daye) veşartiye ka ew kîjan nimêj e, da ku hemû nimêj bi xuşûê werin edakirin.*

*Toba meqbûl di nav toban de veşartiye da ku zehf tobe werin kirin (ji bo bi awayekî taybetî jî di wextê seheran de îstiğfar werin kirin).*

*Wextê mirinê di nav candaran de veşartiye ji bo xwe di her wext û anê de ji bo mirinê amade bikin û bi vê hestê bijîn.*

*Şeva Qedrê di nav şevên Remezanê de veşartiye ji bo îtîna ji hemû şevên Remezanê re were şanîdan.*" [189]

## DELÎLA QEBÛLA ÎBADETÊ; BERDEWAMÎTÎ

Ya ku li cem Heq heyata îbadetî ya mûmînî bi qîmet dike ev e; ew, wan wek wezîfekeke sînordara ku ewê werin edakirin û ewê

189. Razî, Tefsîra Kebîr, XXIII, 281-282.

xilas bibin nebîne; lêbelê ew, wan wek deynekî dilî bibîne ku ewê di dirêjahîya emrê xwe tevî de berdewam wan îfa bike.

Çawa Cenabê Heq di nav sifetên bendeyên xwe ku mizgînî daye ew nîmetên Cennetê ji wan re îkram dike de wiha gotiye:

“**Ew nimêj dikin û li ser nimêjên xwe berdewam dikin**.” [190]

“**Ewên ku nimêjên xwe mûhafeze dikin.**” [191]

Berdewamîya li ser îbadetan ew qeder mûhîm e ku Mezinê me Pêğember di hedîseke şerîfa xwe de wiha gotiye:

“*Li cem Ellah Teala amelê ji hemû amelan hezkirîtir, ew e ku bi berdewamî tê kirin çendan hindik be jî.*”[192]

Dêya me **Hezreta Aîşe** jî gotiye:

“Amelê Resûlê Xuda, wekî wê baranê bû sivik û bi berdewam dibare.”[193] Bi vê daye zanîn ku wî dest bi kîjan îbadetî kiribe ew berdewam kiriye û hîç ti zemanekî ew terk nekiriye.

Çendan hindik be jî dewamkirina li ser îbadetî, heke çi qeder di nêrîna pêşîn de besît û netêrker xuya bibe jî heke bi sebr û istiqrar li serê were dewamkirin, bêşiwar wê di netîcê de gencîne û komeke mezin jê were meydanê. Lewra lazim e mirov bifikre ku tişta deryayan dixe derya berdewamîya dilopên baranê ye. Dilop li ser hev kom dibin û kom dibin heta paşê dibin umman (okyanûs).

Li ser vî esasî sade îhyakirina şev û rojên mûbarek û digel hebûna îmkanan jî îhmalkirina rojên din, ziyaneke mezin e.

190. Mearic, 70/23.
191. Mearic, 70/34.
192. Mûslim, Mûsafirîn, 218; ji bilî vê li Buxarî, Rîqaq, 18’an binêrin.
193. Buxarî, Sewm, 64, Rîqaq 18; Mûslim, Mûsafirîn, 217.

Li alîyê din evd, heke dirêjahîya emrê xwe di nav coş û xuroşa îbadetê de bijî û bi qasî ku ji dest wî were bi ğeyret bibe, ev rewş ji ber ku tê maneya biryardarîya nîyeta îbadetê û berdewamîya wê ya di qelbê wî de, wê Cenabê Heq jî mûkafateke ebedî ji wî re lutf bike.. Heta evd, heke ji ber sebebên ne di dest wî de îbadetên nafîle yên xwe eda neke jî Cenabê Heq wê ji bo hurmeta nîyet û arzûya evdînîyê ya di dilê wî de wekî ku wî ew îbadet eda kiribe wilo mûkafatê bidîyê. Çawa Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

اِلَّا الَّذٖينَ اٰمَنُوا وَعَمِلُوا الصَّالِحَاتِ فَلَهُمْ اَجْرٌ غَيْرُ مَمْنُونٍ

“**Lêbelê ji bo yên ku îman anîne û amelên salih kirine ecreke nequt û berdewam heye**.” [194]

Mûfessiran di bara vê ayetê de gotiye: Dema bedena evdî nikaribe amel bike, heta piştî ew wefat bike jî ecra wî; bi qasî semîmîyeta wî ya di nîyeta xwe de û ğeyreta wî ya di zemanên sihheta xwe de şanî dabe, ew heman ecr û mûkafat jê re heta bi bêdawîyê jî dewam dike..

Pêğemberê Xuda di hedîsa şerîf de dibêje:

“*Heke merev nexweş bikeve, yan jî (ji bo cîhad û xêrê) derkeve rêwîtîyê ji lewma îbadetên nafîleyên ku dikirin nikaribe wan eda bike, bi qasî sewaba wan amelên ku dema li mala xwe tendurust bû dikirin, jê re tê nivîsîn*.” [195]

Bi vê sebebê divê mirov dema hê sihhet, firsend û derfet hebe îbadet û amelên salih ji xwe re bike adet û bi awayekî bi istiqrar edakirina îbadetan ji xwe re ğenîmet zanibe.

Li alîyê din, di Qur’ana Pîroz de fermanên di bara îbadetan de jî îfadeya îstimrarê/berdewamî û dirêjepêderîyê hildigrin. Yanî

194. Tîn, 95/6.
195. Buxarî, Cîhad, 134; Ehmed, IV, 410, 418.

fermanên îlahî îbadetan bi zemanekî diyarkirî ve sînordar nakin û beyan dike ku divê ew di dirêjahîya emrekî temam de were îfakirin.

Ji bilî vê, fermanên îlahî di bara kevir-barana li şeytanê ku daîm li hemberî îbadetan sistahî û tembelîyê dide mirovan de jî îfadeya îstimrarê/dewamî û dirêjepêderîyê hildigrin. Li gorî vê divê mûmîn, bi her wesîlê dûaya îstîazê bike, yanî divê ew dibêje; اَعُوذُ بِاللّٰهِ مِنَ الشَّيْطَانِ الرَّجِيمِ "*Ez bi Xuda xwe ji şeytanê ku ji rahma îlahî hatiye qewirandin diparêzim.*" Divê ew tim daîm ji bo amelê salih, exlaqê xweş, îbadet û taetan reğbet û ğeyretê şanî bide û daîm kevi-ran li şeytanî bibarîne.

## XILASÎYA JI XUSRANÊ

Di Sûretê Esr de Cenabê Heq li ser "**zeman**"î sûnd xwariye. Divê em zanibin ku Xuda bi vê sûndê daye zanîn; piştî zeman bibûre ew careke din bi şûn de venagere. Ew bi deyn nayê standin û dayîn. Ew yek ji wan nîmetên mezin e ku însan di bara pêzanîna qedrê wî de ğafil mane. Ew bi însanan dide hizirîn ku temenê fanîyê xwe bi lezûbez xilas dikin û ew me mirovan ji vê ğefletê îqaz dike. Di pişt de eşkere dike ku zemanê xilasîya temamê însanîyetê bi çar xusûsan ve girêdaye: Yanî ew wek bi **îman, amelê salih, tewsîya heqîyê** û **tewsîya sebrê** tije, bijîn. Yanî dide zanîn; ew zemanên ku bi van çar xusûsan nehatibin îhyakirin, sebebê xusraneke mezin in.

Ji bilî vê sûnda di vî sûretî de ne bi pişkeke diyarkirî ya zemanî ve taybet e, lêbelê ew emrekî temam dide ber xwe. Çawa Xuda di ayeteke din de dibêje:

"**Û heta yeqîn** (mirin) **were te ji Rebbê xwe re îbadetê bike!**" [196] Naxwe şert e ku em hîç ti zemanekî wecda îbadetê winda nekin.

196. Hicr, 15/99.

Ew kesê ku bi wecda îbadetekî rastîn di rêya evdînîyê de birêve diçe, nefeseke tenê ya wî jî zîyan nabe. Çawa **Hezretê Îbrahîmê Xewwas** jî gotiye:

"*Tu, kesê sadiq yan dema îbadetê li serê ferz eda dikî, yan jî dema bi îbadetekî nafîle ve meşğûl be, dibînî; ji bilî vê tu wî di halekî din de nabînî.*"

Ehlê hikmetê jî gotiye; "*Dinya zemanê anekê ye; tu wê bi taetê derbas bike!*" [197] Ji lewma îcab dike mirov firsendê nede heta ku ti zemanekî xwe wek bê-îbadet û ji xêr dûr derbas bibe.

**Ebû Hazim** -rahmetûllahî eleyh- dibêje:

"Min û **Ebûhûreyre** pevre rêya xwe bi ber qebrekê xist ku ew nû hatibû definkirin. Ebûhûreyre wiha got:

*«-Du reket nimêjên ku sivik têne kirin û hûn besît dibînin, li vir (di qebrê de) ji bo min ji vê dinyaya we hezkirîtir û bi qîmettir e.»*" [198]

Dîsa li gorî rîwayetê **Yûnus bin Habeş**, dema roja înê di germahîya nîvroyê de di qebristana Dîmeşqê re derbas dibû, dengek bihîst ku jê re wiha digot:

"*-Gelî însanên li heyatê! Hûn diçin hecê, car caran diçin umrê, rojê pênc wext nimêj jî dikin. Îro îmkan di dest we hene hûn karin amel bikin, lêbelê hûn ehwalên dehşetdar ên axretê nizanin. Me jî yeqînen rewşa axretê îdrak kir lêbelê êdî îmkana me nîn e ku em amel bikin!*"

Yûnus, wek hembera vê îqazê li mirîyan vegerîya û silav da wan. Lêbelê hembera silava wî nehat. Wî wiha got:

---

197. Îmam Ğezalî, Mûkaşefetû'l-Qulûb, rûp. 166.
198. Îbnû Ebûşeybe, Mûsennef, VII, 126/34702.

"-Subhanellah! Ez peyva we dibihîzim lêbelê hûn nikarin bersiva silava min bidin." Mirîyên li qebristanê jî jê re gotin:

"-Me silava te bihîst lêbelê bersivdana wê sewabê bi însanî dide qezenckirin. Ji bo me jî êdî ne derfeta sewab qezenckirinê heye, ne jî îhtîmala ketina gunehan maye. Bi vê sebebê me bersiva silava te neda." [199]

Ha heyat, nîmeteke sînordar e ku ji bo qezenckirina seadeta uxrewî ji me re hatiye lutfkirin. Ne tekrara wê heye, ne jî telafîya wê heye.. Naxwe hê firsend ji dest me neçûyî divê em ğeyret bikin ku her wexteke heyatê bi amelên salih tije bikin. Lewra ew wextên ku mirovî nagihînin rizaya Xuda û ji bo axretê bi sermayê seadetê nayên kirin, ji bo îstiqbala ebedî sebebê xusranê ne.

Divê em bifikrin; heyata dinyayê ku ji rojên bijimar îbaret e, ew çi qeder dirêj werin dîtin jî dîsa wekî Remezana şerîfa ku ji rojên bijimar îbaret e, zemanekî kurt e. Bi vê sebebê çawa em Remezanê ji bo qezenca manewî wek mewsima firsendekê dibînin û em ğeyretê xwe zêdetir dikin, wilo wergirtina emr û temen jî zerûrî ye..

Divê mirov di vê xusûsê de dostên hezkirî yên Heq ji xwe re bike rêber. Lewra ew di xusûsa nirxandina sermayê heyata xwe bi îbadetê de di nav şîyarîyeke dilî ya wilo de ne ku heke xeber ji wan re were ku ewê sibê bimrin jî dîsa îmkan nîn e ku ew îbadetê xwe hê bêhtir zêde bikin. Digel vê jî ew, di nav tewazûyeke mezin û xeşîyetê de daîmî xwe kêm û netemam dibînin. Heta ew ğefleta di nav civakê de jî dixin stûyê xwe, xwe bi şeklekî titîz dikişînin hesabê.

199. Ebû Nûeym, Hilye, V, rûp. 166.

Ev setrên ha ku ji mektûbeke dostê mezinê Heq **Hezretê Ebdûllahê Dehlewî** hatiye wergirtin, ji bo vê çi qeder mîsaleke manedar e:

“*..Em hatine bexçê cîhanê ji bo gulan berhev bikin, lê mixabin me strî kom kirin. Sihhet, efîyet û rehetî ji me re hatiye dayîn, lêbelê heyhat me di şukirê tevan de jî qusûr kiriye. Wekî Qur'ana Pîroz û Mezinê me Pêğember du nîmetên mezin ji me re hatine bexşkirin. Lêbelê heyf û mixabin em ji şukirê wan ğafil mane. Xuda biparêze, ez di heyretê de me; sibê emê bi çi rûyî di hizûra Xuda û Resûlê wî de qebûlê bibînin. Bi vê bêlîyaqetê, gihiştina şefaet û meğfîretê zehf zor e! Lêbelê hêvîya me rahma Ellah Teala ye ku ew ji ğezeba wî derbas bûye.. Heke na, hîç ti mazereta me û rûyê me yê ku pê uzr bixwazin nîn e!*

*Mirinê, li ber serê me kemîn vedaye, qiyamet jî zehf nêzîk e. Gelo me çi qeder amelê xêrê kiriye ku bikêrî kar were? Evdên salih diçin Cennetê û bi nîmetên ebedî û dîdara Heq digihin. Em ğafil jî di roja hesabê ya bi hezaran sal (dirêj) de wê me bikişîne ber hesabê û emê bi tiştên ku bersitika me naberdin ve meşğûl bin.*

*Îro em halê xwe baş bifikrin, bila sibê ya di destan de maye, nebe hesret û zîyan. Wekî evdên biqîmet ên Heq kirine, Heq Teala wilo ji me re bike nesîb ku em di seheran de rabin, hêstirên hesretê ji çavên xwe bibarînin û bi ğeyreteke canxiraşane îbadet û evdînîyê bikin...*”

**Rebbê me, ji me re bi nesîb û mûyesser bike ku em karibin heyata xwe daîmî bi wecda evdînîyê di nav rûhanîyeta Remezaneke bêdawîn de bijîn, em karibin ji dostanî û nêzîkbûna ji Heq re wek nail, bi hizûr û seadeta sibeha cejneke ebedî nefesa dawîna xwe bidin!**

**Amîn..**






# *Bi Exlaqê Îlahî Exlaqbûn*

*Hezretê Mewlana dibêje:*

*"Şems (quddîse sirruh) tiştek li min hîn kir, ew jî ev e: Heke li dinyayê serma bide mûmînekî tenê jî,  heqê te yê germbûnê nîn e. Ez jî dizanim li sererdê mûmînên ku serma dide wan hene, êdî ez jî nikarim xwe germ bikim!"*

*Divê zanibe ku; menfîet û arzûyên nefsanî; jehr in, li rûhê me hatine reşandin. Her yek ji wan di mesabeya zincîran de ye ku li heyata rûhanî ya me hatine xistin. Bes di piştî jêketina van zincîrên nefsanî de mirov dikare bi vî exlaqê îlahî bigihe.*

# BI EXLAQÊ ÎLAHÎ EXLAQBÛN

Ji sehabîyan **Hakim bin Hazim** lêzimê dêya me **Hezreta Xedîce** bûye. Ew mirovekî comerd, mûşfiq û xwedan xêr û hesenat bûye. Ew bavên ku di serdema cahilîyetê de dixwestin keçikên xwe hê bi sağî veşêrin, keçikên wan ji wan dikirrîn, heyata wan xilas dikir û ew hîmaye dikirin. Piştî ew misliman bû jî rojekê hate cem Resûlûllah, jê pirs kir, jê re got:

"-Ey Resûlê Xuda! Hinek xêrên min hene, min ew di serdema cahilîyetê de kirine: Her wekî dana sedeqeyan, azadkirina koleyan, kirina sileya rehmê... Gelo wê di hemberî van de ecr ji min re were dayîn?"

**Mezinê me Fexrê Kaînatê** jê re wiha got:

"*-Tu ji xwe bi xêra van qencîyên ku te berê kirine, bi Îslamê şerefdar bûyî!*" [200]

Naxwe exlaqê xweş, li cem Heq bi qasî ku wek bedelê nailîyeta şerefa îmanê were jimartin, xwedî qîmetekî mûezzam e. Em mecanen, yanî digel ku me bedelek nedaye jî em bi lutf û keremê bi nîmeta Îslamê şerefdar bûne. Ji lewma ji bo edakirina bedelê îmana xwe, hem jî wek şukran ji bo vê lutfa bêdawîya Rebbê me,

---

200. Buxarî, Zekat 24, Buyu 100 Itk 12, Edeb 16; Mûslim, Îman, 194-196.

em mecbûr in ku exlaqê Îslamê di şeklê ji hemû şeklan zerîftirîn de di şexsîyeta xwe de temsîl bikin.

Ew exlaqê ku Ellah Teala ji bo însanî bexş kiriye, ew bariztirîn wesf e ku însanî ji mexlûqatên dîger vediqetîne. Ew însanê ku bihayên exlaqî yên xwe winda kiribe, di esilê xwe de wî xatir ji wesfê xwe yê însanîyetê jî xwestiye. Tişta ku însanî dixe însan, xemilîna wî ya bi exlaqê xweş e; ew tişta ku însanî ji însanîyetê derdixe û wî dixe zilleta “**bel hum edall**/ji heywanan jî nizmtir” asêbûna wî ya di teqana bêexlaqîyê de ye.

Di netîca bêexlaqîyê de ji bo nankorên ku “heysîyeta însanîyetê” terk kirine gellek tecellîyên ezab û întîqama îlahî waqî (çê) bûne. Qewmên wekî Ad, Semûd û Lût ku bêexlaqîyên curecur adeta ji xwe re kiribûne meslek, ji bo (rûbirûna) van (întîqamên îlahî) bariztirîn mîsal in. Hinek ji wan însanên ku ji van qewmên di zemanên berê de çûne helakê, ji bo roja me jî hatine întîqalkirin û guhastin, em mewcûdîyeta wan di civakên roja xwe de jî dibînin. Cenabê Heq, bal û diqqet kişandiye ser van bi vî awayî ji me dixwaze em ji wan îbret bigrin û em xwe ji dûçarbûn û çûna ji bo helaka manewî, biparêzin.

Naxwe îcab dike em ji bo mûhîmtirîn wesfê xwe yê însanî ku exlaqê me ye, bidin tekamul-kirin ğeyretê şanî bidin ji bo îmana me li zeîftîyê nekeve.

Lewra ğayeya dîn; perwerdekirin û gihandina însanê sipehî, rûh-tenik û alema hundurîna xwe paqijkirî ye. Ev jî bi îdrak-kirina evdînîya ji Heq re çêdibe. Li gorî Îslamê însanê îdeal, ew e ku exlaqê Xuda û Pêğemberê wî ji xwe re kiribe exlaq. Rêya gihiştina vê îdealê jî di terbîye û perwerdeya manewî re derbas dibe.

Li alîyê din terbîya ji hemû terbîyan zortir, terbîya însanî ye. Lewra di însanî de nefseke ji terbîyê re mûhtac û ezperestîyeke

dijwar heye ku ev di heyberên din de nîn e. Bêşiwar ev rewş, encama vê rastîyê ye ku însan ji bo îmtîhana îlahî peywend e.

Ji bo vê Cenabê Heq pêğember ji însanan re şandine ku ew ji bo mirovan perwerdekarên ji hemû perwerrdekarên din mezintir in. Pêğember terbîyekar û mûrebbîyên nimûneyên exlaqê bilind in. Çawa Mezinê me Pêğember rasteqîneya wezîfeya xwe îfade kiriye û wiha gotiye:

“*Ez ne ji bo meqsedeke din, lêbelê sirf ji bo exlaqê xweş temam bikim, hatime şandin*.” [201]

Exlaqê Mezinê me Pêğember, nimûneya zirweyî ya exlaqê bilind e ku Rebbê me ji bendeyên xwe xwestiye. Rebbê me, ev heqîqet di vê ayeta pîroz de eşkere kiriye, gotiye: “(Resûlê min!) **Bêşiwar tu, li ser exlaqekî mezin î**.” [202]

Çawa Mezinê me Pêğember jî bi vê eşkerekirina xwe; “*Rebbê min ez terbîye kirim û terbîya min jî zehf sipehî kir*.” [203] Wî bi vê îşaret pê daye ku exlaqê bilindê şexsê wî yê mûbarek ji serkehnîya “**exlaqê îlahî**” ye.

Naxwe ji bo mirov karibe ji heqîqeta “**exlaqê îlahî**” waqif bibe wesîla ji hemû wesîleyên din sipehîtir, naskirina yeqînî ya exlaqê Mûhemmedî ye. Em di wî de çi qeder karibin fanî/tine bibin, wê ew qeder esrarê (sirrên) exlaqê îlahî eyan bibin. Ew mirovên ku ji her kesî bêhtir ji Xuda Teala nêzîk dibin jî ew kes in ku rêç û şopa Mezinê me bi exlaqê xweş (ê wî) taqîb dikin.

Dema pirsa exlaqê Resûlûllah ji dêya me **Hezreta Aîşe** dihate kirin, wê bi awayekî zehf kurt û wecîz exlaqê Mûhemmedî îfade kiriye, gotiye:

---

201. Îmam Malik, Mûwetta, Husnû’l-Xulq, 8.
202. Qelem, 68/4.
203. Suyûtî, Camîûs-Seğîr, I, 12.

*“Exlaqê wî Qur’an e.”* [204]

Hezretê Ebûbekr jî ev telqîn û dan-hînkirin li me kiriye, gotiye;

*“Ellah Teala di Qur’ana Pîroz de mûkafata ku dide bi ezabê re zikr kiriye ji bo bi vê wesîlê evd, îbadet û exlaqê xweş rîayet bike û xwe ji ezabê jî biparêze.”*

Divê em jî feyza dilî ya xwe ji dersên hikmetê yên **Qur’ana Pîroz**a ku pêşangeha exlaqê îlahî ye û ji sîreta Resûlê Xuda, ya ku wî bi jîyîna xwe exlaqê Qur’anê şerh û îzah kiriye, wergirin.

Dostê Heq **Hezretê Mewlana** çi xweş dibêje:

“*Qur’ana Pîroz, hal û wesfên pêğemberan e. Heke tu wê bixwînî û tetbîq bikî, xwe ferz bike ku te hevdîtin bi pêğember û welîyan re kiriye! Digel ku tu Qur’anê bixwînî jî heke tu fermanên wê bicih nekî û tu exlaqê wê nejiyî, heke tu pêğemberan û welîyan bibînî jî ma çi feyda vê hevdîtinê ji te re çêdibe?.. Ewên ku ji her kesî bêhtir Qur’ana Pîroz fehm dikin, ew kes in ku wê dijîn.*”

Heke mûmin; bi ehkamê Qur’anê amil be, bi exlaqê wê jî kamil bibe, adeta ew bi exlaqê îlahî xwedan exlaq bûye. Ji bo vê jî divê mirov Qur’ana Pîroz bi tefekkur-kirina maneya wê û bi semîmîyet jê re vekirina qelbê xwe wê tîlawet bike, **aqlen** û **qelben** di keş û hewaya Qur’anê de bijî û endaz û pîvanên Qur’anê li ser tevger û bizavên xwe bike hakim.

Di netîca vê de di mûmînî de xesletên wekî merhemet, şefqet, îkram, sexawet, efûkarî, parvekirina îmkanên xwe bi bira-dînên xwe re dibin halê hizûr û lezzeteke bêtarîf.

204. Mûslim, Mûsafirîn, 139.

## XESLETÊN KU EVDÎ Bİ REBBÊ WÎ DİDİN HEZKİRİN

Bi exlaqê îlahî exlaqbûn, berî her tiştî, bi pêrebûna dilî ya bi Ellah re pêbend e. Wasîteya vê jî **mehebbet** e. Lewra hatiye gotin; "*mirov ji kê hes bike pêre dibe.*"[205] Maneyeke vê pêrebûnê jî pêrebûna xusûsîyetan e. Lewra mehebbet, serkehnîya wê mûşterekîyeta xusûsîyetên hezker û jêhezkirî ye.

Di kakila însanî de sirreke îlahî heye. Ew sirr rûh e ku ew jî nefxa îlahî ye. Ji vê re rûhê sultanî jî tê gotin.[206] Evdek, dema rûhê xwe yê ku Ellah ji rûhê xwe pif kiriyê û ew jê re lutf kiriye, bi sipehîtîyên îlahî jî bixemilîne, hingê wî sipehîtirîn mûşterekîyet bicih kiriye ku ew ji bo mehebbeta Xuda wesîle ye. Çawa her hal û hereketa mûmînê ku ji Xuda hez dike, ji nav û sifetên Wî şopan bi xwe re hildigre.

Divê em vê jî bidin xuyakirin ku meqseda me ji exlaqbûna bi exlaqê îlahî; ne ew sifetên celalî yên wekî ezamet û kibrîyayê ne ku Rebbê me naxwaze wan di evdên xwe de bibîne. Lêbelê exlaqbûna bi wan sifetên cemalî ye ku Rebbê me dixwaze wan di evdên xwe de bibîne û ew ji wan razî ye, her wekî şefqet, merhemet, efûkarî û comerdîyê..

Cenabê Heq, bi vî awayî şopa van nav û sifetên xwe di kîjan evdên xwe de bibîne, jê hez dike. Mesela; Ellah Teala ji ber ku "tek" e, ji kitê hez dike, ji ber ku sipehî ye, ji sipehîtî û yên sipehî hez dike, ji ber ku alim e, ji aliman hez dike, ji ber ku comerd e, ji comerdîyê hez dike, ji ber ku xwediyê hêz û qudretê ye, ji mûmînên

205. Buxarî, Edeb, 96.
206. Di însanî de rûhekî din jî heye, ew failîyetên azayan dide temînkirin ku ji vî re jî rûhê heywanî tê gotin. Rûhê sultanî, bedena ku bikeve xewê, wê terk dike û dema ew şîyar dibe dîsa lê vedigere. Ji ber vê sebebê ye ku dema ew di xew de be, melekeyên zêhnî ne feal û çalak in.

madden û manen xurt ên ku çeng û perên xwe ji mûmînên zeîf re datînin hez dike, ji ber ku ew ji wadeya xwe venagere û ji ehda xwe re wefadar e, ji wefadaran hez dike, ji ber ku ew sadiq e, ji mirovên rastgo û hal û hereket durust hez dike. Mûmkin e mirov vê heqîqetî li ser hemû esma û navên cemalî şamil bike.

Lêbelê divê mirov vê jî jibîr neke ku îzafe-kirina sifetekî ji sifetên Cenabê Heq ji bo însanekî ji însanan mecazî ye. Divê ew sifet jî bi sifetê wî yê "mûxalefetû'l-Hewadis" re, yanî neşibihîna wî bi hîç tiştekî ku piştre hatiye xuliqandin re teleqqî bike, wergire. Heke na, tewsîfkirina însanekî ji însanan bi yekî ji wan sifetan wê bibe şirk.

Ev hedîsên şerîf mîsalên sipehî ne, didin zanîn ku evd çi qeder xwe bi exlaqê îlahî xwedan exlaq kiribe ew qeder ji bo mehebbeta Xuda nail dibe:

*"Ellah Teala comerd e. Xwedî îhsan e; ji comerdîyê hez dike. Dîsa ew ji exlaqê sipehî hez dike.."* [207]

*".. Ellah Refîq e (xwediyê rifqê ye), ji mûamela bi rifqê (nermahîyê) hez dike. Wê sewaba ku ji bo tundkarî û tiştên din nade, ji bo mûamela bi rifqê dide."* [208]

Dîsa **Mezinê me Resûlê Ekrem** di carekê de gotibû:

"*-Ew kesê ku bi qasî zerreyekê jî kibr di dilê wî de hebe naçe cennetê.*"

Sehabîyekî got:

"*-Ya Resûlellah! Însan li xweşîya wî diçe ku cilên wî û pêlavên wî sipehî bin. (Ev çawa dibe?)*"

207. Suyûtî, el-Camî, I, 60; Tirmizî, Edeb, 41/2799.
208. Mûslim, Birr, 77.

Mezinê me Pêğember eşkere kir ku ev ne kibr e, û wiha got:

*"Ellah sipehî ye, ji sipehîtîyê hez dike. Kibr jî xwe mezin-kirin e (nîmetên ku Xuda lutf kirine bike aîdê nefsa xwe) heqî înkar û redkirin e, û biçûk-xistina însana ye."* [209]

*Dîsa Mezinê me Resûlûllah kesek dît ku wî wek bê-îzar* [210] *di cihekî vekirî de ğusl dikir. Vêca Mezinê me Resûlûllah çû ser min-berê, piştî hemd û sena ji Xuda re kirin, wiha got:*

*"-Ellah zehf bi heya û veşartî ye. Bi vê sebebê ew ji heya û xwe nixumandinê hez dike. Naxwe dema yek ji we xwe bişoyê, bila xwe binixumîne."*[211]

**Hezretê Şêx Sadî Şîrazî** di berhema xwe ya bi navê "**Gulistan**"ê de di xusûsa "**heya**"yê de ku ew exlaqekî îlahî ye, wiha dibêje:

"Yek ji evdên gunehkar, bi hêvîya ku wê qebûl bibe destê xwe vedike, dûa dike. Lêbelê Xuda Teala dûaya wî qebûl nake. Ew evd tekrar dûa dike, dîsa jî Xuda qebûl nake. Ew evd ji bo cara sisêyan destên xwe vedike, dûa dike û dest bi lavlavê dike. Vêca Cenabê Heq dibêje:

«*-Ey melaîketên min! Min ew dûaya evdê xwe ya ku bi israr dikir qebûl kir û min daxwaza wî dayê. Lewra ez ji dirêj dirêj dûa-kirina wî û ji nalîna wî şerm û heya dikim.*»"

Şêx Sadî piştî ev neql kiriye, wiha dibêje:

"Lutf û kerema Ellah bibîne ku evd dikeve gunehan, lêbelê Ellah heya dike."

---

209. Mûslim, Îman, 147; Ehmed, Mûsned, IV, 133.
210. Îzar; cileke qismê bedenê yê ji navikê berjêr dinixumîne.
211. Ebûdawud, Hemmam, 1/4012.

Serkehnîya exlaqê Mezinê me Pêğember jî ku bi vî awayî hatiye tewsîfkirin; “ji keçeke ciwana ku ketibe wextê xwe nixumandinê hê bêhtir xwedî heya bû” bêşiwar ev exlaqê îlahî ye.

Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

“**Bibêje: Hûn çi dikin bikin! Ellah jî, Pêğemberê wî jî û mûmîn jî wê amelên we bibînin. Piştre hûnê li Ellah ê ku berçav û ğeybê dizane, werin vegerandin û amelê ku we dikir, ewê ji we re vebêje**.” [212]

Mezinê me Pêğember jî wiha gotiye:

“*Tendurustîya (sağlemîya) min ji we re xêr e: (Lewra) Hûn bi min re diaxivin; ez jî bi we re diaxivim! Wefata min jî ji we re xêr e: (Lewra) Amelên we li min tên erzkirin, dema ez amelên bixêr ên we dibînim, ji ber wî ez ji Xuda re hemdê dikim; dema ez amelê xirab ê we jî dibînim, ez ji bo we meğfiretê ji Xuda dixwazim*.” [213]

Em jî wek ummeta Mûhemmed divê jibîr nekin ku em çi amelî bikin hemû kirinên me daîmî ji terefê Xuda ve têne dîtin û heta ew li Resûlûllah jî têne erzkirin. Divê heta tu bibêjî bes, em xwe ji kirina wan şaşîyên ku nikarin li ber çavên wan bikin, biparêzin û şerm bikin.. Lewra îro xwe parastina ji şaşîyan, wê sibê li mehşerê însanî ji rezîl û riswabûnê xilas bike.

## DILÊ XWE JI BO EXLAQÊ ÎLAHÎ BIKE AYNE...

**Hezretê Mewlana** di Mesnewî’ya xwe de qisseyekê diguhêze:

212. Tewbe, 9/105.
213. Heysemî, IX, 24.

“Ji welatê zehf dûr dostekî dilê wî ji mehebbetê tije hat li cem **Hezretê Yûsuf** bû mêhvan. Ew hê ji zarokatîya xwe ve ji hev re dostên semîmî bûn.

Hezretê Yûsuf bi sipehîtîya xwe çav didan kwîrkirin, midetekî pê re sohbet kir, piştre bi awayekî tinazwarî jê re got:

«-Dostê min bibêje, ez binêrim te ji deverên ku çûbûyî wan çi ji me re anîye?»

Mêhvanê wî pêşî li pêşberî vê daxwaza wî nizane wê çi bibêje. Piştre hissîyatên xwe bi van îfadeyên semîmî tîne zimên, dibêje:

«-Ez ji bo xelatê ji te re bînim, min di vê alema fanî de li gellek tiştan meyzand. Lêbelê çavê min ji yekî ji wan negirt û min yek ji wan ji te re layiq nedît. Ma min karîbû çawa perçekekî zêr ê wekî firdikekî mezin ji besteke zêran re wek xelat bibim, yan jî dilopekê ji deryayekê re wek xelat bibim? Ma çi tuxmek heye ku ji sipehîtîya te re hevkêş be û di ambara vî welatê Misrê de nebe? Ew hedîya ku ji te re were anîn, divê ji sipehîtîya te re hevta be, yan jî yeka wekî wê be. Ji ber vê min jî bi bêçaretî layiq dît ku ayneyeke wekî nûra dil berraq, bêleke û bêtoz ji te re bînim û wê ji te re teqdîm bikim.

Hey Yûsufê ku nûra rûyê asîmanî yê wekî taverojê! Min ayneyek ji nûra dil ji te re anî ku tu çi qeder lê meyzînî, sipehîtîya xwe têde bibînî û jê re heyran bimînî. Tu çi qeder têde rûyê sipehîyê xwe bibînî, tu têde tecellîyên cemalî yên Rebbê xwe di xwe de seyr bikî û tu min jî di bîra xwe bînî.»

Piştî mêhvanî ev gotin, ji bin paldankê xwe ayneyek deranî û ji Hezretê Yûsuf re teqdîm dike.

Hezretê Heq Teala, ji her tiştî mûsteğnî ye. Li kaînatê hîç tiştekî sipehî û biqîmet nîn e ku di xezîneyên bêdawî yên wî de mewcûd nebin. Lewra Ew, ji bo hemû sipehîtîyan esil Xaliq û mûsebbib e.

Bi vê sebebê meqbûltirîn hedîya ku mirov karibe ji hizûra bilinda wî re teqdîm bike, ayneyeke dilî ya ji qirêjên masîwa temîzkirî, ji tecellîyên exlaqê îlahî re makes (xuyageh), mûcella, mûseffa û pak e. Yanî ew qelbekî selîm e ku dema Rebbê me lê nezar bike, sifetên cemalî yên xwe seyr bike û jê razî bibe.. Qelbekî ew qeder saf û berraq ku karibe ji bo sipehîtîya Heq bibe ayne, layiqtirîn hedîye ye ku ji Cenabê Heq re were birin. Lewra ji terefê Rebbê me ve qebûlbûna me li hizûra îlahî ya wî bes bi "**qelbê selîm**" mûmkin e.

Çawa Xuda di ayeta pîroz de vê heqîqetê wiha îfade dike, dibêje:

"**Ew roj, ne mal feyde dide, ne jî ewlad! Lêbelê ewên ku bi qelbê selîm** (bi dilekî tertemîz) **werin cem Xuda mûstesna ne!**" [214]

Dîsa **Hezretê Mewlana** çi xweş dibêje:

"*Ayneya hebûnê çi ye? Ayneya hebûnê tinebûn e. Ey aşiqê Heq! Heke tu ne ehmeq bî, tinebûnê bibe hizûra Heq.*

*Marîfet ev e; mirov karibe ji kesretê bi wehdetê întîqal bike û karibe xwe bi rengê Heq boyağê li xwe bixe. Ewrên li asîmanî û avên di deryayan de rengên wan bi xwe nîn e. Taveroja li asîmanî wan ji rengekî dixe rengekî din.*

*Tu jî xwe ji arzûyên nefsanî bixeritîne, bi tinebûnê yanî hîçîtîyê bigihe! Lewra kemala her tecellîya îlahî, piştî gihiştina hîçîtîyê destpê dike..*"

Divê zanibe ku; menfîet û arzûyên nefsanî; jehr in, li rûhê me hatine reşandin. Her yek ji wan di mesabeya zincîran de ye ku li heyata manewî ya me hatine xistin. Bes di piştî jêketina van zincîrên nefsanî de mirov dikare bi vî exlaqê îlahî bigihe.

214. Şûera, 26/88-89.

Yanî rêya çûna mehebbet, nêzîkatî û dostanîya Xuda, bi jîyîna xwe bûna ayneyek ji bo exlaqê îlahî re derbas dibe. Ew ayneyeke wilo ye ku kî lê binêre divê têde ne halên malûlên bi zeîftîyên nefsanî seyr bike; lêbelê tecellîyên navên cemalî yên Heq temaşe bike. Lewra ew qelbên ku bi kesafetê hilm girtibin û reş bûbin ti nesîbekî wan nîn e ku ji exlaqê îlahî bigrin.

Tabîra ku mezinên Tesewwufê bi “xwedan exlaqbûna bi exlaqê Xuda” îfade kirine, di Heq de fanî-tinebûn jî ji tezkîye û tesfîye-keke wiha pê ve, yanî ji paqijbûna manewî pê ve ne tiştekî din e.. Sihhet û heqîqeta mûraqeba mûhebbetê di rêya seyr û silûkê de jî bes dikare bi vê elametê were zanîn. Lewra sîstema terbîya manewî ku di tesewwufê de wasîteya wê “mehebbet” e, netîceya wê jî “edeb” e. Tesewwuf îfadeya safaya qelbî, yanî gihiştina paqijîya manewî ye.

Çawa **Ebûbekr el-Kettanî** gotiye:

“*Tesewwuf exlaq e. Kesê ku bi exlaqê xwe ji te çêtir be, ew ji hêla safayê, yanî ji hêla paqijîya manewî ve jî çêtir e.*”

**Ebû’l-Huseyn en-Nûrî** jî gotiye:

“*Tesewwuf ne şeklek e, ne jî zanistek e; ew sade ji exlaqê xweş îbaret e. Heke ew şekil bûya bi mûcahedê, zanist bûya bi hînbûnê dihate tehsîlkirin. Bi vê sebebê sirf şekil û zanist nagihînin meqsedê. Tesewwuf, lixwe-kirina exlaqê Heq e.*”

## RÊWÎTÎYA HEQ

Tesewwuf, rêwîtîyeke Heq e ku di rêbertîya **îman**, **Îslam** û **îhsanê** de tê qutkirin. Di vê rêwîtîyê de wezîfa mûmînî, tefekkurkirina li ser esma û sifetên Cenabê Heq e, û xwedan exlaqbûna bi exlaqê mûcibê wan e.

Hezretê Bûrsewî vê çi xweş îzah dike, dibêje:

“Zanibe ku meqamên dînî sê ne: Îslam, îman û îhsan e.. Zikrkirina navên Xuda jî bi sê texlîta ye: Di meqamê Îslamê de bi tealluqê, di meqamê îmanê de bi texalluqê, di meqamê îhsanê de jî bi teheqquqê ye,

Di meqamê Îslamê de bi tealluqê zikrkirina navên Xuda ev e; salik bixwaze berhema her yekî ji van navan di nefsa wî de, di bedena wî de, di hemû zerreyên wî de, di hemû hal û hereketên wî de were dîtin.

Hemû zuhûrat, hukm û eserên navên ku wan zikr dikin, dibînin, wekî şukirkirina ji bo nîmetan û sebrkirina li hemberî belayan, hemberê mûnasibê her eserê bidin..

Di meqamê Îmanê de bi texalluqê zikrkirina van navan; waqifbûna rûh ji mane û heqîqetên van navan û bi mûcibê gotina; *“bi exlaqê Xuda xwedan exlaq bibin”*[215] bi exlaqbûna her yekî ji wan navan çêdibe. Di vê teqdîrê de ew kesê ku bi yekî ji van navan xwedan exlaq bûbe, aynî wekî wî navî dibe. Wate ew tiştên ku ji wî navî tecellî dikin, di vî kesî de jî (bi qasî îstîdada wî) tecellî dibin...

Di meqamê îhsanê de bi teheqquqê zikrkirina navên Xuda jî; bi teqwayê, bi tiştên ku mirov ji wan re xwedî be, yan jî di nava wî de zihûr dikin, piştre mohra çêbûnê li wan hatiye xistin xwe xwerû-kirina ji hemû sûret û maneyan û lixwe-kirina hizûra heqîqî, çêdibe..”[216]

Yanî hesta **îhsan**ê ev e; mirov heqîqeta her tiştî û hebûna mûtleq sade Cenabê Heq bibîne û bigihe vê îdrakê ku ji ğeyrî Xuda hemû heyber û bûyer, îzafî, demî û di hukmê sihê de ne. Daîmî

215. Binêrin. Mûnzirî, Terğîb, IV, 185.
216. Rûhû’l-Beyan, VI, 440-441.

wekî ku mirov Heq dibîne hesta evdînîyeke wilo qezenc bike, vî haletê rûhîye di qelb de sabit bike, wê ji bo şexsîyeta xwe bike unsûr û regezekî hakim û jênebirr û wilo bijî. Ev jî karê dostên Heq e ku di Xuda de fanî-tine bûne.

## DOSTANÎYA HEQ

Mezintirîn ğayeya mûmînên heqîqî ev e ku di netîca xwedan exlaqbûneke wilo de ku mehebbet û dostanîya îlahî temîn bike, karibe bigihîje merteba "**dostê Heq**"e. Dostên Heq ew bextiyar in ku di rêya tesewwufê de zahir û batinê xwe îkmal kirine, merhelên qelbî qut kirine û bi mûkemmelîyeta bizavan û "waristîya Pêğember" gihane.. Ew, ji bo îrşada nebewî û mûkemmelîyeta bizavan zirwe ne ku li ser zemanan hatine belavkirin. Dîsa ew, ji bo exlaqê îlahî nimûneyên fiêlî û mûşexxes in.

Dostên Heq ji ber ku bi îmanê gihane marîfetûllah'îyê; bi teqwayê jî gihane exlaqê bilind, ewê di roja ji hemû rojan zortir de jî ji her cure tirs û kederan di selametîyê de bibin. Lewra wan bi dostanîya Ellah ê ku xwediyê qudreta mezintirîn û bilindtirîn e, xwe avêtine ber penah û hîmaya ji hemû hîmayan ewletir û ew ketin bin temînata îlahî..

Çawa Xuda di ayetên pîroz de dibêje:

"**Zanibin ku ji dostên Xuda re tirs nîn e û ewê ğemgîn jî nebin. Ew jî ew kes in ku îman anîne û gihane teqwayê**." [217]

Di van ayetên pîroz de şert, ji bo karîna gihiştina merteba "**dostanîya bi Xuda re**" wek "**îman** û **teqwa**" xulase kirine.

217. Yûnus, 10/62-63.

**Îman**, xwe xwerû-kirina ji hemû bawerîyên batil û şaş e û tam bi îtmî'nana qelbî gihiştina heqîqeta ku tekane îlah, Ellah Teala ye.

**Teqwa** jî xilasbûna ji her cure rêyên şaş û xirab, serberedayî, jîyîneke nefsanî û heywanî ye û bi qelbê xwe jî bi temamî ji Ellah re teslîm-bûn e, di ronahîya heqîqetên îlahî de heyata xwe birêxistin e, û bi vî awayî "**ketina dîsîplîna exlaqê îlahî**" ye.

Hedefa mûtesewwifan jî gihiştina vê heqîqetê ye. Ev jî rabiteyeke (peywendîyeke) qelbî ya ku bi Xuda re hatî çêkirin îfade dike. Ew kesê ku ev rabîte bi awayekî tendurust saz kiribe, bi exlaqê îlahî xwedan exlaq dibe û dibe evdekî ji Rebbê xwe re welî. Êdî îhtîras û temayulên nefsanî di wî de heyatîyeta xwe winda dikin. Aynî wekî çemekî ku piştî digihîje nav behrê huwîyeta (nasnameya) xwe winda dike û di behrê de tine dibe, êdî destpê dike sade hal û bizavên ji mûrada Rebbê xwe re mûwafiq, şanî dide. Ew bi nezara Rahmanî li her tiştî dinêre, bi wê dibihîze, bi wê diaxive û bi wê dijî.

Ev hedîsa qudsî, vê rewşê çi xweş îzah dike:

"*Her kî dijminahîya evdekî min yê welî bike, ezê jî li hemberî wî herbê îlan bikim. Evdê min, ji wan tiştên ku min li serê ferz kirine hezkirîtir, bi tiştekî din nikare nêzîkbûna ji min, qezenc bike. Evdê min, (bi îlawe li ser ferzan) bi îbadetên nafîle her xwe ji min nêzîk dike, heta paşê ez jê hez bikim. Dema ez ji evdê xwe hez bikim jî (adeta)* ez dibim ew guhê wî yê ku pê dibihîze, ez dibim ew çavê wî yê ku pê dibîne, ez dibim ew destê wî yê ku pê digre, ez dibim ew lingê wî yê ku pê birêve diçe, ez dibim ew qelbê wî yê ku pê aqil dike û ez dibim ew zimanê wî yê ku pê diaxive.. *Ew her çi ji min bixwaze, hemin ezê wê bidimê. Heke ew xwe bavêje ber penaha min, ezê wî biparêzim.*" [218]

218. Binêrin. Buxarî, Rîqaq, 38; Ehmed, VI, 256; Heysemî, II, 248.

Bi vî awayî ew mûmînê ku fikrê wî û zikrê wî Ellah be, mirov nikare bihizire ku ewê ji exlaqê îlahî yên wekî merhemet, sebr, sexawet, û efûkarîyê bênesîb bimîne. Lewra dîtin-nêrînên wan, pêhisên wan, hizirînên wan û îfadeyên wan êdî ji cereyana (herk û darêja) nûra îlahî îbaret in.

**Cenabê Heq, me bike ku em para xwe ji van heqîqetan wergirin û dilê me jî bike mecra û cokeke bi bereketa exlaqê îlahî. Ji bo me tevan bi nesîb û mûyesser bike ku em karibin ji bo hemû mexlûqatan şefqet, merhemet, lutf, efiw û sipehîtîyê tewzî û belav bikin!**

**Amîn..**




# *Jîyîna Exlaqê Îlahî -1*

*Cenabê Heq di ayeta pîroz de dibêje: "Wekî ku Xuda ji te re îhsan kiriye tu jî wilo îhsanê bike.." (Qeses, 28/77.) eşkere dike ku ew arzû dike comerdîyeke wekî comerdîya xwe di bendeyên xwe de jî bibîne.*

*Ji bo vê ew mûmînê ku dixwaze exlaqê îlahî bijî; divê ew bi destên xwe, bi zimanê xwe, bi halê xwe, bi qalê (peyvên) xwe, welhasil bi her îmkanên xwe yên maddî-manewî di halê îkramê de li rizaya Heq bigere.*

# JÎYÎNA EXLAQÊ ÎLAHÎ -1

Kaînat, dersxaneyeke ku têde heqîqetên îlahî têne tehsîlkirin; ew însan û cinên ku ji bo werin îmtîhankirin ji dinyayê re hatine şandin jî di mesaba talebe û şagirtên vê dersxanê de ne. Tehsîla manewî ya di vê dersxanê de wê heta bi nefesa dawîn jî berdewam bike. Di encamê de însan, wê bi amelên xwe yên mûsbet, yan jî menfî cihê xwe di singa vê axê de bigre.

Rebbê me, ji bo em karibin bi awayekî layiq sirr û hikmetên hatina vê dinyayê û ji wê jî derbasbûn û koçkirina ji bo uqbayê îdrak bikin û em karibin heyata xwe li gorî wan tenzîm bikin, bi gellek beyan û daxuyanîyên îlahî me îrşad dike, rêya rast û durust ji me re şanî dide.. Çawa di Qur’ana Pîroz de yekem fermana wî ayeta; “**bixwîne! bi navê Rebbê xwe yê ku aferandiye,**”[219] ye. Ferehtirîn maneya ku bi vê ayetê hatiye mûradkirin jî ev e;

Mûmîn, divê pêşî karibe Qur’anê, Kaînatê, hadîsatê û bizzat aferandina xwe bi xwe tefekkur bike û li hemberî herk û darêjên qudreta îlahî bigihîje kûrahîya fikr û hestan. Di pişt de jî bigihîje vê îdrakê ku ev hemû bi sebebên zahirî hatine perdekirin lêbelê ji terkîba esmayên îlahî îbaret in. Wek dawî jî divê ew karibe heyata xwe di ronahîya van heqîqetan de pêkbîne. Bi vî awayî, divê bi

219. Elaq, 96/1.

ğeyreta ku karibe dilê xwe ji bo navên cemalî yên Heq bike tecellîgehek û li sererdê wek şahidekî Xuda karibe nezaket, zarafet û rûkenîya îslamê di hal û tevgerên xwe de şanî bide.

Yanî divê dil di çarçova îtaetkirina ji bo fermana Cenabê Heq; "**bixwîne**" de mohrên qudreta Xaliqê mezin û bilind ên di hemû heyberên kaînatê de mewcûd; ji alema mîkroyê bigre heta bi alema makroyê mûşahede bike û divê ew bi navên şerîf ên wî di tehsîleke manewî re, yanî di perwerdeya teqwayê re derbas bibe.. Çawa çîçek ji bo berdewamîya heyata xwe daîm îhtiyaca wan bi avê hebe, qelb jî ji bo berdewamîya feyz û rûhanîşyeta xwe îhtiyaca wan bi teqwayê heye. Çawa Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

"**Ji Xuda bitirsin** (li ser teqwayê bibin!) Xuda wê (tişta ku hûn nizanin jî) **li we bide hînkirin!**.."[220]

## el-MÛSEWWIR..

Mûmîn, ji bo karibe para xwe ji tecellîyên esmayên îlahî wergire û manen sewîyê qezenc bike; mesela, zerûrî ye ku mûmîn bi nezara îbretê li tecellîyên navê celîlê îlahî yê el-MÛSEWWIR ê ku li vê kaînatê hemû heyberan bi sipehîtî û mûkemmelîyeteke bêhempa pêktîne, temaşe bike. Lewra kaînat, ji bo tecellîyên ku ji serkehnîya qudreta îlahî dirijin, pêşangeh e. Ew mûemma'ya ku jê re însan tê gotin jî ji bo navên îlahî tecellîgeheke kamil e.

Ew qelbên ku bi nûra Xuda dibînin, dibihîzin û hestpê dikin, di her tiştî de tecellîyên îlahî îdrak dikin. Ji zerreyê bigre heta bi kurreyê li vê alemê çi hebe, tev xarîqeyeke hunerê îlahî ne û her dever jî adeta di hukmê mûzexaneyekê de ye, têde neqşên qudreta îlahî têne raxistin. Eser ji bo mûessirî; huner jî ji bo hunermendî ayne ye.

220. Beqere, 2/282.

Evdekî ku çavê qelbê wî ne kor be, ew li çi nezar bike, li ser kîjan zerreya kaînatê tefekkur bike, wê hunerê Rebbê xwe mûşahede bike û ewê di çêja hizûr û sirûra heyrantîyeke bêdawî ya xwe ya ji bo Hunermendê Mûtleq de ğerq bibe. Ew kîjan menzara û dîmenê bibîne, ew wî zêhnen û qelben digihîne Aferînerê wî.

Bi rastî ji bo însanê ku karibe zanîna xwe bi sewîya "**marîfet**"ê bilind bike, her zerreyek li kaînatê ji hebûn, yekbûn û qudreta bêdawîya Xuda re delîlek e. Ji bo însanê ku îdraka xwe bi vê sewîyê bilind nekiribe jî aynî zerre, ji dîtina Heq re perdekek e.. Wate hemû heyberên li kaînatê, dema mirov bi hesta îmanê lê binêre delîlek in mirovî dibin digihînin Xuda, di rewşa korbûna îdrakê de jî perdekek in ku dibin asteng, nahêlin mirov ji Wî nêzîk bibe. Ji ber vê ye ku gellek ji alimên tabîetê, dema hûrkolînê li ser heyberên maddî dikin, ew dikarin ji qudret û ezameta Heq Teala waqif bibin. Lêbelê hinek ji wan jî îdraka xwe dixin hebsa maddê û dibin zebûnê (qels û perîşanê) zêhnîyeteke materyalîst. Heyberên ku hûrkolîn li ser wan tê kirin her dem aynî ne. Lêbelê ferqdarîya di îdraka ku berê xwe dide wan de dikare însanî aynî wekî reş-sipî bibe, bigihîne netîceyên ji hev re dijber û hevzid.

Naxwe mûmînê kamil, ew kes e ku di nêrîna li kaînatê de kariye îdraka xwe bigihîne wesfekî wilo ku sirr û hikmetên îlahî fehm bike. Ev jî, aynî wekî camê ye ku dema bişike çawa qabil e, mirov karibe wê bixe elmas, aynî wilo îdraka însanî jî bi vê ve bend e ku bi îbadetên îxlas, teqwa û mehebbetê barkirî, înkîşaf bibe. (Hingê ewê bibe îdrakeke ku ji sirr û hikmetên îlahî fehm bike û her zerreyeke li kaînatê jî ji bo hebûn, yekbûn û qadirbûna Rebbê xwe bixe delîlek)..

Bi vê sebebê, ew kesên ku manen xwe li hemberî sipehîtîyên bêjimar ên ku sererd tije kirine; her wekî çîyayan, deryayan û beyanatên bêdeng ên bayê kor û kerr kirine û ji îdraka tecellîyên navê

şîrînê **el-Mûsewwir** ê Cenabê Heq dûr mane, ew rêwîyên ğafil û şaşomaşo yên heyatê ne!..

## el-BARÎ..

Wekî vê, heta mirov bi çavên dilî tecellîyên sifetê "**el-BARÎ**/ aferîner" seyr neke, di maneya kamil de mirov nikare ji tehsîla manewî bipeyive. Ji bo însan li hemberî hukmranîya îlahî ya Rebbê me ya ku wî hemû cîhazên cemadat, nebatat, heywanat û însanan wek ji hev re lihevhatî, guncaw û di nav ahengeke mûdhiş û tenasubê de aferandine heyran bimîne, şert e ku ew bi qelbê xwe hevkêşîya ekolojîka li kaînatê û îhtîşama nîzama îlahî îdrak bike..

Her heyber divê dilên mûmîn bi ser van fikran ve bajoyê. Mesela însan, dema însan li şope-telîya xwe bi xwe jî binêre, bila aferandina bêdawî ya Heq û ezameta qudreta teswîra wî mûşahede bike. Divê ew karibe ji naverok û mûhtewaya van tecellîyên îlahî ji xwe re nesîbên derûnî wergire. Bes bi xêra îdrakeke di vê sewîyê de, hemû kaînat, dikare bibe kitêbeke ku sirr û hikmetan eşkere dike.

Pêzanîna her hadîse û bûneke li kaînatê ka ji kîjan navên îlahî tecellî kiriye, maneya wê ev e; zanîn bilind bûye û gihaye sewîya marîfetê. Ji xwe zirweya zanîna beşerî jî ev e. Fehmkirina mûrada îlahî ya di van tecellîyan de jî, halê keşf û kerameteke xusûsî ya evdên welî yên Heq e..

Mûmînên kamil jî dilê xwe li ser esma û sifetên îlahî himbiz û teksîf dikin, şexsîyet û karekrêrên xwe bi tefeyyuza ji wê serkehnîya îlahî pêktînin û bi şiûr û hesta ku çêdibe ew bi mehebbet û rizaya Xuda wasil bibin, dijîn.

Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

“**Esmau’l-husna** (navên ji hemû navan sipehîtir) **yên Xuda ne. Naxwe bi wan navên sipehîtir, dûa ji Wî bikin..**” [221]

Mûfessir **Bûrsewî** di tefsîra vê ayetê de wiha dibêje:

“*Bi nav û sifetên Xuda xwedan sifet bibin û bi awayê xwedan exlaqbûnê dûa ji Xuda bikin. Bi wan sifetan xwedan sifetbûn jî, bi amelê meqbûl û nîyetên salih mûmkin e.*

*Mesela bi sifetê rizqîyetê (rizqbexşîyê) xwedan sifetbûn, bi belavkirina hinekî ji rizqên ku Xuda dane li ser hewcedaran, bi tiştek jê neveşartinê û li ser hevkom nekirinê (yanî bi xwe parastina ji nemerdî û îsrafê) çêdibe. Sifetên din jî li ser vî qiyas bike.*” [222]

## er-REZZAQ..

Bi rastî tekane tişta ku Cenabê Heq têde xwe ji hemû mexlûqatan re kiriye kefîl û ew kirine aîdê xwe, rizq e. Hîç ti candarek heta rizqê xwe temam neke, namire. Ji lewma bi xwe re hilgirtina fikar-kirina ji rizqê xwe, ji hesta îmanê re berevajî ye. Çawa Xuda di ayeta pîroz de wiha dibêje:

“**Rizqê her candar ê ku li sererdê birêve diçe, bes li ser Xuda ye. Xuda, cihê ku ew candar lê radiweste û wî mekanê ku wê di dawîyê de wî lê deyne jî dizane**..” [223]

Rebbê me, di her gav û anê de ji bo hemû mexlûqatên xwe bi sifreyên bêjimarên îlahî rizqê wan îkram dike. Zêdebarî vê Rebbê me yê ku Rezzaq e, li sererdê ji bo her cins mexlûqatê xwe sifreyên

221. E‘raf, 7/180.
222. Bûrsewî, Rûhû’l-Beyan, cild, VI, rûp. 446, Weşanên Erqam, Îstanbûl.
223. Hûd, 11/6.

cuda cuda radixe. Mesela ew tişta ku mêşinek dikare bixwe, mirov nikare gellekan ji wî bixwin. Tişta ku însan jî dikare bixwe, mêşin nikare gellekan ji wî bixwe. Yanî nîmetên rizq jî li gorî tenzîm û teqsîmeke hessas a îlahî hatine lutfkirin.

Em jî di her luqme û parîyê ku dixwin de divê em van îkramên îlahî bînin bîra xwe, em bi besmelê (Bismillahîyê) dest bi xwarinê bikin, bi hemdelê (el-Hemdûlillahîyê) dawîyê lê bînin û em ji Rebbê xwe re daîmî di nav hestên şukranê de bibin. Heta divê em ğeyretê şanî bidin ku bi awayê têrxwarin-kirina zikbirçîyan û av îkramkirina ji tîyan re bibin wesîla xêrê ji bo rizqê xwe bidestxistina mexlûqatan.

Lewra şukirê ji nîmetan re bi du awayan e:

**Ya yekê**; bi îdraka ku hemû nîmet lutfa Xuda ne, lefzen, yanî wek bi peyvê şukir-kirin e. **Ya duduyan**; îkramkirina wan nîmetan e, ji bo mirovên ku ji wan mehrûm bin. Ev jî şukirekî fiêlî ye ku mûtleq e, îfaya wê lazim e.

Ev qisse, vê ufûqa îmanê çi xweş xulase dike:

**Hezretê Şeqîqê Belxî**, ji bo karibe debara xwe temîn bike qerar pê dide ku ticaretê bike. Ji bo vê jî pêwîst bû biçûya welatên dûr. Berî jê cuda bibe jî rêya xwe bi dostê xwe yê ku zehf jê hez dikir û hurmet jê re digirt, Îbrahîm bin Edhem dixe, li hev helal dikin, piştre jî diderkeve rê. Lêbelê Şeqîq ê ku dihate zenkirin ewê heta mideteke dirêj neyê dîtin, piştî çend rojan ji nişkave derket û hat. Çi dema Îbrahîm bin Edhem Şeqîq'î li mizgeftê dibîne, bi heyret jê dipirse, jê re dibêje:

"-Çima tu zû vegerîyayî?" Şeqîqê Belxî jê re dibêje:

"-Min di rêwîtîya xwe de tiştekî ecayîb dît, ji bo wî ez zû vegerîyam."

Çi dema Îbrahîm bin Edhem jê re got:

“-Înşaellah xêr e, te çi dît?” Şeqîq jê re wiha got:

“-Di esnaya rêwîtîyê de min xwe da kenarekê ji bo bêhna xwe vekim. Min li wir çûkekî kor û kulek dît. Dema ez difikirîm û min ji xwe bi xwe re got; «gelo ev çûk bi tena serê xwe çawa li vir dijî, çi dixwe, çi vedixwe?» Piştî bîstikekê çûkekî din ji nişkave derket di devê xwe de jê re xwarin hilgirtibû anîbû. Ev çend caran wiha dubare bû. Vêca min got; «Ellah li vê devera bêkes û bêkûs rizqê vî çûkî dide, helbet ewê rizqê min jî bide û hêza wî ji bo vê heye.» û ez vegerîyam hatim.”

Vêca Hezretê Îbrahîm bin Edhem jê re wiha dibêje:

“-Ya Şeqîq, ez li te dimînim heyirî! Çima te xwe xiste şûna çûkekî şel û şehtê ku bi arîkarîya dîgeran dijî û tu nefikirî xwe bixî şûna wî çûkê ku hem ji bo xwe kar dike, hem jî bazdide, bi hewara ketîyan ve jî diçe?!”

Vêca Şeqîqê Belxî ji van peyvên wî heqîqetê fehm dike. Derhal radibe ser xwe, destê Îbrahîm bin Edhem radimûse û bi şûn de vedigere ser ticareta xwe.” [224]

Ha ev e ğeyreta jîyîna exlaqê îlahî, ji malbata xwe re, ji lêzimên xwe re û ji derdorên xwe re îkram dike. Ew fezîleteke wilo ye ku însanî digihîne mehebbet û rizaya Heq. Mûmîn jî, di mijara rizq de divê xwe bi dest têgihiştinên şaş ên tewekkulê ve bernede û heta qeweta wî hebe divê her hewl û ğeyretê şanî bide û bi vî awayî divê hewl bide vê fîrasetê qezenc bike ku ji rizqê xwe bêhtir li pey Rezzaqê xwe be.

224. Yûsuf el-Qeredawî, Problema Xizanîyê û Îslam.

## MALÎKU'L-MULK..

Rebbê me **Malîku'l-Mulk** e; ew ji bo hemû mulkî xwedî û hukmdarê rasteqîne ye. Ew çawa bixwaze, di mulkê xwe de wilo teserrufatîyê dike. Ew kê bixwaze, ji mulkê xwe zehf didiyê û ew kê bixwaze jî ji mulkê xwe hindik didiyê. Lêbelê ew her kesî jî bi qasî nîmeta ku dabiyê, jê berpirs digre.

Hezkirina ji dinyayê û hirsa qezenckirina mal, yek ji wan xusûsa ye ku ji her tiştekî din bêhtir dilan dixe ğefletê. Rebbê me yê mezin vê zeîftîya însanî, wiha eşkere dike, dibêje:

"**Herçî însan e, dema Rebbê wî, wî îmtîhan bike, îkramê bidiyê û zehf nîmetan bidiyê, dibêje**; «**Rebbê min, îkram da min**.» **Lêbelê dema wî îmtîhan bike û rizqê wî teng bike jî dibêje**; «**Rebbê min, ez biçûk xistim**.»" [225]

Dostên Heq bi awayekî layiq îdrak û fehm kirine ku mal û mulk dibe ku bi xwe re hem seadetê, hem jî felaketê bîne û zengînî jî û feqîrtî jî îmtîhaneke îlahî ne. Ew di nav vê fîrasetê de dijîn ku di herdu rewşan de jî manen bi qezenc derkevin. Dema Cenabê Heq nîmetên xwe (ji bo wan) zêde dike; xwe ji îsraf, nemerdî û serxweveçûnê diparêzin û zanin wan di rêya rizaya Heq de bikar bînin. Dema Xuda nîmetên xwe (ji bo wan) kêm jî dike, ew dihizirin ku ev jî ji bo wan xêr e. Lewra ew di bîra xwe tînin ku serweta dinyayê ji bo gellek mirovan sersebebê fitne û mûsîbetê ye, ji bo halê xwe şukir dikin û bi hizûra dilî lezzeta sebrê dijîn..

Mûmîn jî bi vê hestê, divê qenaeta xwe bi teqsîmata îlahî bîne û jê re riza û teslîmîyetê şanî bide û xwe bi îhtîrasên nefsanî ji binpêkirina tixûbên îlahî û çavê xwe berdana mal û mulkê ku ji dîgeran re hatiye teqdîrkirin, biparêze. Divê ew jibîr neke ku

225. Fecr, 89/15-16.

xwediyê heqîqî yê mal û mulk Ellah e; divê ji bîra xwe nederîne ku ew mulkê jê re hatine teqdîrkirin emaneteke ewê ji bo mideteke berwext were bikaranîn. Vêga jî ji bo hinek mulkan “mulkê dewre” tê gotin. Haleveku dema bi nezara îmanê were meyzandin, hemû mulkên fanî mulkê dewre ne.

Di esasê xwe de mûmînê ku dilê wî bi mehebbeta Xuda tije be, di nav vê îdrakê de dibe ku di rastîyê de ew ne xwediyê tiştekî ye. Lewra ji ber ku mehebbet, fedakarîyê pêwîst dike, bi malikîyeteke haris û çikûs, yanî bi arzûya xwedîtîyeke nefsanî re hîç li hev nayê. Hezker, di ber hezkirîyê/ya xwe de dest ji her tiştî berdide. Çawa ku mûmîn, çi qeder di rêwîtîya Heq de ewa ku ji îmanê diçe îhsanê de mesafê qut bike, pîvanên wî yên di nêrîna li dinyayê de jî di aynî dehm û paralelê de sewîyê qezenc dikin:

Mesela, di **şerîet**ê de ku biçûktirîn sewîya ferman û qedeğeyên îlahî ku li ser gelemperîya însanîyetê hatine teklîfkirin û barkirin ev têgiha derbasdar e; “**malê te ji te re ye, malê min jî ji min re ye**.”;

Di **terîqet**ê de ku ew rêya gihana manewî ye û kesên ku bi qelbê xwe amade bin pêve diçin jî ev cîhetê nêrînê mahîyeta fedakarîyeke bi vî şeklî; “**malê te ji te re ye, malê min jî ji te re ye**” qezenc dike.

Ji vê biwêdetir jî di keş û hewaya heqîqetê de ku evdên bijarde yên Heq dikarin bigihinê, digihîjin vê teleqqî û wergirtinê; “**ne malê te malê te ye, ne jî malê min, malê min e; tev yê Xuda ye!**”

Mirovekî ji **Hezretê Îbrahîm bin Edhem** xwestibû ew şîretan lê bike, wî ev peyvên manedar jê re gotibûn:

“*Heke tu gunehan bikî qene nîmetê Xuda nexwe! Ma rewa ye ku mirov wî rizqê Heq lutf kiriye bixwe, hem jî bibe îsyankar?! Ma rewa ye ku mirov di milkê wî de rûne û soza wî negire?!*”

Rêwîyê Heq, divê di ronahîya van heqîqetan de daîm wezîyeta xwe di ber çavan re derbas bike. Zêdebarî vê jî, divê ew jibîr neke ku di mal û milkê jê re hatiye teqdîrkirin de mafê hewcedaran jî li ser wî heye. Çawa Xuda di ayeta pîroz de wiha dibêje:

“**Ji sailan** (ew feqîrê ku dikare îhtiyaca xwe erz bike) **û mehrûman** (ew hewcedarê ku ji îffeta xwe naxwaze) **re di serweta wan** (zengînan) **de heqek** (pêzan û malûm) **heye**.” [226]

Dîsa mûmîn bi sirrê ayeta; “..**Tu wan ji sîmayên wan nas dikî**..”[227] digihe û divê ew bigihîje vê fîrasetê ku hê lizûm pê çênebûyî biradînê wî jê bixwaze jî ew wî ji sîmayên wî nas bike.

## el-MÛMÎN..

Sifetek ji sifetên Cenabê Heq jî **el-Mûmîn** e. Rebbê me, ev sifetê xwe bi awayê ku ji bendeyên xwe yên ehlê îmanê re layiq dîtiye, arzû dike ku bendeyên wî jî bi qasî amadekarî û îstîdada xwe vî exlaqê îlahî bijîn.

**El-Mûmîn**; bi maneyên wekî van tê; di dilên “**mûmîn**” de nûra îmanê dide beriqandin. Kî xwe bavêje ber penaha wî, emanê dide wan. Ew wan di nav emnîyetê de digre û wan diparêze. Ewê ku hizûr û aramîyê dide wan. Ewê ku sedaqet û rastgotinîya xwe û pêğemberên xwe derdixe meydanê. Ewê ku ji soz û peymana xwe venagere. Cenabê Heq, her wekî navên cemalî yên dîgerên xwe arzû dike em bi sifetê wî yê “mûmîn” jî sifetmend bibin. Ew qeder ew vî sifetê xwe ji bo me arzû dike ku ji me bendeyên xwe re dibêje; “**gelî mûmînan!**” û bi peyva mûmîn bi me re diaxive. Bi

226. Zarîyat, 51/19.
227. Beqere, 2/273.

vî awayî bi me dide hînkirin ku divê em bi şexsîyet û karaktêreke ji vî sifetî layiq re dînê xwe temsîl bikin.

Ji bo bicihbûna sifetê **Mûmîn** di dil de elametê ji hemû elametan mezintir jî ev e ku bende daîm xwe di bin kamerayên îlahî de his bike û karibe bi her halê xwe ji bo dînê xwe bibe temsîlkar û nûnêrekî baş û sipehî. Bi vî awayî karibe îmanê di dilan de fetrîm bike, merhemetê tewzî bike, xwe û hawîrdorên xwe ji her cure xirabîyan mûhafeze bike û îtîmad û emnîyetê (pêbawerîyê) bide hînkirin û telqînkirin.

Çawa dema hate pirskirin, hate gotin; "bi fezîlettirînê misliманan kî ye?" **Mezinê me Pêğember** ev bersiv da, got:

"*Ew kes e ku misliman (ên din) ji zimanê wî û ji destê wî di emnîyetê de bin.*" [228]

Bi berevajî vê, di bara kesên ku li ser sozên xwe namînin û ewleyî li wan nabe de jî gellek îqazên dehşetdar ên Mezinê me Pêğember mewcûd in. Di bara van herduyan de jî dibêje:

"*Ew kesê ku cîranê wî ji xirabîyên wî ne di emnîyetê de be, naçe cennetê.*" [229]

*"Ew kesê ku emanetê (pêbawerîya) wî nebe, îmana wî jî nîn e.*" [230]

Êminî nedana mûmînekî ji bo derdorên xwe ji bo zeîftîya îmana wî heta windakirina wî ji bo hessasîyeta îmana xwe, îşaret e. Êdî di wî de sade navê mûmîntîyê maye, naveroka îbadetan hatiye valakirin, li pey wî sade menzarayeke bêsemîmîyet maye.

228. Buxarî, Îman, 4, 5, Rîqaq 26.
229. Mûslim, Îman, 73.
230. Ehmed, III, 135.

Çawa **Hezretê Ûmer** îfade kiriye ku îbadet bi xwe jî di zemîna exlaqê xweş de qîmetekî wan heye. Wî ev heqîqet wiha çi xweş anîye zimên:

“*Li nimêja ku kesek dike û li rojîya ku ew digre, nenêrin. Dema ew diaxive gelo rast dibêje, dema tiştek jê re tê emanetkirin gelo ji emanetê re rîayet dike, dema ew meyla xwe dide dinyayê gelo helal-heramê li ber çavan digre, ha li van binêrin.*” [231]

Divê em jî di nav cehd û xebatê de bin ji bo para xwe ji sifetê Rebbê xwe “el-Mûmîn” wergirin û karibin bibin ji wan mûmînên kamil, ewên ku Xudayê me ji wan razî dibe û ji wan hez dike.

## es-SABÛR..

Rebbê me, zehf bi sebr e. Ji bo întîqam standina ji bendeyên xwe yên gunehkar lezê nake. Bi berevajî vê, ji bo ew berê xwe bidin tobê û rewşa xwe îslah bikin, ew bi sebr firsendên bêjimar ji wan re lutf dike û mohletê her dide wan.

Divê mûmîn jî li hemberî ezîyet û cefayên ku di rêya xizmeta dînê wî de têne serê wî sebrkirinê zanibe û hewl bide ku ji vî sifetê îlahî para xwe wergire. Divê ew êciz nebe û bi lezûbez hukm nede. Divê ew gilehkirin û zarînê terk bike. Divê ew di dema bi her dijwarîya xwe ve hatina mûsîbetan de jî selametîya di dawîya sebrê de bifikre û aramîya dilî ya xwe biparêze.

Ewê ku rizaya Rebbê xwe dixwaze, pêşî divê ew bi xwe ji teqdîra Rebbê xwe re ya di bara xwe de razî be. Kî di rewşa razîbûna bi teqdîra Xuda de bijî, ewê tim û daîm di bin tecellîyên rahma îlahî de bibe. Welew ku ew di nav nexweşîya giran û êş û îzdîraban

231. Beyheqî, Sunenu’l-Kubra, Darû’l-Fikr, st. VI, 288; Şûebû’l-Îman, IV, 230, 326.

de be jî.. Lewra Xuda her dem ji bo wî yar û arîkar e û di dawîyê de Xuda dê mûkafatê bide wî. “ /çi xweş bende bû.”

Di vê xusûsê de rewşa **Eyyûb** nimûneyeke sipehî ye. Lewra wî, li hemberî îbtîlayên ji tehemmulê biwêdetir ku hatibûne serê wî bi sebr û teslîmîyeteke mezin pêşwazî kirine û ji teqdîra Heq re riza şanî daye. Cenabê Heq jî di bara wî de gotiye: “**çi xweş bende bû**.”

**Welhasil** di her mijarê de sebr lazim e: Di îbadetê de, di mûamelatan de, di hebûnê de, di nebûnê de û di yên wekî van de.. Lewra li heyatê her tişt, ji bo îmtîhana îlahî alev û melzeme ye. Ji bo vê, bi taybetî divê em hewl bidin di îstîqameta fermanên Kîtab û Sunnetê de karibin bijîn û îcab dike ku mirov di xizmeta banga Heq de neweste, bêzar nebe û di her sefha heyatê de bi sebr be.

Dostê Heq **Hezretê Hatemê Esam** wiha gotiye:

“*Mûhîmtirîn nuqta tecrûba exlaqê xweş, sebrkirina li hemberî ezîyetan û tehemmûlkirina kulfetê (mesûlîyet û berpirsîyê) ye. Gilehkirina ji xuyên xirab ên dîgeran, delîla exlaqê xirabê mirovî bi xwe ye. Lewra exlaqê xweş, di aynî zemanî de xwe dana ber ezîyeta ye.*” [232]

Ew mûmînê ku zanibe dinya fanî ye û sebrkirina li hemberî cefayên li wir wê bibe sermayê seadetê jî, barê mûsîbetên ku bi wan re rûbirû dimîne naxe qelbê xwe, mûwazena xwe li hemberî şertên guhêrber ên heyatê xirab nake û rota’ya dilê xwe ji rizaya Rebbê xwe pê ve nade alîyekî din..

232. Îhya, III, 161.

## el-KERÎM..

Rebbê me heta tu bibêjî bes comerd e, xwedî lutf û îhsana mezin e. Li cem Xuda xwedî kerem bûn, yanî bi qîmet û bi îtîbar bûn jî bi kerîm-bûna li vê dinyayê, yanî bi comerdbûnê ve bend e. Çawa dema ji **Îbnû Ebbas** hate pirsîn, hate gotin:

"-Kerem çi ye?" Wî ev bersiv da, got:

"-Wekî ku Ellah Teala di Qur'ana Pîroz de gotiye;

«..**Bêşiwar li cem Xuda bi keremtirînê we** (bi qîmettirînê we) **ew e ku zehf ji wî ditirse**..» [233] halê xwediyê teqwayê ye." [234]

Ew mûmînên ku para xwe ji navê îlahî yê "el-Kerîm" wergirtine, nabêjin; şev û roj e, bi awayekî bi dizî û bi eşkerehî her dem û gavan înfaqê dikin û dilên xwe adeta dikin sebîl. **Hezretê Ûmer** di wextên şevê de çiwalê ard didanî ser pişta xwe û li taxên feqîran digerîya. **Hezretê Zeynelabidîn** di tarîtîya şevê de erzaq ji feqîran re dibir, ji lewma di pişta wî de birîn mabûn, ev sade du mîsal in ji bo ufûqa kerema dostên Heq.

Cenabê Heq di ayeta pîroz de dibêje: "**..Wekî ku Xuda îhsan li te kiriye, tu jî wilo (li însanan) îhsanê bike**.."[235] Bi vê ayetê eşkere kiriye ku ew comerdîyeke wekî ya xwe arzû dike wê di bendeyên xwe de jî bibîne. Ji lewma mûmînê ku dixwaze exlaqê îlahî bijî, divê hewcedaran jî ji nîmetên di dest xwe de bide feydedarkirin. Divê ew bi destê xwe, bi zimanê xwe, bi halê xwe, bi qalê (peyvê) xwe, welhasil bi hemû îmkanên xwe yên maddî û manewî wek di halê îkramê de li rizaya Heq bigere. Çawa Rebbê

233. Hucûrat, 49/13.
234. Îhya, III, 123.
235. Qeses, 28/77.

me ji bo mirovên di nav lêgerîneke wiha de vê mizgînîyê dide û dibêje:

“**..Bêşiwar Rahma Rebbê te ji yên ku qencîyê dikin, zehf nêzîk e**.” [236]

## er-RAHMAN, er-RAHÎM..

Ji bo mirov ji navên **Rahman** û **Rahîm** ên Cenabê Heq, para xwe wergire û karibe bi vî exlaqî bijî; ev jî bi vê mûmkin dibe ku mirov bi kuderê bigihîje, rahmê li wê derê tewzî û belav bike. Lewra merhemet, guzîdetirîn meyweya îmanê û encama pêşî ya wê ye ku ev jî lazim dike mirov ji bo mehrûman bibe penahgeheke şefqetkar û êwirgeh. Di Qur’ana Pîroz de ji esmayên îlahî yên ku pêşî derdikevin pêşberî me **Rahman** û **Rahîm** in. Besmela di serê Sûretê Fatîhê de-heke çi qeder em qebûl bikin ku ev ayet di sûretekî din de derbas bûye- û li vir ji bo teberrûkê hatiye qeydkirin jî lêbelê di wî sûretî de jî pêşî dîsa navên **Rahman** û **Rahîm** ên Ellah derdikevin pêşberî me.

Mûmînekî ku bi awayekî layiq para xwe ji tecellîyên Rahma Xuda wergirtibe, ew nikare li hemberî feryada hîç mexlûqatekî di serî de jî feryada însanî çi ya bideng be, çi jî ya bêdeng be, bêgane bimîne; çi arîkarî ji dest wî were, ew nikare wê ji ber mexlûqan bigre û nede wan.. Çawa dostê Heq **Hezretê Mewlana** bi para xwe ya ku ji vî exlaqê îlahî wergirtiye, dibêje:

“***Şems*** *-quddîse sirûh- tiştek li ber min hîn kir: «Heke li dinyayê serma bide mûmînekî tenê jî heqê xwe germkirinê ji te re nîn e.» Ez jî dizanim ku li sererdê mûmînên li ber sermayê hene; êdî ez jî nikarim xwe germ bikin!..*”

236. E‘raf, 7/56.

Dîsa **Hezretê Şemsê Tebrîzî** hessasîyeta wijdaneke wilo li Mewlana hîn kiribû ku ji ber serma-dana bendeyên Xuda, dilerizî. Bi rastî germbûna bedenê bi cilan mûmkin e. Lêbelê ji bo wijdan karibe germ bibe, ev jî bes bi hereketên tezahurê merhemetê û bi nêzîkbûna qelb ji Xuda ve bend e.  Ev mîsal, wekî şablonekê ye ku divê mexlûqat wê li hemberî her cure mehrûmîyetê bikarbîne. Ji ber vê îcab dike ku berî bedenan wijdan, li hemberî menzarayên her cure felaket û sefaletê bilerizin. Ev lerzeyên wijdanî yên ku bi vî awayî li ser rasta Heq hatine siwarkirin wê dilan germ bikin û wan di hizûrê de ğerq bikin.

Bêşiwar ev hal, ji bo ufûqa cîhanşimûla merhemetê tezahurek e ku divê mûmîn ji ber Aferînerê wan li hemberî hemû aferîndeyan ji wê merhemetê re xwedî bin. **Mezinê me Pêğemberê Rahmê** ji eshabê xwe re îfade kiriye ku ji bo ew karibin herin cennetê divê ew bi merhemet bin. Lêbelê divê ev merhemeta wan ne ji hev û din tenê re be; feqet divê ew merhemeta wan li ser hemû mexlûqatan şamil were û ew hemû bikevine berê (ti mexlûqek jê mehrûm nemîne).. [237]

Dîsa mîsalek ji tezahurên merhemetê yên bêjimar ku li ser hemû aferîndeyan şamil tê, eşkere kiriye ku jineke gunehkar hebûye, sekekî ji têhna xwe dikir bimre, wê jinê av dayê (û ew ji tehlûka mirinê xilas kir) ji lewma ew ji bo efûya îlahî nail bû. Li hemberî vê jineke din hebûye, guh nedabû birçîbûna kitikekê û bûbû sersebebê mirina wê. Ev jin jî bi sebeb bêmerhemetîya xwe ji bo cehennemê dûçar bûye. [238]

Bi vê sebebê îcab dike mirov nebêje; ev guneh û ev sewab biçûk e, yan mezin e û wan ji hev cuda neke û mirov hîç yeka tenê ji wan nemûhîm nebîne. Lewra rahma Xuda û ğezeba wî jî hinek

237. Binêrin. Hakim, IV, 185/7310.
238. Binêrin. Buxarî, Enbîya, 54; Mûslim, Selam, 151, 154, Birr 133.

caran ji bo tiştên ku mezin têne dîtin, hinek caran ji bo tiştên ku weset têne dîtin û hinek caran jî ji bo tiştên ku biçûk têne dîtin, tecellî dibe. Naxwe wezîfa ku dikeve ser milê evdî jî ev e ku di her hal û rewşê de bi fîraseta îmaneke kûr tevbigere.

Li alîyê din, Rahm û merhemeta Rebbê me zora xezeba wî biriye. Wate Ew, çendîn bendeyên xwe yên gunehkarên ku cezayî heq dikin, di netîca toba semîmî ya wan efû dike û dîsa ji bo qencîyên biçûçik ên bendeyên xwe jî bi comerdîyeke ji şanê ulûhîyeta xwe re layiq, ecreke zehf zêde îhsan dike. Divê mûmîn jî daîm bi vê uslûba rahmê tevbigere; divê ew her hewl bide ku bibe xwedî rûhekî ne helak-xwaz û têkdaner, lêbelê divê bibe xwedî rûhekî îhyakar, bunyadner û hêşînkar.

**Ebûhûreyre**, mîsaleke jîyîna vî exlaqê îlahî wiha diguhêze, neqil dike:

“Me di ğezwekê de ji **Resûlê Xuda** xwest ku ew ji bo tinebûna kafiran nifiran bike. Wî jî got; «*ez, ne ji bo lanetkirinê lêbelê; ez wek rahm hatime şandin.*»”[239]

Dîsa Rebbê me Resûlê xwe bi vî awayî teqdîm û teltîf dike: “..**Ew ji bo mûmînan Raûf** (heta tu bibêjî bes bi şefqet) **û Rahîm** (heta tu bibêjî bi merhemet) **e.**” [240] Yanî Rebbê me Raûf û Rahîm ên ku ji navên wî ne, eşkere dike ku ew ji sifetên bariztirîn ên Resûlê wî Mûhemmed in jî.

Divê em jî wek mûmîn dilê xwe bikin dergehê rahmê û em ğeyretê şanî bidin û di her firsendê de îsbat bikin ku em bendeyên **Rahman** in û ummeta **Pêğemberê Rahmê** ne.

239. Mûslim, Birr, 87.
240. Tewbe, 9/128.

**Rebbê me, me tevan bike ji wan bendeyên xwe!; ewên ku bi awayekî layiq hemû nav û sifetên îlahî li ser xwe tefekkur dikin, bi exlaqê xweş ê ku ew pêwîst dikin, dijîn û bi vî awayî digihin keş û hewaya mehebbet û dostanîya îlahî.**

**Amîn..**




# *Jîyîna Exlaqê Îlahî -2*

*Ew rûh û gîyanê menfîetperest û xwedbînê ku îro îradeya efûkirina bendeyên Xuda şanî nade, gelo ewê sibê bi çi rûyî li hizûra îlahî efûyê bixwaze?! Îlletê efûnekirinê, serkehnîya wî ğefleta însên bi xwe ye. Lewra esil xwediyê efûyê Cenabê Heq e. Mûmîn jî bi qasî mehebbeta Xuda ya di dilên xwe de karin efû bikin. Dostên Heq ku bi vî exlaqî dijîn jî, nefreta xwe ya ji gunehan naguhêzin gunehkaran. Ew gunehkaran wek çûkekî birîndar qebûl dikin û di seraya dilê xwe de ji bo îrşad û îslaha wan kar dikin.*

*Rebbê me ji bo xatirê navê xwe yê Settar, çendîn gunehên me bendeyên xwe nixumandine û ew di qelb de kirine nuqteyên reş. Ev jî ji mezinatî û bilindîya wî ye, ji merhemet û lutfa wî ye. Lewra heke şûna gunehên ku hatine kirin ne di qelb de; lêbelê di enîyê de di sûretê leke û deqeke reş de xuya bûbana, bêşiwar wê hîç rûyê ti kesî nebûya ku li dîgerê xwe binêre.*

# JÎYÎNA EXLAQÊ ÎLAHÎ -2

Me di nivîsa xwe ya berî vê de ehemmîyeta sifetmendbûna mûmînê rastî bi qasî îstîdad û taqeta wî bi sifetên cemalî yên Cenabê Heq dîyar kiribû û me di bara hinekan ji wan sifetan de jî hinek îzahat kiribûn. Emê di vê nivîsa xwe de jî behsa hinek sifetên cemalî yên dîger bikin û emê li ser vê mijara xwe berdewam bikin:

## el-WEDÛD..

Navê Rebbê me **el-Wedûd** bi maneya “ewê ku zehf hez dike” û “ewê ku zehf tê hezkirin” tê. Cenabê Heq, bi sebeb mehebbetê kaînat aferandiye. Heke li kaînatê nesîbek ji tecellîyên vî sifetê îlahî nebûya, ti kesî ji ti kesî hez nedikir; hîç ti dêyekê li zarokê/a xwe nedimeyzand û ew xwedî nedikir. Rebbê me wek berhemeke rahma bêdawî ya xwe mexlûqatên xwe bi peywenda hezkirin, mehebbetê bi hev û din ve sağlem girêdane. Çawa Mezinê me Pêğember ev heqîqet di hedîseke şerîfa xwe de jî daye zanîn ku Cenabê Heq rahma xwe ji sedan yeka tenê jê li ser erdê peya kiriye. Heta dema mehînek ciwanîka/ê xwe şîr dide ji bo ezîyetê nede ciwanîka/ê xwe

lingê xwe bi jorê ve radike, ev bizava mehînê jî ji wê rahma îlahî ye ku ew yeka tenê ji sedê ye. [241]

Ji lewma serkehnîya mûtleqa bawerzîna hemû rahmên di heyberên aferandî de, Cenabê Heq e. Dema em bi vî çavî binêrin, em li kaînatê li tecellîyên bêjimar ên ku berhema mehebbeta îlahî ne, rast tên. Heta ew marên ku bi xuyabûnîya xwe mûyên mirovî didin gijkirin lê çêlîkên xwe jî bi nêrîneke mûşiq mezin dikin; dûpişkên ku çêlîkên xwe li ser pişta xwe hildigrin û dibin, heke ev heywanên ji hemû heywanan wehşîtir jî li gorî cihê xwe karibin bibin hemêzeke fereha mehebbetê, bêşiwar ew tecellîyek ji sifetê el-Wedûd ê Xaliqê me ye..

Dîsa bi bereketa mehebbeta îlahî ye ku Rebbê me, ji evdên salih ên xwe hez dike, ew ji kîjan evdên xwe hez bike jî wan bi dilên nesîbdar de jî dide hezkirin. Ew, heyata wan, di piştî temenê mirok ê wan de - bi nesîhetên hikmetdar ên wan û bi qisseyên îbretdar ên wan- di dilan de jî dide dewamkirin.

Evdekî ku ji bo mehebbetûllahê nail bûbe, di serî de Cenabê Heq û bi qasî nêzîkbûna xwe ji Wî, her heyberî di daîreya mehebbeta dilê xwe de werdigre. Lêbelê heta mûmîn hezkirina xwe ji Rebbê xwe dernexe ser hezkirina xwe ya ji fanîyan û ji pêbendîyên wan, bi îmaneke kamil nagihe. Lewra Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

“..**Hezkirina mûmînan ji Xuda, ji her tiştî bipêşvetir û bi qewettir e**..” [242]

Bi vê sebebê însan, divê hezkirinên beşerî lêbelê hezkirinên meşrû û rewa yên wekî hezkirina zar û zêçan, dê-bavan, bira û dost û hevalan di dilê xwe de di sewîya layiq de bigre. Di rewşeke

241. Binêrin. Buxarî, Edeb, 19; Mûslim, Tewbe, 17.
242. Beqere, 2/165.

berevajî de evên ha wê ji “nîmet”bûnê derkevin û bibin “fitne” û ewê qelbî jî li fesad û xirabkirinê bixin.

Dê-bav, mêr û jin ewlad û hemû îmkanên ku em ji wan re xwedî ne, lutfeke mezina Cenabê Heq in, ji bo me evdên wî. Lêbelê hemû hezkirinên ji van, divê ji bo xatirê Heq bin û ew di rêya Heq de bin. Lewra ew kesên ku dilê xwe ji bo sipehîtîyên berwext ên fanîyan bi esîr kiribin, ewê ji mehebbeta îlahî ya ku serkehnîya hemû sipehîtîyan e, mehrûm bimînin.

Mehebbet û eşq jî ku dijwarbûna wê bi awayekî wilo ye ku êdî dorê li hemû hebûnê bigre, ew jî du beş ên wê hene; eşqa **heqîqî** û eşqa **mecazî**.. Eşqa heqîqî, ji mehebbeta Ellah îbaret e û ji bo rêya gihiştina Heq mezintirîn sermaye ye. Eşqa mecazî jî hezkirina ji mexlûqekî ye û bi wî ve bendbûn e. Di esil û esasê xwe de hezkirin û mehebbet ên ku di nav pîvanên rizaya îlahî de werin jîyîn jî, ji bo mehebbeta heqîqî pêpelingek e, di mahîyeta wan meşq û hîndekarîyan de ye ku îstîdad û amadekarîya dilî zêde dikin. Serpêhatîya mehebbeta di navbera **Leyla** û **Mecnûn** de ji bo vê nimûneyeke şaheser e.

Heke dilê Mecnûn, bi Leylayê ve daleqandî bimana, ew, wê ji bo wî bûbana pûtek. Lêbelê Leylayê ji bo Mecnûn roleke berwext leyist. Piştî wê qelbê Mecnûn anî ser qiwameke wilo ku karibe ji bo evîna îlahî bibe mûxateb, êdî Leyla ji çavan ket. Mecnûn digel ku ji bo Leylayê derketibû rê jî lêbelê ew li wir nema û dîrayeta ku berê dilê xwe bide alîyê Mewlayê xwe şanî da û ew ji bo Heq bû aşiq. Ew ji hemû peywendên fanî û îzafî yên dîger azad bû. Bi vî awayî ew bû ku êdî ji hezkirîyê xwe pê ve tiştekî din nedifikrî û nedidît. Lewra li hemberî lezzeta manewî ya mehebbeta îlahî, hemû zewq û lezzetan di nezara wî de bihayê xwe winda kir.

Ha va ye ew kesê ku bi mehebbeta îlahî mest bûbe, ji esareta cazîbeyên fanî û ji hesedkirina ji tiştên di dest mirovan de xilas

dibe. Bi vî awayî ew bi kemal û menzila meqsûd digihe. Ev jî eşqa safî û hubba îlahî ye.

**Welhasil** hemû mehebbet, bi qasî meqbûlîyeta wê heybera ku berê xwe dabîyê, meşrû û bi qîmet e. Bes bila mehebbetên mecazî ji bo qelb nebin rawesteka dawîn û bi xusrana wê bi encam nebin! Esil tehlûke, mirov nêzîkatî û îltîfatê ji bo wî/wê şanî bide ku ji bo mehebbetê ne layiq be. Lewra her însan, bi qasî lîyaqeta wê hebûna ku di heyatê de jê hez dike ji bo vê mehebbetê, sewîyekekê qezenc dike. Ji hêla maneyê ve di bilindbûn û nizmbûna însanî de bi qasî mehebbetê, bikaranîna ziddê wê xusûmetê jî tesîreke zehf mûhîm îcra dike. Heke mirov karibe berê mehebbeta xwe bide yê/a jê re layiq be û berê xusûmeta xwe jî bide yê/a jê re mûsteheq be, hingê ev mehebbet û xusûmet xwediyê xwe abad dikin. Lêbelê bi berevajîyê vê heke mirov berê mehebbeta xwe bide yê/a jê re ne layiq be û berê xusûmeta xwe jî bide yê/a jê re ne mûsteheq be, ev jî bi qasî dijwarî û jidilîya însanî di vê helwesta wî de wî nizm û biçûk dike..

Di vê xusûsê de peyğama ku vê ayeta di bara apê Mezinê me Pêğember de nazil bûyî:

“**Bila herdu destên Ebûleheb şeht bibin! Şeht jî bû!**” [243] dayî ev e; zerûrî ye ku em berê nefreta xwe bidin mirovê ku jê re mûsteheq be û bi vî awayî jî îmana xwe bigihînin kemalê.

Di ayeteke din de jî hatiye beyankirin; zerûrî ye ku însan temayula hezkirina fitrî ya xwe li ser serkehnîya mehebbetê û yê jê re layiq Cenabê Heq hesr bike û divê mirov xwe ji zîyankirina vê nîmetê di adresên din de biparêze. Xuda di ayeta pîroz de wiha dibêje:

243. Tebbet, 111/1.

"**Bibêje: Heke bavên we, kurên we, birayên we, jinên we, xizmên we, malên ku we qezenc kirine, ticareta ku hûn li kesadê ketina wê ditirsin, cih û warên ku li xweşîya we diçin bi we ji Xuda, ji Resûlê wî û ji cîhada di rêya Xuda de hezkirîtir bin, êdî çavnêrî bikin heta Xuda fermana xwe bîne.. Xuda, civaka fasiqan bi hîdayetê nagihîne**." [244]

Xwezîya me bi wan mûmînan be ku mehebbeta Xuda û Pêğemberê wî li ser her tiştî digrin û bi çîçekên sexte yên bexçên bîyanî nayên xapandin!..

## el-EFUW..

Yek ji navên dîtir ê cemalî yên Rebbê me jî navê şerîfê wî **el-Efuw** e. Cenabê Heq zehf efûkar e. Mûmînên kamil jî bi mûcibê destûra "ewê ku nizanibe efû bike, nayê efûkirin" divê li hemberî evdên Xuda zehf zêde efûkar bin ji bo karibin ji efûya îlahî re bibin layiq. Lewra ewê ku karibe neheqîyên li şexsê wî hatine kirin, adeta di hukmê "tine" de bibîne, hêrs û dilmayîneke biçûçik jî di dilê xwe de his neke û karibe efûkirinê ji bo xwe bike meleke; (ev helwesta wî) şahesera gihana (kemala) qelbî ye, mezintirîn qehremanîya manewî ye.

Dema **Hellacê Mensûr** ji terefê mirovên ku ew fehm nekiribûn ve kevir lê dihatin barandin, wî ev nîyaza ha dikir, digot:

"Ya Rebbî! Van kesên ku keviran li min dibarînin, berîya min tu wan efû bike!" Lewra ewên ku jê dipirsîn; exlaq çi ye? Ew bûbû xwedî ufûqeke dilî ya wilo ku karibe ji wan re bibêje:

"*Exlaq ev e; mirov Heq bifikire û giringîyê bi ezîyet û cefayên ji xelkê nede*."

244. Tewbe, 9/24.

Dîsa dostê Heq **Hezretê Samî Efendî** ji nû fakulteya Hiqûqê ya Darûl-Funûnê xilas kiribû. Dostekî Heq ê ku halê sipehî yê wî û sîreta tertemîza wî zehf ecibandibû, jê re got:

"-Ewladê min, ev tehsîl jî baş e, lêbelê tu li îkmalkirina tehsîla heqîqî binêre! Were, em te li mekteba îrfanê qeyd bikin, li wir îlmên dilî û sirrên axretê hîn bibe!.." Piştre ev jî li peyva xwe îlawe kir, jê re got:

"-Ewladê min, ez nizanim ka di wê mektebê de çawa perwerdê dikin, çi didin hînkirin. Lêbelê tiştek heye, ez pê dizanim, dersa pêşî ya vê tehsîlê, **neêşandin** e, dersa paşî ya wê jî **neêşîn** e.."

Neêşandina ti kesî, heke çi qeder zor be dîsa jî ew di destê mirovekî gihayî de ye. Lêbelê neêşîna ji ti kesî hema bibêje, bêîmkan e. Ji bo vê, divê însan karibe neheqîyên ku li şexsê wî hatine kirin di singa xwe de biqurpîne û bêdeng bibe. Ev marîfeteke mezin e. Lêbelê esil marîfet ev e; mirov karibe dilê xwe jî bêdeng û huş bike. Lewra bêdengkirina zimanî bi îradê mûmkin e, lêbelê di qelb de îrade nîn e; naxwe ew dîsa di dilê xwe de bi dizî diaxive û berdewam diêşe. Zalbûna li ser qelb, gihan (kamilbûn) û dîrayeteke mezina manewî dixwaze. Ji lewma neêşîn; ji bo mirov karibe ezîyet û cefaya ji bira-dînê xwe jibîr bike û karibe burûdeta/sarîtîya li hemberî wî ji dilê xwe bibe, divê mirov xwedîyê vê meharetê be ku karibe qelbê xwe bi teqwayeke bilind bide bêdengkirin. Bi vê sebebê **neêşandin**, serê rêya manewî, **neêşîn** jî nîhayeta wê hatiye jimartin.

Di vê xusûsê de ew fezîleta ku **Hezretê Yûsuf** raxistiye ber çavan zehf bi îbretdar e: Ew birayên wî ku çavnebarî ji Yûsuf kiribûn û ew avêtibûne bîrê, di piştî gellek tecellîyan de fezîleta (çêtirbûna) bilinda wî qebûl kirin û gotin; "**bi rastî Xuda tu, ji me çêtir kirî**.." Yûsuf jî adeta mêzerek avête ser wan birînên kûr ên ku di dilê wî de hatibûne vekirin û ji wan re got; "**îro şermezarî ji we re**

**nîn e**..” Piştre wî destpê kir ew dilên mehcûbên wan jî tesellî kirin û ji wan re got; “**Ellah bi merhemettirînê bi merhemetan e**.”[245]

Ji bilî vê jî mûmînên kamil, li hemberî bûyereke ku wan diêşîne, pêşî berê xwe didin mûhasebekirina nefsa xwe û ji xwe bi xwe re dibêjin; gelo em ji bo vê mûamelê mûsteheq in, yan jî ne mûsteheq in. Bi vî awayî ew ji cefayên ku ji wan re rûbirû dimînin jî, ji hêla maneyî ve îmkanên îstîfadekirinê bidestdixin. Ev qisse, vê heqîqetê çi xweş îzah dikin:

Mirovekî di wextê xwe de dest ji serserîtîyê berdabû û li heyateke salih vegerîyabû. Dema ew li dikana xwe dixebitî, zilamekî bi hêrs hatibû wir, pirs û sûalek ji wî nekiribû û bi awayekî fecî lê dabû ew birîndar kiribû. Vî serserîyê berê ne hemberîyek dabû wî, ne jî dengê îtîrazê ji wî bilind bûbû. Ew zilamê hêrsbûyî ji dikanê derket û çû, piştî saetekê bi şûn de vegerîya, jê re got; min bi şaşî li te daye, min tu mirovekî din zen kiribûyî û uzr jê xwestibû. Wî zilamî jê re got:

“-Ne xêr, di vî karî de ti şaşîyek nîn e. Min ev lêdan heq kiribû. Lewra min di wextê xwe de wekî ku te kirî bi behaneyên bêesas li gellek mirovên bêguneh dabû. Min ev mûamela te kirî ji zû de heq kiribû. Ezê li axretê wî heqê ku ji te bistînim, bidim wan mirovên ku min bi neheqî li wan dabû.”[246]

Alîyekî dîtir ê vî karî heye: Her mûsîbet, bi sebeb mûsteheqbûna ji bo wê nayên serê mirovî. Carinan jî takekesek bi mûsîbetekê re rûbirû dimîne ji bo bi mezlûmîyetê were tacdarkirin, di netîca sebrê de derecê bidestbixe û were mûkafatkirin. Heke mûsîbet hemû di netîca heqkirinê de bûbana, însan mecbûren baş dibûn û hîç ti mûsîbetek nedihate serê pêğemberan. Haleveku di

245. Binêrin. Yûsuf, 12/91-92.
246. Binêrin. Samîha Ayverdî, Mesîh Paşa Îmamî.

tarîxa însanîyetê de mirovên ku bi mûsîbetên mezintirîn re rûbirû mane, silsîleya pêğembera ye. Zêdebarî vê, wan sifetê masûmîyetê jî heye.

Divê mirov bifikre ku ew rûh û gîyanê menfîetperest û xwedbînê ku îro îradeya efûkirina bendeyên Xuda şanî nade, gelo ewê sibê bi çi rûyî li hizûra îlahî efûyê bixwaze?! Îlletê efû-nekirinê, serkehnîya wî ğefleta însên bi xwe ye. Lewra esil xwediyê efûyê Cenabê Heq e. Mûmîn jî bi qasî mehebbeta Xuda ya di dilên xwe de karin efû bikin.

Bi vê sebebê ye ku mirovê di meselên şexsî de fezîleta efûkirinê şanî nede û ajotina kîn û întîqamê, ji mûmînên kamil re ne layiq e. Tişta ku li para mûmînî dikeve ev e; ew li hemberî mirovên qusûrdar di şûna ğezebê de bi hesta merhemetê tije bibe. Bi hesta dil-şewitîna bi gunehkaran ji ber gunehê ku ketinê hember dana wan, îfadeyeke gihiştina kemala di îmanê de ye. Lewra mûmînên kamil, li hemberî mûmînên ku qusûr kirine çendan ew qusûr li dijî wan bi xwe hatibe kirin jî wekî mûamelekirina doktorekî bi nexweşên wî re helwesteke wilo radixin holê. Hîç ti doktorek ji ber nexweşîya ku pê ketiye çendan qusûra şexsî ya wî hebe jî pê de nağeyide. Ew xwe ji pêşkêşkirina şîfayê ji bo nexweşê xwe mûkellef dizane. Dostên Heq jî ku bi vî exlaqî dijîn berê nefreta xwe ya ji gunehî nadin gunehkaran. Wan wekî çûkekî nexweş qebûl dikin û di seraya dilê xwe de di nav ğeyreta îrşad û îslaha wan de, dibin.

Çawa dema pirsa exlaqî ji **Sehlê Tusterî** hatiye kirin, wî wiha gotiye:

"*Biçûktirîn dereca exlaqî; tehemmulkirina ezîyetê ye, li dûv întîqamê neçûn e, heta merhemetkirina li zalimî ye, ji bo wî îstiğfarkirin û dil bi wî jî şewitîn e.*" [247]

247. Îhya, III, 163.

Ev hedîsa ku ji **Enes bin Malik** hatiye rîwayetkirin jî bi awayekî sipehî eşkere dike ku xwedî-bûna ji bo qiwameke dilî ya wiha însanî dixe rêwîyê cennetê:

Em bi **Resûlê Ekrem** re rûniştibûn. Wî got:

“-*Vêga wê zilamek ji ehlê cennetê were cem me*.”

Me meyzand ku wa ye zilamek ji Ensarîyan derket hat, hê dilopên ava desmêjê xwe ji riha wî berdidan dihatin xwarê û pêlavên xwe bi destê xwe yên çepê girtibûn. Dema bû roja piştî wê, Resûlê Ekrem dîsa wekî ya pêşî got. Ev zilam dîsa wekî ya pêşî derket hat. Çi dema bû roja sisêyan, Mezinê me Resûlê Ekrem dîsa ew peyva xwe dubare kir û dîsa heman zilam bi halê xwe yê pêşî hat. Dema Resûlê Ekrem rabû ser xwe **Ebdûllah bin ‘Emr** ew zilam taqîb kir û jê re got:

“-Min bi bavê xwe re mûnaqeşe kir, min sûnd xwariye heta sê rojan ez neçim balê. Gelo di zarfê vî zemanî de tu yê min li mala xwe bikî mêhvan?” Wî zilamî jî ew qebûl kir.

Ebdûllah bin ‘Emr piştre tiştên ku bûne, wiha vegotin:

“-Min sê şev bi wî re derbas kirin. Lêbelê min dît ku bi şev dirêj dirêj îbadetê dike. Feqet heta bi fecrê jî car caran şîyar dibû zikr dikir û tekbîr didan. Min jê nebihîst ku wî ji xêrê pê ve tiştekî din gotibe. Çi dema sê roj xilas bûn ez bûm wekî ku min amelê wî biçûk dîtibe û min jê re got:

«-Hey Evdê Xuda! Di navbera min û bavê min de îxtîlafek nîn e. Lêbelê min bihîst ku Resûlê Ekrem di bara te de sê caran got: “*Vêga wê zilamek ji ehlê cennetê were cem me*.” Di hersê caran de jî tu derketî. Min xwest li cem te bimînin, ji bo hîn bibim ka tu amelên wekî çi dikî, ez te ji bo xwe bikim nimûne. Lêbelê min

nedît ku te amelekî mezin jî kiribe. Gelo ew çi amel e ku tu gihandî wê merteba ku Resûlûllah gotî?»

Wî zatî jê re got:

«-Ji vî yê ku te dîtî pê ve ne tiştekî din e.»

Feqet dema ez fetilîm ji bo li cemê cuda bibim herim, wî li pey min bang kir, ji min re got:

«-Erê, amelê min ji vî yê ku te dîtî pê ve ne tiştekî din e. Lêbelê ez di dilê xwe de kînê li hemberî hîç ti kesî ji mislimanan nagirim û ez ji ber ti nîmetek û xêreke ku Xuda dabe kesekî jî hesedê, çavnebarîyê nakim.»

Vêca min jê re got:

«-Ha tişta ku tu gihandî vê derecê ev hal e.»”[248]

Ev qisse, exlaqê efûkirinê çi xweşik îfade dike, dibêje:

Hinek mirovan ji **Ehnef bin Qeys** pirs kirin, jê re gotin:

“-Tu, exlaqê xweş jê kê hîn bûyî?” Wî jî got:

“-Ji **Qeys bin Asim** hîn bûm.” Dema jê pirs kirin, jê re gotin;

“-Ev zat xwedî exlaqekî çawa bû?” Wî ev îzahat kir:

“Ev zat dema rojekê li mala xwe rûniştîbû, carîyekek ji carîyeyên wî bisteke hesinî di dest wê de bû û pişikên kebabê jî bi bistê ve bûn û wilo hate cemê. Çawa çêbû ez nizanim lêbelê bist ji destê carîyê ket, li serê kurê biçûkê wî ket û zarok mir. Carîye li hemberî vê wezîyeta zor kete dehşetê, perîşan bû û adeta helîya. Lêbelê wî zatî, di demeke wiha de jî di şûna ku hêrs bibe û pê de biğeyide de ji carîyê re got; «ğemgîn nebe, teqdîra îlahî wiha bûye, ji ber ku ti

248. Ehmed, III, 166.

qesdeke te nebûye, ti sûcekî te jî nîn e, li hemberî ferfitîna wijdanî ya te min jî tu azad kirî..»" [249]

Li alîyê din, mûmînê ku di nav wê ezim û ğeyretê de be ku efû bike û efû bike heta ku ji bo efûya îlahî bibe layiq, divê jibîr neke ku bi awayê qebûlkirina uzrê mirovên ku poşman bibin û jê uzrê xwe xwestibin jî maneya wê ev e; wî para xwe ji exlaqê Rebbê xwe yê ku **Tewwab** e, yanî ewê ku tobê qebûl dike, wergirtiye..

## el-HELÎM..

Navekî dîtir ji navên îlahî jî **el-Helîm** e. Rebbê me xwediyê helîmtîyê ye, heta tu bibêjî bes, ew bi evdên xwe re nerm tevdigere, ew li hemberî xeta û qusûrên evdê xwe derhal li wan nayê ğezebê, sebr û tehemmuleke mezin şanî dide. Dîsa bi Rebbê me xweş e ku evdên wî jî vî exlaqê wî raxin holê û di xwe de didin xuyakirin.

Çawa **Mezinê me Resûlûllah** ji **Eşecc** re axiviye, ew yek ji Kurên Ebdûlqeys bûye, jê re gotiye;

"*Di te de du xusûsîyet hene, Xuda ji wan hez dike: Hilm (xuy-nermî) û teennî (bi endazbûn) ye.*" [250]

Ziddê helîmtîyê jî dijwarî û serhişkî ye. Ew jî xuyeke xirab e ku însanan diêşîne, rê li ber vê vedike ku ew ji mirovî nefret bikin û ew xwe ji mirovî dûr bikin. Bi vê sebebê helîmtî, sifetek ji sifetên pêğembera ye. Çawa hinek ji alimên cihûyan ku ev ji kitêba xwe hîn bûbûn, sifetê helîmtîyê yê Mezinê me Pêğember tecrûbe kirine û dema deryaya helîmtîyê ya di wî de fehm kirine jî hatine îmanê.

249. Îhya, III, 164.
250. Mûslim, Îman, 25-26.

Ellah Teala dibêje:

“(Resûlê min!) **Bi rehma Xuda tu, li biwara wan nerm bûyî! Heke tu, mirovekî xebertehl û dilhişk bûbayî, bêşiwar ewê ji hawîrdora te belav bibûna û biçûna. Naxwe li wan bibûre, lêbûrîna gunehên wan ji Xuda bixwaze**.”[251]

Resûlê Xuda ji nav nesla însên mirovê ji hemû mirovan mûlayimtir bû. Ji lewma wî daîm di mûamela xwe ya digel însanan de hêsankarî tercîh dikir û cih nedida zorkarî, hêrs û qehrê. Ji derveyî binpêkirina Heqîyê, ew ji bo şaşîyên din hêrs nedibû, qusûrên ku li hemberî şexsê wî hatibûne kirin bi hêsanî efû dikirin. Ew çi qeder bi mûameleyeke hov û hişk re rûbirû dima jî dîsa wî nezaketa xwe xirab nedikir û wî bi mirovên ku xirabî lê dikirin re jî bi sipehî mûamele dikir.

**Luqmanê Hekîm** wiha dibêje:

*“Ewladê min! Sê tişt, bi sê tiştan têne zanîn: Helîmtî di dema ğezebê de; şecaet di meydana herbê de; biratî jî di dema îhtiyacê de.”*

Naxwe ew zemanên ku divê ji her wextên din zêdetir exlaqê helîmtîyê were jîyînê ew wextên nazik in ku însan xwe bi dest hêrs û qehrê ve berdide û aqil jî cihê xwe ji hissê re dihêle. Di wextekî wiha de kontrolkirina hefsarê nefsa xwe, gihaneke manewî dixwaze. Çawa Mezinê me Pêğember jî gotiye:

“*Agîd ne ew kes e ku di gulaşê de rikeberê xwe têkdibe; esil agîd ew kes e ku dema hêrs dibe dikare hêrsa xwe kontrol bike.*” [252]

Dîsa Mezinê me Pêğember li hemberî mirovên ku ji nû misliman bûbûn, hê firsend nedîtibûn ku bi awayekî têr û tam edeb û

251. Alî Îmran, 3/159.
252. Buxarî, Edeb, 76; Mûslim, Birr, 107, 108.

nezaketa dîn hîn bibin jî daîm bi helîmtî û mûsamehakarî hereket dikir. Çawa ev bûyer ji bo vê, mîsaleke tîpîk e:

Mirovekî bedewî destava biçûka xwe li Mizgefta Nebewî xirab kiribû. Sehabîyan derhal destpê kiribû li erza wî dabûn. Vêca Hezretê Pêğember ji wan re gotibû:

"*-Zilamî li ser halê wî bihêlin. Dêwlek av jî bi ser cihê destava wî de birijînin. Hûn hatine şandin ji bo hêsankarîyê şanî bidin, ne ji bo zorkarîyê derînin.*" [253]

**Îmam Şa'bî** jî ku yek ji mezinên tabîîna ye, bersiva wî ji bo şexsekî fasiq ê ku heqaret lê kirî ya bi vî awayî jî:

"-Heke tiştên ku tu dibêjî rast bin, Xuda min efû bike! Heke tu derewîn bî, bila Xuda te efû bike!" ji bo exlaqê helîmtîyê tezahureke mûstesna ye.

**Welhasil** helîmtî û mûsameha ku encama xesletên sipehî yên wekî merhemet, şefqet û mehebbetê ye, fermana îlahî ya Cenabê Heq û tebîetê eslî yê Mezinê me Pêğember e.

Pêğemberê Xuda wiha dibêje:

"*Ewê ku nesîbê wî ji rifqê (xuy-nermîyê) hebe, nesîbê wî ji xêrê jî hatiye dayîn. Ewê ku nesîbê wî ji rifqê nebe, ew ji xêrê jî hatiye mehrûmkirin.*" [254]

Digel vê jî wekî hemû xesletan ji bo helîmtî û mûsamehakarîyê jî endazek heye. Naxwe bi navê xuy-nermîyê stûxwehrkirina ji zulimê re, yan jî li hemberî binpêkirina fermanên îlahî şanîdana mûsamehakarîyê hîç ne rast e. Bizaveke wiha ku jê re hilma hîmarî (sernermîya kerîtîyê) tê gotin, ji ber ku ewê arzû û

253. Buxarî, Wudû', 58, Edeb, 80.
254. Tirmizî, Birr, 67/2013.

cesareta xirabîxwazan ji bo xirabî-kirinê zêde bike, heta tu bibêjî bes, ew bizaveke çewt û şaş e..

## es-SETTAR

Navekî cemalî yê dîtir ê Rebbê me jî navê şerîfê wî "**es-Settar**" e. Rebbê me ji hemû halên bendeyên xwe yên bi dizî û eşkere tevan waqif e. Ew gellek ayb û qusûrên wan dinixumîne û wan efû dike. Bi vî awayî ew firsendê dide wan ji bo karibin halên xwe îslah bikin. Lewra ew kesê ku ayb û qusûrên wî derkevin holê êdî zehf zor e ku ew bikare halên xwe sererast bike.

Divê heta ji mislimanî were ew xwe ji tecessusê biparêze. Yanî divê ew lêgerînê li ser ayb û qusûrên bira-dînê xwe yên ku hê nederketine meydanê, neke û bi dûv ayb û arên wan nekeve. Lewra Cenabê Heq bi vê gotina xwe; "**tecessusê nekin!**" [255] ev bizava mekroh qedeğe kiriye.

Ewê ku guneh kiribin û her wekî ku marîfet be vegotina wan ji xelkê re jî tê maneya belavkirina xirabîyê. Bi taybetî di zemanê me de ew sûcê ku dem bi dem însan lê rast tê û ew bi navê "ji kurterê ve fetlebazîya goşê, yanî sextekarî" her wekî ku meharet be şanîdana wê ji tevahîya belavbûna gunehan e ku ji pêkhatina wê xirabtir e.. Yanî ragihandina bizavên xirab û mekroh di nav civakê de û meşğûlkirina zêhnê mirovan, ji ber ku ewê tehlûka hê bêhtir kirina wan biwelidîne hê mehzûrtir e. Cenabê Heq wan kesên ku dixwazin xirabî belav û berfereh bibe bi ezabekî mezin tehdîd dike. Li hemberî van ew kesê ku ji ber gunehê kirî heya û şerm dike, wî diveşêre û jê poşman dibe, tê umîdkirin ku Rebbê me yê "Settar" wî di roja qîyametê de rezîl û riswa neke.

255. Hucûrat, 49/12.

Li alîyê din divê mirov bifikre ku Rebbê me ji bo xatirê navê xwe yê Settar, çendîn gunehên me bendeyên xwe nixumandine û ew di qelb de kirine nuqteyên reş ên bi dizî. Ev jî ji mezinatî û bilindîya wî ye, ji merhemet û lutfa wî ye. Lewra heke şûna gunehên ku hatine kirin ne di qelb de; lêbelê di enîyê de di sûretê leke û deqeke reş de xuya bûbana, bêşiwar wê hîç rûyê ti kesî nebûya ku li dîgerê xwe binêre.

Divê em jibîr nekin ku dil nezargeha îlahî ne. Însanek çi qeder qusûrdar dibe bila ew qeder qusûrdar bibe, lêgerînkirina li ser qusûrên bidizî yên wî û li meydanê rijandina wan, ji ber ku ewê dilê wî rencîde bike, ewê ğezeba Rebbê me jî bi ser xwe de celb bike, bîne. Bizavên suflî yên wekî zeîfkirina îffet û heysîyeta însanan, vegotina halên wan û bi vî awayî hewldan ji bo xwe çêtir şanîdanê, ewên ku di vê xusûsê de dikevin ğefletê, dibe sersebeb ku çendîn amelên xêrê yên wan jî berehewa bibin û pûç bibin.

Heke em dixwazin ku Cenabê Heq bi taybetî di roja mehşerê de aybên me binixumîne, divê em jî hewl bidin ku îro aybên evdên wî binixumînin û mehcûb û rencîdebûna wan asteng bikin. Mîsaleke şahesera vê xusûsê wiha ye:

**Hezretê Hatemê Esam** bi jineke zeîf, derdmend û perîşan re diaxivî. Dema wê jinê bi heyecaneke mezin derdê xwe jê re vedigot, ji wê -ğeyrê îxtiyarî- dengekî ne xweş hate bihîstin. Ew jin ji mehcûbîyeta xwe wekî mûmekî helîya, perçiqî û mehû bû. Hezretê Şêx jî wekî ku hîç tiştek nebihîstibe û ferq nexistibîyê wilo bi weqareke mûezzam li wê jinê meyzand û destê xwe bire ber guhê xwe, jê re got:

"-Ez gotinên we nabihîzim, ez baş seh nakim, bi dengê bilind bi min re biaxive, bi dengê bilind biaxive! Ez kerr im!"

Wê jinê zen kir ku qusûra wê nehan maye, wekî ku ji nû li heyatê vegerîyabe, wilo keyfxweş bû.

Ev nezaketa ku nimûneyeke dîtira wekî wê di edebên mûaşereta hîç ti milletekî din de nehatiye dîtin, leqeba "**Esam: Kerr**" li Hezretê Şêx kiriye. Lewra di piştî vê bûyerê de Hezretê Hatem, xwe di nav xelkê de wek kerr şanî da ji bo ti kes bi qusûra wê jinê nehese û ew mehcûb û şermezar nebe.  Lêbelê di piştî wefata wê jinê de êdî wî ji mirovên li hawîrdora xwe re got:

"-Êdî guhên min dibihîzin; hûn dikarin bi dengê normal biaxivin!"

Vegotina ayb û qusûrên însanan, di dîn de bi navê "ğeybet"ê wek ji gunehên mezin hatiye qebûlkirin, ev jî mezinbûna vî sûcî şanî dide. Zêdebarî vê ğeybet, gotina qusûreke mewcûd e. Gotina qusûreke ne mewcûd jî "**îftîra**" ye ku ew sûcekî hê girantir e.

**Welhasil** para xwe wergirtina ji exlaqê îlahî û bi awayekî sipehî di rûh û gîyanê xwe de çêj jê dîtin, ji bo fezîletên mûhteşem dibe wesîle. Lêbelê sifetên cemalî yên Cenabê Heq, bes di mûmînên ku nefsa xwe tezkîye û qelbê xwe tesfîye kiribin de bi awayekî zehf sipehî tecellî dibin. Bi vê sebebê mûmînek, bi qasî ku karîbe alema hundurîna xwe ji menfîtîyan paqij kiribe, yanî bi qasî ku wî karîbe xwe ji hemû tiştên ku wî ji Xuda dûr dikin paqij kiribe, ew dikeve rewşa aynekeke mûcella ji bo exlaqê îlahî.

Me li vir di bara navên cemalî de çend mîsal dan. Heke mirov karibe wan ji xwe re bike exlaq û wan ji bo şexsîyet û karektêrê xwe bixe perçeyekî cudaneber ji bo têketina keş û hewaya dostanîya Heq di mahîyeta vîzeya mezintirîn de ye.

**Cenabê Heq, me tevan ji exlaqê îlahî hissedar bike û me bike ji wan bendeyên bextiyar ên xwe ku karîne berata seadeta ebedî ya xwe wergirin!**

**Amîn..**



# Dilê Xwe Bi Dergehê Rahmê Kirin

*Hemû ğeyret û fikra mûmînên kamil, hizûr û seadeta mexlûqata ye. Lewra ew, di netîca terbîya nebewî de ji xweğemîya "nefsî, nefsî!"yê xilas bûne û bi dîgerğemîya "ummetî, ummetî!"yê gihane. Ew bi qiwama dilekî wilo gihane ku bi jana dîgeran êşmend dibin û bi hizûra wan jî hizûrmend dibin. Ew têgihane ku xilasîya wan bi xebet-kirina ji bo xilasîya dîgeran, hasil dibe.*

*Ew mûmînên kamil ên ku dilên wan bi terbîyeke mûkemmela manewî ya wilo hatibe stranê ku xwe ji êşandina mîroyekê jî bidin paş, ewê ji bo hemû mexlûqatan bibin serkehnîya rahmê. Ew ji dilên xwe şefqet û merhemetê tewzî û belav dikin. Ew her wekî barana nîsanê/avrêlê bexçên dilê xwe hêşîn û îhya dikin. Ew li hemberî hemû mexlûqatan her di nav tenikî, nezaket û zarafeta exlaqê xweş de dijîn.*

# DILÊ XWE BI DERGEHÊ RAHMÊ KIRIN

Însanê ku ji hikmet û heqîqetên Îslamê mehrûm be, di nav bûyer û hadîseyên îmtîhana heyata dinyayê de, bi sebeb şert û mercên ku tim û daîm diguherin wê di navbera rûhanîyet û nefsanîyetê de dudil bibe û here û were. Ew bi vî halê xwe;

Aynî wekî wê gemîyê ye ku di okyanûseke tarî, bi firtone û bi ger û girdab de sekanê wê şikestibe. Ji ber ku wî ew rota'ya manewî ya xwe ya ku îhtiyaca wî pê heye winda kiriye, mechûl û ne pêzan e ka ewê di nav kîjan girdab û gerên nefsê de biçe helakê.

Ew însanê ku di korîdorên girtî yên rêwîtîya heyatê de digere, winda-nekirina heysîyet û şerefa evdînîya xwe, mehû-nekirina seadeta ebedî ya xwe û li alîyê din jî ji bo însan karibe tenikî û zarafeta Îslamê îdrak bike rêya ku divê ew taqîb bike, ne mûmkin e ku ew sirf bi aqilê xwe yê bêçare wê keşf bike.. Di vê rêwîtîya ebedîyetê de ji bo rêberîya qanûnên îrşada îlahî zehf zêde îhtiyac heye.

Hemû candarên ku hatine aferandin, ji bo karibin heyatên xwe bidin dewamkirin mecbûr in werin xwedîkirin. Wekî vê însan jî, li heyatê ji bo karibe di nav hevkêşîya madde û maneyê de rêyeke rast bigre, mecbûr e ku aqilê xwe bixe halê selîm, qelbê xwe bi

nûra Qur'an û Sunnetê xwedî bike, welhasil divê ew bikeve bin terbîya îlahî.

## MEHEBBET û ÎTAET

Mezinê me Pêğember di hedîsa şerîf de dibêje:

"*însan ji kê hez bike wê pê re be.*"[256]

Hezkirina ji Resûlê Xuda, îtaetkirina ji wî re û bi peywendîya qelbî jî pêre-bûnê pêwîst dike. Lewra mehebbet, xeteke cereyanê ya di navbera du dilan de ye û sewîya hezkirinê, bi keyfîyeta vê xetê ve pêbend e. Ev pêrebûna qelbî bi van tiştan mûmkin e; heke mirov karibe nesîbê xwe ji exlaqê nebewî bigre, heke mirov karibe bigihîje kûrahîya hestan, heke mirov karibe terz û teherê bi nezara Xaliq nêrîna li mexlûqatan qezenc bike..

Yanî dil, bi qasî ku karibin bi halê Resûlê Xuda hevhal bibin, ewê karibin ji bo feyz û bereketa pêrebûna wî nail bibin. Mehebbeteke wiha jî bi îtaet, fedakarî û ğeyretê ve bend e. Hezkirina ji Xuda, bi wecdeke mezina îmanê peyrewbûna Resûlê wî pêwîst dike. Çawa Xuda di ayetên pîroz de dibêje:

"(Resûlê min!) **Bibêje: Heke bera hûn ji Xuda hez dikin naxwe li pey min werin da ku Xuda jî ji we hez bike û gunehên we efû bike**." [257]

"**Ji însanan hinekên wisan hene ku ji bo rizaya Xuda qezenc bikin xwe** (û malê xwe) **feda dikin**.." [258]

---

256. Buxarî, Edeb, 96.
257. Alî Îmran, 3/31.
258. Beqer 2/207.

Bi teslîmîyeteke tam û mehebbetê îtaeta ji Cenabê Heq re, ew e, ya ku mechûlên însanî bixe malûm, tarîtîyên alemên ji îdrakê biwêdetir wekî qebr û axretê û tarîtîyên derbasgeh û surprîzên wê alemê rohnî bike û ewê rûh û gîyanê însanî bigihîne hizûrê. Evd, bes bi vî awayî wê bigihîje kemala manewî ya ku Xuda jê razî bibe.

Di vê xusûsê de bi selamettirîn rêya ku mirov wê taqîb bike jî ev e; mirov li pey rêç û şopa bi nûra Hezretê Pêğember here, hem jî ew Pêğemberê ku Rebbê me wek modela însanê kamil ji bo temamê însanîyetê kiriye xelat. Dîsa rêya bi selamettirîna ku mirov wê taqîb bike ev e; mirov hewl bide ku ji tevna dilî ya wî para xwe wergire û di eşqa îlahî, wecd û mehebbetê de kûr bibe.

## GIHANA/KEMALA MANEWÎ

Alemên dilî ya wan kesên ku bi sedaqet serê xwe di vê rê de danîne wê bibin deryayeke fereha rahmê. Lewra ew Ellahê Rahman û Rahîm, Resûlê hezkirîyê xwe ji bo temamê aleman wek rahm şandiye û ew bi sifetê wî yê merhemetê jî ji bo însanîyetê xistiye nimûne.

Naxwe dilê wan kesên ku karibin bi awayekî layiq para xwe ji tevna dilî ya Resûlê Xuda wergirin jî wê bibe **dergehekî rahmê ku hemû mexlûqatan hemêz bike**. Ew, êdî ji pêvemanên nefsanî û ji esareta hesabên berjewendî û menfîetên şexsî azad bûne. Dilên wan, bi mehebbeta Xuda û Pêğemberê wî, tam ji lezzeta mehebbeta heqîqî dîtine. Bi vê sebebê hemû çêj û lezzetên fanî, di nezara wan de giringîya xwe winda kirine. Hemû ğeyret, fikr, derd û jana wan, ji bo hizûr û seadeta hemû mexlûqata ye.

Lewra ew, di netîca terbîya nebewî de ji xweğemîya “nefsî, nefsî!”yê xilas bûne û bi dîgerğemîya “ummetî, ummetî!”yê gihane. Ew bi qiwama dilekî wisan tenik û hessas gihane ku bi jana dîgeran

êşmend dibin û bi hizûra wan jî hizûrmend dibin. Ew têgihane ku xilasîya wan bi xebet-kirina ji bo xilasîya dîgeran, hasil dibe.

Ev qisse, çi xweş îfade dike ka wusleta ji bo Heq bi qiwameke qelbî ya çawa ve bend e.

Qisse wiha ye:

**Bayezîdê Bîstamî** -quddîse sirûh- vedibêje:

“Di zemanê me de bi hezaran welî hebûn. Lêbelê wezîfa qutubtîya sedsalê ji hesinbirrekî bi navê **Ebûhafs** re hatibû dayîn. Ez çûme dikana wî ji bo hikmeta vê hîn bibim. Min ew zehf derdmend, ğemgîn û meğmûm (kedermend) dît. Min sebebê wê jê pirs kir. Wî bi kul û kovaneke mezin ji min re wiha got:

«-Derdê ji derdê min mezintir; gelo mirovekî ji min derdmendtir heye? Derdê min ev e; gelo wê di roja qiyametê de halê ummeta Mûhemmed çawa bibe?»

Piştre wî dest bi girî kir û girîyê min jî anî. Min meraq kir û jê pirs kir:

«-Tu, dûçarbûna xelkê ji bo ezabê çima ev qeder ji xwe re dikî kul û keder?»

Hezretê Ebûhafs di bersiva min de wiha got:

«-Fitretê min bi havênê merhemet û şefqetê hatiye meyandin. Heke hemû ezabê ehlê ğefletê li min were barkirin û ew bêne efûkirin, ez ji vê zehf memnûn bibim û derdê min jî wê bi dawî bibe.»

Vêca min fehm kir ku Hezretê Ebûhafs ne ji wan kesan e ku dibêjin; «**nefsî, nefsî**» ew di meşreba Pêğember de ji wan kesan e ku dibêjin; «**ummetî, ummetî**»”

Wekî ku hate dîtin her halê warisên Mezinê me Pêğemberê Rahmê ku para xwe ji keş û hewaya dilê Pêğember wergirtine, hessasîyetên bilind ên dilekî dergehê rahmê didin xuyakirin.

**Hezretê Ebû'l-Hesen Xarqanî** jî gotiye; "*di saha ji Tirkistanê heta bi Şamê de strîyekî ku bikeve telîya bira-dînekî min, ew ketiye telîya min..*" Dîsa **Hezretê Serrîyyê Seqtî** ku mideteké pûnijîbû û felaketa ku hatibû serê bira-dînê xwe nefikirîbû, ew bi selametîya xwe keyfxweş bûbû, ew tam sih salan ji bo wê midetê di nav tobe û îstiğfarê de bûbû. (Ev rewşa wan û) Hissîyata hemû dostên Heq ên wekî wî jî, yek ji tezahurên bêjimar ên vî halî ne.

## FEZÎLET LI SER FEZÎLETÊ

**Hezretê Reb'î** yek ji wan dostên Heq e ku dema pêwîst bike ew ji nefsa xwe jî ferağet dikin û daîm bi rûhekî dîgerğem şefqet û rahmê tewzî û belav dikin, ew bi xwe felç bûbû. Rojekê hejarek hate ber derîyê wî. Hezretê Reb'î got:

"-Şekirekî bidin wî!" Lewra wî bi xwe zehf ji şekir hez dikir. Wî ev ayeta pîroz: "**Heta hûn ji tişta ku jê hez dikin înfaqê nekin, hûnê bi birrê** (kemala xêrê) **negihin!**"[259] wisan fehm dikir.

Çi dema êşa Hezretê Reb'î zehf zêde bû, dilê wî bijîya goştê mirîşkê. Lêbelê wî çil rojan xwe girt û goştê mirîşkê nexwar. Rojekê wî ji xanima xwe re got:

"-Ev çil roj in ku canê min goştê mirîşkê dixwaze. Min got belkû ez karibim dev jê berdim, min hewl dida xwe bigrim."

Xanima wî got:

259. Alî Îmran, 3/92.

“-Fesubhanellah! De ka tu li vî tiştê ku ew xwe ji xwarîna wî asteng dike, binêre! Xuda ev ji te re helal kiriye!”

Xanima Hezretê Reb‘î derhal çû sûkê û mirîşkek jê re kirrî. Mirîşk serjê kir û jê re sor kir. Nanekî xweş jî jê re çêkir, sifrekek ji çend texlîtan hazir kir, anî û li ber Hezretê Reb‘î danî. Tam di vê navê de hejarek hate ber derî û got:

“-Ji bo Xuda sedeqekekê bidin da ku Xuda jî bereketê bide we!”

Vêca Hezretê Reb‘î dev ji xwarina goştê mirîşkê berda û ji xanima xwe re got:

“-Raje vê mirîşkê û wê bide vî hewcedarî!”

Çi dema xanima wî jê re got;

“-Subhanellah!”, Hezretê Reb‘î jê re got:

“-Min çi ji te re gotibe, tu wê bike!”

Vê carê xanima wî jê re got:

“-Hema nebe ji bo wî tiştekî hê bi xêrtir bike.”

Çi dema Hezretê Reb‘î jê re got;

“-Baş e, ez çi bikim?”, xanima wî jê re got;

“-Em heq-pereyê mirîşkekê bidinê û tu jî wê mirîşka ku te arzû dikir, bixwe!”

Hezretê Reb‘î jê re got:

“-Ev teklîfeke ğayet sipehî ye! Bi qasî heq-perê vê mirîşkê jê re pere bîne!” Çi dema xanima wî pere anîn jî wî jê re got:

“-Vêga pereyan deyne cem vê mirîşkê û herduyan jî bide vî zatî!”

Xanima wî jî hem pere hem jî ew mirîşk (a sorkirî) bir û da wî hejarî." [260]

Bêşiwar ev hal, fezîleta "**ÎSAR**"ê ye ku ew sewîya zirweya comerdîyê ye. Yanî îsar ew fedakarî ye ku mirov ji bo rizaya Xuda karibe derfet û îmkanên xwe ji bira-dînê xwe re dewr bike. Cenabê Heq vê fezîletê di ayeta pîroz de çi xweş tarîf û teltîf dike, dibêje:

"**Ew, digel ku pêdiviya wan pê heye û canê wan dibijîyê jî dîsa xwarinê didin xizan, sêwî û yexsîran. Ji wan re dibêjin: «Em bes ji bo rizamendîya Xuda xwarinê didin we; em ji we ti perûyekê û ti spasiyekê jî naxwazin**. (Em vê qencîyê dikin lewra) **em di rojeke dijwar bi bela de ji** (bi ber ketina ezabê) **Xudayê xwe ditirsin.» Ha ji ber vê Xuda, wan ji ezabê neqenciya wê rojê diparêze, rûsipehîtî û dilşadiyê dide wan**."[261]

## UFÛQA/ASOYA MERHEMETÊ

Ha va ye exlaqê Îslamê, wê qiwameke dilî ya wilo mûkemmel ava kiriye ku dema pêwîst bike ew dikare ji îhtiyacên xwe fedakarîyê bike û bi xweş-kirina dilê bira-dînê xwe hizûrê dibîne. Ewên ku gihabin vê gihana/kemala qelbî, wan bi temamê îhtîşama maneya wan ve ev hedîsên şerîf fehm kirine;

"*Ewê ku bi derdê mûmînan derdmend nebe, ne ji wan e*." [262]

"*Ewê ku ziktêr raze û cîranê wî jî zikbirçî be, ne mûmîn (ekî kamil) e*." [263] Yanî wan fehm kiriye ku destê wan bigihîje kuderê û ew ji her tiştî berpirs in. Wan îdrak kiriye ku birçîtî sade ne ji

260. Bûrsewî, Rûh'l-Beyan, (Alî Îmran, 3/92).
261. Însan, 76/8-11.
262. Hakim, Mûstedrek, IV, 352; Heysemî, Mecmau'z-Zewaid, I, 87.
263. Hakim, II, 15/2166.

birçîbûna mîdê îbaret e, esil birçîbûna rûhan dikare însanî ber bi nexweşîyên ciddîtir û buhran û qeyranan ve bikişkişîne.

Şexsîyetê bêemsalê nimûneyî yê me **Mezinê me Hezretê Mûhemmed Mûstefa** rojekê ji eshabê xwe re got:

"-*Ez bi Xuda sûnd dixwim ku nefsa min di destê qudreta wî de ye, heta hûn li hev neyên rahmê, hûn naçin cennetê*."

Eshabê kîram jê re gotin:

"-Ya Resûlellah! Ji xwe em hemû bi merhemet in."

Resûlê Xuda ji wan re got:

"-*Merhemeta (ku min qesdkirî), ne bi wî awayê ku we fehmkirî sade merhemeta we li hev û din e. Tam berevajîyê vê ew merhemet e ku li ser hemû mexlûqatan şamil tê, (erê) merhemeta ku li ser hemû mexlûqatan şamil tê!..*" [264]

Yanî şefqet û merhemeta Mezinê me Resûlûllah, xwedî wesfekî cîhanşimûl bû. Lewra dilê mûbarekê wî ew terzê nêrînê qezenc kiribû ku bi nezara Xaliq li hemû mexlûqatan binêre.

Ji bo vê ew xwedî esaleta rûhekî bû ku karibû bi merhemetê li neyarên xwe jî binêre. Çawa di Ğezweya Bedrê de artêş hatibûn hemberî hev, Mezinê me Resûlûllah berî şerr bike qasid ji mûşrikan re şandin û şîyarîyên xwe yên dawîn jî ji wan re kirin. Di vê navê hinek mûşrikan ku Hakim bin Hîzam jî di navbera wan de hebû, hatin ku ji hewzên mislimanan avê vexwin. Dema mislimanan xwest ji wan re bibin asteng, Resûlê Xuda ji wan re got:

"-*Dest ji wan berdin bila avê vexwin!*" Ew jî hatin û av vexwarin. Piştre ji bilî Hakim wan mûşrikan tevan şûr li artêşa Îslamê

264. Hakim, IV, 185/7310.

kişandin û ew ji terefê mislimanan ve jî hatin kuştin. Di paşerojê de Hakim bi hîdayetê şerefmend dibû.

Dîsa mûşrikên Mekkê bi salan her cure zulim ji mislimanan re rewa dîtibûn. Lêbelê dema ew bi birçîtî û ğelayê re rûbirû man, Mezinê me Pêğemberê rahmê erzaq ji wan re şandibû. Bi vî awayî wî ji kesên ku di wextê xwe de ambargo li ser wan danîbûn û ew bi birçîtî û mirinê re terk kiribûn re teblîğ kir ka Îslam çi qeder xwedî têgihiştina exlaqekî xweş û bilind e.

Dîsa Mezinê me Pêğember, di her firsendê de ev hessasîyet li însanan dida hînkirin ku divê ji bo xatirê Aferînerî mirov bi şefqet, merhemet, nezaketê bi aferîndeyan re mûamele bike û bi taybetî jî divê mirov dilê kesî neşikîne û ji ti kesî jî neêşe. Bi saya vê telqîna wî dil tenik dibûn, nezaket û zarafet bi zirwe dibûn û qiwama dilekî wisan dihate avakirin ku ew rûkenîya Îslamê temsîl bike.

Heta Resûlûllah di xusûsa xwedî-kirin, meyzandin û paqijkirina heywanan de jî wesîyet dikir, bi taybetî jî dixwest qirêj û toza li ser mêşin û bizanan werin temîzkirin.[265]

Mezinê me Pêğember ferman dikir ku dema însan marekî yan jî heywanekî bi zirar bikujin jî divê ezîyetê nedin wan û wî di lêxistineke tenê de bikujin.

Ji sehabiyan **Ebû'd-Derda** li hinek mirovan rast hatibû ku barekî zêde li hêştirên xwe dikirin. Hêştir ji ber giranîya barê xwe nikarîbû rabe ser xwe. Ebû'd-Derda derhal barê zêde ji ser hêştirê avêt, piştî hêştir rabû ser xwe ji xwediyên wan re wiha got:

"-Heke Ellah Teala ezîyetên ku we dane heywanan efû bike, wî ji bo we meğfîreteke mezin kiriye. Min ji Mezinê me Resûlûllah bihîst ku wiha digot:

265. Heysemî, IV, 66-67.

*«Ellah Teala ferman dike ku hûn bi van heywanên nikarin biaxivin re baş mûamele bikin! Heke hûn di zevîyeke berhemdar re derbas bibin hinekê destûr bidin ji bo heywanê we li wan biçêrin! Heke hûn di zevîyeke ziwa re derbas bibin bi lez di wir re bibûrin, li cihên wiha xwe zêde nesoğînin û diltengî û zirarê nedin heywanên xwe!»*"[266]

Dîsa Resûlûllah li şexsekî ku mêşin didohtin rast hatibû. Jê re gotibû:

"*-Ey Filan kes! Dema te heywan doht ji bo berxê wê jî şîr bihêle!*" [267]

**Sewade bin Reb'î** vê mîsala mûhteşema ziravî û merhemetê diguhêze, dibêje:

"Ez derketim hizûra alî-ya Mezinê me Pêğember û min hinek tişt jê xwestin. Wî ji bo min (ji hevalên xwe re) got; çend (ji 3ê heta bi 9'an) hêştiran bidinê. Piştre wî ev şîret jî li min kirin:

*«-Dema tu vegerî mala xwe, ji xelkê malê re bibêje; bila ew baş li heywanan meyzînin, bila xwarina wan qenc bidin wan! Dîsa ji wan re bibêje; bila ew neynokên xwe jêkin da ku dema heywanan bidoşin guhanê wan neêşînin û birîndar nekin!»*"[268]

Dîsa dema Mezinê me Pêğember bi eshabê xwe re diçû Mekkê li ğezalekê rast hatin ku wê li ser rêyên wan xwe li hev pêçabû û bi xew ve çûbû. Mezinê me ku ji bo aleman rahm bû, ji kesekî ji eshabên xwe re got; tu li ber ğezalê çavnêrî bike heta ku her kes jê derbas bibe û nehêle ti kes wê têdergîn bike. [269]

266. Îbnû Hecer, el-Metalîbû'l-Elîye, II, 226/1978.
267. Heysemî, VIII, 196.
268. Ehmed, III, 484; Heysemî, V, 168, 259, VIII, 196.
269. Mûwetta, Hecc, 79; Nesaî, Hecc, 78.

Dema ew bi artêşa xwe ya deh hezar kesî re diçû fetha Mekkê, di rê de dêlesegek dît ku wê xwe bi ser cewrikên xwe de avêtibû erdê û ew şîr didan. Mezinê me Pêğember ji nav eshabê xwe **Cuayl bin Suraqe** ji bo cem xwe gazî kir û ew li ber serê wê dêlesegê û cewrikên wê kire nobedar. Pêğember tenbih lê kir, jê re got; *"bila artêşa Îslamê wê û cewrikên wê nebizdînin."* [270]

Carekê Mezinê me Pêğember kun-mîroyek dît ku agir pê hatibû xistin. Wî nekarî vê rewşê qebûl bike; kun-mîroya şewitî qelbê tenik ê wî xiste dehşetê. Wî bi teessureke mezin got:

"*Kê ev şewitand?! Bi agirî ezab dan, sade ji Rebbê agirî re mexsûs e.*" [271]

Dîsa Mezinê me Pêğember bedewîyek dîtibû, çovek di dest wî de bû û wî pê li çiqilên daran dida ji bo pelên wan biweşin û heywanên wî ji wan bixwin. Ji mirovên li cem xwe re got:

*«-Wî bedewî-yî bînin dev min, lêbelê bi nermî pê re tevbigerin, wî netirsînin!»*

Dema ew bedewî hate cemê, bi uslûbeke nazik jê re got:

«-*Ey bedewî! Bi awayekî nerm û bi şîranî wan bihejîne û pelên wan biweşîne, ne bi lêxistin û şikandinê!*»[272]

Bi Mezinê me Pêğember ne xweş bû ku çiqilekî ter û şîn ê tenê jî beyhûde were şikandin û wî di her firsendê de ummeta xwe li hemberî her tiştî ji bo hereketkirina bi nezaket, zarafet, letafet û merhemetê bang dikir.

270. Waqidî, II, 804.
271. Binêrin. Ebûdawud, Cîhad 112/2675, Edeb 163-164/5268.
272. Îbnû'l-Esîr, Usdu'l-Ğabe, Beyrût 1417, VI, 378.

## MÎROYÊ JÎ NEÊŞÎNE!..

Ha va ye dilên mûmîn, bi bereketa exlaqê nebewî ku ew ji wan re nimûneya ji hemû nimûneyan mezintir e, însanên wilo diltenik, fikrhûr û hestkûr gihandine û perwerde kirine ku qîm nedikirin çîçekekê biqurêfin û ew bi nezareke mezin û bilind heta li mîroyekê jî dinêrin.

Ev bûyer, yek ji mîsalên şahesera vê heqîqetê ye:

**Qanûnî Sultan Suleyman** ji bo bikarin mîroyên ku li hewşa Sarayê darên hirmîyan hişk dikirin, bikujin, bi vê malika jêrîn fetwe ji **Şeyxûlîslam Ebûsuûd Efendî** xwest:

Diraxta ger[273] zîyan etse karinca,

Zarari var midir ani kirinca?

....

Heke mîro darê zîyan bike,

Zirara wê heye ku wê bişikîne?

.....

Ebûsuûd Efendî jî bi malikekê bersiva fetwe xwestina Padîşahî da, jê re got:

Dema ew sibehrojê bigihe dîwana Heq

Mîro wê mafê xwe ji Suleymanî wergire!..

Ew mûmînên kamil ku ew qeder dilên wan bi terbîyekeke mûkemmela manewî hatibûn stran heta ku xwe ji êşandina mîroyekê jî bidin paş, ji bo temamê mexlûqatan bûne serkehnîya rahmê. Şefqet û merhemeta wan ew qeder fereh bû ku temamê

273. Diraxta; Dar e, Ger: Eger, şayet.

mexlûqatan hemêz bikin. Ew bûne ewrên rahmê ku siha wan bigihîje her deverê. Ew fena tavî-baranên Nîsanê/Avrêlê bexçê dilên hemû mexlûqatan şîn û îhya kirin. Ew li hemberî her tiştî di nav ziravî, nezaket û zarafeta exlaqê xweş de jîyan.

## JI BO XATIRÊ AFERÎNERÎ!..

Yek ji dostên Heq **Hezretê Ehmed er-Rîfaî**, li hemberî heywanan zehf bi merhemet bû. Segek bi êşa gurîbûnê ketibû. Kê ew seg didît mirûsê xwe jê dikir û ti kesî ew li ber derîyê xwe nedihişt. Seg bi vî awayî ji ber vî derî û ber wî derî hate titkirin heta paşê hate ber derîyê Hezretê Ehmed er-Rîfaî. Ew bê taqet û di nav birîn û xwînê de bû.

Ehmed er-Rîfaî ev rewşa segî dît, rahiştiyê ew bire devereke li derveyî bajêr. Ji wî re sihberek çêkir û li wir dest bi dermankirina segî kir. Wî ew seg paqij kir, merhem li birînên wî kir û zikê wî têr-xwarin kir. Ew seg bi vî awayî çil rojan hate dermankirin û bi sihheta xwe giha. Ji gurîtîya wî ti eser neman. Piştre wî ew seg sipehî şûşt û anî nav bajêr. Xelkê jê pirs kir, jê re got:

"-Seydayê min! Hûn zehf bi vî segî re elaqedar bûn, gelo hikmeta vê çi ye?" Wî ev bersiv da wan, ji wan re got:

"-Ez ditirsim ku roja qiyametê Rebbê min ji min bipirse, ji min re bibêje; *«tu çima li vî segî nehatî rahmê? Te çima ew ji vê belaya ku lê ketibû, xilas nekir? Tu çima nehizirî ku dibe ev belaya ew pê ketî tu jî pê ketibûna?»*

Gelî mirovan! Dilên xwe li hemberî mexlûqatên ku Ellah Teala ew aferanfdine bi hissa merhemetê tije bikin. Ji vê bitirsin ku Cenabê Heq we jî bi aynî derdî mûbtela bike!"

Ha van e dostên Heq, adeta ew di nav para xwe girtina ji letafeta melaîketan de bi dilekî tenik jîyane. Ji xwe tu ji vê behs neke ku ew rabin însanan biêşînin, yan heqê evdan bixwin, yan jî destê xwe ji bo tiştekî ku ne heqê wan be, dirêj bikin; heta wan bi nezara emanetê Heq e li cem wan, li nîmetên di dest xwe de jî meyzandine û ew di nav hissa mesûlîyeteke kûr de heta tu bibêjî bes bi pîvan û endazên nazik, nişmî û titîz tevgerîyane..

Divê mirov jibîr neke ku Cenabê Heq, bi her wesîlê mûmînan ji bo çûna Darû's-Selamê yanî ji bo çûna cennetê bang dike. Ji bo vê, ew daîm dixwaze ku alema dilî ya wan;

-Bi Cenabê Heq re bibe, her an û bi her wesîlê li rizaya Xuda bigerin,

-Bi mehebbetê ji Resûlê Xuda re îtaet bikin,

-Mesûlîyeta biratîya dînî bi xwe re hilgirin,

-Karibin bi nezara şefqet û merhemeta Xaliq, li mexlûqatên wî binêrin.

**Rebbê me, van hessasîyetan ji dilên me kêm neke! Dilên me, bike penahgeha şefqetê û dergehê rahmê ku hemû mexlûqat têde hizûr û aramîyê bibînin!**

**Amîn...**



# Ji Bo Xatirê Aferînerî Merhemet-kirina Li Aferîndeyan

*Di dilên tenik û hessas ên mûmînên kamil de ku bi jana êşdaran kûr dibin, adeta mehşerek dikele. Ev şewata dilî, wan heta bi ber pêpelinga derîyê ku li ber dergehê merhemeta Heq vedibe, dibe. Kî dizane ka li wir çi sirrên mûstesna têne bihîstin, çi dîmen û menzarayên mûhteşem ên hikmetê têne temaşekirin?!*

*Li kaînatê heybereke abes û zerreyeke bêhikmet nîn e. Hemû aferînde, mexlûqat giş, berhemeke xarîqe ya îlm, qudret û hunera Cenabê Heq in û mohra ezameta îlahî bi xwe re hildigrin. Bi vê sebebê aşiqên Heq, daîm di hikmetê de kûr dibin, van hemû vîtrînên îlahî bi nezara mehebbet û îbretê temaşe dikin û bi heyranîya ku dibihîzin jî mest dibin.*

# JI BO XATIRÊ AFERÎNERÎ MERHEMET-KIRINA LI AFERÎNDEYAN

**Şêx Sadî Şîrazî**, kûrahî û tenikîya qelbî, ya ku divê mûmîn jê re xwedî be, bi hîkayetekê wiha îzah dike, dibêje:

"Salekê li Şamê ğelayeke wilo rabû ku aşiqan eşq jibîr kir. Dilopeke tenê jî baran nebarî. Çandinî, lêvên wan jî şil nebûn. Çi qeder kehnî hebûn tev çikîyan. Ji bilî hêstirên çavên hejaran hîç ti aveke din nema.

Dema wezîyet wiha bû, rojekê dostekî min hate dev min. Bûbû çerm û hestî û wilo mabû. Haleveku ew mirovekî zengîn, qudretmend, xwedî şan û şeref bû, hem jî gewde-mezin bû. Dema min halê wî dît ez heyirî mam; min ji wî pirs kir, min jê re got;

«-Ey dostê xuy-xweş ê min; çi bû, felaketeke çawa hate serê te? Sebebê vî halê xwe yê zeîf, kerixî û kedermend ê ku ez dibînim ji min re vebêje!..»

Dostê min ji ber vê peyva min ğemgîn bû, di nav heyretê de ji min re wiha got:

«-Dostê min! Heke tu sebebê kedera min nizanibî, ev çi ğeflet e! Heke tu zanibî naxwe tu çima ji min dipirsî? Ma tu nabînî ku hema bibêje felaket gihaye dawîya xwe. Ne ji asîmanî baran bi ser

erdê de dibare, ne jî ji erdê feryad û hewarên ax-goyan bi asîmanî ve derdikevin!»

Min jê re got:

«-Ez pê dizanim! Lêbelê ev ğela çima ev qeder tu di bandora xwe de ğerq kirî? Her tiştên te hene. Heke mirovên din ji birçîyan biçin helakê, ji ber vê çi ji te re ye?»

Vêca ew dostê min ê ehlê kemalê, her wekî nêrîna alimî li cahilî manedar manedar li min meyzand û ji min re wiha got:

«-Ma însanekî ku ew bi xwe li sahilê be û bibîne ku wa ye dostê wî jî di behrê de dixeniqe wê hizûr bikeve qelbê wî? Ev rengê min, ji ber sefaleta gel zer bûye. Rewşa bêkes û hejaran ez xistime vî halî. Ewê ku xwedî wijdan be, çawa naxwaze birînan di azayên xwe de bibîne, aynî wilo ew naxwaze birînan di mexlûqatên dîger ên Xuda de jî bibîne. Hemd ji Xuda re be, birînên min nîn in, lêbelê janên dîgeran wijdana min bi ligelig dilerizîne. Însanê ku li ber nexweşî rûniştibe, çendan bi sihhet be jî ma ewê çawa bi keyf bibe?

Ez kengê halê hejarên bêçare bibînim, her luqme û parîyê ku ez dixwim di qirika min de dimîne. Dibe her wekî ku ez jehrê dixwim. Ew însanê ku hevcinsên xwe di sefaletê de dibîne, ewê çawa li nav gulistanê keyf û şahîyê bike? Dema mirovek digrî, hêstir ji çavên min jî tên.»

Wekî ku di vê qissetê de jî hatiye ragihandin, di dilên tenik û hessas ên mûmînên kamil de ku bi jana êşdaran kûr dibin, adeta mehşerek dikele. Ev şewata dilî, wan heta bi ber pêpelinga derîyê ku li ber dergehê merhemeta Heq vedibe, dibe. Kî dizane ka li wir çi sirrên mûstesna têne bihîstin, çi dîmen û menzarayên mûhteşem ên hikmetê têne temaşekirin?!

## JI BER GOTIYE; HEQ EW AFERAND...

Îman, gihiştina heqîqeta mehebbetê ye. Mehebbet, ew meharet e ku mirov karibe wê ji bo serkehnîya mûtleqa wê, wê ji bo yê ku ji wê re layiq be, yanî wê ji Ellah Teala tenê re hesr bike (mehebbet û hezkirina xwe bide wî bi tenê). Lêbelê hezker, ji hezkirinên hezkirî/ hezkirîya xwe jî hez dike. Ji lewma hezkirina ji Xuda, îcab dike ku mirov di serî de ji hebîbê wî Mezinê me Pêğemberê wî, ji ehlê Beyta wî, ji eshabê kîramên wî, ji dostên Heq hez bike. Piştre jî mirov ji her heyber û mexlûqan hez bike; lêbelê bi qasî qîmetê wan yê li cem Xuda, ji wan hez bike.

Dema **Hezretê Yûnus Emre** digot; "em ji aferîndeyî hez dikin ji bo xatirê aferînerê wî.." û dema ew kûr û hûr bi çîçeka zer re hesbahal dibû, ew bi heyranîya bilind û ulwî ya temaşekirina mohra qudreta îlahî ya di heyberan de ketibû halekî mest..

**Hezretê Şahê Neqşebendî** di salên pêşîn ên întîsaba xwe de ji wan heywanên ku bi xizmeta wan ve meşğûl bû waqif bûbû ku ew dengên ğemgîn ğemgîn derdixin û bi wan dengên xwe jî li ber Heq digerin, lavlavan jê dikin, wî ji van dengên wan çêjeke manewî ya cipcuda distand..

**Hezretê Hudayî**, destên xwe ji bo jêkirina kîjan çîçekê dirêj kiribe, her wî ji wê candarê dibihîst ku wa ye ew bi zimanê xwe ji Heq re tesbîhan dide û wî qîm nekiribû çîçekekê ji wan jî biqurêfe, jêke.

Lewra ji bo aşiqên Heq li kaînatê heybereke abes û bêhikmet nîn e. Hemû aferînde, berhemeke wisan mûkemmela ji îdrakê biwêdetir ya îlm, qudret û hunera Hunermendê Mûtleq e, ewê ku ew ji tineyî anîne wicûdê. Ji lewma ew mohra qudret û ezameta îlahî bi xwe re hildigrin. Bi vê sebebê aşiqên Heq, daîm di hikmetê

de kûr dibin, hemû aleman bi hissa mehebbeta îlahî û bi nezara îbretê temaşe dikin û bi heyranîya ku dibihîzin jî mest dibin.

## NEZARA RAHMÊ

**Hezretê Mûhyeddîn Îbnû Erebî** dibêje:

“*Bi evdên Xuda re bi şefqet û merhemetê mûamele bike. Merhemet û şefqeta xwe zehf zehf bi ser hemû mexlûqatan de biweşîne û zinhar nebêje; «ev gîya ye, bêcan e, feyda wî nîn e!» Tam bi berevajî vê, ji têgihiştina te biwêdetir, zehf zêde feyda wan û xêra wan heye. Tu aferîndeyî li ser halê ku dîtî bihêle û bi merhemeta Aferînerî merhemetê li wî bike!*”

Fêkîyê pêşî yê îmaneke kamil merhemet e. Merhemet jî pêwîst dike ku em tiştên di dest xwe de ji bo mirovên hê ji xwe mehrûmtir îkram bikin. Însan, di îmanê de çi qeder bigihe kemalê, her ku diçe ew her berfereh dibe û dibe dergehekî merhemetê yê wisan ku rahma wî li ser hemû mexlûqatan şamil tê.

Ewê ku ji Heq hez bike, ewê ji aferîndeyên wî jî hez bike. Ewê ku dostê Heq be, ewê ji bo mexlûqatên wî jî bibe dost. Bi nezara şefqet û merhemeta Xaliq jî meyzandina li hemû mexlûqatan, zafereke/serkeftineke exlaqbûna bi exlaqê îlahî ye.

**Mezinê me Pêğemberê** ku ji bo alemê wek rahm hatiye hinartin wiha ferman dike, dibêje:

“*Cenabê Heq rahma xwe li ser sed qisman dabeş kir; not û neh beşên wê li cem xwe girtin, beşeke wê jî li ser erdê peya kir. Ha bi sebeb vê beşa rahmê, mexlûq li hev û din rahmê dikin. Heta dema mehîn şîr dide ciwanîkê/a xwe jî lingê xwe bi jorê ve radike*

*ji bo zirarê nede ciwanîkê/a xwe, ev jî esereke wê beşê ye ku ji sedê yek e.*" [274]

Ji lewma dilê wî însanê ku bi exlaqê îlahî xwedan exlaq bûbe, ji bo xatirê aferînerê wan, aferîndeyên wî jî xweş dibîne; dilê wî heta bi kuderê dirêj bibe û pê bigihe xwe wezîfedar dijmêre; bi hewara hewcedaran ve bazdide diçe; şefqet û merhemetê tewzî û belav dike.

Lewra di dilê mûmînî de çi qeder mehebbet zêde bibe, nîhayet ewê bigihîje wê sewîyê ku -bi qasî qîmetê wan yê li cem Xuda- hemû heyberan bixe nava vî sûretê mehebbetê. Mûmîn, di vê rewşê de dibe evîndarê heqîqî, yanî dibe dostê Heq.

Dostên Heq jî bi mexlûqatan re zehftir îtîbarê didin cewhera wan û li ser wê bi wan re tevdigerin. Mesela însan ji hemû heyberan mûkerremtir e, ew bi hesta ku "însan li sererdê xelîfê Xuda ye" lê dinêrin. Dîsa ew, bi îdraka ku sirreke îlahî têde hatiye pifkirin[275] ji însanî nêzîk dibin.

Bi vê sebebê, di dînê me de çi qeder hurmet ji bo sağê însên hatibe fermankirin, aynî ew qeder hurmet ji bo mirîyê însên jî hatiye fermankirin. Dema Mezinê me Pêğember li cenazê însanekî mirî rast dihat, li vê nedimeyzad ka ew misliman e, yan jî ne misliman e, derhal definkirina wî dixwest. Dîsa ji ber vê hurmeta ku ji însanî re tê girtin, şûştina cenazeyan bi ava zehf sar, yan jî bi ava kelî, hincirandin û kişkişandina wî, pêl qebra wî kirin, yan jî li wir raxistina bizavên bêhurmetî hatine qedeğekirin.

Di roja me de bi taybetî ji bo dost û lêzimên li deverên dûr jî karibin di rêwresma cenaze de beşdar bibin bi rojan rawestandina cenaze di depoyên hewaya sar, yan jî morgan de di esilê xwe de

274. Buxarî, Edeb, 19; Mûslim, Tewbe, 17.
275. Binêrin, Hicr, 15/29.

divê em jibîr nekin ku ev cefa gihandina bi mirîyan e.. Çawa Mezinê me Pêğember jî tewsîye kiriye ku di karê techîz û tekfîna mirî de lezê bikin, tabûtê bi lez hilgirin bibin, cesedî bê dan-çavnêrîkirin demek berî demekê defin bikin.

Li alîyê din, mûmînên kamil ku dikarin bi nezara merhemeta Xaliq li mexlûqatan binêrin, însan çi qeder gunehkar dibe bila bibe -çi qeder di gunehan de noq bûbe bila bûbe- îtîbarê bi mûkemmelîyeta di cewhera wî de didin û pişta xwe nadinê. Ew hîdayet û li tobe-vegerîna wî dixwazin û hewl didin ji bo xilasîya heyata ebedî ya wî bibin kemerbenda rizgarîyê. Ev mîsal, vê heqîqetê çi xweş îzah dike, dibêje:

Di esnaya sohbeteke di dergehê Hezretê Mewlana de serê mirovekî serxweş derket û ew hate dergehî. Derwêşan ew êşandin û hewl dan wî derxînin derve. Hezretê Mewlana, hizir pê kir ku ew serxweş, însanek e, ji bo lêgerîna li heqîqetê hatiye xwe avêtiye ber penaha dergehî û ji derwêşên ku ew êşandin re axivî, ew wiha îqaz kirin:

“-Wî şerab vexwariye lêbelê adeta hûn serxweş bûne!”

Lewra bi nezara merhemeta Xaliq li mexlûqatan meyzandin; nefret-kirina ji gunehan neguhêzin ser gunehkaran û di şûna hêrsbûna ji gunehkaran de îcab dike dilê mirov bi wan bişewite û li wan were rahmê. Ewên ku ji nîmeta îmanê mehrûm bin, yan jî ewên ku xwe bi dev zeîftîyên nefsanî ve berdabin, divê mirov ne bi zimanê sar û jehr-verêjê mar, lêbelê bi lîsanê rahmê ji wan nêzîk bibe û pêşî jî dilên wan feth bike.

Wezîfa mûmînî ne ev e; ji gunehkaran hêrs bibe, wî ji halê wî re terk bike, yan jî bi ser wî de hil bibe û pê de bike qîrewîr. Lêbelê wezîfa wî ev e; bi destên wî bigre û jê re bibe arîkar ji bo ew li heyateke nezîh û paqij vegere. Ğayeya mûsamehakarî ya di

banga dostê Heq **Hezretê Mewlana** de jî ku dibêje; "*were, were, tu çi dibî bibe, dîsa were!..*" ev e; ew însanî bi cewhera rasteqîneya wî bide naskirin, wî di zemîna feyzdara şefqet û merhemetê de ji gemara gunehan temîz bike û lezzeta îmanê pê bide çêjandin û tamkirin. Lewra dergehên dilî yên mûmînên kamil, wekî merkeza rehabîlîteyeke manewî ye ku bi uslûba rahmê nexweşîyên manewî têde têne dermankirin.

Ji tabîînan alimê hedîs û fiqhê **Mûtarrif bin Ebdûllah** dibêje:

"*Ew kesê ku di nava xwe de li hemberî gunehkaran hest bi merhemetê neke, hîç nebe jî naxwe bila di lehê (ji bo) wan de bi tobe û îstiğfarê dûa bike. Lewra ji bo mirovên li sererdê ji Ellah Teala meğfîret xwestin, ji exlaqê melaîketa ye.*"

Ha ewên ku bi Xuda re dost bin, nemaze ew bi bira-dînên xwe re jî dibin dost. Di dilê xwe de zehf zêde ji wan hez dikin. Heta ev mehebbeta wan di nav zemanî de ew qeder berfereh dibe ku ew dikevin derdê xilaskirina temamê mirovan. Çawa **Ebû Ebdûllah el-Besrî** di bersiva pirsa:

"-Bendeyên welî yên Xuda di navbera xelkê de çawa têne naskirin? Elametên wan çi ne?" de gotiye:

"-Welî, bi zehf şîrînbûna zimanê wî û xweşbûna exlaqê wî, bi qebûlkirina uzrê mirovên ku uzr dixwazin, -çi baş bin, çi jî xirab bin- tam bi şefqet û merhemetê meyzandina li hemû mexlûqatan tê fehmkirin."

Bi rastî dilê mûmînekî kamil, bi xilasîya ebedî ya însanekî bextiyar dibe û ji bo bûna însanekî di nav herifîna manewî de jî ğemgîn dibe. Lewra dilê wî, ummaneke (okyanûseke) merhemetê ye ku çendan dijminê wî be jî bi helakbûna însanekî hest bi îzdîrab û janê dike. Bi vê sebebê, hîç naxwaze ti kes li zirarê bikeve, tam bi berevajî vê ew ji bo her kesî selamet û seadetê arzû dike.

Çawa dema li Taîfê kevir li **Mezinê me Pêğemberê Rahmê** dihatin barandin jî wî ji Rebbê xwe, ne ji bo helaka xelkê wî bajarî; lêbelê ji bo hîdayet û xilasîya ebedî ya wan dûa dikir.

**Hebîb en-Neccar** ê ku di Sûretê Yasînê de qisseta wî tê vegotin, dema wî nefesa dawîya xwe dida jî, dema perdeyên aîdê dinyayê dihatin girtin û perdên îlahî dihatin vekirin, wî merhemet li mirovên ku kevir lê dibarandin, dikir û wî wiha gotiye:

"**..Ax, xwezî qewmê min bizanîya ku Rebbê min ez efû kirime û ez kirime ji yên ku ji bo îkraman bûne mezher**." [276] Ev jî ufûqa şefqet û merhemetê ya di dilê mûmînekî de ku ji bo qewmê xwe yê ew şehîd kirin jî xilasîyê arzû dike, li holê datîne.

## ÎLAHÎ EXLAQ

Dostên Heq ku para xwe ji sifetên Rebbê me yên "Rahman û Rahîm" wergirtine, di şûna ku bi aynî hemberê bidin wan bendeyên Xuda ku di bara wan de xeta û qusûr kirine de, yan jî di şûna cezakirina wan de efûkirinê tercîh dikin. Lewra ev, tezahura mehebbet û merhemeta sipehîtirîn e ku ji bo xatirê Aferînerî ji aferîndeyan re tên şanîdan. Yanî ew kemal û gihan e ku mirov bi umîda nailbûna ji bo efûya Xuda, di xusûsa bersivdana sûckerî de nefsa xwe ji navberê derxîne û karibe wî ji bo efûya îlahî bixe mûxateb. Ew netîcekeke wê umîdê ye ku mirov karibe bendeyên Xuda her efû bike û her efû bike heta paşê mirov jî ji bo efûya Xuda bibe layiq. Ev qisse, vê heqîqetê çi xweş îzah dike:

**Hezretê Behaûddîn Neqşebendî** ji bo mirovekî ku li hemberî wî bêedebî kiribû, hêrs nebûbû û bi tebessumê pêşwazî li wî kiribû. Lêbelê ew însanê ku bêtoretî kiribû kete derdekî mezin û

276. Yasîn, 36/26-27.

kete wezîyeteke wisan ku biçe helakê. Wî xetaya xwe fehm kir û tobe kir. Hezretê Neqşebend, dema di ber mala wî zilamî re derbas dibû, diçû nav mala wî û pirsa hal û xatirê wî dikir. Piştre jî ji wî zilamî re got:

“-Ellah Teala şîfa-bexş e, netirse, înşaellah tu dê baş bibî!”

Wî kesî li ser vê peyvê bi nedameteke mezin got:

“-Mezinê min! Min li hemberî we bêedebî kir, min dilê we êşand, min efû bikin.”

Vêca Hezretê Behaûddîn Neqşebend jê re got:

“-Qelbê me ew dem êşîya. Lêbelê vêga ayneya dil tertemîz e. Baş zanibe ku şûrê mûrşidan, rêzanan şûrekî tazî ye û ji kalanê xwe derketiye. Lêbelê mûrşid xwedî merhemet e. Ew şûr li kesî naxe. Ji nav mirovan sade ewên ku li belaya xwe digerin, tên xwe li wî şûrî dixin.”

Dema bi nezara Xaliq li mexlûqatan were meyzandin, hingê tehemmulkirina diltengî û meşeqqetên mirovan jî hêsan dibe. Ew hê bêhtir bi efûkarî, merhemetdarî û mûsamehakarî tevdigere. Lewra exlaqê îlahî vê pêwîst dike. Çawa Rebbê me wek mûqtezaya rahma bêdawî ya xwe, li hemberî mirovên ku li dinyayê li ber wî radibin û îsyan dikin jî sebr dike, nîmetên bêjimar ji wan re bexş dike, rizqê wan dide û ji bo wan efû bike jî gellek firsendan ji wan re nas dike û dixwaze ew halê xwe îslah bikin û biçin cennetê; dostên Heq jî feyza xwe ji serkehnîya merhemeta îlahî werdigrin, însanan efû dikin, ew rêya rast dibînin û ji bo qezenckirina rizaya Heq jî bi semîmîyet ğeyretê şanî didin.. Hîç ti zemanî ew xwe ğem nabin; ew şexsîyeteke misliman radixin ber çavan ku ehlê înfaqê ne, dîgerğem in û ji bo her kesî qencîyê difikrin.

Dîsa mûmînekî kamil, dema bendeyên hewcedar û jandar ên Heq dibîne, derhal berê xwe dide mûhaseba nefsa xwe, difikre û ji xwe re dibêje; "dibe ku ez di rewşa wan de bûma û ew jî rewşa min de bûna" û ew derdê wan bi derdê xwe dizane. Lewra ewê ku sade xwe difikre û bi helwesteke 'serê min jê naêşê' li hemberî însanên dîger hestsar bûn, bi ti awayan exlaqê mislimanî nabe.

**Şêx Sadî**, di berhema xwe ya bi navê "Bostan"ê de qisseteke wiha diguhêze, dibêje:

"Şevekê nîveke Beğdadê şewitîbû. Di wê navê de mirovekî got:

«-Zehf şukir, vî agirî zirar nedaye dikanên me!..» Mirovekî dinya-dîtî ev bersiva wî da:

«-Ey zilamê menfîetperest! Ma tu xwe tenê difikirî? Bila bajarekî nehîtî bişewite lê bila mala te xilas bibe, ma (ev) li xweşîya te diçe? Ew kesê ku dibîne însan ji birçîya keviran li ser zikê xwe girêdidin, heke ew ne mirovekî dil-kevir be, nikare mîda xwe tije bike! Kesekî bi wijdan ê ku dîtibû wa ye feqîrek ji birçîyan xwînê didaqurpîne, wê çawa karibe parîyê ku xistî devê xwe biçûyê?.. Rêwîyên bi merhemet dema bigihin cihê qunağa xwe, heta ewên di rê de mane newin, negihin wan, ew nikarin razin. Ewê ku keviran dikişîne dema merkeba wî di herîyê de biteqine, dilê padîşahan (pê) mûzderib dibe.»"

Ha halê siltanên dilan jî wiha ye. Dilên hessas ên wan, ne ku bi ezîyet pê gihana mûkerremtirînê mexlûqatan kurên Adem, lêbelê ew bi ezîyet pê gihana her mexlûqatekî din jî heta tu bibêjî bes, muteessir dibin.

Mezinê me Pêğemberê Rahmê li mirovekî rast hat ku wî bi guhê mêşinan digirt, ew dikişandin û ji bo serjêkirinê dibirin. Dilê wî bi vê xweş nebû. Derhal desttêwerdan kir û jê re got:

"-*Guhê heywanê berde û bi kenarê qirika wê bigre!*"[277]

Dîsa Mezinê me Pêğember di rê de li komeke mirovan rast hatibû. Ew li ser pişta heywanên xwe yên siwarbûnê rawestîyabûn (û bi hev re mehebbet û sohbet dikirin). Wî ji wan re wiha got:

"-*Bê westandin bi awayekî sipehî li heywanên xwe siwar bibin û bi awayekî sipehî bêhnberdanê bidin wan. Wan ji bo axaftinên xwe yên li ser rêyên xwe û li kolanên xwe nekin kursî. Çendîn heywanên lê siwarbûnê hene ku ew ji mirovên li wan siwar dibin bi xêrtir in û ew ji siwarê xwe bêhtir Ellah Tebareke û Teala zikr dikin*." [278]

Ev beyanên nebewî, di xusûsa nêrîna li mexlûqatan de çi qeder ufûqeke mûhteşema dilî dide telqîn û hînkirin. Ji bilî vê jî, di dewreke ku însan ji hessasîyetên wijdanî dûr bûne, di sulte û otorîteya maddeyê de dijîn û di wehşetê de ji keftaran jî derbas bûne de peydakirina hiqûqekî heta ji bo heywanan jî û heqên wan jî xistina bin mûhafezê; mîsaleke şaheser e, dide xuyakirin ka Îslam heq, edalet, şefqet û merhemeteke çawa bicih dike..

Çawa hêstireke/qantireke **Hezretê Ûmer bin Ebdûlezîz** hebû. Wî ew li bazarê dida xebatê û bi diravên ku ji heq-kirêya wê dihatin jî îhtiyacên xwe temîn dikirin. Karkerê ku hêstir dida xebatê, rojekê ji her zemanekî din bêhtir dirav anîn. Dema wî ji karkerê xwe pirs kir, jê re got:

"-Îro te çima zêde dirav anîne?" Karkerê wî ev bersiv dayê:

"-Bazar qerebaliğ û bi bereket bû." Lêbelê Hezretê Ûmer bin Ebdûlezîz ji bersiva wî tetmîn nebû. Wî ev talîmat da karkerê xwe, jê re got:

277. Îbnûmace, Zebaih, 3.
278. Ehmed, III, 439.

“-Ne xêr, ne wisa ye! Te hêstir zehf daye xebatê û ew westandiye. Sê rojan îstîrahetê bide hêstirê.”

Dîsa yek ji dostên Heq **Hezretê Bayezîdê Bistamî**, bi zehf zêde mehebbeta xwe ji Xuda bi rûhê xwe ew qeder hessas dibû ku ji bo xatirê Xaliqî îzdîraba her yekî ji mexlûqatan di singa xwe de hiss dikir. Ev dostê Heq rojekê, merkebek dît ku ji ber lêdana wê xwarî ji pişt wê ve xwîn dihat. Di wê gavê de xwînê destpê kir ji çaqên Hezretê Bayezîdê Bistamî jî bider hat.

Di dilê **Hezretê Ûmer** de hesta ku mexlûqat emanetekî îlahî ye û qeweta mislimanî bi çi tiştî bigihe ew jê berpirs e, ew qeder cihê xwe girtibû ku dilê wî bi merhemetê ew qeder zirav û tenik bûbû heta ku bibêje: “*Heke li kenarê Diclê mêşinek bikeve avê û têde bixeniqe, Xuda wê hesabê wê ji Ûmer bipirse*..”

Yek ji dostên Heq **Hezretê Sufyanê Sewrî** jî, li hemberî mexlûqatan pirr bi merhemet bû. Rojekê wî li çarçîyê çûkek dît ku ew di rekehekê/ qefesekê de bû û wî her dixwend. Wî ew çûk kirrî û serbest berda. Ev çûk her şevê dihat mala Sufyanê Sewrî û dema wî nimêj dikir wî çûkî jî li wî temaşe dikir. Carina jî dihat li ser milên wî didanî. Dema wî wefat kir, ew çûk dîsa hate mala wî. Çi dema ew li malê nedît, çû ser qebra wî, xwe avête serê û ew jî li wir mir. Di wê esnayê de ev dengê sivik hate bihîstin:

“Ji ber merhemeta Sufyan ji mexlûqatên Ellah Teala re, Ellah Teala jî zehf merhemet lê kiriye.” [279]

Carinan jî qencîyeke biçûka ku besît û ne giring tê xuyan jî dikare ew qeder merhemeta Cenabê Heq celb bike ku ew bi îkram û lutfên mezin wasil bibe. Ji lewma divê mirov li hemberî xêrên biçûk ên ku ne giring tên zenkirin jî bêgane nemîne. Lewra însan,

279. Ewlîyalar Ansîklopedîsî, c. 11, rûp. 65, Weşanên Tûrkîye Gazetesî, Îstanbul 1993.

li dinya û uqbayê îhtiyaca wî bi arîkarîya manewî ya her xêrê heye; çi biçûk be, çi jî mezin be.

Yek ji giregirên eshabê kîram **Ebû'd-Derda** dar û dirext li Şamê diçandin. Mirovek ji cem wî nêzîk bû, sosret-mana xwe ji rewşa wî îfade kir û jê re got:

"-Tu dostê Hezretê Pêğember bûyî û tu xwe bi çandina daran ve meşğûl dibî?"

Hezretê Ebû'd-Derda ev bersiv da wî kesê ku karê wî dikir, biçûk didît û jê re wiha got:

"-Raweste, di bara min de wiha bi rasthatin zû biz û hukm nede! Min ji **Resûlûllah** bihîst ku wiha digot:

«*Heke kesek darekî biçîne û însanek ji fêkîyê wê darê bixwe, yan jî kîjan heyberek ji mexlûqatên Xuda jê bixwe, ev, ji bo wî kesê ku ew dar çandiye, dibe sedeqe.*»" [280]

Tabî ye ku bi berevajîyê vê, zirar gihandina bi gîya û candanên dîger jî tevgereke wisa ye ku webalê mûcib dike. Çawa bav û kalên me jî gotine; *"ewê ter û şînîyê bibirre, ew ser (îyan) dibirre."* bi vê gotina xwe jî bi awayekî wecîz û zehf kurt ev heqîqet îfade kirine.

Di civakên Îslamê de bi mûessesebûna destûra 'ji bo xatirê Aferîner şefqet û merhemet-kirina li aferîndeyan' ku berdewamîyê erz dike, **weqf** anîne meydanê. Ğaye, bi merdîtî îkramkirina ji bo hewcedarên hemû mexlûqata ye, bi şefqet û merhemet nêzîkbûna ji wan e û bi vî awayî jî qezenckirina rizaya Cenabê Heq e.

Bav û bapîrên mûbarek ên me -bi qasî ku hatiye tesbîtkirin- bîst û şeş hezar û çend weqf damezirandine, ji însanan bigre heta bi heywanan, ji heywanan bigre heta bi nebatat û gîyayan xizmet ji

280. Ehmed, VI, 444.

wan tevan re pêşkêş kirine û hemû mexlûqat wek emanetekî îlahî teleqqî kirine, wergirtine. Ev jî yek ji mûhîmtirîn wezîfeyên wijdanî yên ku divê em ji wan re xwedî bin, tîne bîra me..

Lewra li gorî exlaqê Îslamê, hemû mexlûqatên ku ji bo însanî hatine mûsexxer û stûxwehrkirin, emanetekî îlahî ne. Ew jî roja qiyametê wê dîsa werin sağkirin û wê heqê xwe ji însanên ku neheqî li wan kirine, wergirin. Ji vê hêlê ve, divê mirov jibîr neke ku bi taybetî di roja me de bi behaneya ku mirov li rengên wan temaşe bike, yan çêj û zewqê ji çiheçiha şîrîna wan bistîne hebskirina çûk û teyran di rekehan de, yan jî mehkûmkirina hinek masîyan di akvaryûman (hewzê camî) de ewê sibê di qiyametê de wek hesab derkevin pêşberî însanî.. Ya ji van tevan jî xirabtir ev e ku ji bo paqijkirina firêz û koka çandinîyan şewitandina zevîyan e ku bi agir-berdana wan jî bêjimar mexlûqat telef dibin. Dîsa li gellek deveran wehşetên wekî 'dan-berdana-hav' ya hêştir, conega û dîkan ku têne kirin, yek ji webal û gunehên giran in û ewê di mîzana îlahî de derkevin pêşberî mirovî.

**Welhasil** Cenabê Heq, di nav heyberan de însan mûkerrem kiriye, şanê wî bilind kiriye û her tişt ji bo fermana wî stûxwehr û amade kiriye. Ji vê hêlê ve her tişt, ji wî re emanet e. Însan, bi qasî taqeta xwe ji hemû heyberên di behrê de, di bejîyê de û di hewayê de berpirs e. Çawa Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

"**Paşê ew roj, bêşiwar pirsa nîmetan** (ên ku we li dinyayê ji wan îstîfade kiriye) **wê ji we were kirin!**" [281]

Ji lewma bi çakî û qencî bizavkirina bi hemû mexlûqatan re çi candar bin û çi necandar bin; îsraf nekirina wan, çarcur nekirina wan, ji nefsa xwe tenê re terxan nekirina wan, bi nezaket, hessasîyet û hurmet bikaranîna wan nîmetên ku ji bo mideteke berwext

281. Tekasur, 102/8.

ji teserrufatîya me re hatine bi emanetkirin; nîşaneke eşkere ye ji bo mehebbet û tazîma me ji bo Rebbê me yê ku ew ji me re bexş kirine..

Seydayê rahmetî yê me **Hezretê Mûsa Efendî**, ji cil û bergên wî bigre heta bi xwarin û vexwarina wî, heta bi destgirtina wî bi qedehekê jî di her hal û hereketên wî de tenikî, nezaket û zarafet bi ber çavan diket; ew îfadeyeke fiêlî û kiryarî ya hessasîyeta wî bû ku ew her tiştekî aferandî wek emanekî îlahî dibîne.. Dîsa wek ji van cureyan, bi îlawe li ser îhtîmama ku wî ji mûmînên xwedî îhtiyac re nîşan dida, wî ğeyret dikir ku kitik û segên li derdorên wî dihewîyan û heta qaqlîbaz (martı) û kevokên bi ser bexçê wî re difirîn jî bi îkram û îhsanên xwe û ji merhemeta fereha xwe nesîbdar bike..

Mûmînekî bi merhemet, ji bo karibe deftera amelê xwe bi xêran tije bike, ew sermayê heyata xwe bi awayê berhemdartirîn bikartîne û di nav ğeyret û hewldanê de dibe ji bo her îmkana xêrê ku derdikeve pêşberî wî, binirxîne. Lewra wekî ku **Hezretê Ebûbekr** jî gotî:

“*Dinya, bazara mûmînan e; bi şev û bi roj, sermayê wan; amelên salih, malên ticaretê ye; cennet, qezencên wan e; cehennem jî zirara wan e.*”

Yanî li pêşîya însanî du rê hene: Ji seîdan (bextiyaran) re cennet, ji şeqîyan (bedbextan) re cehennem heye. Li dinyayê bariztirîn elametê şeqîtîya li uqbayê jî “bêmerhemetîtî” ye. Çawa Mezinê me Pêğember di hedîsa şerîf de gotiye; “**Merhemet, bes ji dilê mirovê ku şeqî be, tê standin**.” [282]

282. Tirmizî, Birr, 16/1923.

**Rebbê me, dilê me bixe serkehnîyeke bi bereketa şefqet, merhemet, mehebbeta ji aferîndeyan re ji bo xatirê Aferînerî! Me tevan bike ji bendeyên salih ên xwe ku mexlûqat ji destên wan, zimanên wan, halên wan û peyvên wan îstîfade dikin. Me ji bo rahma îlahî ya xwe, înayeta xwe û ef û meğfîreta xwe bike mezher!**

**Amîn...**

اللهم احشرنا في زمرة الصالحين

**"Xudayê me! Me di roja qiyametê de bi zumreya salihan re heşr bike!"**

# *Di Pevrebûna Digel Salihan De Ufûqa Teberrukê*

*Hezretê Îmam Ğezalî dibêje:*

*"Ewladê min! Heke xusûsek hebe ku heta tu bibêjî bes, tu dêhnê xwe bidiyê, ew jî ev e; tu bi kê re dikevî û bi kê re radibî. Vê baş bizane ku sevîkeke sağlema sêvan, nikare sêveke rizîyayî ya di nav xwe de sağlem bike. Lêbelê sêveke rizîyayî, dikare tevan birizîne. Ji bo vê, tim û daîm bi salihan re rûne û rabe!"*

*Çawa ji salih û sadiqan hizûr û dilşadî xwe di dilên mirovan de dide xuyakirin, aynî wisan ji ğafil û fasiqan jî diltengî û qesawet (dilhişkî) xwe dide xuyakirin. Lewra bahoreke ku bi ser gulistanekê de bawezîn bike ku ew bi çîçekên nadîde yên wekî gul, sumbil/pîvok û qerenfîlan hatibe xemilandin, ew bi kuderê ve here her bi xwe re bêhnên ku dilan mest dikin, dibe; bi berevajîyê vê jî, bayekî ku bi zibilgeh û mirarên bêhn-pêketî de derbas dibe û tê jî wan bêhnên ne xweş li hawîrdoran diweşîne, belav dike; ew bi vî awayî nefesan dixitimîne û rûh û gîyanan jî dilteng dike.. Ji lewma ulfet û hezkirina ji zalim û fasiqan, adeta pençeşêra heyata manewî ye.*

# DI PEVREBÛNA DIGEL SALIHAN DE UFÛQA TEBERRUKÊ

Ji bo mûmînekî şensê ji hemû şensan mezintir ev e; ew karibe bi dostên Heq û salihan re bibe heval û bi wan re hevhal bibe. Lutfeke mezina Cenabê Heq û nîmeteke mûstesna ya ku şukirê pêwîst dike jî ev e; însan dostên Heq û ehlê manewîyatê nas bike, biçe hizûra wan, here derdora wan û ji feyz û rûhanîyeta hal û hereketên wan îstîfade bike.

## TRANSFERA HALÎ/GUHASTINA REWŞÊ

Çawa mirovê ku li nav bexçê gulan digere, bêhna gulan diçe wî, ew kesê ku diçin dîwana salihan jî ji wan însanên qenc feyz û rûhanîyet xwe di dilê wan de didin eks û xuyakirin. Lewra hal sarî ye (sîrayet dike, ji yekî diçe yê din). Nexasim jî ev taybetmendî û xusûsîyet, di “hal”ên kurê-Adem de hene. Ji lewma dil tim û daîm di halê tesîra kirrîn-firotinê de ne.

Ji vê hêlê ve pevrebûna digel mûmînên salih û sadiq, di terbîya nefsê de -aynî wekî radyasyonê- mûşahedekirina wê bê îmkan e, lêbelê ew mûessirek e ku encama wê mûtleq e.

Yek ji aliman **Cafer bin Suleyman** -rahmetûllahî eleyh-, wê feyza dilî ya pevrebûn û hevaltiya bi însanên salih re ku bi wî daye qezenckirin, wiha vedibêje:

"Dema ez di dilê xwe de hest bi hişkbûnekê dikim ez radibim derhal diçim cem **Mûhemmed bin Wasî** (yek ji arif û alimên mezinên tabîîna ye) û di meclisa wî de pişkdar dibim, li rûyê wî dimeyzînim. Bi vî awayî hişkbûn ji dilê min diçe, keyfxweşîya îbadetê tê, dikeve nava min, tenbelî ji ser min radibe diçe û ez heft-eyeke temam bi vê keyfxweşîyê îbadetê dikim."

Ji bo vê divê mûmîn ehemmîyeteke mezin bi pevrebûn û hevaltîya bi evdên alim, arif, salih û sadiq re bide û zanibe ku ev yek ji ğiza û xureka mûstesna ya hebûna manewî ye. Çawa Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

"**Gelî ehlê îmanê! Ji Xuda bitirsin û bi sadiqan re bibin!**"[283]

Heke em dêhnê xwe baş bidinê emê bibînin ku Cenabê Heq di vê ayeta pîroz de ji bendeyên xwe re negotiye; "**sadiq bibin!**" lêbelê ji bo mûhafeza teqwayê ferman kiriye, gotiye; "**bi sadiqan re bibin**." Lewra di rêya bûna sadiq de gava pêşîya ku were avêtin, berê xwe dana mehebbeta ji sadiqan û bi wan re heval bûn e. Sadiq bûn jî, netîca tebîîtirîna vê rewşê ye.

Çawa gellek ji **eshabê kîram** ku stêrên asîmanê Îslamê ne, di serdema cahilîyetê de heyateke nîv-wehşî ya ji fitretê re berevajî jîyabûn. Lêbelê piştî ew bi Îslamê şerefmend bûn, bi Resûlê Xuda re bûn heval. Di encama wê pevrebûna keş û hewaya mehebbeta fereh ku dijîyan de, exlaqê nebewî xwe di wan de şanî da û êdî ew bûne qenctirîn û bi fezîlettirîn însanên dinyayê.

283. Tewbe, 9/119.

Ew mehebbet, semîmîyet, ğeyret û fedakarîya ku wan di vê pevrebûnê de raxistî ber çavan destana li ser zimana ye. Lewra wan, di oğira ku karibin bi Resûlê Xuda re bibin de di **hazar** (nav malên xwe) û seferê de xwe ji ber dana ti bedel û bacekê nedane paş.

Çawa di Herba Uhudê de hinek sehabe ji Ensar û Mûhaciran xwe li hawîrdora Resûlê Xuda pêçan ku wan ji canê xwe jî hê bêhtir ji wî hez dikir; û wan li ser şehîdbûna li pêşberî wî peyman dane Xuda û wiha gotin:

"-Ya Resûlellah! Bila rûyê me li pêşîya rûyê te sîper be, bila bedena me ji bedena te re feda be! Silavên Xuda, her daîm li ser Te bin! Em hîç ti zemanî ji cem te cuda nabin!" û wan heta bi dawîyê şerr kir. [284]

Di sefera Zatû'r-Rîqaê de jî her şeş kes ji eshaban bi dor li hêştirekê siwar dibûn, ji ber rêveçûnê lingên wan qul dibûn û neynokên wan jê diketin. Wan perçên kincan li lingên xwe yên ku di nav xwîn û birînan de bûn, dipêçan û ew bi vî halê xwe li pey pêğemberê Xuda diçûn. [285]

Dîsa sehabîyên xanim jî ewladên xwe yên ku di hatina dîtina Resûlûllah de dereng diman û zemanekî dirêj ew nedidîtin bi awayekî ciddî şîyar û îqaz dikirin û di vê xusûsê de hîç tawîz nedidan.

**Welhasil** ji bo mirov qelb ji masîwa mûhafeze bike û tim û daîm wî ji bo telqîn û danhînkirinên xêrê bike mûxateb, ji bo mirov karibe ji rûhanîyeta wan îstîfade bike divê mirov unsîyet û sebra xwe bi warisên Pêğemberê Xuda; alim, arif, salih, sadiqan bîne. Ev hal, bi navberên dîyarkirî (zeman zeman dubarekirina wî)

284. Îbnû Sa'd, II, 46; Waqidî, I, 240.
285. Binêrin. Buxarî, Meğazî, 31.

adeta wekî şarjbûneke maneyî û dubare qezenckirina enerjîyê ye. Çûna hevdîtina mûmînên ehlê ğeyretê û bi eşq û şewq hatin, îbret standina ji halên zatên xwedî fezîlet û şîyarbûna ji temara ğefletê, bera îhtiyaceke mezin e.. Bi vê sebebê rêya terbîya manewî tesewwuf e. Di tesewwufê de pîvana esğerî ji bo pevrebûna digel salihan; pişkdarbûna di "**sohbet**"an de ye û zeman zeman bi salihan re hatina cem hev e ku ev qaîdeyekî heta dereca dawîyê mûhîm e.

## BI CIVAKA ZALIMAN RE NERÛNE!

Bav û kalên me gotine; "def'a mefasidan ji celba menafi'an ewla ye." Yanî defkirin û berterefkirina tiştên xirab û bi zirar ji qezenckirina tiştên baş û bi feyda li pêştir û giringtir e.. Ji lewma xwe parastina ji rûbirû-manê ya li ber tesîrên xirab ên mirovên zalim û fasiq zerûretek e; hem jî ew li pêşîya beşdarbûna di heleqeya feyza salihan de tê. Çawa **Hezretê Îmam Ğezalî** di nesîheteke xwe de wiha dibêje:

"Ewladê min! Heke xusûsek hebe ku heta tu bibêjî bes, tu dêhnê xwe bidiyê, ew jî ev e; tu bi kê re dikevî û bi kê re radibî. **Vê baş bizane ku sevîkeke sağlema sêvan, nikare sêveke rizîyayî ya di nav xwe de sağlem bike. Lêbelê sêveke rizîyayî, dikare tevan birizîne.** Ji bo vê, tim û daîm bi salihan re rûne û rabe!"

**Mezinê me Resûlûllah**, ehemmîyeta pevrebûna digel salihan û xwe parastina ji îxtîlat û tevlîkirina bi fasiqan re çi xweş îfade kiriye, gotiye:

"*Mîsala hevalê qenc û hevalê neqenc; wekî însanên barhilgirê miskê û pifkerê kurhê ye. Herçî barhilgirê miskê ye, ya ewê ji bêhna xwe ji te re îkram bike, yan jî tu dê ji wî bikir.*

*Herçî pifkerê kurhê ye; ew, yan wê cilên te bişîewitîne, yan jî bêhna pîsa wî wê were te.*” [286]

Wekî ku hate dîtin temayulên rûhê însanî, bi qasî îstîdada mirovên li nêzîkî wî -çi hindik be yan jî gellek be- lêbelê bivê-nevê her wê sîrayet bike û biçe wan. Zêdebarî vê, sîrayeta di halan de bi “**mûsbet**”-bûnê yan jî “menfî”-bûna halê yê ku sîrayet dike ve jî ne bend e. Di her hal û karî de întîqal û guhastin bicih tê. Bes bila di vê nêzîkatîyê de peywendîyên “**mehebbet**” û “**unsîyet**” hebin.

Yanî çawa ji kesên salihên ku mirov bi mehebbetê ji wan nêzîk dibe hizûr û dilşadî xwe di dilên mirovan de dide xuyakirin, aynî wisan ji ğafil û fasiqan jî diltengî û qesawet (dilhişkî) xwe dide xuyakirin. Lewra bahoreke ku bi ser gulistanekê de bawezîn bike ku ew bi çîçekên nadîde yên wekî gul, sumbil/pîvok û qerenfîlan hatibe xemilandin, ew bi kuderê ve here her bi xwe re bêhnên xarîqe yên ku dilan mest dikin, dibe; bi berevajîyê vê jî, bayekî ku bi zibilgeh û mirarên bêhn-pêketî de derbas dibe û tê jî wan bêhnên ne xweş li hawîrdoran diweşîne, belav dike; ew bi vî awayî nefesan dixitimîne û rûh û gîyanan jî dilteng dike.. Ji lewma ulfeta xwe dana bi zalim û fasiqên ku xwe di heyata nefsanî de noq kirine û ğafilên ku Xuda û axret jibîr kirine û unsîyeta xwe bi wan anîn, adeta pençeşêra heyata manewî ye.

Ji bo vê Cenabê Heq, di xusûsa xwe parastina ji mûnkerên ku tim û daîm bandorên xirab li hawîrdorên xwe diweşînin de wiha dibêje:

“**Dema tu mirovên ku di bara ayetên Me de bi neqencî xwe di axaftinê de noq dikin, bibînî, derhal berê xwe ji wan vegerîne, heta paşê ew xwe di peyveke ğeyrê wê de noq bikin.**

---

286. Buxarî, Buyû, 38.

**Heke şeytan, bi te bide jibîrkirin, piştî bi bîrhatinê li cem wê civata sitemkaran nerûne**."[287]

## DEMA PÎVAN ZIRAV BIBIN..

Wekî ku di her xusûsê de wisa ye, di mijara pevrebûna bi salihan re û xwe parastina ji fasiqan de jî çi qeder hessasîyet zêde bibin, pîvan jî ew qeder zirav dibin. Gellek tecellî têne hisskirin; lêbelê ti kes ferqê naxe wan. Ev bûyera ku mîsaleke vê ye, zehf bi îbret e:

**Seyfî Baba**, yek ji hezkirîyên **Hezretê Samî Efendî** ye, zatek ji ehlê hal bû, keşfa wî eşkere bû. Ew li Topqapîyê dirûnişt. Ew rojekê hatibû Erenkoyê, hatibû serdana Hezretê Samî Efendî. Lêbelê dema ew hat kete dîwanxanê, li erdê ket û ji xwe çû. Ew kesê ku hatibû pêşwazîya wî ji bo wî bigihîne hizûra Seyda bi telaş av bi ser wî de rijand û piştî ew bi hişê wî ve anî, dema got:

"-Derhal doktorekî bang bikin!" Seyfî Baba di halekî westayî de mûdaxele kir û dema jê re got:

"-Na ewladê min! Doktor moktor bang nekin; Elaqa halê min bi ti nexweşîyeke maddî re nîn e! Heta ez ji Topqapîyê hatim Erenkoyê di rêyan de ez li ehlê îsyanê rast hatim, qesaweta di cihên wan ên îsyanê de tesîr li min kir. Vêca çi dema ez di vî derîyê tertemîz re ketim hundur û ji nişka ve bi rûhanîyeta li hundur nail bûm, dilê min nekarî xwe li berê bigre. Bi bereketa keş û hewaya manewî ya li vir û bi himmeta siltanê arifan Samî Efendî piştî demeke hindik hîç tiştekî (nexweşîyeke) min namîne."

Sîrayeta di halan de, dema di pevrebûnên ğeyrê îxtiyarî de jî ev qeder bi tesîr dibin, naxwe mirov nikare bihizire ku mûmînekî

287. En'am, 6/68.

ehlê teqwayê bi îrade û arzûya xwe bi ğafilan re rûne û rabe. Di vê xusûsê de nuqsanîya hessasîyeta ku tê şanîdan, dikare însanî heta bi xusrana ebedî jî bikişkişîne û bibe. Çawa Pêğemberê Xuda di hedîsa şerîf de gotiye:

"*Însan ji kê hez bike, pê re ye*." [288] Yanî însan ji kê hez bike û zehftir bi kê re rûne û rabe wê di qiyametê de jî bi wî re heşr bibe.

**Şêx Sadî Şîrazî**, sîrayeta di halan de di bara ku çawa ew dikare heyata manewî ya kesekî biguherîne de van mîsalan dide, dibêje:

"*Segê Eshabê Kehf, ji ber ew bi sadiqan re bû, wî şerefeke mezin qezenc kir; navê wî kete Qur'ana pîroz û tarîxê. Jina Lût Pêğember jî ji ber bi fasiqan re bû, ew bi kufrê dûçar bû*."

**Hezretê Ubeydûllah Ehrar** jî di vê xusûsê de hezkirîyên xwe wiha îqaz kirine, gotiye:

"*Bûna bi eğyar û bêganeyan re, futûrê bi qelb, bêserûberîtîyê bi rûh û perîşanîyê bi dil dide*."

Çawa **Hezretê Bayezîdê Bistamî** rojekê di dilê xwe hest bi diltengîyeke wiha kir. Wî, kir û nekir xwe ji wî halî xilas nekir. Vêca ji mirovên li dîwana xwe re got:

"- Ji kerema xwe binêrin ka di nav we de yekî bîyanî heye?"

Wan jî lêgerîn kir, ti kes nedîtin. Lêbelê Bayezîdê Bistamî israr kir û ji wan re got:

"-Ji kerema xwe baş lêgerîn bikin. Li cihê kopalan jî binêrin."

Wan tekrar lêgerîn kir û kopalê mirovekî ğafil dîtin. Wan ew kopal deranîn derve. Dilaramîya Bayezîdê Bistamî jî hate cihê xwe.

288. Buxarî, Edeb, 96.

Ev hal, tezahureke eşkere ya keyfîyeta manewî ye ku heta sîrayet dike diçe tiştan jî. Divê mirov hizr pê bike ku heke di tiştên fasiq û zaliman de jî diltengî û qesawet xuya bibe, naxwe divê mirov çi qeder bi awayekî ciddî xwe ji îxtîlata wan biparêze!

**Welhasil;** çawa ji ğafilan tesîrên menfî xuya dibin û qelbî dilteng dikin, aynî wisan ji salihan jî tesîrên mûsbet û feyzdar hasil dibin û dil keyfxweş dikin. Heqîqetan bi bereketa îrtîbata qelbî ya ku bi salihan re tê danîn, mirov dikare bi çendîn qezencên manewî nail bibe û bigihe.

Lêbelê ji pevrebûna bi salihan re meqsed; pevrebûneke qelbî ye. Lewra pevrebûneke fiêlî, dibe ku her zeman mûmkin nebe. Yan jî heke pevrebûneke fiêlî çêbibe jî dema pevrebûna qelbî çênebe, dîsa feydekek jê hasil nabe. Bi vê sebebê ji pevrebûna bi salihan re meqsed; pevrebûna dilî ye, yanî ev e; mirov karibe li hemberî heyat û weqaetan wekî salih û sadiqan hiss bike û wekî wan tevbigere. Heke halê pevrebûneke wiha hebe feyda pevrebûnên zahirî jî heye. Dîsa heke halê pevrebûneke wiha hebe, zirara cudahîyên zahirî jî nîn e.

Li alîyê din, ji bo mirov karibe feyza dilî ya ku ji pevrebûna bi salihan re tê payîn temîn bike, wê hinek usûlên sipehî hene ku yek ji van jî "**teberruk**" e.

## COŞ Û XUROŞA TEBERRUKÊ

**Teberruk**; mirov ji ber mehebbeta îmanê çi qeder ji Ellah Teala hez bike, wek encameke siriştî ya hestê jî ew qeder mirov ji hemû tecellîyên îlahî yên di heyberan de ji wî nêzîk bin re jî hurmet û tazîmê şanî dide. Lewra hezkirina ji heyberekê, sîrayet dike, ji wê diçe tiştên ku ji bo wê mehebbetê bûne wesîle, yan jî diçe tiştê ji bo her tiştê ku elaqa wê pê re heye jî. Hezker, ji her tiştê hezkirîyê/ya

xwe hez dike û ji bo wî/ê dibe medfûn. Teberruk, terbîya meheb-beteke zirav e ku mirov di rêya kemala qelbî de serî lê dide.

Pevrebûna bi salihan re çawa ji bo bibîranîna Xuda dibe wesîle û manewîyata mûmînî teqwîye dike, aynî wisan tiştê ku salihan tînin bîra mirovî jî, îrtîbata qelbî ya bi zatên salih re jî temîn dike.

Ji bilî vê ji bo mirov karibe bi feyz û rûhanîyeta salihan nail bibe, yek ji usûlên ku mirov serî lê bide jî teberruk e, wekî ku hinek mirov zen dikin ew ne karekî bêmesned û ji cureya bid‘etan e jî. Lewra di heyata Hezretê Pêğember de tezahurên bêjimar ên vê hene, di bara hebûna vê de hedîs hene û di kitêbên sîyerê de gellek rîwayet hene. Heta di Buxarî'yê de beşeke mûsteqil hatiye vekirin, têde dide zanîn ku eshabê kîram û mislimanên ku li pey rêç û şopa wan çûne jî xwe bi tiştên wekî zirxê Mezinê me Pêğember, kopalê wî, şûrê wî, gustîla wî, pora wî, riha wî, pêlavên wî, aman û firağên av û xwarina wî û cil û bergên wî, teberruk kirine..[289]

Çawa **Enes bin Malik** dide zanîn ku eshabê kîram çawa bi hev re pêşbazî dikirin ji bo xwe bi pora Mezinê me Pêğember teberruk bikin. Ew vê rastîyê jî wiha diguhêze, dibêje:

"Min Mezinê me Resûlûllah dît; berberê wî ew tiraş dikir. Eshabê wî jî adeta li hawîrdora wî bûbûne wekî perperîkan. Wan dixwest mûyekî tenê jî ji pora wî nekeve erdê û bêşiwar ew bikeve destê yekî ji wan." [290]

Mîsaleke dîger ji mîsalên sipehîtirîn ên ğeyret û hewldanên eshabê kîram ku xwe bi her tişteke aîdê Mezinê me Fexrê Kaînatê teberruk kirine jî ev e; **Xalid bin Welîd** çend mûyên mûbarek ji riha şerîfa **Hezretê Pêğember** di nav şaşika xwe de mûhafeze dikirin.

---

289. Binêrin. Buxarî, Fardû'l-Humus, 5.
290. Mûslim, Fezaîl, 75.

Li gorî rîwayetê di Hecca Wedaê de dema mûyên di enîya mûbareka Mezinê me Pêğember de hatin qusandin, Xalid bin Welîd li ber Mezinê me pêğemberê Xuda gerîya û jê re got:

"-Ya Resûlellah! Mûyên enîya xwe bide min! Di vê xusûsê de ti kesî li ser min tercîh neke! Bila dêya min û bavê min ji Te re feda bin!" Dema ew mû jê re hatin dayîn, wî çavên xwe bi wan maliştin û ew xistin nav qismê pêşî yê şaşika xwe. Bi bereketa van mûyên mûbarek jî ti civakek nîn e ku ew di cengê de bi wan re rûbirû hatibe û ew meğlûb nekiribin. Çawa Xalid bi xwe jî gotiye:

"-Min berê wê bi kîjan terefî ve dabe, ew dever her hatiye fetihkirin!"[291]

Eshabê kîram jî ji bo karibin ji arîkarîya îlahî re bibin mezher, bi mûyên mûbarek ên aîdê Mezinê me Pêğember ku wan bi xwe re digerandin û dibirin û dianîn teberruk dikirin.

Di berhema bi navê "**Esrarû'l-Mûhemmedîyye**"de wiha hatiye gotin:

"Heke pora Resûlûllah, kopalê wî, yan jî qamçîyê wî di qebra miroveki gunehkar de were danîn, ew îsyankar, bi bereketa wê tişta ku hatiye danîn ji ezabê xilas dibe. Evên ku hatine jimartin, heke li mala însanekî, yan jî li bajarekî hebin, ewên ku li wir dijîn çendan haya wan ji hebûna wan nebe jî dîsa bi xêra bereketa wan gellek bela li wan nakevin. Ava Zemzemê û kefenê ku bi Ava Zemzemê hatibe şilkirin jî ji vê qebîlê (cureyê) ne." [292]

Dîsa Mezinê me Pêğember xirqeya xwe ji bo Hezretê Weysel Qeranî şandibû û gotibû:

291. Waqidî, III, 1108; Îbnû Esîr, Usdu'l-Ğabe, II, 111.
292. Rûhu'l-Beyan, VII, 486-487.

"*-Bila ew vê li xwe bike û ji ummeta min re dûa bike!*" [293]

Ev jî îşareteke eşkere ye ku xwe teberruk-kirina bi tiştên Mezinê me Pêğember heye.

Çawa **Esma**'ya keça **Ebûbekr** jî rojekê cubbeyek deranî û wiha got:

"Ev cubbe yê Resûlê Xuda bû. Ev heta bi wefata wî jî li cem **Aîşe** ma. Hezreta Aîşe di piştî (berî) wefata xwe de cubbe da min. Pêğember ew li xwe dikir. Em wî ji bo nexweşan dişon û bi ava wî (xwe bi wî teberruk dikin û ji Ellah Teala) şîfayê teleb dikin." [294]

Çi qenc çi jî neqenc bi qasî hemû keyfîyetên manewî û tiştan ew bi mekanan jî sîrayet dikin. Ji lewma mûmîn, heta ku jê were divê xwe ji cih û mekanên ku masîyet li wan têne kirin û qehra îlahî li wan tecellî dibe, dûr bigre. Li hemberî vê jî heta mûmkin bibe divê ew ji cih û mekanên mûbarek û mûqeddes ên ku amelên salih li wan têne îfakirin û lutfên îlahî li wan tecellî dibin jî îstîfade bike. Ev bûyer, vê heqîqetê çi xweş îfade dike:

**Resûlê Xuda** û eshabê xwe, di wextê xwe de koça xwe li devera Hicrê li warê Qewmê Semûd danîbûn. Eshaban, ji bo îhtiyacên xwe ji bîrên li wir av deranîbûn û hevîrê xwe bi wê avê strabûn. Vêca Resûlê Xuda ji wan re got; wê ava ku we ji wan bîran deranî birijînin, hevîrê ku we pê straye jî deynin ber hêştiran û bi wan bidin xwarin û ji bo xwe avê ji bîra dîtira ku hêştira Salih jê vexwarî, derînin wergirin. [295]

---

293. Mûslim, Fedaîlu's-Sehabe, 223-225.
294. Mûslim, Lîbas, 10.
295. Buxarî, Enbîya, 17; Mûslim, Zuhd, 40.

Dîsa Mezinê me Pêğember dibêje:

"*Ev Uhud çîyayekî wilo ye, hem ew ji me hez dike, hem jî em jî ji wî hez dikin. Dema rêya we bi wî alîyî bikeve çendan bi strî bin jî ji darên li wir bixwin.*" [296]

Mezinê me Pêğember bi wiha gotina xwe, nav li mûmînan daye, ew teşwîq kirine da ku ji bo teberrukê ji fêkîyên darên li derdora wî çîyayê mûbarekê Uhudê bixwin. Lewra rahm li ser wan cih û mekanan peya dibe ku mirovên salih lê hebin û li warên ku amelên salih hatibine kirin jî, melaîket li wan deveran hazir dibin, hizûr û sekînet perda xwe bi ser wan deveran de berdidin. Divê mirov li mekanên wiha berê xwe bi dûa û îstiğfarê bide Xuda û ji bereketa manewî ya li wir îstîfade bike.

Çawa eshabê kîram, bi her tiştê Mezinê me Pêğember re di halê teberrukê de jîyane. Di dilên wan de bûbû lezzeteke cipûcuda ku ew ji wê ava wî av jê vexwaribe, avê vexwin, destê wî bi çi tiştî gihabe, ew wê ji xwe re bikin sertac, por û riha şerîfa wî ya ku bêhna gul-bêhna xwêhdana wî jê dihat, (li cem xwe) veşêrin, bi van bîranên ezîz, feyz û rûhanîyeta Mezinê me Pêğember li cem xwe hiss bikin, mehebbet û bey'eta (peymana) xwe ji wî re taze bikin, çendan piçek be jî hesreta xwe ya ji wî, pê bibin û tim û daîm wî di rojeva îmana xwe de (zindî) bigrin..

Ji van hemû rîwayetan tişta ku tê fehmkirin ev e; bi Resûlûl-lah bi xwe, bi tiştên wî û bi her çi tiştekî aîdê wî teberruk kirin; sunneteke merfû û usûleke meqbûl û rewa ye. Wiha kirina gellek ji eshabê guzîde yên wî û tesdîqkirina Mezinê me Pêğember ji bo vê kirina wan, heta hinek caran bi van tiştan ferman-kirina wî û hinek caran jî bi van tiştan îşaret pê dana wî, delîleke eşkere ya vê rastîyê ye.

296. Buxarî, Cîhad, 71, 74, Et'îme 28; Mûslim, Hec, 462, 503-504.

Selefê salihîn ê ku di piştî eshabê kîram de hatine jî li ser jîyandina van cure usûlên bi teberrukê re elaqedar, dewam kirine. Çawa **Ehmed bin Henbel** ku ew bi xwe ji selefê salihîn e û yek ji seydayên mezin ê hedîsê ye, çend mîsalên teberrukê ku mehebbeta wî ji Resûlûllah didin xuyakirin, kurê wî **Ebdûllah** wiha vedibêje:

“Bavê min, radihişt mûyekî ji pora Resûlûllah, li ser lêvên xwe didanî û ew radimûsan. Min bavê xwe dît ku mûyên pora Resûlê Xuda li ser çavên xwe didanî. Wî, mûyên pora Resûlê Xuda di avê de noq dikirin û wî ew av vedixwar. Wî bi vê avê (ji bo teberrukê) ji Xuda şîfa dixwest.

Rojekê bavê min rahişt tasa ava Resûlûllah, piştre ew di satilekê de şûşt û ji wê vexwar.

Dîsa wî bi nîyeta şîfayê ji ava Zemzemê vedixwar û ew bi destên xwe û bi rûyê xwe dihekand.” [297]

Dîsa yek ji dostên Heq **Hezretê Çeştî Mûînûddîn** e, her sal perda qebra wî dihat guherandin û perda kevin jî bi mezinekî ewlîya dihate dayîn. Yan jî ew bi padîşahê wî zemanî dihate dayîn, wî jî ev wekî gewhereke bi qîmet ji bo teberrukê di sindoqekê de dihilanî û diveşart. Di wextekî ji mirina **Hezretê Îmam Rebbanî** nêzîk de dîsa perda wê qebrê guherandin û perda kevin ji Hezret re birin, jê re teqdîm kirin û wiha gotin:

“-Yê ji bo vê layiq hûn in.”

Hezretê Îmamê Rebbanî tam bi edeb qebûl kiriye û perde daye xizmetkarên xwe, ji dilê xwe axîneke kûr kişand û got:

“-Ji bo Hezretê Hace ji vê perdê, lîbasekî nêzîktir nîn e. Vê veşêrin, bila ev ji kefenê min re bimîne.” [298]

---

297. Zehebî, Sîyeru A‘lami’n-Nubela, Beyrût 1986-1988, XI, 212.
298. Ewlîyalar Ansîklopedîsî, c. 7, rûp. 322, Weşanên Turkîye Gazetesîyê, Îstanbûl 1992.

## MEHEBBET ŞERT E!..

Sirrê îstîfadekirina ji teberrukê, “**mehebbet**”a rastî ya ji xwediyê wê xatira û bîranînên mebarek e. Mezintirîn elametê mehebbetê jî bi fedakarî û îtaetê jîyîna li ser îstîqametê ye. Heke mehebbeteke wiha hebe, ji teberrukê tê îstîfade-kirin. Di rewşeke berevajî de ew tişt, yan jî mekanê ku pê tê teberruk-kirin, wê wekî heybereke ji rêzê bimîne. Aynî wekî wî gomlekê Yûsuf li Misrê ye, bavê wî Yaqûb heta ji welatê Kenanê bêhna wî dikir, li hemberî vê, birayê wî yê ku ew gomlek anî ji sirra wî emanetê ezîz bêxeber bû.

**Hezretê Mewlana** vê mîsalê wiha îzah dike, dibêje:

“*Di Yaqûb de cazîbeyeke (surdarîyeke) Yûsuf hebû. Ji lewma bêhna gomlekê Yûsuf ji cihekî zehf dûr jî giha wî. Birayê wî, yê ku ew gomlek hildigirt jî ji bêhn-kirina wê bêhnê mehrûm bû. Lewra gomlekê Yûsuf di destê birayê wî de emanetek bû. Birayê wî mûkellef bû ku wî gomlekî bibe ji Hezretê Yaqûb re teslîm bike. Yanî ew gomlek di destê birayê wî de wekî carîyekeke mûtena ya di destê bazirganê koleyan de bû. Ne ji bo nefsa bazirganê koleyan bû..*”

**Welhasil** şertê lîyaqeta ji bo îstîfadekirina ji teberrukê, mehebbeteke rastî ye. Transfera (guhastina) halî ya ku tê arzûkirin, bes bi xêra vê bi aynîbûnê, yan jî bi arîkarîya manewî digihe. Heke na, ewên ku ji bo kûrahîyeke rûhî ya wiha bêgane bin, ji bereketa nîmeta ji hemû nîmetan bi feyztir jî mehrûm dibin.

Ev qisse, vê mijarê çi xweş û xweşik îzah dike:

Mirîdek ji mirîdên wî ji **Hezretê Bayezîdê Bistamî** re dibêje:

“Ez benî, perçekekî ji kurkê xwe bidin min ezê ji bo teberrukê wî li ser xwe hilgirim!..” Bayezîdê Bistamî jî di bersiva wî de jê re wiha dibêje:

“Kurê min, piştî tu ne li ser îstîqametê bî, ne kurkê Bayezîd, heke tu di çermê wî de sobaberîyê bikî û bikevî navê jî ti feyda nade!..”

Yanî sirf bi şeklî tenê mirov bi kemala manewî nagihe. Ji bo ew netîca ku ji teberrukê tê hêvîkirin hasil bibe, pêşî ya zerûrî ev e; divê mirov qiwama dilî qezenc bike.

## BI ĞAYE-KIRINA WASÎTEYÊ

Em vê jî îfade bikin ku feyda teberrukê, însan ji ber meheb-beta îmanê hurmetê ji heyberên mûbarek re şanî dide, bi sebeb vê Cenabê Heq jî arîkarî û rahma xwe ji wan re lutf dike. Ewê ku rahm û bereketê lutf dike, ne ew heybera ku teberruk pê tê kirin bi xwe,  bes Cenabê Heq e. Heke Heq Teala rahma xwe nede tecellî û xuyakirin, ew heyberên ku bereketa wan tê hêvîkirin di hukmê “hîç”ê de ne.

Ji lewma divê mirov di vê rê de nekeve îfrat û tefrîtê û li ser îtîdalê here. Yanî divê mirov xwe ji van fikr û hizrên îfratê dûr bise-kine; digel ku însan wan amelên salih ên ku Cenabê Heq bi kirina wan ferman kiriye, nake jî dîsa bawer dike ku heke ew xwe bi zatên salih, yan jî xwe bi bîranên wan teberruk bike, ev ji bo xilasbûna wî têrê dike.. Dîsa îcab dike ku mirov nekeve şaşîyên wekî vê; mirov di heyberên ku xwe bi wan teberruk dike de adeta qudreteke îlahî wehm bike..

Lêbelê di vê mijarê de heke mirov însanên ku zêdegavîyan dikin ji xwe bike behane û bi temamî teberrukê red bike, yan jî îddîa bike ku teberruk “**bid‘et**” heta “**şirk**” e, lewra ew di esrê seadetê û di serdema selefê salihîn de nebûye jî esera cehaleteke eşkere ye. Divê mirov jibîr neke ku failê Mûtleq bes Cenabê Heq e û ew heyberên ku teberruk bi wan tê kirin jî sade ji wan wesîlan

îbaret in ku ew rahm, meğfîret û lutfa Xuda (bi ser mirovî de) celb bikin. Çawa di mideta seyahetê de ew navgîna ku mirov lê siwar dibe wasîteyek e, ne ğaye ye, aynî wisan ew heyberên ku teberruk bi wan tê kirin jî her yek ji wan wesîlan îbaret in ku mirov serî li wan dide ji bo rahma Xuda (bi ser xwe de) celb bike, bikişîne.. Naxwe ew tiştên ku aîdê zatên salih ên xwedî fezîlet, bi sebeb ku Ellah Teala qîmet bi wan zatan daye, ew bi qîmet in û ji ber vê ehemmîyet bi wan tê dayîn. Bila evd, mirada xwe, bi van wesîlan ji Xuda bixwaze.

**Rebbê me, ji bo me tevan bi nesîb û mûyesser bike ku em karibin li vê dinyayê bi qelbê xwe bi bendeyên wî yên salih û sadiq re bibin, li axretê jî em bi evdên wî yên ku ji wan hez dike re heşr bibin. Ew, me bike ji wan bendeyên xwe yên ehlê besîret, fîraset û ğeyretê ku karin bi awayê layiq her wesîlan ên ku me ji wî nêzîk bike, binirxînin..**

**Amîn...**



# *Tewessul*

*Rêyên ku diçin cem Heq, bi qasî hijmara nefesên mexlûqatan pirr in. Ya mûhîm, em bibin xwedî ew dil ku haya wî ji wan wesîlan hebe; ew ên ku ji Cenabê Heq tên û me ji Heq nêzîk dikin û ew karibe bi awayekî layiq ji wan îstîfade bike. Heke dilê evdî ji bo heq û heqîqetê tî be Rebbê me, dê ji wî re bi nesîb bike ku wan wesîlên wî ji Xuda nêzîk dikin, bi wî bide dîtin.*

*Ji bilî pêğemberan û mirovên ku wan ragihandibin wekî din hîç ji ti kesî re temînat nîn e ku ewê di nefesa dawî ya xwe de bi îmanê here (axretê). Mûmîn, bi sebeb vê fikarê divê her nefesa heyata xwe di nav ğeyreta jîyîna Kîtab û Sunnetê de derbas bike û ew jî her wekî Yûsuf vê nîyazê; ".. (Ya Rebbî!) Min wek misliman bimirîne û min bixe nav salihan!"* (Yûsuf, 12/101) *ji dilê xwe û ji ser zimanê xwe nexe.*

# TEWESSUL

Hezker, ji bo gihiştina hezkirîyê/ya xwe her firsendê li ser canê xwe bi minnet dizane û serî li her rêyê dide. Ji bo bi mehebbet û dilxweşîya hezkirîyê/ya xwe bigihe jî hemû derfetan dinirxîne û naxwaze di vê rê de hîç ti firsendekê ji dest xwe berde.

Evîndarekî Heq ê ku dilê wî bi mehebbeta îmanê tije ye jî, ji bo her **wesîlê tewessul** dike û wê ji xwe re bi navgîn dike ku wî digihîne rizaya Heq û nêzîkatîya ji wî. Yanî ew bi eşq û şewq xwe bi her wesîlê digre. Lewra Rebbê me bi xwe bi vê ferman dike, dibêje:

"**Gelî ehlê îmanê! Ji Xuda bitirsin û li wesîleya ku we ji wî nêzîk dike jî bigerin!**.." [299]

Bêşiwar wesîleyên ji hemû wesîleyan mezintir ew navgîn û wasîte ne; ku evdî bi ğayeya aferîna wî û bi rizaya Heq digihînin. Di serê van wasîteyan de jî Qur'ana Pîroz, îbadet, amelên salih, esmau'l-husna, selewatên şerîf, zeman û mekanên mûbarek, pêğember û dostên Heq, tên. Tewessul ev e; însan van xusûsên ku Cenabê Heq ji wan hez dike bi wesîle bike û bi hurmeta van dûa ji Ellah Teala bike. Yanî tewessul, bi hurmeta xusûsên ku Cenabê Heq ji wan hez dike, ji nîyet û arzûya celbkirina riza û lutfa wî îbaret e.

299. Maîde, 5/35.

## WESÎLEYÊN WUSLETA HEQ

Ew wesîleyên ku evdî bi Heq digihînin (ew qeder zehf in ku) bi hijmartinê xilas nabin. Rebbê me, wek berhema rahma bêdawî ya xwe, ji bo lutfê li me bendeyên xwe bike çendîn wesîle ji me re îhsan kirine. Ev wesîle, însanîyetê diajone ser heq û heqîqetê û ew ji bo “**banga ji bo cennetê**” ya Rebbê me qasidîtîyê dikin.

- Ew ayetên Qur’anê ku **Hezretê Ûmer** li mala xweha xwe Fatima bihîstin, jê re bûne wesîle ku ew bi îmanê şerefmend bibe.

-**Hezretê Bişrê Hafî** di rê de perçekek kağez dît, ji ber ku li serê lefzê “Ellah” nivîsayî bû, wî ew mîna gewhereke nadîde nesîbekî mezin zanî, ew temîz kir û bi hurmet ew li mekanekî mûtena’yê jê re layiq danîbû, ev jê re bûbû wesîle ku ew ji heyata nefsanî ya xwe ya berê xilas bibe, were ser hîdayetê û bikeve ser sîrata mûsteqîm..

- Dozeke tije sirrên manewî ya mêr û jinekê bûbû wesîle ku **Qadî Mehmûd** bi keş û hewaya heqîqetê bigihe. Dema ew bi semîmîyet bi dûv vê dozê dikeve, xwe li ber derîyê **Hezretê Uftade** dibîne û li ber wî derî-yî rêya **Hudayî** keşf dike ku ew jî diçe zirweya marîfetûllah’îyê.

-Derwêşê bi navê **Şems** pencereyekê ji alema îşq û wecdê vedike û ew dibe wesîle ku **Hezretê Mewlana** bi sultantîya dilan bigihe.

Zêdekirina mîsalên wekî van mûmkin e. Lewra rêyên ku diçin cem Heq bi qasî hijmara nefesên mexlûqatan pirr in. Ya mûhîm, em bibin xwedî ew dil ku haya wî ji wan wesîlan hebe; ewên ku ji Cenabê Heq tên û me ji Heq nêzîk dikin û ew karibe bi awayekî layiq ji wan îstîfade bike. Heke dilê evdî ji bo heq û heqîqetê tî be, Rebbê me, dê ji wî re bi nesîb bike ku wan wesîlên wî ji Xuda nêzîk dikin, bi wî bide dîtin.

Yek ji dostên Heq **Hezretê Ebû'l-Hesen Haraqanî** wiha gotiye:

"Evdek hewl bide kîjan tiştî ji bo dîtina Xudayê bilind bike wesîle; ya ji wan tevan sipehîtir **Qur'ana Pîroz** e. Naxwe divê hûn di rêya Qur'anê de li Xudayê bilind bigerin." [300]

Heqîqeten Qur'an, serîyekî wê di destê qudreta Xuda de ye, serîyê dîtirê wê jî werîsekî sağlemtirîn e û ji me re hatiye dirêjkirin. Divê em vî werîsî sağlem û asê bigrin û wî ji xwe re bikin wesîle ji bo em bi nêzîkatîya ji Heq û bi lutfên îlahî bigihin.

Ji bo meqbûlbûna dûayan yek ji xusûsên ku însan ji bo xwe karibe bike wesîle jî **selewatên şerîf** in. Di 'en'aneya Îslamê de dûa, bi hemdele û selweleyê destpê dike, dîsa bi wan jî bi xîtamê tê gihandin. Selwele, di bara Mezinê me Pêğember de dûayek ji Cenabê Heq e ku ew (selewat) nayên redkirin û di rêya qebûlbûna wan de qenaetek mewcûd e. Naxwe serkehnîya ku em serî û paşîya dûayên xwe bi selat û selamê dixemilînin jî ev heqîqet e. Bi vî awayî em tewessulê dikin; em bi hizra ku qebûlbûna dûayên xwe jî temîn bikin, em dûayên xwe dixin navbera du dûayên ku qebûlbûna wan mûheqqeq e..

Wesîlekeke dîtira ku mûstecab-bûna dûayan temîn dike jî **esma'yên îlahî** ne. Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

"**Navên ji hemû navan sipehîtir** (esmau'l-husna) **yên Xuda ne. Naxwe bi van navan dûa ji wî bikin!**"[301]

Ji bilî vê Mezinê me Pêğember dema ji Ellah Teala baran dixwest "**Nimêja Îstisqa**"yê kiriye, bi vî awayî ji bo qebûlbûna dûaya xwe bi nimêja nafîle tewessul kiriye. Çawa Rebbê me jî gotiye:

---

300. El-Hedaîqu'l-Werdîye, rûp. 458.
301. E'raf, 7/180.

**“Gelî ehlê îmanê! Bi nimêj û sebrê arîkarîyê ji Xuda bixwazin!.**.” [302]

**Amelên salih** jî ji bo gihiştina xêran û xilasbûna ji diltengîyan wesîle ne. Di bara îzahkirina vê mijarê de hedîseke şerîf heye, dide zanîn ku ji ummetên berê sê heval derketibûne seferê û halê wan ji me re digihîne. Bi kurtî ew wiha ye:

“Di esnaya rêwengîyê de baran li wan sê hevalan dibare, ew xwe dixin şikefttekê ji bo şeva xwe têde derbas bikin. Ji nişka ve kevirek ji çîyê dikeve û devê şikeftê bi ser wan de digre. Vêca ew jî ji hev re dibêjin:

«- Ji bilî bi amelên salihên me ji Xuda dûa-kirinê me ti çareyek nîn e. Ji Xuda pê ve ti kes nikare me ji vir xilas bike.»

Yek ji wan îtaet-kirina xwe ji bo dê-bavên xwe ji xwe re dike wesîle. Kevir piçekê ji cihê xwe dileyize, lêbelê ne wekî ku ew karibin ji şikeftê derkevin.

Yê duduyan, tirsa xwe ji Xuda, heya û îffeta xwe ji bo xwe dike wesîle. Kevir piçeke din jî ji derî dertê lêbelê dîsa ne wekî ku ew karibin ji şikeftê derkevin.

Yê sisêyan jî rîayetkirina xwe ji bo heqê evdan ji xwe re dike wesîle û lavlavê ji Xuda dike. Vêca kevir bi temamî ji devê şikeftê derdikeve û ew jî jê derdikevin derve.” [303]

302. Beqere, 2/153.
303. Binêrin. Buxarî, Edeb 5, Enbîya 53, Zikr 100.

## WESÎLEYA ME YA JI HEMÛ WESÎLEYAN MEZINTIR..

Çawa mirov dikare amelên salih ji xwe re bike wesîle, aynî wisan ji bo xwe bi wesîle-kirina **Resûlûllah** jî ku em bi wesîleya teblîğ û îrşada wî hînî wan amelan bûne jî zehf tebîî ye ku ew caiz û heta elzem e. Lewra ew, li cem Heq ji hemû mexlûqatan bi qîmettir e.. Ellah -celle celaluh- ji amelên me û ji her tiştên mewcûd tevan bêhtir ji Mezinê me Pêğember hez dike.

Beşerîyet, bi hurmeta mehebbeta Rebbê me ji Wî "Nûrê Hebûnê" ji bo ef û kerema bê serî û bê binîya Rahman bûye mezher. Çawa Mezinê me Pêğember di hedîsa şerîf de gotiye:

"Dema Adem ew zelleya ku bi sebeb wê ji cennetê hatiye derxistin, kir, wî xetaya xwe fehm kir û got;

*«-Ya Rebbî! Ez bi heqqê Mûhemmed ji Te dixwazim Tu min bibexşînî.»*

Ellah Teala got:

*«-Ey Adem! Te Mûhemmedê ku hê min ew neaferandiye, ji kuderê zanî?»*

Adem got;

*«-Ya Rebbî! Dema Te ez aferandim û ji rûhê xwe pif kire min, min serê xwe rakir, min li ser sitûnên 'Erş dît ku hevoka; "La îlahe îllellah, Mûhemmedur-Resûlûllah" nivîsayî ye. Min zanî ku Tu, hezkirîntirînê aferîndeyan li cem navê Zatê xwe datînî!»*

Vêca Ellah Teala got;

*«-Ey Adem! Te rast got. Heqîqeten Ew, li gorî min ji mexlûqatan tevan hezkirîtir e. Ji bo heqqê wî dûa ji min bike. (Madem*

*te dûa kir), Min jî tu efûkirî. Heke Mûhemmed nebûya, min tu nediaferandî!»"*[304]

Ha qîmetê Mezinê me Pêğember li cem Heq ew qeder bilind e ku destpêka aferînê bi nûra wî bûye. Xaliqê Mûtleq Cenabê Heq e; lêbelê saiqê aferînê, Hezretê Mûhemmed e. Heke ew nebûya, alem dibûne çolên bêkes û bêkûs. Li kuderê sipehîtîyek hebe, eksek ji wî têde heye, lewra ew ji bo xatirê ava rûyê wî hatiye aferandin.

Ji bo vê, berî ew şerefê bi dinyayê bibexşe jî gellek pêğemberan di dûayên xwe de ew ji bo xwe kirine wesîle û xwe pê avêtine ber penaha Xuda. Bapîrê însanîyetê **Adem** mezinê me Pêğember ji bo dûaya xwe kire wesîle; bi efûya îlahî nail bû. Ew Resûlê bilind, ji bo sulba/pişta **Îbrahîm** întîqal kir; agir ji wî re hînik û bi selamet bû. Ew durrê bilind, dema kete sedefa Îsmaîl, kêrê stûyê wî nebirrî, li ser navê wî ji asîmanan beranê qurbanê hate peyakirin.

**Welhasil** pêğemberan jî bi hurmeta wî ji rahma îlahî îstîfade kiriye. Heta **Hezretê Mûsa** ji bo karibe bi bereketa tabîbûn û peyrewbûna wî bigihe xwestiye ku bibe yek ji ummeta wî. [305]

Ev bûyer, ji bo tewessula eshaban bi Mezinê me Pêğember mîsaleke tîpîk e:

Mirovekî kor hate cem Resûlûllah ji êşa di çavê xwe de gileh kir. Mezinê me Pêğember lê tewsîye kir ku sebrkirina wî, wê hê bi xêrtir be. Mirovê kor jê re bi israr got:

"-Ya Resûlellah! Min ti kes nîn e ku bi destê min bigre û bibe. Ev rewş, min zehf diêşîne. Ji kerema xwe, ji bo vebûna çavên min dûa bike!" Vêca Mezinê me Pêğember jê re got:

---

304. Hakim, Mûstedrek, II, 672.
305. Binêrin. Taberî, Camîu'l-Beyan 'an Te'wîlî ayî'l-Qur'an, Beyrût 1995, IX, 87-88.

*"-Here desmêj bigre, piştre du rekat nimêj bike, di pey de jî wiha dûa bike:*

*«Xudayê min! Ez bi (hurmeta) Mûhemmed Nebîyê Te ku Pêğemberê rahmê ye, ji Zatê Te dixwazim û berê xwe didim Te.. Ya Mûhemmed! Ji bo bi min dana îhtiyacên min ez bi Te berê xwe didim Rebbê Te!.. Xudayê min! Wî ji bo min bike şefaetçî!..»"*[306]

Di rîwayeta Hakim de ev jî hatiye îlawekirin; êdî çavê wî korî dît û ew rabû ser xwe. [307]

**Hafiz Îbnû Kesîr** dibêje; di Herba Yemamê de parolaya mislimanan:

"**Ya Mûhemmedah**: Ey Mûhemmed, arîkarîya me bike!" bû. **Xalid bin Welîd** di Herba Yemamê de piştî dijminê xwe ji bo mûbarezê (daberistinê) bang kir, bi dengekî bilind bi gotina parolaya mislimanan gazî kir; "Ya Mûhemmedah!" Ji bilî vê jî, di wê rojê de ji bo mûbarezê kî derketibe hemberê wî, wî tev jî têkbirin û ew ğalib hat. [308]

Tabîî tişta ku ji vê îfadê dihat qesdkirin ev nîyaz bû: "Xudayê min! Em bi wesîla Resûlê Hezkirîyê Te Mûhemmed berê xwe didin Te, bi hurmeta wî ji bo me nusret û zaferê lutf bike!"

Di tarîxê de gellek mîsalên vê hene. Çawa di herba Çanaqqalê de çi dema **Sersed Lutfî Beg**, bi wezîyeteke zehf mûşkil re rûbirû ma, wî bi feryad got; "Ya Mûhemmed bigihe! Kitêba te ji dest diçe!" û ew bi arîkarîya Xuda ji wê dîyarde/badîreyê xilas bûye.

Wekî vê çendîn tecellî hatine jîyîn. Çawa di herba Çanaqqalê de serdarê Îngilîz tarîxzan **Hamilton** jî ev heqîqet wiha îtîraf kiriye:

---

306. Tirmizî, Deawat, 118; Ehmed, Mûsned, IV, 138.
307. Binêrin. Hakim, Mûstedrek, I, 707-708.
308. Taberî, Tarîx, II, 513; Îbnû Kesîr, el-Bîdaye, VI, 324.

“*Ne hêza maddî ya Tirkan, lêbelê hêza manewî ya wan em meğlûb kirin. Lewra wan barût jî nemabû ku bavêjin me. Feqet me, hêzên ku ji asîmanî peya dibûn, mûşahede kirin!..*”

## BI HURMETA DILÊN ŞIKESTÎ..

Mezinê me Pêğember di hedîsa şerîf de dibêje:

“*Gellek kes di nav we de hene, ser û pora wan tevlihev e, di nav cilên kevin de ğerîb dixuyên û însan jî îtîbarê nadin wan, heke ew bi Xuda sûnd bixwin, Xuda sûndên wan pûç nake..* ***Bera bin Malik*** *jî yek ji wan e.*” [309]

Yanî kesên wiha li hemberî Cenabê Heq -heke tabîr caiz be- “ehlê nazîyê” ne. Heke ew bi israr çêbûna tiştekî ji Xuda nîyaz û umîd bikin û bi yemîn vê ji mirovan re bibêjin, Ellah Teala rûyê wan reş dernaxe.

Çawa **Bera** ku birayê **Enes bin Malik** bû ji tiştên dinyayî wî kevirekî çikandî jî nebû. Ew bi zadekî ku bi qeder nemire dijîya lêbelê feqîrtî jî bi sebr û tewekkulê pêşwazî dikir. Bera di serdema Hezretê Ûmer de di herbekê ji herban de pişkarî kiribû. Di vê cengê de misliman bi hijmara xwe zehf hindik bûn û ketibûne wezîyeteke zehmet. Fermandarê artêşê, bi israr ji Bera teleb kir ku ew ji bo serkeftina mislimanan sûnd bixwe. Vêca Hezretê Bera got:

“**Ey Rebbê min, ez bi Te sûnd dixwim ji bo tu li hemberî wan zaferê îhsan bikî û ji bo Tu min jî bi Mezinê me Nebîyyê Ekrem bigihînî!**..”

Heqîqeten di roja pey de zafer bi nesîb bû û Hezretê Bera jî bi şewq şerbeta şehadetê ya ku arzû dikir, vexwar. [310]

309. Tirmizî, Menaqib, 54/3854.
310. Hakim, III, 331/5274.

Mezinê me Pêğember jî dema ji Xuda zafer û arîkarî teleb dikir bi wesîla feqîrên mûhaciran nîyaz dikir û wiha digot:

“*Ji min re zeîfan bang bikin. Lewra bes bi (bereket û dûayên) zeîfên we rizqê we tê dayîn û arîkarî ji we re tê kirin.*” [311]

Di bara bi wesîle-kirina dilên şikestî û mehzûn û bi rizaya îlahî gihiştinê de ev rîwayeta **Malik bin Dînar** jî heta tu bibêjî bes manedar e:

“Mûsa di îltîcayeke xwe ya ji Cenabê Heq de got:

*«-Ya Rebbî! Ez li kuderê li Te bigerim!»*

Ellah Teala got:

*«Li cem dil şikestiyan, li min bigere!»” [312]*

## TEWESSULA BI EVDÊN SALIH..

Evdên salih ên Xuda wesîla rahm û bereketê ne. Ew mirovan ji bo îtaeta Xuda bang dikin û ji bo selametîya ummetê jî dûa dikin. Heke Ellah Teala bixwaze, bi hurmeta van evdên xwe yên ku ji wan hez dike, wê tehlûkên mûhtemel def bike û rahm û nusreta xwe jî lutf bike.

Mûfessir **Bûrsewî** di bara vê ayetê: “**Li wesîleya ku ji Xuda nêzîk dike, bigerin**..”[313] de wiha dibêje:

“Ev ayet, bi awayekî eşkere ferman dike, dibêje; li wesîlê bigerin. Ev, mûtleqa lazim e. Wusleta bi Xuda, bes bi wê tehqîq dibe. Ji wesîlê meqsed, alimên heqîqetê û mûrşidên kamil in.” [314]

311. Ebûdawud, Cîhad, 70.
312. Ebû Nueym, Hilye, II, 364.
313. Maîde, 5/35.
314. Bûrsewî,Rûhû’l-Beyan, c. IV, rûp. 543.

Alimekî salih ê ku ders dide telebê xwe, ji bo gihana wî wesîle ye. Mûrşidên kamil jî wezîfeyeke wekî wê rêberîya ku alim di îlmên zahirî de dikin, di rêyên manewîyatê de îfa dikin, tînin cih.

Naxwe ev wezîfa ku alim û salih berê evdên wî didin alîyê Rebbê wan, ne failîyeteke di mahîyeta ruhbanîyetê de ye. Ew îrşad û îqaz e. Ew di rêyên ku mirov têde birêve diçe de ji rêbertîya ji bo rêwîyan îbaret e. Li hemberî vê di krîstîyantîyê de ruhbanîyet heye. Bi nêrîna wan ruhban, di navbera Xuda û bende de wasîteyeke zerûrî ye. Îslam jî vê red dike. Yanî di navbera Xuda û bende de şexsekî sisêyan nayê tesewwirkirin. Bende, bi şexsê xwe û yekser her demê dikare xwe bavêje ber penaha Rebbê xwe. Mûmîn, sade ji Xuda re îbadet dike û sade arîkarîyê ji wî dixwaze. Çawa Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

اِيَّاكَ نَعْبُدُ وَ اِيَّاكَ نَسْتَعِينُ

“(Rebbê me!) **Em sade evdînîyê ji Te re dikin û em sade mededê ji Te dixwazin**.” [315]

Li alîyê din îhtiyaca însanî ya ji hemû îhtiyacan mezintir, bi selametî derbasbûna wî ji îmtîhana dinyayê û gihiştina Heq e. Dostên Heq ku di vê xusûsê de bi destê însanan digrin û rê ji wan re şanî didin jî ji wan cure wesîleyan e ku Xuda ew ji mirovan re lutf kirine.. Lewra di heman demê de mûnasebetên wan hem bi xelkê re, hem jî bi Heq re hene. Bi vê sebebê ew erka pirekê dibînin ku xelkê digihînin cem Heq.

Seydayê rahmetî yê me yê Farisî **Yaman Dede** ku ew berê krîstîyan bûye, lêbelê bi wesîla **Hezretê Mewlana** û *Mesnewî*’yê hatiye ser hîdayetê, dema jê dihate pirsîn, jê re dihate gotin:

315. Fatîhe, 1/5.

“-Hûn, çima ev qeder ji Mewlana û Mesnewî’yê behs dikin?”

Wî digot:

“-Ewladê min, Mewlana bi destê min girt. Wî ez birim ber derîyê Hezretê Pêğember û ji bo hîdayeta min bû wesîle. Yekî ku ez ji êgir xilas kirime ev qeder di bîra xwe anîna min ji bo wî hindik e jî!”

## TEWESSUL NE ŞIRK E..

Ellah Teala, destûr daye ku însan arîkarîyê ji hev bikin û ferman kiriye ku dema yekî arîkarî ji wî bixwaze jî ew îcabet dike û arîkarî daye.

Eshabê kîram jî arîkarî ji Resûlûllah dixwestin, şefaet jê teleb dikirin, halên xwe yên wekî feqîrtî, nexweşî û deyndarîyê lê erz dikirin, dema ew diketin tengasîyê jî bazdidan diçûn ber destê wî.. Li gorî di gellek rîwayetan de hatiye guhastin; dema halê ziwahîyê zihûr dibû, însan dihatin cem Resûlûllah, ji wî teleb dikirin ku ew dûa ji Cenabê Heq bike û baranê jê bixwaze.

Dema eshabê kîram wiha dikirin jî ev baş dizanîn ku Resûlûllah di gihiştina wan ya ji bo xêran de sade wasîte û sebeb e.. Failê heqîqî Qadirê mûtleq sade Cenabê Heq e. Lêbelê wan hêvî dikir ku Rebbê me, bi hurmeta mehebbeta xwe ya ji Hebîbê xwe, zûtir dûayên wî qebûl bike, bi vê rê tewessul dikirin.. Mezinên me sehabî jî ew kes bûn ku hemin ji me bêhtir dizanîn ka çi “şirk” e, çi jî “tewhîd” e..

Heke mûmînek, tiştekî ku xwe bi wesîle-kirina wî Xuda ferman kiriye ji xwe re bi wesîle dike, ev şanî dide ku ji ber ew îtaeta Xuda yê ku bi wesîle-kirinê ferman kiriye, dike, ew wiha dike;

-haşa- ne ku ji ber ew ji bilî Xuda yekî din ji xwe re wek Reb nas û qebûl dike.

Zêdebarî vê, ew kesê ku tiştek bi wesîle kiriye, ji ber ku ew bawer dike Ellah Teala ji wî kesî yan jî wî tiştî hez dike, ji lewma wî ji bo xwe dike wesîle. Heke ew kesê tewessulê dike, wan tiştên ku ji bo xwe dike wesîle di mewqî û cihekî wilo de bibîne ku ew jî wekî Ellah Teala bi xwe feyda, yan jî zirarê dide, ev, ew dem dibe şirk. Ew kesê ku tewessulê dike, divê zanibe ku ew zatê bi wî tewessul tê kirin dikare sade bi îzna Xuda ji bo xêrekê bibe sebeb, dîsa ew dikare xirabîyekê jî bes bi xwestina Xuda, def bike.

Dema Cenabê Heq çêbûna tiştekî mûrad bike jê re "كن" yanî "**bibe!**" dibêje û ew kar jî çêdibe. Digel vê jî Ellah Teala bi mûqtezaya mûrada îlahî ya xwe teserrufatîya hinek hadîseyan bi hinek bendeyên xwe sipartiye. Çawa di çar melaîketan de jî wisa ye:

Cebraîl bi danezanîna wehyê ji pêğemberan re; Mîkaîl bi sewq û îdarekirina hadîseyên tebîetê; Ezraîl bi qebda rûhan; Îsrafîl jî bi pifkirina di sûrê de hatine wezîfedarkirin.

Cenabê Heq, helbet dikare van wezîfan bêyî wan melaîketan jî bicih bîne. Lêbelê Ellah Teala bi îradeya îlahî ya xwe wezîfe û selahîyeteke wiha daye wan. Ellah Teala ew hêz ji wan re bexş kiriye. Aynî wekî vê ehlûllah jî carina ji bo mûrada Cenabê Heq dibin alet û makes (xuyageh). Qudreta îlahî bi wesîteya wan tê zihûrê.

Mesela şîfa, ji Xuda ye. Lêbelê Cenabê Heq, doktor, derman û hwd. ji bo şîfayê kirine wesîle. Ji lewma divê mirov bi tewessula van wesîleyan li şîfayê bigere. Naxwe ji bo şîfayê serlêdana evdan ji bo nexweşxane û dermanxanê şirk nayê jimartin. Lewra her mûmîn, dizane ku Ellah şîfayê dide; doktor û derman her yek ji wan ji wasîteyê îbaret in.

Digel vê jî hinek mirov, di ğiyaba zatên salih de yan jî di esnaya zîyareta qebrên wan de bi peyvên wekî van; “ey filan zat! Şîfayê bide min! Vê îhtiyaca min bîne cih!” ku rasterast ji wan teleb dikin heta tu bibêjî bes, şaş e û li derîyê şirkê digerin. Bêşiwar heke çi qeder ji bo van cure îfadeyan hinek te’wîl werin kirin jî, lêbelê divê mirov bi dijwarî xwe ji van peyvên cahilane û helwestan biparêze ku ew zirarê bi eqîda tewhîdê ya ğayet hessas digihînin. Lewra eqîda tewhîdê tehemmula wê ji şirîkatîyê re nîn e. “**Rîya**” jî ku di îbadet û amelên salih de ğeyrê Xuda jê re kirin şirîk e jî “şirka nihanî” hatiye jimartin û ew bi dijwarî hatiye menkirin naxwe îcab dike ku mirov bi qet‘îyyet xwe ji van cure bizavan biparêze ku ew bi eşkerehî tehlûka şirkê erz dikin,..

**Welhasil** tewessul, ji ğeyreta ezrkirina merama xwe bi hurmeta zatên ku Cenabê Heq ji wan hez dike, li wî û dan qezenckirina meqbûlîyetê bi dûayên xwe, îbaret e. Heke na, ew ne qudsîyetdana bi evdên salih ên Heq Teala ye.

Divê em vê hîç jibîr nekin ku ji bilî pêğemberan û mirovên ku wan ragihandibin wekî din hîç ji ti kesî re temînat nîn e ku ewê di nefesa dawî ya xwe de bi îmanê here (axretê). Mûmîn, bi sebeb vê fikarê divê her nefesa heyata xwe di nav ğeyreta jîyîna Kîtab û Sunnetê de derbas bike û ew jî her wekî Yûsuf vê nîyazê;

تَوَفَّنِي مُسْلِماً وَأَلْحِقْنِي بِالصَّالِحِينَ

“.. (Ya Rebbî!) **Min wek misliman bimirîne û min bixe nav salihan!**” [316] ji dilê xwe û ji ser zimanê xwe nexe. Divê em hîç ti zemanî halê **Bel‘am bin Baûra**[317] yî jibîr nekin ku piştî ew bi wî meqamî giha, ku pê bikare li Lewhû’l-Mahfûzê meyzîne û wê bix-

316. Yûsuf, 12/101
317. Binêrin. E ‘raf, 7/176.

wîne, dîsa ew li hemberî nefsa xwe meğlûb bû û li xusrana ebedî ket. Yanî bende di kîjan meqamî de dibe bila bibe, ew ji tayînkirina aqîbeta xwe jî nekare ye; tim û daîm îhtiyaca wî bi lutfa Rebbê wî heye.

Rebbê me ji bo lutfê li me bike yek ji wan wesîleyên bêjimar ên ku aferandine jî rojên Remezan û Cejnê ne, ku di wan de adeta rahm, ef û meğfîreta îlahî bi ser ve diherike, dirije. Bi îxlas û semîmîyet bi tewessul-kirina van wesîleyan û xwe parastina ji zayî-kirina van firsendan tebîîtirîn lazimîya fîraseta îmanê ye. Lewra zîyan-kirina van nîmetan, li hemberî Rebbê me yê ku ev nîmet lutf kirine nankorî ye. Ji bo vê Mezinê me Pêğember gotiye:

"*.. Cebraîl bi min hate dîtin û got: «Bila ew kesê ku bi Remezanê bigihe û gunehên wî neyên efûkirin ji rahmê dûr bibe!» Min jî got: «Amîn!»..*"[318]

Divê em hemû hewldan û ğeyretên xwe şanî bidin ji bo em bikarin roj û şevên mûbarek ên ku wesîleya ğufrana îlahî ne, bi awayê layiqê wan, binirxînin û em nebin ji wan ğafilên ku li xusranê ketine.

**Ya Rebbî! Îbadetên me, amelên salihên me, xizmet û ğeyretên me digel qusûr û kêmasîyên me jî qebûl bike! Van tevan ji bo rahm û meğfîreta xwe bike wesîle! Me, bi hurmeta ava rûyê Mezinê me Hebîbê Ekrem, efû bike! Me, bi bendeyên xwe yên ku Tu ji wan hez dikî re bijîne û me bi salihan re heşr bike!..**

**Amîn..**

318. Hakim, IV, 170/7556; Tirmizî, Deawat, 100/3545.



**"Her candarên li sererdê fanî ne."** (Rahman, 55/26.)

# *Hazirîya Axretê û Zîyaretên Qebran*

*Heyateke ku bi tefekkura mirinê nehatibe rohnîkirin, ti ferqa wê ji mûsîbeteke şeva tarî nîn e. Tava seadeta ebedî, ji ufûqên wan kesan dertê ku dilên xwe bi daxuyanîyên îlahî û îrşada wehyê didin, pê dijîn û zanin bi wijdaneke mûsterîh bimirin.*

*Îro ew axa ku em pêlê dikin û bi ser de dibûrin, sibehrojê emê bibin perçekek ji wê. Ji bo sibehrojê em bi nehêjabûna bin-axê dûçar nebin, divê em îro bi seltenetên fanî yên li ser axê û bi surdarî û cazîbeyên nefsanî neyên xapîn. Divê em li dinyayê bi edaya xwe cihî negerin û divê em hîç ji aqilê xwe nederînin ku em rêwîyên mirinê ne, her gav û demê dibe ku em ji bonê werin bangkirin û di zeman û mekanekî nedîyar û mechûl de civanê me bi Ezraîl re heye.*

# HAZIRÎYA AXRETÊ û ZÎYARETÊN QEBRAN

Ev dinya, ji bo însanan û cinan wek mekanê îmtîhanê hatiye aferandin, ew ji bo neqşên hikmet û qudreta îlahî pêşangeheke tije îbret e. Hukmê vê pêşangehê wê bi însanê dawîyê re bigihîje nîhayetê. Yanî kaînat, bi her tiştê xwe ve mirok û fanî ye. Her heybera ku bi hebûnê hatibe anîn ji bo tinebûnê û her candarê/a ku hatibe dinyayê jî bi mirinê mehkûm e. Însanên ji hemû însanan îsyankartir û înkarkertir jî di rojekê ji rojan de bivê-nevê wê stûyê xwe ji bo vê fermana amûtama Cenabê Heq xwehr bike.

Lêbelê ew însanê ku Ellah ê ezelî û ebedî bi xwe ew aferandiye û qabilîyetên mûstesna jê re îhsan kirine, hîç fanîtîyê naxwaze, daîm ji ber mirinê bazdide û li bêdawîtîyê digere. Ev lêgerîn, yek ji xusûsîyetên ji hemû xusûsîyetan bi koktir e ku ew di kûrahîya aferîna wî de hatiye neqşkirin. Ji bo vê, ew însanê ku di dirêjahîya heyata xwe ya dinyayê de di rekeha/qefesa fanîtîyê de hatiye bi hebskirin, ji bo wî meseleya ji hemû meseleyan mûhîmtir ku di hundurê xwe de çareserkirina wê arzû dike, bi berdewamî "**mûammaya mirinê**" bûye..

Însan; di qiwameke wisan de hatiye aferandin ku ji heq û heqîqetê re ram bibe, bi cewhera xwe ji mechûlê re razî nabe. Ew

daîm bi ber malûmê ve bazdide; mechûl, mûbhem û nepêzan, wî ji bo îzdîraba derûnî dûçar dikin.

Bi vê sebebê nedîyarîya aqîbetê, mechûlên di bara heyata piştî mirinê de ji mêj ve, ji roja roj ve zêhn û dilê însanîyetê zehf meşğûl kiriye. Ev mechûlîyeta ku di zêhnan de wekî marekî bijehr xwe li hev badayî û çi wextê xwe bilebitîne jî însanî ji hundurî ve dibizdîne û têdergîn dike, xebat hatiye kirin ji bo bi teleqqîyên curecur serê wê were nixumandin.

Digel vê jî mirin, di rewşa ger û girdabeke dijwar û agirîn de xwe li dora herkesî dipêçe -bê îstisna- ew çetîntirîn mûsîbeta paşerojê ye ku wê bi ser serîyan de bikeve. Dema hal ev be, naxwe bi malûmê ve girêdana wê jî di rêza pêşîna îhtiyacên beşerî de tê.

Heta hest, hizr û hewldan li ser mûammaya mirinê kûr nebin, mirov bi sirrên wî warê paşerojê yê di bin axê de nagihe. Bi tirs û lerze bazdana ji ber mirinê, kerixîna beyhûde; xwe li nedîtina wê danîn û hewldana ji bo jibîrkirina wê, mezintirîn hemaqet e. Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

“**Serxweşiya mirinê, bi fermana heqîyê va ye hat**. (Hey însan) **ha ev e, ewa ku ji roja roj ve tu jê direviyayî!**”[319]

Yanî çawa sitargehek nîn e ku mirov ji ber mirinê pê ve bireve, xebereke halo jî nehatiye bihîstin ku ewê ji ber mirinê revîbin, xilas bûne.

Rûdana mirinê, çi bawer bike, çi jî bawer neke fikareke hevbeşa însanîyetê ye. Însan, heke çi qeder di maneya ku li mirinê bar dikin de ji hev cuda bibin jî lêbelê bi sûalên wekî; “gelo piştî ez bimrim halê min wê çawa bibe?”endîşeya paşerojê ya ku di qelban de girêk lê tê xistin, meseleya mûşterka temamê însanîyetê ye.

319. Qaf, 50/19.

Lewra heyat, heqîqeteke ew qeder ulwî ye ku nakeve mesafa kin a di navbera dergûş û tabûtê de. Dema hal ev bû, heke pirsa “heyat çi ye?” ku di îdraka însanî de xuya dibe, wek bersiv sade ritûbeta axa sar û bêdengîya hişka kevirên mezaran bilind bibe, ji heyateke ev qeder tarî çi tehltir dibe? Însanê ku li hemberî dîmena hatina dinyayê û çûna uqbayê aqîbeta xwe bi xwe difikre, tekane mercî û otorîteya ku wî ji îzdîraba mûammayeke girana alema hundurîna wî ya wisan xilas bike, beyanên îlahî ne. Çareserkirina korgirêka vê paşeroja ku bi tefekkura beşerî fehmkirina wê ne mûmkin e, bi dila xwe bi îrşada wehyê û pêxemberan ve bend e. Tekane derîyê xilasîyê ku însan berê xwe bidiyê ev e; li dinyayê di îstîqameta Qur’an û Sunnetê de bijî û karibe ji bo heyata rastîn û ebedî hazirîyê bike..

Em tev, di mekteba vê cîhana ku warê îmtîhana îlahî ye de, şagirt û xwendekar in. Tahsîla evdînî ya me wê bi tesdîqnameya ecel re bi dawî bibe û emê bi amelên xwe jî di singa axê de werin definkirin. Yanî heyata dinyayê ji mohleteke ku hatî dayîn îbaret e, ji bo em bi rizaya îlahî nail bibin û em bikarin îstiqbal û paşeroja ebedî qezenc bikin.

Di dirêjahîya tarîxa însanîyetê de mirovên ku pişta xwe dane van heqîqetên îlahî, bawerîya xwe bi xurafeyên bêjimar ên bi mirin û ji wê biwêdetir re elaqedar, anîne û nekarîne xwe ji kişkişîna bi ber rêşaşîyên curecur ve xilas bikin. Lewra ew mirin û ji mirinê biwêdetir a ku mijareke di ser aqilan re ye, pîvana wê bi mîzanên îdraka weza ne mûmkin e.

Çendîn ğafilên ku rabûne mefhûmên axretê bi aqilên xwe bipîvin û bidirûn, dema bi beyanên îlahî esilê kar ji wan re tê eşkerekirin jî di şûna ku heqîqetê qebûl bikin de -ji ber ku li xweşîya nefsa wan naçe- carina pê tinaz kirine, carinan jî di nav telaşê de

xwe di îxtîlaf û mûnaqeşan de noq kirine.. Mûşrikên Mekkê ji van ğafilan bûne. Cenabê Heq halê wan wiha eşkere dike, dibêje:

“**Ew pirsa çi ji hev dikin? Ma ew ji xebera mezina ku** (bawerî pê anîne yan jî bawerî pê neanîne) **têde ketine cudahîyê?**” [320]

Mûfessir **Hemdî Efendî** “**xebera mezin**” a ku di vê ayeta pîroz de hatiye beyankirin wiha îzah dike, dibêje:

“Ev xeber, şandina Mezinê me Pêğember e û bi taybetî jî **xebera qiyametê** ye ku wî ew bi Qur’an û nubuwwetê daye zanîn.. Ewên ku îmanê nayênin, di bara bi pêğembertî şandina Mezinê me de ji hev dipirsin; «ev xeber jî çi ye?! Ma ew ev qasid e ku ji terefê Xuda ve hatiye şandin da ku mirovan ji bo bawerîya bi yekîtîya Xuda û axretê bang bike? Ma ew xebera qiyametê çi ye? Mirî wê dîsa werin sağkirin, kî çi kiribe pirsa wê dê ji wî were kirin, ma wisa ye?» Hinek ji wan dibêjin; «wisa ye» Hinek ji wan dibêjin; «ma tiştekî wisan çêdibe?» Hinek ji wan jî dibêjin; «gelo!» û halo tereddud dikin.” [321]

Divîyabû ev xebera îstiqbalê ku **Mezinê me Resûlê Ekrem** daye bi teşekkurê, bi minnetê hatibûya pêşwazîkirin -mixabin- bi tinazan, heqaret û bêganetîyê hate pêşwazîkirin. Tebîîtirîn encameke wê ev e ku însanên ji nefsa xwe re meğlûb, wê aqîbeteke wiha qebûl nekin. Di bara helwesta înad û tekzîbkirinê ya mûşrikan li hemberî xebera heqîqeta axretê ya ku ji wan re hatiye dayîn radixin ber çavan de jî ayeta pîroz wiha dibêje:

“**...Qesem bi Qur’ana şerefmend e ku kafir bi hatina şîyarkerekî ji navbera wan bi xwe şaş û metel man û gotin; «ev**

---

320. Neb’e, 78/1-3.
321. Haq Dînî Qur’an Dîlî, VIII, 488-489.

**çi tişteke ecêb e! Ma piştî em bimrin û bibin ax** (emê dîsa werin sağkirin)**? Ev, vegereke ji aqil re dûr e.**»”[322]

Haleveku ji nû ve sağkirina piştî mirinê, ji bo Rebbê me ne zor e. Di hinek ayetên din de jî wiha hatiye beyankirin:

**“Ma însan nabîne ku me ew ji dilopek ava meniyê aferandiye? Vêca tu dinêrî ku va ye, ew bûye nîqaşkarekî eşkere, dijwar! Xulqbûna xwe ji bîr kiriye û li hemberî me nimûnê eşkere dike, dibêje: Kî ye, ewê ku van hestiyên riziyayî sağ bike? Bibêje: Ewê ku cara pêşîn ew aferandine, ewê wan sağ jî bike. Lewra ew, bi aferîndeyên xwe, xweş zana ye**.”[323]

**“Ma ji însên were ku di piştî ji hev ketina wan de em nikarin hestiyên wî bicivînin? Erê, em dikarin movikên [324]wan jî bînin rewşa wan ya berê**.”[325]

**“Her ew e, yê ku ji tinebûnê mexlûqatan diaferîne, piştre dîsa ewê wê aferandinê** (di qiyametê de) **vegerîne ku ev** (ji nû ve sağkirina piştî mirinê), **ji wî re hêsantir e**...”[326]

Xelkê Mekkê bi taybetî Ebûcehl û terefdarên wî ku xwe ji eşrafan dijimartin lêbelê ji kibr û ğurûra xwe re bûbûn esîr, ji ber ku çavê wan jê re bar nedigirt ku Mezinê me Pêğember wezîfa

322. Qaf, 50/1-3.
323. Yasîn, 36/77-79.
324. Di roja me ya îro de bi navê “daktîloskopî”yê şağeke zanistê heye. Ew, hûrkolînê li ser şopa movikan dike. Ev zanist li holê dideyne ku di dirêjahîya emrê wî de şopa movikên ti kesî hîç naguhere û şopa movikên ti însanekî bi şopa movikên însanekî din re ne aynî ye. Bi vê sebebê, di asayîş û hiqûqê de bi ewletirîn tesbîta nasnamê, bi şopa movikan tê kirin. Ev heqîqet, di dawîya sedsala 19’an de hatiye keşfkirin. Naxwe Qur’ana Pîroz, ji berî sedsalan ve bal kişandiye ser vê xusûsîyeta movikan, bi vî awayî mûcîzeyeke cuda raxistiye ber çavan. Ev jî yek ji wan mîsalên bêjimar e ku Qur’an Pîroz tim û daîm li pêşîyê diçe, zanistên pozîtîf jî wê şerh û tesdîq dikin û li dûv wê diçin.
325. Qiyame, 75/3-4.
326. Rûm, 30/27.

xwe ya nubuwwetê bîne cih, xebera axretê ya ku wî daye wan jî bi heyret û şaşomaşotîyê pêşwazî lê kirin.. Sûretê Nebe, bi behskirina ji vê helwesta menfî ya Qureyşîyan destpê kir û wek bi xebera ku mechûlên piştî mirinê rohnî dike re elaqedar jî gotiye; “**xebera mezin.**” Hikmeta vê jî zehf eşkere ye: Lewra însan, li hemberî mirinê di nav îzdîrabeke mûşterek de ne. Hemû rêyên heyatê diçin û tên û di ufûqa mirinê de winda dibin, ev jî ji kûra kûr ve cerg û hinavan diêşîne. Ji bo mirovên ku dijîn çawa bûyereke ji mirinê mezintir nîn e, xebera ku pişt wê rohnî dikin jî “**xebera mezin**” e.. Ew îdrakên ku vê ezametê fehm dikin, ji lazimîya wan zêdetir xwe xapandina bi nîmetên berwextên fanî terk dikin, dev ji xeyalên îstiqbala derewîn berdidin û berê xwe didin îstiqbala rastîn û ebedî.. Lewra kîjan însanê xwedî aqilê selîm dikare xebera îstiqbaleke wiha mezin piştçav bike?!.

Heyateke ku bi tefekkura mirinê nehatibe rohnîkirin, ti ferqa wê ji mûsîbeteke şeva tarî nîn e. Tava seadeta ebedî, ji ufûqên wan kesan dertê ku dilên xwe bi daxuyanîyên îlahî û îrşada wehyê didin, pê dijîn û zanin bi wijdaneke mûsterîh bimirin. Ji bo vê dînê Îslamê, bi bîranîna mirinê, û di bara wê de meşxûlbûna bi hazirîyê berhema zekayê jimartiye. Çawa pêğemberê Xuda di hedîsa şerîf de dibêje:

“*Aqilmend ew kes e ku li ser nefsa xwe hakim dibe, hesabê jê dipirse û ji bo piştî mirinê kar dike..*” [327]

## WEKÎ KU DI HEMÊZA MIRINÊ DE DIJÎ...

Tam bi berevajî ğafilên ku xwe dixapînin, ji mirinê direvin, beyhûde xwe diwestînin û mirinê ji xwe dûr dibînin, eshabê kîram ên ku bi terbîya nebewî perwerde bûbûn û gihabûn û dostên Heq

327. Tirmizî, Qiyamet, 25/2459.

ên ku li pey rêç û şopa wan diçin jî, bende ne wisa ne ku ev ji xwe re kirin destûra heyatê; ewê xwe ji mirinê re hazir bikin, ewê dem bi dem mirinê di bîra xwe bînin û adeta ewê bi mirinê re di nav hev de bijîn.. Çawa ji eshabê kîram **Ebûhûreyre** mirin ew qeder ji xwe nêzîk didît ku dema wî cenazeyek didît adeta gazî yê mirî dikir û jê re digot: "Here, em jî li pey te tên." [328]

**Hezretê Elî** jî dem bi dem qebr zîyaret dikirin. Rojekê dema jê re gotin:

"-Çi dibe, hema bibêje êdî tu bi qebran re bûyî cîran?" Wî ev bersiv da wan:

"-Ew, cîranê zehf ji we çêtir in. Lewra ew, ji tiştên dinyayî behs nakin. Ew bi lîsanê halên xwe jî tim û daîm axretê vedibêjin.." [329]

Bi rastî milên lawazên peyvan, nikarin giranîya tirsnaka mirinê hilgirin. Her kevirê mezaran ê ku bêdengîya mirinê li xwe kiriye, şîretkarekî peyv-agirîn e, bi lîsanê halê xwe diaxive. Naxwe ji bo mûmînan bextiyarîyeke mezin e ku karibin wan feryadên bêdeng ên ku ji kevirê mezaran bilind dibin, bibihîzin û hiss bikin.

**Hezretê Osman** jî kengê çûbe qebristanê, digirî heta ku riha wî şil dibû. Rojekê jê re hate gotin;

"-Dema behsa Cennet û Cehennemê tê kirin tu nagirî lêbelê çima tu li ber serê mezaran digirî?" Vêca wî ev bersiva wan da û got:

"*-Ji ber ku Resûlê Ekrem gotiye: «Qebr, cihê qunağa pêşî ya rêya axretê ye. Heke însan xwe li wir xilas bike, ya piştî wê hêsan e. Heke ew xwe xilas neke, ya piştî wê hê zortir e.» ez digrîm.*"[330]

328. Îhya, IV, 865.
329. Îhya, IV, 866.
330. Îhya, IV, 866.

**Meymûn bin Mihran** vedibêje:

Em bi **Ûmer bin Ebdûlezîz** re bi rasta qebristanekê ve çûn. Dema wî ceban (mezar) dîtin ew ğemgîn bû. Piştre li min vegerîya û got:

"-Ey Meymûn, ev cebanên bav û kalên me ne. Her wekî ku ew hîç tevlî dinyayê nebûne. De ka binêre, ew çawa di bin axê de mane, cebanê wan kevin bûne, axê bedena wan jî xwariye û ew xilas kirine." Piştre wî bi çavên hêstirbarîn li mezarî meyzand û wiha got:

"-Wellahî, ji wî kesê ku çûbe vî cebanî û ji ezabê emîn bûbe ez nikarim bifikrim ku kesek hebe û bi nîmeteke ji vê mezintir gihabe."[331]

## ZÎYARETÊN QEBRAN

Mezinê me Pêğember di destpêka pêğembertîya xwe de ji ber tehlûka dubare vegerîna li şirkê zîyareta qebran qedeğe kiribû. Lewra însan di serdema cahilîyetê de difikrîn ku rûhên aîdê bav û bapîrên wan qudsîyet qezenc kirine û ew diçûn zîyareta qebran ji bo mezinatîya qewmên xwe ji xwe re bikin îftîxar û wan bi vî awayî pirranîya mirîyên xwe didane pêş. Mezinê me Pêğember ji bo ti eserek ji vî adeta cahilîyetê nemîne, di zemanên pêşîn de zîyareta qebran qedeğe kiribû.

Lêbelê piştî Îslam bi qewwet bû û îman û tewhîd di qelban de baş bicih bûn, ji ber ku êdî cihê ji vê endîşê re nemabû ku însan mezaran biperêsin, mededekê ji wan hêvî bikin, Mezinê me Pêğember bi zîyaret-kirina qebran îzn daye.. Heta wî ziyareta qebran bi van peyvên xwe teşwîq kirine, gotiye:

331. Îhya, IV, 868.

“*Min zîyareta qebran li we qedexe kiribû. Lêbelê vêga herin zîyareta wan. Lewra zîyareta qebran axretê di bîra we tîne*.”[332]

Çawa Mezinê me Pêğember jî dem bi dem şehîdên Uhudê û qebristana Cennetû’l-Baqî zîyaret dikirin û ew bi xwe (ji bo eshabê xwe û hemû mûmînan) di vê xusûsê de dibû nimûne.

Dîsa Hezretê Pêğember li eshabê kîram hîn dikir ku dema ew biçin qebristanan wiha bibêjin:

“*Silav li ser we be, ey xelkê mûmîn û misliman ê vî warî! Înşaellah di nêzîk de emê jî di navbera we de beşdar bibin. Ez ji Xuda dixwazim ku ew hem me, hem jî we efû bike*.” [333]

Dema mûmînek jî biçe qebristanê, pêşî bila silavê li xelkê qebran bike, bila ji bo wan dûa bike û bila tefekkur bike ku ew jî her dê rojekê wekî wan bibe. Çawa ji dostên Heq **Hezretê Hatemê Esam** jî gotiye:

“Ew kesê ku biçe nav qebristanê û dûa ji bo yên li wir dûa neke û (aqîbeta) xwe nefikire; tê jimartin ku wî hem li xwe, hem jî li yên li wir îhanet kiriye.” [334]

Mezinê me Pêğember jî di hedîsa şerîf de wiha dibêje:

“*Mirîyê di qebrê de wekî wî kesî ye ku di behrê de dike bixeniqe û di nav dehşetê de arîkarîyê dixwaze. Ew ji bavê xwe, ji dêya xwe, ji birayê xwe û ji hevalên xwe yên semîmî û sadiq dûayekê çavnêrî dike. Heke dûayek were, ev ji bo wî, ji dinyayê û ji yên di nava wê de bi qîmettir û hezkirîtir e. Bêşiwar Ellah, ji bo ehlê qebrê bi bereketa dûaya mirovên li dinyayê wekî çîyayan ecrê dide.*

332. Tirmizî, Cenaiz, 60; Mûslim, Cenaiz, 106.
333. Mûslim, Cenaiz, 104.
334. Îhya, IV, 868.

*Dîyarîya çêtirîna ku sağ karibin ji mirîyan re bişînin jî ji bo wan îstiğfarkirin û li ser navê wan sedeqe-dan e*." [335]

Di zîyaretên qebran de jî bi taybetî Qur'an xwendin, îcma'ak e, ev bû 1400 sal in ku hatiye tetbîqkirin.[336] Ji bo îstîfadekirina mirîyan jî ji rehma îlahî ya ku ji tîlaweta Qur'anê hasil dibe bi taybetî jî xwendina Yasîna Şerîf usûleke ku herkes pê dizane û wê tetbîq dike. Çawa Mezinê me Pêğember di hedîsa şerîf de gotiye:

"*..Yasîn, qelbê Qur'anê ye. Kesekî ku wê bi telebkirina rizaya Xuda û mala axretê, bixwîne, mûheqqeq gunehên wî tên efûkirin. Sûretê Yasînê li ser mirîyên xwe jî bixwînin."* [337]

Mirov dikare ji bo îstîfada manewî ya ehlê qebran, ayet û sûretên din jî bixwîne. Di bara vê de gellek rîwayet hene. Yek ji wan rîwayetan jî wiha ye:

"*Dema yek ji we wefat bike, wî zêde nedin rawestandin û bibin qebrê. Dema hûn wî defin bikin jî bila yek ji we li ber serê wî Sûretê Fatîhê, li ber lingê wî jî ayetên dawîn ên Sûretê Beqere (Amener-resûlû) bixwîne*." [338]

**Îmam Şafiî** -rahmetûllahî eleyh- jî wiha dibêje:

*"Li ber serê mezarî xwendina ayet û sûretan ji Qur'anê mûsteheb e. Xwendina temamê Qur'anê (xetim-kirina wê) jî sip-ehîtir e."* [339]

---

335. Deylemî, el-Firdews bi-Me'sûri'l-Xîtab, IV, 103/6323; Elî el-Mûtteqî, XV, 694/42783; Xv, 749/42971.
336. Îcma'a: Di hiqûqê Îslamê de çar delîlên esilî hene: Qur'an, Sunnet, Qiyasa Fuqeha, îcma'a ummetê. Îcma'a ummetê; îttîfaqa temamê misliman, bi taybetî jî ya alimên Îslamê ku ji meselê waqif in, li ser mijarekê ye.
337. Ehmed, V, 26.
338. Taberanî, Kebîr, XII, 340; Deylemî, I, 284; Heysemî, III, 44.
339. Newewî, Rîyazû's-Salihîn, Beyrût, Werg. Rûp. 293.

Wekî hate dîtin zîyaret-kirina qebran, silav-kirina li ser yên li wir, dûa û îstiğfar-kirin ji wan re, li ser navê wan kirina xêr û hesenatan, tîlawet-kirina Qur'anê, ji bo mewta (mirîyan) wesîleyeke rahmê ye.

Zîyareta qebran, dema bi rîayetkirina esasên edeba Îslamê were îcrakirin ji bo gellek xêran wesîle ye. Lewra mûheqqeq e ku di netîca tefekkura mirinê de wê îhtîrasa nefsan were şikandin, wê însan hê zehftir berê xwe bide ser teqwayê, ewê bibe xwediyê riqqeta qelbî û ewê xwe ji ğefleta gerê bi edaya xwecihî ya li dinyayê, biparêze.. Qebristan wekî aynekekê ne ku ji bo her însanî îstiqbala/paşeroja wî şanî didin. Heke însan karibe dem bi dem û bi nezara îbretê li vê aynê binêre, ewê xwe ji heyata xwe zîyankirina li dûv hewesên pûç, dûr bigre. Ji lewma zîyareta qebran, ji bo ğeyret û hewldana xwe hazirkirina ji bo mirin û axretê, sipehîtirîn wesîle ye.

Li gorî bawerîya Ehlê Sunnetê, yekî ku dimre, xwedî şiûr e, dibihîze û hiss dike. Ji xêrên ku têne kirin îstîfade dike û keyfxweş dibe. Ew ji şeran jî ezîyet dibîne û ğemgîn dibe. Yanî însan, bi bedena xwe dimre, ne bi rûhê xwe.

Di gellek hedîsên şerîf de hatiye gotin; Mezinê me Pêğember di piştî wefata xwe de tiştên ku têne axaftinê dibihîze, bersiva silavan dide, amelên ummetê li wî têne erzkirin, ew ji bo gunehên ku dibîne îstiğfar dike û bi sebeb hesenatan jî ew ji Xuda re hemd dike. Di ser de jî ev hal, sade ji bo Mezinê me Pêğember tenê ne taybet e. Ev rastî jî di hedîsa şerîf de wiha eşkerekirin:

"*Amelên we, ji eqrebayên we û êlên we yên ku wefat kirine re têne erzkirin. Heke amelên we bi xêr bin ew pê keyfxweş dibin. Heke ne bi xêr bin jî ew dûa dikin û wiha dibêjin; «Xudayê min,*

*wekî ku te em bi hîdayetê gihandine heta tu wan jî bi hîdayetê negihînî, canê wan negire!*»"[340]

Xezûrê **Hezretê Seyyîd Taha l-Hekarî**, qadîyê Nehrî bûye. Wî ew qeder ji vî zavayê mûbarekê xwe hez dikir ku wesîyet kir, got; bila qebra min li ber dergehê bexçê qebra wî, were çêkirin. Ew aşiqên Heq ku dixwazin qebra Hezretê Seyyîd Taha zîyaret bikin, bila rêya xwe bi mezarê min jî bixin û derbas bibin. Belkû bi hurmeta mirovên ku wî zatê mûbarek zîyaret dikin Ellah Teala min jî efû bike. Yan jî ezê bi lêketina axa mezarê min bi lingên mirovên ku têne zîyareta wî, teberruk bikim." [341]

Di hedîsên şerîf de îşaret pê heye ku zatên salih di piştî wefata xwe de jî ji bo derdorên xwe wesîleya rahmê ne. Mezinê me Pêğember di hedîsa şerîf de wiha dibêje:

"*Heke yek ji eshabê min li deverekê wefat bike roja qiyametê ew ji bo ehlê wir wek pêşîvan û nûr tê heşrkirin.*"[342]

"*Mirîyên xwe di navbera însanên salih de defin bikin.*" [343]

Li alîyê din divê mirov di zîyaret-kirina qebrên mezinan de bi titîzî xwe ji hinek helwestan û hinek bid'etan dûr bigre. Wekî li ber serê qebran mûm pêxistin, kinc girêdan û rasterast meded hêvîkirin ji wî zatê di qebrê de nivistîye..

Divê mirov hîç jibîr neke ku kesê di qebrê de razayî çi qeder zatekî mezin dibe bila bibe, bila mirov tiştekî ji şexsê wî nexwaze. Divê mirov bi wesîla qîmet û xatirê wî yê li cem Heq dîsa ji Xuda bixwaze. Lewra tekane mercîyê ku tiştek jê were xwestin Failê

340. Ehmed, III, 164; Taberanî, Kebîr, IV, 129/3887.
341. Ewlîyalar Ansîklopedîsî, c. 11, rûp. 410, Weşanên Tûrkîye Gazetesîyê, Îstanbûl 1992.
342. Tirmizî, Menaqib, 58/3865.
343. Deylemî, Mûsned, I, 102.

Mûtleq, Cenabê Heq e. Heta ew nexwaze hîç ti evd, nikare hîç ti xêrekê bîne meydanê, nikare hîç ti şerrekê jî def bike. Ji lewma rasterast ji mirî-yî xwestin, derî ji şirkê re vedike. Naxwe îqazkirina mirovên ku bi sebeb ğeflet û cehaletên xwe wiha dikin, wezîfeyeke zerûrî ya her mûmînî ye.

Li alîyê din ew mirovên ku dibêjin; emê di vê xusûsê de li dijî zêdegavîyan derkevin lêbelê ew qeder zêde bipêşve diçin heta ku zîyareta qebran ya bi rîayetkirina edeba Îslamê hatî kirin jî “şirk” dijmêrin, ew jî xetayeke wekî vê ji berevajîyê wê ve derdixin meydanê.

Îslam, wekî ku di her meselê de wisa ye di mijara zîyareta qebran de jî îtîdalê esas digre. Peyv û kirinên Mezinê me Pêğember û eshabên wî, di vê xusûsê de nimûneyên ji hemû nimûneyan sipehîtir in. Ew şanî didin ka divê mirov çawa di vê xusûsê de nekeve îfrat û tefrîtê û divê mirov çawa tevbigere.

**Cenabê Heq me tevan, bike ji bendeyên salihên xwe yên xwedî fîraset û besîret ku dikarin her roja xwe wekî roja wan ya dawîyê be wisan bi ğeyret û riqqeteke mezin binirxînin, berî bimrin para xwe ji sirrên mirinê bistînin, ji pencereya axretê ve li dinyayê temaşe bikin, û ji waizên dehşetdarên qebristan lêbelê yên bêdeng û bêpeyv re aşîna bibin..**

**Amîn..**

# Ferheng

### A-a

**Abid**: Îbadetkar. Taetkar. Xwe binimêjêbexş. Ewê ku Xudaperestî, nimêj û taet ji xwe re kiriye pîşe û meslek.

**Al**: Ehl, aîle, ewlad, nesl, kinês, zurrîyyet.

**Amil**: 1. Sebeb. 2. Kirde, ewê ku dike. 3. Faktor, hêman, 4. kartêker.

**An'ene**: Adet, kevneşopî.

**Anafor**: Herka berevajî; ew herka avê, yan jî hewayê ye ku dema li astengekî dikeve û bi şûn de vedigere, di encama wê de ew herka berevajîya ku pêktê.

**Aqilê selîm**: Ew aqilê ku gihaye selametîyê, ew hesta rastgîr, ew aqilê ku dikare qerar û biryarên rast û durust bide.

**Arif**: 1. Zana, aşîna. 2. Ewê ku bi awayê layiq Heq Teala û berhemên wî fehm dike, wan dizane, bi îlmê xwe emel dike, bûye xwediyê îrfanê û gihaye zanîna kemal, merîfet û heqîqetê.

**Ariz bûn**: Piştre hatina meydanê, pişte çêbûn.

**Azade**: Ji qeyd û bendan xilas bûye; serbest, hur, rizgar, riha, felat.

### B-b

**Bab**: 1. Derî. 2. Cihê serlêdanê. 3. Qism, beş.

**Batinî**: Hundurî, nedîtber, tişta ku bi raz û sirr û hikmetan re têkildar e. Navxweyî.

**Bayê seba**: Ew bayê sivik ê ku ji rojhilatî ve tê, bayê hînik, bayê xweş.

**Bêgane**: 1. Bê elaqe. 2. Ne naskirî, biyanî, ecnebî. 3. Di Tesewwifê de ewê ku têkilîya xwe ji dinyayê qut kiriye.

**Behr**: Derya, nebejî.

**Bera**: Heqîqeten.

**Berat**: Ew name, yan jî ferman e ku ji terefê meqamekî bilind ve di bara nîşan, rutbe, meaş û tiştên wekî van de hatiye dayîn.

**Besîret**: 1. Dîtina bi dilî, dîtina rast û biendaz, jîrîtî, şûmbûn. 2. His, dîtina dûr, dûrebînî. 3. Firsend, fehmkirin, kûrbînî. Pêşebînî, dîtina bi qelb e. Dîtina rast û bi endaz, dûrbîn, feraset, fehmkirin.

**Beşer**: Însan, mirov, ne-cin.

**Bey'et**: 1. Hevpeymanîya ku bi zehfî bi girtina bi destan tê kirin û ew soza sedaqet û pêbendîyê ye ku ji bo serokê dewletê tê dayîn. 2. Ketina bin hukmranîya kesekî, îtaet ragihandin.

**Beyhûde**: Bêfeyde, bêmûfa, li ber çav nayê girtin, bêencam, bêmane.

**Beytû'l-mal**: Dirav-xane, ew di hiqûqê Îslamê de navê darayî, malîye, xezîne ye.

**Bi mûcibê**: Bi lazimîya wê.

**Bid'et**: 1. Tişta ku eslê wê di dîn de nîn e, paşê derketiye holê. 2. Ew tişta ku di zemanê mezinê me Pêğemberê Xuda de nebû, piştre bi navê dîn derketiye holê û ketiye nav dîn.

**Bîyokîmyewî**: Tevnên zindî û bûyerên kîmyewî yên bi van tevnan re elaqedar.

**Bunyadner**: Avasaz, çêker.

## C-c

**Cehd**: Hewldan, ğeyret-kirin, karkirin, xebat-kirin, şiğûl-kirin.

**Celal**: 1. Bilindahî, mezinahî, ezamet. 2. Ew sifetên celalî yên Xuda Teala ne ku dijwarî û mezinatîyê îfade dikin her wekî "qehhar, cebbar, mûtekebbir."

**Celb kirin**: Bi terefê xwe ve kişandin, kişkişandin, anîn, vexwendin, gazî kirin.

**Cemadat**: Geljimareya **cemadet** e, bi maneya heyberên bêrûh, bêgîyan, bêcanan e.

**Cemal**: 1. Sipehîtî, xweşikahî, bedewî, delalî. 2. Bedewîya rû. 3. Sipehîtî, ciwanîya hundurîn û derveyî. 4. Bi rehma xwe tecellîkirina Xuda, lutf, riza, îhsan û sifetên wî yên wekî van. Hemberîya Celal e.

**Cemalûllah**: Sipehîtîya bêdawîya Heq Teala.

**Cîdal**: 1. Pevçûn, mûcadele. 2. Mûnaqeşe, axaftina agirîn.

**Cîhanşimûl**: 1. Ewa ku her derê dide ber xwe. 2. Di çapa dinyayê de, di pîvana dinyayê de, bi endaza cîhanî.

**Curum**: Ew sûcê ku cezayê lazim dike.

**Cuz**: Hindik, piçek, kêm.

## D-d

**Dalağ**: Çêlîka hêştira ye, golika deveha ye.

**Dalalet**: Jirêderketin, rêşaşî, ji hîdayetê ketin, ji rêya rast ketin, rêya xwehr, serxweveçûn, meyla batilî, heqnenasî.

**Dasitanî**: 1. Di mahîyeta destanan de, bi awayekî layiqê destanan. 2. Bi qehremanî, bi lehengî, bi mêrxasî.

**Dergehê îzzetê**: Dergehê îzzetê, dergehê bilindahîyê, dergehê mezinatîyê.

**Derûn**: Nav xwe, alema derûnî, alema nava xwe.

**Derûnî**: Qelbî, dilî, tişta bi qelb bend be, ji dil, ji nava xwe. Hinavî, daxilî.

**Dîdar**: 1. Rû, sûret, çehre. 2. Hevdîtin, dîtin. 3. Hêza dîtinê, çav.

**Dîgerkam**: Îsar, dîgerbîn; ewê ku dîgeran dihizire.

**Dîrayet**: 1. Zekawet, agahî, têgihiştin, tijefehmî. 2. Baladest-bûn, dest-bilindbûn, mûqtedirbûn.

**Dûçar**: Mûbtela, bela-lêketî, pêvedayî, hatî-girtî, pêgirtî.

## E-e

**Ebûs**: Rûtirş, rûqermiçî, bêmad, bêkeyf, nedestevîl.

**Ecr**: 1. Ew heqdesta ku wek hembera karekî, yan jî xizmetekê tê dayîn, ucret. 2. Mûkafata manewî ya ku di hembera sewab, sebr û tewekkulê de tê dayîn.

**Efsûn**: Sêhrbazî, cazûbazî, efsûnkarî.

**Eğyar**: Geljimareya **ğeyr** e. 1. Bîyanîyan, dîgeran, dinan, dîtiran, bêganeyan. 2. Ewên ku ji bo heyata tesewwufî ne çavnas û aşna ne, dîgerên me.

**Ehkam**: Geljimareya **hukm** e. Hukman, darazan. Yanî hukm û ferman.

**Ehlûllah**: Ehlê Xuda, xelkê Xuda, peyayê Xuda, ewlîyaûllah, rîcalûllah, welîyan.

**Ehwal**: Geljimareya **hal** e, rewş, wezîyet, dana Xuda, halên manewî.

**Ekolojîk**: Zanista hawîrdorê, hawîrnasî, derdorzanî.

**Elametê farîqe**: 1. Wesfê cudaker. 2. Taybetmendîya karakterîstîk.

**Emrê celîl**: Fermana Xudayê mezin.

**Enanîyet**: Ezîtî, ezperestî, egoîstî, xwedbînî.

**Enbîya**: Geljimareya **nebî** ye. Bi maneya nebîyan, resûlan, şandeyan, qasidan, pêğemberan e.

**Enfûsî**: Tişta ku di nefsê de çêdibe. 2. Tişta ku hatiye hizrkirin, tişta ku xasê zêhnê ferdî ye, subjektîf.

**Entuvîzyon**: His, seh, pêhisî.

**Eqîde**: Îtîqad, îman, bawerîya dînî.

**Erd**: Ax, dinya. Sererd, serzemîn.

**Erkan**: Geljimareya **rukn** e. 1. Ruknan, sitûnan. 2. Esas, bingeh. 3. Giregir, girgirek, mezinên dewletê, yan jî dezgehekê.

**Erş**: 1. Text, ban, çetr. 2. Ew tiştê ku ji ber bilindahîya xwe hemû cisman di nav xwe de dihewîne, ew tiştê ku Xuda li serê îstîwa kiriye. 3. Asîmanê li qata nehan, bilindtirîn qata asîmanî.

**Esef**: Berketin, dilkulî, kovanî, ğemgîn bûn.

**Esma**: Geljimareya **îsm** e, bi maneya navan e.

**Esma'ê îlahî**: Navên Ellah Teala.

**Esrar**: Geljimareya **sirr** e. 1. Sirran, razan, tiştên nehanî. 2. Maddeyeke hişber û tevzênerîyê ye.

**Esrê seadetê**: Ew serdema ku pêğemberê me Hezretê Mûhemmed wek pêğember li dinyayê bûye.

**Estetîk**: Lihevhatî. 1. Bi hesta sipehîtîyê re elaqedar. 2. Bedew, xweşik, tişta ku hesta ciwanîyê dide şîyarkirin.

**Eşqa safî**: Evîna paqij û safî ya ku ji hemû hestên nefsanî berî ye.

**Eşraf**: Geljimareya **şerîf** e. Bi maneya mirovên xwedî şeref û îtîbar e, bi maneya giregir û girgireka ye.

**Eşrefê mexlûqat**: Însan ji hemû mexlûqatan bi şereftir e.

**Etfa nezer**: Çav lê kirin, nêrîn, meyzandin.

**Ewam**: Xelk, amî, ne xewas.

**Ewdet**: Hatina bi şûn de, vegerîn, zîvirîn, fetilîn.

**Ewrad**: Geljimareya **wird** e. 1. Zikrê ku bi awayekî xusûsî tê kirin. 2. Ew beşên Qur'anê ku zehf tên xwendin, peyvên li zimanan.

**Eyan**: Eşkere, belû, xuya, li meydanê, beyan, bi çavan tê dîtin.

**Eza**: Ezîyet, êşandin, tengasî-dayîn, cefa, zulm, jan-pêdan.

**Ezamet**: 1. Mezinatî, bilindahî. 2. Kibr, ğurûr, xwe mezin kirin.

**Ezamî**: Bilindtirîn, pirrtirîn, jortirîn, mezintirîn, gewretirîn.

**Ezkar**: Geljimareya **zikr** e. Zikran, dibîranînan. 2. Dubare dubare bîranîna Xuda bi navên wî yên dîyar û bi dûayên diyar.

**Ez-û-ezî**: Ezperestî, quretî, serxweveçûn, ğurûr.

## F-f

**Fanî**: 1. Mirinber, demî, berwext, xilasber, dawîber. 2. Pirr yextiyar, zehf biemr.

**Fariq**: Cudaker, veqetîner, cihêkar.

**Fasiq**: Ewê ku fermanên Xuda nas û qebûl nake. Ewê jirêderketî, ewê ku gunehan dike. Ewê ku fesadîyê dike. Ewê ku xirabîyê dike. Jirêketî, gunehkar, xirabkar û berbatkar, ewê ku bi bêşermî û heya gunehan dike û dema gunehan dike jî rûyê wî naêşe..

**Fedl û kerem**: Qencî, fezîlet, lutf, comerdî.

**Fehşa**: 1. Ew peyv û karê ku aql û mentiq nikare qebûl bike. 2. Ew halên şehwanî yên ne rewa, fihûş, zina.

**Feqr û Zerûret**: Rewşa bûna di nav xizanî û bêçaretîyê de ye,

**Fer'î**: 1. Ya ne eslî, qismî, di dereca duduyan de. 2. Tefsîlat, kitekiteyî. 3. Ta, şağ.

**Ferağet**: 1. Bi vîyana xwe li heqê xwe bûrîn, terka heqê xwe kirin. 2. Li doza xwe bûrîn. 3. Efûkirin.

**Feraset**: Jîrîtîya zêhnî, qabilîyeta zû fehmkirina tiştekî, ji rûyê wî fehmkirina amadekarî û exlaqê kesekî, hesta çêbûna tiştekî berî hatina wî ye.

**Fesad**: 1. Xirab-bûnî, rizîn, gendelî, karê nelirê. 2. Tevlîhevî, gelacî, nîfaq. 3. Ewê ku tevlîhevî û berdîberdanê derdixe, nîfaqê dike, navbera mirovan xirab dike.

**Fesahet**: Fehmker, meramzelal, daxwazsade. Ew xeberdana ku ji hêla gotin, mane, aheng û rêzkirinê ve bêqusûr e. Bikaranîna zimanî bi awayekî rast, eşkere û rewan, herkbar.

**Fexrê Kaînatê**: Şehnazîya cîhanê, îftîxara kaînatê, bînahîya çavan Hezretê Resûlê Ekrem, serkehnîya şehnazîya hebûnê,

**Feyyaz**: Raweya mûbaleğa feyzê ye. Maneya wê; zehf bi feyz, gellek berhemdar.

**Feyz**: 1. Şîranîya manewî; aramîya dil. 2. Destferehî, bereket. 3. Gihan, kemal û pêşveçûn. 4. Serveçûna avê û rijîna wê ye.

**Feyz-yab**: Feyz-bîn. Ewê bi feyzê gihayî.

**Ficûr**: Gunehkarî, şemitîna exlaqî.

**Fiqh**: 1. Bi awayekî layiq zanîna tiştekî, bi şiûr îdrak-kirin, fehmkirin. 2. Hiqûqê Îslamê.

**Fîraset**: Qabilîyeta têgihiştin, fehmkirin û sehkirina maneyê ye.

**Fisq**: 1. Derketina ji rêya Heq, nankorîya li hemberî Xuda, îsyankarîya li hemberî Xuda. 2. Noqbûna di sefahetê de. 3. Bêdînî, bêexlaqî.

**Fişar**: Zext, serkutî, xurtî.

**Fitne**: 1. Îmtîhan, ceribandin. 2. Eyarkirin, har-kirin, aql ji serî birin. 3. Tevlîhevî, teşqele. 4. Navber xirab-kirin, fesadî.

**Fiyûzat**: 1. Geljimareya **feyz**ê ye. Bi maneya feyzan e. 2. Zêde bûn, zehf bûn. 3. Bereketan, zehfbûnan. 4. Nîmetan, îhsanan. 5. Şîrînî û çêjên manewî.

**Futûr**: Bêzarî, sistahî, westin, kerixîn.

## G-g

**Gem lê xistin**: Asteng-bûn, nehiştina serxweveçûnê ye.

**Geşbîn**: Bi umîd-bûn, bi hêvî-bûn, ji bo paşerojê bi hêvî-bûn, geş dîtin, îyîmserlîk.

**Giriftar**: 1. Girtî, desteserkirî, êsîr, dîl. 2. Mûbtela, girtî, ketî.

**Giring**: Mûhîm, ehemmîyet, pere-pêdan.

**Global**: Cîhanî, alemî, gerdûnî, dinyayî, bi dinyayê re elaqedar, ya hemû dinyayê.

**Gurûh**:1. Qerebaliğ, civak, cemaet. 2. Beşek. 3. Qerebaliğa pûç, civaka nehezkirî, kerî.

**Guzîde**: Bijarde, neqandî, mûmtaz.

**Guzîn**: Bijardin,

## Ğ-ğ

**Ğaib**: 1. Yê peyda nabe, nehazir, berze, winda. 2. Alema ku nayê zanîn. Nedîtber, nenêreber.

**Ğeflet:** 1. Rewşa ğafilbûnê ye. Bêxeberî, hay ji xwe neman. 2. Bi arzûya nefsa xwe kirin, zemanê xwe bi tiştê pûç ve derbaskirin. 3. Bi tiştê ne mûhîm ve mijûl bûn.

**Ğeleta ru'yetê**: 1. Şaşbûna çavan. 2. Ew nezaketa xistina stûyê xwe ya sebebekî, yan jî tiştekî, yan jî rewşeke xiraba ku yekî din bûye sebebê wê; lêbelê ji ber nezaketa xwe ji mûxatebê xwe re nabêje bi sebeb te çêbûye lê dibêje; ez bûme sersebebê wê.

**Ğeraîb**: Geljimareya **ğerîb** e. Bîyanî, nenas, nejime, nejimalê, nedost, ne yar.

**Ğeyb**: Nehazir, ne li ber çavan, ne elenî, nependî, berze.

**Ğeyrê îxtiyarî**: Bê vîyana xwe, bê hemdî xwe, bê haya wî jê hebe, ne di dest xwe de.

**Ğeyya:** Rêşaşî, harbûnî, serxweveçûn. 1. Ew bîra di Cehennemê de ye. 2. Ew cihê ku derketina jê zehmet e.

**Ğezeb**: Hêrs, ğeyd, enirîn, ne razî bûn.

**Ğezeba şahane**: Hêrsa padîşahî, acizbûna wî, qeherîna wî.

**Ğezwe**: 1. Ceng, şerr. 2. Sefera ku li hemberî dijminên Xuda tê kirin.

**Ğibte**: Nîmeta ku li bal yekî din heyî, xwestina wê ji xwe re. Ew berevajîyê hesedê ye.

**Ğufran**: Efûbûn, biber-efûyê ketin.

## H-h

**Hadîsat**: Geljimareya **hadîset** e, yanî hadîseyan, bûyeran, rûdanan, qewimînan, weqaetan.

**Hadîsat:** Geljimareya **hadîset** e, yanî hadîseyan, bûyeran, rûdanan, qewimînan, weqaetan.

**Haiz**: Malik, sahib, xwedî, hilgir.

**Hale**: Ew xeleka ronahîyê ye ku carina li dora heyvê, yan jî rojê tê dîtin.

**Haletê rûhî**: Rewşa gîyanî, halê rûhî, rewşa psîkolojîka însên.

**Halûkar**: Rewş, hal, wezîyet, kar û îş.

**Hamîş**: 1. Daxuyanîya ku li kenarê derî tê nivîsîn, derkenar, haşîye. 2. Ew nivîsa ku di piştî temambûna namê de li binê wê tê danîn.

**Handîkap**: Zorî, asteng, rewşa ne bi dest ve hatî.

**Haris**: Hirsdar, çikûs, temakar, diltêde, dilpêve, ji îhtiyacê bêhtir xwestin.

**Hasîlat**: Berhema ku hatiye meydanê, tişta bidestketî, kar, qezenc.

**Hatif**: 1. Ewê ku nayê dîtin lêbelê dengê wî tê bihîstin. 2. Ew melekê ku ji ğeybê xeberê dide.

**Heddê layiq**: Bi qasî pêwîst, di tixûbê xwe de, di sînorê xwe de, nekêm-nezêde, pîvana di biryarê de.

**Heds**: his, hest, entuvîzyon.

**Helak-xwaz**: Ewê ku helakê dixwaze, tinekirinê dixwaze.

**Helîm**: 1. Sernerm, xuynerm, sakin, aram. 2. Ew navê şîrînê Xuda ye ku bi dilovanî, teennî û nermî bi mexlûqatên xwe re mûamele dike, bi lez ceza nade sûckeran, zû hêrs nabe, bi bêhnferehî hereket dike.

**Helwest**: Tewr, mewqif, sekin.

**Hemaqet**: Ğelaya fehmkirinê, fehmkorî, tênegihayî, berneketî, nefehm.

**Hemdele**: Kurtenivîsa hevoka "**elhemdûlîllah**"e. Ew di kitêban de di piştî besmelê de tê danîn.

**Heml kirin**: Îsnad kirin, lê-anîn, lê barkirin, sebeb şanîdan, westandin, xistin stû.

**Hengame**: 1. Dewr, zeman, çağ. 2. Komele, cemîyet, sazûman. 3. Pevçûn, qerebaliğ, xirecir. 4. Şerr, herb, ceng, pevketin.

**Heqnas**: Ewê ku heq û heqîqetê nas dike û wê qebûl dike. Ewê ku li pey tişta rast diçe.

**Hesbahal**: Hevhal-bûna bi dostanî, hevderdbûn, yarîtî, hevaltî.

**Hesenat**: Geljimareya **hesenet** e, yanî qencîyan, rewşên çak, karên xêrê.

**Hesene**: Qencî, rewşa baş, karê çak û bi xêr.

**Heşr bûn**: Hatin komkirin, hatin cem hev, hatin berhevkirin.

**Heşr kirin**: 1. Kom kirin, berhev kirin, cem kirin. 2. Di roja vejînê de komkirina mirovan li meydana mehşerê.

**Heşr-neşr bûn**. Di nav mûnasebet û têkilîyên zehf nêzîk de bûn, li cem hev bûn û bi hev û din ve kelîn.

**Hevderd**: Hevalderd, hevğem, hevkul, heval-kovan, şirîkê derdan.

**Hevhal**: Ew mirovên ku halê wan dişibihe hev, ewên li ser yekhalî bin.

**Hewa**: 1. Ew arzû, hewes û pê xweşbûna ku bi tiştên nefsê re elaqedar e. 2. Zewqên nefsanî û dil-pêve-mayî.

**Heya:** Şerm, hesta tengavbûnê, reva ji guneh û bizavên der-exlaqî bi sebeb tirs û hezkirina Xuda.

**Heyhat**: 1. Bangnîşana ku ğemgînîyê îfade dike, mixabin, ğebînetê! 2. Ji bo daxwaza ku tehqîqbûna wê ne mûmkin, tê îfadekirin.

**Heysîyet**: Qîmet, biha, şeref, rûmet, îtîbar, navûdeng.

**Hezer**: 1. Rewşa aştiyê, silh, medînbûnî. 2. Rewşa mirovên ku li devereke niştecihbûnê dimînin. Dêmanîtî.

**Hicran:** 1. Cudabûn. 2. Êşa cihêbûnê. 3. Ğema dijwar. Kedera mezin. 4. Ğeyda yarê, terk-kirina yarê ye.

**Hikemî**: Peyv û ramana bi hikmetê re elaqedar.

**Hilm**: 1. Nermahîya di tebîetê însanî de. 2. Rûnermî, bêhnferehî.

**Himmet**: Îhsan, arîkarîya manewî, îtîmada rûhanî.

**Hissîyat**: Geljimareya **hissîyet** e, yanî hisan, hestan.

**Hovîtî**: 1. Hişk û bê usûl. 2. Dijwar, tundrew, mûamelenezan, bênezaket. 3. Xuynexweş, bêteb‘î.

**Hubba îlahî**: Hezkirina îlahî, mehebbeta Xudayî.

**Hûlya**: Xewn, xeyal.

**Huner**: Sen‘at. Pîşe. Marîfet. Zanatî. Hostatî, meharet. Pêhlewanî.

**Hurmetkar**: Ewê ku rêzê ji yekî re digre. Ewê ku dizane xatirê yekî bigre. Hurmetê jê re digre. Bimarîfet, xatirnas.

**Husna qebûl**: Di awayekî baş de qebûl dîtin, bi awayekî baş û sipehî rû şanîdan.

**Husna xatime:** Dawîya sipehî, aqîbeta li ser xêrê, li ser îmanê can dan.

**Husna Zenê:** Geşbînîya di bara tiştekî yan jî kesekî de ye. Zena sipehî, gumana başîyê.

**Husûl**: Bi meydanê hatin, çêbûn, hasilbûn.

**Hz.** Kurte-nivîsa Hezret e. Ew ji bo mêran wek Hezretê, ji bo jinan jî wek Hezreta bikartê.

## Î-î

**Îcab:** Lazim, divê, gerek, pêwîst.

**Îcazet**: 1. Destûr, ruxset. 2. Dîploma.

**Îcra:** 1. Çêkirin, bicihanîn, birêvebirin. 2. Kişandin, herikandin û dan herikandin.

**Îctîhad**: Ew destûr û hukm e ku di fiqhê de xwedî peyv û alimên mezin ji Qur'an û sunnetê fehm dikin, ji wan derdixin û tînin li ber xelkê datînin.

**Îctîmaî:** Civakî, komelayîtî, sosyal, bi civakê re elaqedar.

**Îdlal**: Xistina dalaletê, ji rêya rast derxistin, har kirin, çewt kirin, fehş kirin.

**Îfna**: Tine kirin, xilas kirin, qedandin.

**Îfrat:** Zêdegavî, serxweveçûn, sînorê xwe derbaskirin, ji tixûbê xwe bûrîn.

**Îfsad**: Fesadî derxistin, xirabî, gelacî, tevlîhevî.

**Îfşa**: Eşkerekirina karên nihanî, îlankirina tiştên veşartî.

**Îftîxar:** Şehnazî, pesnê xwe dan, şan û şeref.

**Îğwa**: Harkirin, ji rê derxistin, ayarkirin.

**Îhate**: 1. Dorgirtina li tiştekî, dor lê pêçan. 2. Fehmkirina bi zêhn, eql û zanînê; bi awayekî mûkemmel fehmkirin.

**Îhdas**: Peydakirin, bi holê anîn.

**Îhsan:** 1. Qencîya bi rastî û durustî. 2. Karê tekûz, mûkemmel û bêkêmasî. Ajar, nîmet, xweşî, kerem.

**Îhtîmam**: 1. Bi diqqet kar kirin, bi baldarî tevgerîn. 2. Diqqet şanîdan, baş lê meyzandin.

**Îhtîram**: 1. Hurmet, rêz. 2. Rêz û hurmet şanîdan.

**Îhtîras**: Çikûsîya zêde, arzûya zehf pêgirî, meyla zehf zêde li ser tiştekî.

**Îhtîyat**: 1. Di mijarekê de bi kûr hizirîna paşerojê jî bi diqqet bûn, bi tedbîr hereket kirin. 2. Ew yedek û berdestîka ku ji bo roj û şertên zehmet û zor hatiye veşartin û hiştin.

**Îhya kirin:** 1. Ji nû ve heyat dan qezenckirin, hişyarkirin, vejandin, sağkirin. 2. Bi îbadetê derbaskirina wextekî ye.

**Îhyakar**: 1.Ewê ku ji nû ve heyatê dide qezenckirin, ewê ku dide vejandin, ewê ku dide sağkirin. 2. Ewê ku bi îbadetê wextê xwe derbas dike.

**Îkmal kirin**: Bi kemalê gihandin, temamkirin, xilas kirin, tekûzkirin.

**Îkon**: Di dêra Ortodoksî de teswîra olî, ayînî ye.

**Îktîfa**: Kafî-dîtin, têrêkirin, qenaet pê kirin.

**Îlhad**: 1. Ji bawerîya rast ketin, ji îmanê zîvirîn. 2. Xirabîya bawerîyê, bêdînî.

**Îlhaq**: 1. Dane ser hev, lê zêde kirin, pêvekirin. 2. Gihan, tevlîbûn. 3. Xistina bin hakîmîyeta xwe, xistina bin îdareya xwe.

**Îllet**: 1. Nexweşî, nesağî, xestetî. 2. Sebeb, sedem.

**Îltîca**: 1. Penah xwestin, êwirîn. 2. Pêbawerbûn, xwe pê sipartin. 3. Dûa û lavlavkirin.

**Îma**: 1. Vegotina sergirtî. 2. Vegotina bi îşaretkî. 3. Ew peyv, kelîme û îşareta ku tiştekî di zêhn de zindî dike. 4. Di ber de avêtin. 5. Rasterast negotin.

**Îmaret**: 1. Berhemên mîmarî, avasazî. 2. Sazîya ku bi meqseda arîkarîya hewcedaran hatiye avakirin. 3. Cihê ku têde xwarin ji feqîr, xwendekar û rêwîyan re tê dayîn.

**În'îkas**: Ekis bûn, xuyabûn.

**Înayet**: 1. Diqqet, ğeyret, çavlêkirin. 2. Lutf, îhsan, qencî. 3. Arîkarî, meded-kirin, giringî-pêdan.

**Încîzab**: Cezib-bûn, hatin kişandin.

**Înfaq**: Ji bo mirovekî nefedan û debara wî kirin. Xerckirin, mesrefkirin, mal li yekî-xerckirin.

**Înkîşaf**: 1. Vebûn. 2. Mezinbûn, pêşveçûn. 3. Derketina meydanê. 4. Xuyabûna sirrekî, yan jî halekî manewî.

**Îns û cin**: Însanan û cinan.

**Însîyatîf**: 1. Pêşdestî, pêşdestxerî. 2. Hêza kirina tiştekî berî dîgeran, teqeddum. 3. Di mijara birêvebirina qerarê de wesfê ku di însên de heye.

**Înşîrah**: 1. Vebûn. 2. Singferehî, vebûnî.

**Întîba**: Ew tesîr û şopa ku tiştek, yan jî hadîseyek di zêhn de dihêle.

**Întîqal**: 1. Ji deverekê çûna devereke din, cih guherandin. 2. Wek mîras mayîn. 3. Derbas bûn, sîrayetkirin.

**Întîsab**: 1. Mensûb-bûn, hatin girêdan. 2. Çûna karekî, çûna bi rêyekê ve.

**Înzal**: Peyabûn, anîna xwarê, nazil bûn.

**Îqame**: 1. Xistina cih. 2. Dan rûniştandin. 3. Rakirina ser lingan.

**Îrad kirin**: Gotin, axaftin, peyvdan.

**Îrfan**: 1. Zanîn, fehmkirin. 2. Şîyana bi feyza îlahî zanîna sirrên kaînatê ye. 3. Kultur, rewşenbîrî û çand.

**Îrşad**: 1. Rêya Heq, rêya rast nîşandan, îqazkirin. 2. Di tesewwufê de ew e ku mûrşid rêya Xuda şanî mirîdên xwe bide.

Şanî-dana rêya heq, rêya rast û durust, şiyar-kirin.

**Îrtîhal**: Ji dinyayê mala xwe barkirina ji bo axretê, wefatkirin, mirin.

**Îrtîkab**: Kirina tiştekî ku xirabî, berbatî, gunehî teşkîl dike.

**Îsar**: 1. Îkram. 2. Digel ku ew bi xwe mûhtac be jî dîsa ji nefsa xwe ferağet kirin û îhtiyaca yekî din li pêşîya îhtiyaca xwe girtin.

**Îskan**: 1. Bi cih kirin, însan bi cih kirin. 2. Bi war kirin, bi welat kirin, bi mal û xanî kirin.

**Îstîab**: 1. Di nav xwe de girtin, xistina nava xwe. 2. Girtin, kiraskirin.

**Îstîdad**: 1. Amadehî, hazirî. 2. Ew qabilîyet û meyla tebîî ji bo qebûlkirina tiştekî. 3. Aqilmendîtî. 4. Têgihiştîtî.

**Îstifham**: 1. Pirsa ku zêhn mijûl dike. 2. Bi awayê pirs pirsînê fehm kirin.

**Îstiğfar**: Bi peyva "esteğfîrûllah" tobe kirin, ef û lêborîna xwe ji Xuda xwestin.

**Îstiğna**: 1. Qenaetkirina bi tiştekî hindik, çavtêrî. 2. Bê îhtiyacîtî.

**Îstiğraq**: 1. Noq-bûn, di navê de hatin veşartin. 2. Ji xwe çûn û dinya jibîrkirin. 3. Xeniqîn û noqav bûn.

**Îstixfaf**: Sivik dîtin, nehêja dîtin, biçûkdîtin, giringî-pênedan.

**Îştîğal**: Mijûl bûn, kar kirin, hewldan.

**Îştîğala bi ebesê**: Mijûlbûna bi tiştên ne hewce, kelevajî û pûç re.

**Îştîha**: 1. Meyl, xwestek. 2. Bi dilbijênî û îştah xwarin xwarin e.

**Îştîrak**: 1. Pişkdar bûn, şirîkatîkirin. 2. Beşdar bûn, tevlî bûn. 3. Yekîtî, bi yek-bûn.

**Îştîyaq**: Zehf arzû-kirin, bêrî kirin, bi kelecan dîtin xwestin.

**Îtab**: Azar-kirin, erz-şikandin, pê de ğeyidîn, şermezar-kirin, "ne aferîn ji te re" destê te ne xweş" jê re gotin.

**Îtham**: Xistin bin tohmetê, sûc xistin stû, gunehkar dîtin, sûc jê re îsnad kirin.

**Îtîdal**: 1. Di kirin û dozekê de zêde neçûn, di nîvî de bûn. 2. Nermahî, mûlayîmtî. 3. Wekhev bûn, hevkêş bûn.

**Îtîmad**: 1. Piştpêbestin, pêbawerbûn. 2. Asayîş, ewlehî.

**Îtîqad**: 1. Pêbendbûna bi fikrekê, bi bawerîyekê, îman pê anîn. 2. Bihayên bawerîya esasî. 3. Pêbendbûna qelbî ya bi Xuda, bawerîyeke qet'î.

**Îtîyad**: Bi adet kirin, ji xwe re bi xuy kirin, ji xwe re xistin bi hîndekarîyek.

**Îtmî'nan**: Hizûr dîtin, bi aramîyê gihiştin, ewle bûn, bi hev bawer bûn, li hev ewlebûn.

**Îttîhaz kirin**: 1. Qebûl kirin, hijmartin, girtin. 2. Bi malik bûn, wergirtin. 3. Bikaranîn, şiğulandin.

**Îxlas**: 1. Qelbê xwe safî kirin. 2. Hezkirina Ji dil, semîmî û bêrîyakarî. 3. Durustî û pêbendbûna ku ji hezkirina semîmî tê meydanê. 4. Sirf ji ber ku Xuda ferman kiriye îbadet kirin. 5. Di îbadet û karê ku dike de hîç ti hember û menfîetekê nexistin meqsûd û ğaya esasî; 6 Qencîyên xwe ji bo şanîdana ji mirovan re û ji rîyakarî û zerqekjarîyê dûr bûn.

**Îxtar**: 1. Dibîrxistin. 2. Balkişandin, dêhn kişandin. 3. Tenbih kirin, şîyar kirin. 4. Îlhama ku tê qelb. 5. Pêşagahî.

**Îxtîlat**: Tevlîhev kirin, xistin nav hev.

**Îz'an**: 1. Têgihiştin, fehmkirin, eql. 2. Îtaet, guhdarî-kirina li xeberdanê, stûxwehr-kirin. 3. Terbîye, edeb. Lê guhdarî-kirin, teslîmbûn, terbîye, edeb.

**Îzafe kirin**: Elaqe di navbera du tiştan de sazkirin, bi hev û din ve girêdan.

**Îzafî**: Ewa ku dikare bi pêbendbûnja bi tiştekî ve biguhere, guhêrber.

**Îzah**: Bi eşkerehî li holê danîn. Bi kitekiteyî û tefsîlat daxuyandin, beyan kirin.

**Îzhar**: Da eşkerekirin, şanî dan, da derve, dîyar kirin.

## K-k

**Kafî**: 1. Ew tiştê ku kîfayet dike, têrê dike, îhtiyacê pêşwazî dike. 2. Têrker, digihîyê.

**Kapîtalîst**: Sermayedar, maldar, serwetmend.

**Kefaret**: 1. Paqij bûn. 2. Sedeqe dan, yan jî rojî girtin ji bo dan efûkirina wî gunehî ye ku di encama mecbûrîyetê de hatiye kirin.

**Kelamê kubar**: Peyvên meşhûr û bi qîmet ên ku ketine bin hukmê peyvên pêşîyan, gotinên pêşîyan, derbû-meseleyan.

**Kelb**: Se, kûçik, kûd.

**Kemal**: Gihan, têrê-kirin, temamîtî, tamîtî, bêqusûrî, nekêmî.

**Kemala edebê**: 1. Bi îtînayeke mezin, bi titîzî û diqqet şerm-

kirin, heya-kirin. 2. Nezaket û zerafet şanîdan.

**Kemalat**: Geljimareya **kemal**ê ye. Kamilbûna însanî ji hêla sewîya zanîn û sipehîtîya exlaqî ve.

**Kemmîyet**: Çendanî, hijmar, miqdar.

**Kerahet**: 1. Bêdilî, pênexweşî. 2. Bê keyfa xwe kirina îşekî, ji mecbûrî kirina karekî. 3. Ew kirin, fiêl û tiştê ji hêla dînî ve digel ku nehatiye heramkirin jî lêbelê ji heramîyê nêzîk e.

**Kerem**: 1. Şeref. 2. Esalet. 3. Comerdî, lutf, îhsan. 4. Ew arîkarîperwerî, xêrxwazî û karên sipehî yên ku ji van wesfan têne meydanê.

**Kerîm**: 1. Xwedî kerem, comerd, mezin, bilind, îhsankar. 2. Sifetek ji sifetên Xuda ye.

**Kes xwe nagihîne gwîzeka wî**: Ew qeder bilind e ku kes xwe nagihîne gwîzeka wî. Ew qeder qenc e ku kes nikare xwe bigihîne dereca wî.

**Kesad**: Rewşa Rawestahî ya di kirrîn-firotinê de ye. 2. Tinebûn, ğela, hindikbûnî.

**Kesafet**: 1. Himbizbûnî, tîrbûnî, elêlatbûnî. 2. Şefaf nebûnî, şîlobûnî.

**Kesret**: 1. Pirranî, zehfî, zêdehî, fezlehî. 2. Dijbera wehdetê, qerebaliğî.

**Keyfîyet**: 1. Ew qelîte, hal û rewşa ku tiştek li serê çawa çêbûye. 2. Kar û hadîse.

**Kibrîya**: Mezinatî, bilindahî, ezamet.

**Kîfayet**: Kafî-bûn, têrê-kirin, ne nuqsan, nezêde.

**Kîramen katibîn**: Nivîserên pak, katibên camêr. Ew ferîşteyên ku wezîfa wan nivîsandina sewab û gunehên mexlûqata ye.

**Kufrana nîmetê**: Hereketkirina nankorane, nankorî-kirina li hemberî welînîmetê xwe, qedrnenasî.

**Kullîyat**: Geljimareya **kullîyet** e. 1. Temamîya tiştekî ye. 2. Temamê eserên nivîserekî ne. 3. Hemû berhemên di mijarekê de ne.

**Kunh**: Hemû esasên tiştekî.

## L-l

**Laqeyd**: 1. Bêqeyd, guh nedan, elaqe şanî-nedan. 2. Çi ji min re, serê min pê neketiye, serê min pê naêşe. Ji min re ne lazim e, min navê.

**Laûbalî**: 1. Ewê ku tirs û xwe bişûnde dana wî nîn e, bêhurmet, xatirnenas. 2. Bêteklîf, bêmarîfet. 3. Bêqeyd, bêderd, bêğem.

**Lehwîyet**: Leystik û keyfbûrandin, tiştên bêfeyde.

**Letafet:** 1. Letîftî, şîrînî. 2. Sipehîtî, Xweşikî, bedew. 3. Nezaket. 4. Nermî, bêhnferehî.

**Letîf**: 1. Xweş, nerm, narîn. 2. Bedew, şîrîn, netehl. 3. Rûhanî, ne cismanî. 4. Navek ji navên şîrîn ên Xuda ye.

**Letîfe**: Henek, tinaz, pêkenok, qerf, nukte.

**Lîbas**: Cil, kinc, qîyafet.

**Lîsanê hal**: Zimanê hal, maneya ku ji rewş û tevgeran dertê.

**Lutf:** Kerem, îhsan, arîkarî, camêrî, merdî, qencî.

## M-m

**Mahîyet**: Regeza eslî ya ku tiştekî tayîn dike, Heqîqet, rasteqîne, kakil.

**Makes**: Cihê ku tiştek têde eks dibe, lê xuya dibe, eksgeh, sihxuyageh.

**Makro:** Mezintirîn, ya mezintir, ya gewretir.

**Malayanî:** Bêmane, bêfeyde, gotina pûç, tişta ku mirov elaqedar nake, ew mijûlahî û tişta ku ji bo dîn û dinyaya mirovî feyda nade.

**Malik**: 1. Xwedî, sahib. 2. Ewê ku di tiştekî de teserruf dike, xwedî selahîyet, di dest de.

**Malûl**: Bi îllet, êşdar, jandar, nexweş, xeste.

**Manedar**: Bimane, bisirr, biraz, nevala, nepûç.

**Marez**: Nexweşî, êş, bela û rewşa zor.

**Marîfet**: 1. Hostatîya xasê xwe, meharet, huner. 2. Zanîn, îlm. 3. Agahîya tesewwifî, malûmata bêwesfîya ku pala xwe dispêre îlhamê.

**Masîwa**: 1. Hemû heyberên ji bilî Xuda, ji ğeyrî Xuda. 2. Tiştên bi dinyayê re têkildar.

**Masîyet**: 1. Îsyan. 2. Tişta xirab. 3. Guneh.

**Masûmîyet**: Masûmbûnî, bêgunehî.

**Maşûq**: Yar, ewa ku bi elaqe û evînî tê hezkirin.

**Materyalîst**: Ewê ku materyalîzmê dipejirîne, maddîyatê diperêse, bûjenperest.

**Matûf**: 1. Tewandî, ber bi alîyekî ve hatî wergerîn. 2. Atif jê re hatiye kirin.

**Mazî**: Zemanê bûrî, dema çûyî, wextê derbasbûyî, rabûrî. Berî dema têdeyî.

**Meccanen**: Belaş, hema wilo, wek bêheqdest.

**Meclûbîyet**: Hatin girtin, rewşa aşiqbûnê.

**Mecnûn**: 1. Har û dîn, dîwane. 2. Eql ne temam. 3. Evîndarê dînane.

**Mecra**: 1. Coka avê, ew rêya ku av pê ve diherike, herkegeh. 2. Rêya bûna tiştekî, cihê pê ve çûna karekî.

**Mecûsî**: Agirperest. Zerdeştî, ewê ku dînê Zerdeşt ji xwe re dîn dizane.

**Medar**: 1. Nuqta palpiştê, Sebeb. 2. Wesîle, wasîte. 3. Ew nuqta ku dema tiştekî gerok hereket dike pala xwe didîyê.

**Med-cezîr**: 1. Bi tesîra kişandina heyvê rabûn û nizmbûna ava behrê. 2. Nizmbûn-derketin.

**Medfûn**: Mêrê ku hatiye veşavin, hatiye definkirin, bi axê hatiye sipartin.

**Medh û sena**: Sitayîş, pesn û medhê yekî kirin, bi qencî behsa yekî kirin.

**Mefhûm**: 1. Têgiha, ew maneya ku peyvek wê îfade dike. 2. Tişta ku hatiye fehmkirin, hatiye ber-ketin, têgiha.

**Meftûn**: 1. Dilda, lêketî, mûbtela. 2. Heyran, ewê kudi dereceyeke şaşomaşo-bûnê de sergeşte û heyranmayî.

**Meğfîret**: Lê bûrîna Xuda ji bo gunehê evdê xwe, rehma îlahî, ğufran.

**Meğfûr**: Ewê hatî efûkirin, ewê bi ber efûyê ketî, ewê ku jê re dûa tê kirin ji bo Xuda gunehê wî efû bike.

**Meğmûm**: Ğemgîn, ğemxwar, kedermend, kovandar, mehzûn.

**Meğrûr**: Ğurûrmend, serxweveçû, tixûb-buhêr.

**Mehcûbîyet**: 1. Rewşa mehcûb-bûnê, şermezarî, şermende. 2. Rewşa tişta nixumandî.

**Mehel**: 1. Cih, mekan. 2. Teref, dever, mewqî.

**Mehtav**: 1. Tava heyvê, ronahîya mehê. 2. Heyva çardeh şevî.

**Mehwîyet**: 1. Rewşa xilasbûna ji nuqsanîyên beşerî û dinyayî. 2. Tewazû, nefsbiçûkî.

**Meîşet**: 1. Jîyîn, abûr. 2. Ew tişta ku ji jîyînê lazim.

**Meknûz**: Veşartî, tişta ku di erdê de hatî veşartin û depokirin.

**Melahet:** Bedewîtî, şîrîntî, xweşî.

**Melekût**: 1. Seltenet, hukmdarî, padîşahî. 2. Alema melaîketan û rûhan.

**Melik:** 1. Xwediyê milk; padîşah, hukmdar, kral. 2. Xwediyê hemû heyberan Xuda ye. 3. Mîrê nîvserbixwe yê ji bo hukmdarekî pêbend.

**Menfî**: 1. Neyênî, ne erênî, nelê. 2. negatîf, ne mûsbet.

**Menfîetdar**: Bi havil, bi feyde, bi kar û qezenc.

**Menfîetperest**: Ewê ku menfîeta xwe li pêşîya her tiştî dibîne.

**Menqîbe**: Ew pêkenok, hîkaye û qisseyên wan mirovên ku bi pirranî hatine naskirin, yan jî ketine tarîxê.

**Menzila meqsûd**: Ğaye, hedef, mebest, cihê ku gihiştina wî tê xwestin.

**Menzûme**: 1. Dor, dêzî, taqim. 2. Peyva bi qafîye, biwezn, hûnandî.

**Meqbûlîyet**: Rewşa tiştê ku ji eql nêzîk e, maqûltî ye.

**Meram**: 1. Nîyeta ku di dil de tê bûrandin, daxwaz, arzû. 2. Meqsed. 3. Hedef, nîşan.

**Mercek**: Rojik, adese.

**Merdûd**: 1. Hatiye redkirin, hatiye qewitandin. 2. Hatiye birînkirin, hatiye pûçkirin, fikra nemeqbûl. 3. Ewê ku ji rehma Xuda hatiye qewirandin, melûn.

**Merez:** Nexweşî, êş, bela û rewşa zor.

**Merfû**: (Hedîs û sunnet) Ew fiêl, gotin, yan jî teqrîra ku ji bo pêğemberê Xuda tê hildan, tê îsnadkirin, tê nisbetkirin, jê re merfû tê gotin.

**Mes'ûd**: Bextewar, bextiyar, kamiran, şadiman, dilşad, seadetmend, keyfxweş.

**Mesabe**: Qîmet, hukm, derece, mertebe, misl, wekî.

**Mesh**: 1. Bi dest hekandin, dûtin, seyandin. 2. Di dema desmêjê de bi dest serî vemiştin, şilkirin.

**Mesned**: 1. Ew tişta ku dibe palpişt. 2. Rutbe, meqam, ğaye.

**Mesûlîyet**: Berpirsî, rewşa mesûlbûnê.

**Meşreb:** 1. Xuy, tebîet û mîzaca ku ji xulqîyeta kesekî tê. 2. Adet, kevneşopî. 3. Reftar, bizav, sekn, helwest.

**Meşrû:** 1. Ji bo şerîetê guncaw. 2. Ji bo qanûn û hiqûqê mûnasib. 3. Heqdar, mafdar.

**Meta**: Pertal, mal, serwet, hebûna ku jê re bihayê bazirganî heye.

**Metafizîk**: Ji fizîkê bi wêdetir, ew tişta ku bi hissan nayê îdrakkirin.

**Metanet:** Metînbûn, asêbûn, mûhkembûn, xwegirî, sağlemî.

**Mewa'îza**: 1. Geljimareya **mew'îzet** e. Bi maneya we'azan, nesîhetan, şîretan e. 2. Heramkirin, dan jê dûrkirin, dan jê parastin.

**Mexrec**: 1. Cihê derketina deng û herfan ji dev e. 2. Terzê derketina deng ji dev e, teleffuz e, bilêvkirin e.

**Meyan**: 1. Navber, neqebeyn. 2. Kêm-zêde. 3. Qiwam.

**Mezbele**: Cihê maliştinê, kewaşegeh, ting.

**Mezher**: 1. Cih, tişt û maddeya ku tiştek lê zahir û xuya dibe. 2. Gihayî, naîlbûyî. Ewê rûmet pê hatî dayîn.

**Mezherîyet**: Rewşa xuyabûnê.

**Mezîyet**: Xusûsîyeta ku tiştekî ji tiştên din vediqetîne, wî ji wan çêtir dike û xusûsîyetê jê re bexş dike.

**Mezmûm**: Ewê ku zemma wî hatiye kirin, ewê ku bi xirabî behsa wî hatiye kirin.

**Mihwer**: 1. Çerxa ku vedigere, mîl, yan jî ew tîra ku di nîv tekeran, yan jî tiştên wekî wan de cih digre. 2. Xal û nuqteya giranîya mijarekê ye, wate giringtirîn pişka wê ye.

**Mîkro**: Ew qeder biçûçik e ku bes bi arîkarîya mîkroskopê tê dîtin.

**Mûadil**: Hevkêş, beraber, wekhev, hevmeqam, hevcih.

**Mûamelat:** 1. Kirinan. 2. Di fiqhê de hiqûqê kesayetî û malbatî, eynî heq û mafên ku bi mîras, ticaret, deyn û kar re elaqedar in.

**Mûareze**: pevçûn, kêşmekêşî, şerrê bi peyvê.

**Mûaşeret**: Li navbereke jîyîna xweş pevre bûrandin, edebên mûaşeretê.

**Mûbareze**: 1. Levdan, daberistin. 2. Ew levdana ku du dijmin xwe ji hev û din re berdidin meydanê û lihev dixin.

**Mûbtezel**: Bêheysîyet, bêşeref, rezîl û riswa.

**Mûcahede**: 1. Mûcadele, hewldan, ğeyret. 2. Kirina tişta ku nefsa mirov naxwaze bi vî awayî ji bo gihana hestên manewî terbîyekirina nefsê ye.

**Mûcella**: Ewê hatiye cîlakirin, bicîla, ronak, berraq, hatî berraqkirin.

**Mûcerred**: 1. Xwerû, tişta ku ne cism e. 2. Saf û xalis e. 3. Hatiye tecrîdkirin, hatiye tazîkirin.

**Mûcib**: Ewê ku îcab dike, lazim dike, gerek dike.

**Mûemma:** 1. Ew tişta ku maneya wê zor tê fehmkirin. Asêpirs, pirsgirêk, korgirêk.

**Mûessir**: 1. Ewê ku tesîr dike, şopê dihêle. 2. Ewê ku kederan dide. 3. Ewê ku peyva wî derbas dibe, hukmê wî dimeşe.

**Mûezzeb**: Ewê ku di nav ezabê de ye, ewê ku êş û cefayê dikişîne, ewê ku êş û azarê dibîne. Şkencedîtî. Ezîyetxwarî.

**Mûfredat**: Tefsîlat û kitekitehîya tiştên aîda maddeyekê, yan jî, mijarekê.

**Mûğayir**: Ne guncaw, ne mûnasib, zid, dijber, mûxalif.

**Mûhebbetûllah**: Hezkirina ji Xuda, mehebbeta ji Xuda, unsîyet û ulfeta ji Xuda ye.

**Mûkaleme**: 1. Bi hev re xeberdan, bi hev re mijûl bûn, li pêşberî hev bi hev re axivîn, hevpeyvîn. 2. Mûzakere kirin.

**Mûkerrem**: Bi qedr û qîmet. Bi xatir û marîfet.

**Mûlayîm**: 1. Xuy nerm. 2. Sernerm û bi aheng.

**Mûnacat**: Dûa-kirin, lavlavkirin ji xuda.

**Mûnadî:** Gazîker, banghildêr, delêlî.

**Mûnezzeh**: 1. Bê îhtiyac, yê ku îhtiyaca wî bi ti kes û ti tiştî nîn e. 2. Hatiye paqijkirin, temîz, salim, dûr.

**Mûnkir**: 1. Ewê ku înkar dike, ewê ku qebûl nake, ewê ku tesdîq nake. 2. Ewê ku hebûna Xuda qebûl nake, bê îman.

**Mûqabele**: Li hemberî hev, cewab.

**Mûqabil**: Li hember, bedel.

**Mûqteza**: 1. Tiştê ku îqtîza dikin, tiştên lazim û pêdivî, lazimî, pêdivêyî. 2. Encam û paşînek.

**Mûrad**: Tişta ku tê xwestin, tişta kut ê qesdkirin, mebest, hedef, emanc.

**Mûraqebe**: 1. Li ber çav de, bûna di bin çavan de, di bin pişkinîn û kontrolê de. 2. Nêrîna li alema navxweyî ya xwe û noqbûna di tefekkurê de.

**Mûsamahe**: Çavmiç-kirin, xweşbînî, guhnedan.

**Mûsamehekar**: Ewê ku mûsameha dike, xweş dibîne, çavmiçker, bi tolerans.

**Mûsbet**: 1. Ew tişta ku delîla wê hatiye şanîdan, rastbûnîya wê hatiye fehmkirin, hatiye îsbatkirin. 2. Sağlem, qewîn. 3. Tişta nemenfî, erênî, pozîtîf.

**Mûsebbib**: Ewê ku bûye sebeb, ewê ku rê ji bo bi holê derketina wê vekeriye.

**Mûseffa**: Hatiye safîkirin, hatiye paqijkirin, hatiye li parzûnkxistin, safîyet bidestxistiye.

**Mûsexxer**: Stûxwehr, îzndayî, bidestûr.

**Mûstecab**: Ew dûaya ku bersiva wê hatiye dayîn, ewa ku hatiye qebûlkirin.

**Mûstefîd**: Ewê ku jê îstîfade dike, ewê ku xelk jê werdigre, ewê ku qezenc dike.

**Mûsteğnî**: 1. Bêminnet, ewê ku îhtiyaca wî nîn e. 2. Ewê ku tenezzul nake. 3. Çavtêr, qenaetkar. 4. Ewê ku nazik tevdigere.

**Mûsteheb**: 1. Tişta ku tê hezkirin, li xweşîya însên diçe. 2. Ew tişta ku dîn bi awayekî mecbûrî ferman pê nekirîye jî lê dîsa meqbûl tê hesabkirin; ewê ku wê dike sewabê qezenc dike û ewê ku wê nake jî nakeve gunehan.

**Mûsteheq**: Ewê ku heq kiriye, ewê ku îstihqaqê wî ye.

**Mûsterîh**: 1. Ewê di nav hizûrê de, dilaram, dilrehet. 2. Emîn.

**Mûşahede**: 1. Dîtina tiştekî bi çavan e. 2. Seyira manewî.

**Mûşexxes**: Tişta ku hatiye bişexskirin, bicismkirin, 2. Tişta ku bi çavan tê dîtin û bi destan tê destlêxistin.

**Mûşfiq**: 1. Şefqetmend, şefqetkar. 2. Dilovan, merhemetmend. 3.

Ewê ku elaqedar dibe, giringîyê bi yekî dide.

**Mûşkil**: 1. Zor, dijwar. 2. Zehmetî, asteng.

**Mûşterek**: 1. Hevbeş, hevpişk, tişta ku bi şirîkatî tê bikaranîn. 2. Pevrebûn, bi hev re bûn.

**Mûteal**: Bilind, bala, ulwî, mezin.

**Mûteber**: 1. Bi îtîbar, bi qîmet, xatirê wî tê girtin. 2. Pêbawer, emîn. 3. Derbasdar, rewacdar. 4. Meqbûl, pejirandî.

**Mûteessir**: 1. Histên wî hatine lêxistin, hatiye ğemgînkirin, bi kul û keder, mehzûn. 2. Bandor wergirtî, tesîr lê hatiye kirin, kar têde hatiye kirin.

**Mûtekamil**: Hatiye kamilkirin, hatiye temamkirin, gihaye kemalê, gihaye, pêşveçûye.

**Mûtena**: 1. Bi îtîna, hêjayê diqqetê. 2. Bijarde. 3. Giring, mûhîm.

**Mûttesif**: Ewê ku hatiye wesfkirin, biwesf e, sifetmend e.

**Mûwafiq**: Guncaw, mûnasib, di cihê xwe de.

**Mûwazene**: 1. Wekhevbûna halê du tiştan, hevkêş bûn. 2. Mûqayese. 3. Raman, tedbîr.

**Mûyesser**: 1. Ew tişta hêsan, ewê ku bi sehnayî çêdibe. 2. Nesîb.

**Mûzeyyen:** Hatiye tezyînkirin, hatiye xemilandin, hatiye xweşikkirin, zînetdar, bi xeml û rewş.

## N-n

**Na't**: 1. Wesf, sifet. 2. Ew şêira ku ji bo pesndana Pêğember û çar xelîfeyên pêşîn hatiye nivîsîn.

**Nadîde:** Kêm, giranbiha, biqîmet.

**Naîl:** Pê gihayî, bi hedefê gihayî.

**Naîlîyet**: Rewşa gihaştinê.

**Nar**: 1. Agir. 2. Cehennem.

**Nazan**: 1. Cahil. 2. Hov, bêterbîye, serhişk.

**Nazim**: Tenzîmkar, ewê ku dixe nîzamê, tertîbkar.

**Nebatat**: Geljimareya **nebatê** ye, ew jî giya ye.

**Nedamet**: Nedîm bûn, ji bo kirina şaşîyekê ğemgîn bû û poşman bûn.

**Nedîm**: 1. Hevalê sohbetê, dost, hevdem, demsaz. 2. Ew kesê ku bi hukmdar re hevaltî kiriye.

**Nefha**: 1. Pif kirin, nefes. 2. Bêhna xweş. 3. Careke tenê barîna bayê.

**Nefha'ya îlahî**: Hatina bayê rehma îlahî, ew rûhê ku di însanî de tê pifkirin.

**Nefsanîyet**: 1. Kîn, ğerez, xusûmet, dijminahî, neyartîya veşartî. 2. Arzûyên suflî yên nefsê.

**Neşw û nema**: Gihiştin û mezin bûn, hate ajotin û derket.

**Neşwe**: Serxweşîya keyfxweşî, şadmanî, rûkenî, coş û xuroşî'yê.

**Nezanî**: Cehalet, heddê xwe nezanîn.

**Nezar ber qedem**: Nêrîna li ser ling.

**Nezargeh**: Cihê ku lê tê meyzandin, cihê nêrînê.

**Nezîh**: 1. Paqij, temîz, pak. 2. Sipehî, kubar, nefsezîz.

**Nibiwwet**: Pêğembertî, resûltî, qasidtî.

**Nîsyan**: Jibîrkirin, bi bîrê nehatin, bi aqil nehatin.

**Nizûl**: Ji jorê ve ber bi xwarê ve peyabûn, nazil bûn. 2. Di esnaya rêwengîyê de barê xwe li cihekî danîn.

**Nûranîyet**: Nûrbûnî, ronahî-bûn.

**Nusret**: 1. Arîkarî. 2. Arîkarîya îlahî. 3. Serkeftin, zafer, mûzafferîyet, ğalibîyet.

**Nutfe**: 1. Ava mêranî û jinanîyê. 2. Ava zelal û safî.

## P-p

**Payidar**: Mayende, baqî, sabit, dewamdar, baş bi cih bûyî.

**Perîyodîk**: Tişta ku bi awayekî birêkûpêk, car caran tê dubarekirin.

**Perwerde**: Hatiye xwedîkirin, hatiye terbîyekirin, hatiye gihandin, hatiye mezinkirin, hatiye tealîmkirin.

**Peryodîk**: Dewrî.

**Pîrê fanî**: Ew yextiyarê zehf pîr bûyî, ewê ku ji taqetê ketî.

**Piştpalk**: Rota sitûr û sitûna mezina ku di ber dîwar de tê çikandin ji bo pala dîwêr bikeve serê.

**Pûsûla**: Qiblename, cîhetnuma, şanîder.

**Pût**: Senem, hezkirî, dilketî, mehbûb.

## Q-q

**Qabil**: 1. Cins, nesl, cure, çînî, sinif. 2. Wekî.

**Qadirê mûtleq**: Xuda Teala ye ku ew tekane xwediyê hemû hêz, qewet, şîyan û qudretê ye.

**Qaîm**: 1. Şipya. 2. Mewcûd, heye. 3. Ewê ku cihê tiştekî digre.

**Qal**: Gotin, peyv, kelam, rêza kelîman.

**Qebz kirin**: Bi dest xistin, bi dest girtin

**Qeswet**: Tengasîya hinavî, ğem, kul û keder, qesawet.

**Qiraet**: 1. Xwendin, xwendina bi rêkûpêk û berdewam. 2. Xwendina Qur'anê bi tecwîdkî bi usûl û tertîl.

**Qistas**: 1. Pîvan, mîyar, nisbet. 2. Terazîya mezin, mêzîn, şehîn.

**Qiwam**: 1. Mûnasibtirîn rewşa tiştekî, guncawtirîn dereceya tiştekî. 2. Pêkhatina şertên ku ji bo gihan û kamilbûnê pêwîst in. 3. Palpişt, bingeh. 4. Dereca sitûrîyê, pirr-rengîyê.

**Qiyasa fuqeha**: Ew hukm e ku di wan mijarên têde ness, ayet û hedîseke eşkere nîn e, fiqhzanan ew li mijareke wekî wê ya ku têde ayet û hedîs hene, qiyas kirine û qerar pê dane.

**Qudsî**: 1. Mûqeddes, pîroz. 2. Bi Xuda re elaqeda.

**Qudsîyyet**: 1. Qudsîtî, mûqeddesîyet, mûezzezîtî, pîrozî. 2. Paqijbûnî, temîzbûnî.

## R-r

**Rabîta**: 1. Peywendî, wasîta peywendîyê. 2. Di tesewwifê de eve; mûrîd mûrşidê xwe dihizire û tiştên bi dinyayê re elaqedar ji qelbê xwe derdixe. Dilê xwe bi Xuda û Pêğember ve bend kirin.

**Racî**: 1. Ewê ku vedigere, ewê ku bi şûn de tê. 2. Ewa ku nisbet û elaqeya wê heye.

**Ram bûn**: Mûtî bûn, teslîm bûn, desteber bûn, ketina bin fermana yekî din, têkçûn, têkşikestin, bezîn, binketina xwe qebûlkirin.

**Reaksîyon**: Bertek, berepê.

**Rehabîlîte**: Ew tedawîya ku tê kirin ji bo mirovekî bixe rewşeke wisan ku karibe kar bike, îş bibîne, yan şil û şehtîya wî jê bibe, yan jî têrê-nekirina wî jê bibe.

**Rehîm**: 1. Dilovan, merhemetmend, ewê ku ber dikeve. 2. Cenabê Heq ku di axretê de bi bendên xwe yên mûmîn re bi kerema xwe mûamele dike. 3. Navek ji navên şîrîn ên Xuda ye.

**Rehle'ya tedrîsê**: Li ber destê seydayekî yan jî mûrebbîyekî ders xwendin û di terbîya wî re bûrîn.

**Reqîq**: 1. Zehf tenik, zehf zirav, nazik, narîn. 2. Dilnerm, hestgerm, dildayikî.

**Reûf**: 1. Ewê ku zêde zêde dilovan, diltenik û bi merhemet e. 2. Navek ji navên şîrîn ên Xuda ye.

**Rewa**: Meşrû, hêja ye, layiq e, babet e, di cihê xwe de ye.

**Rexawet**: Rehetî, sistahî, ewlehî.

**Reyîha**: Bêhn, bêhna xweş.

**Rezzaq**: Ellah, ewê ku rizqê hemû mexlûqatê xwe dide.

**Riswa**: Rûreş, riswa, rezîl, nehêja, hetikandî.

**Riyazat**: Geljimareya **Rîyazetê** ye. Ew jî ev e; mirov hindik bixwe, hindik raze, tim îbadetê bike. Bi vî awayî, nefsa xwe terbîye û perwerde bike, bi xwe karibe, xwe li hemberî heramîyê bigre, destê xwe ji zewq û sefaya dinyayê bikişîne û nefsa xwe bişikîne.

**Roja mehşerê**: Roja kombûnê.

**Rûhanîyet**: 1. Atmosfera manewîya bi rûh re elaqedar, halên manewî yên ku rûh teqwîye dikin. 2. Dewamkirina qeweta manewîya mirovekî wefatkirî.

**Ruhbanî**: Terzê jîyana rahib, papaz û keşîşan. Jîyîna li dêrê.

**Rukn**: 1. Her yek ji wan regezên esasî yên ku tiştekî tînin holê. 2. Her yek ji ferzên îbadetekî. 3. Sitûn, girş. 4. Esas, prensîp.

**Ruşd**: 1. Dîtina rêya rast, veqetandina qencîyê ji neqencîyê. 2. Derbaskirina serdema zarokatîyê û gihiştina dema bikaranîna mafên xwe yên medenî.

## S-s

**Sadir bûn**: Derketin, hatina meydanê, xuya bûn, zahir bûn.

**Safîyet**: Xasî, temîzî, pakîtî, paqijîtî.

**Saîq**: 1. Ewê ku diajoyê, ajovan, şifêr. 2. Sebebê taybet. 3. Amil, kartêker.

**Salîha**: Jina qencîkara ku fermanê Xuda tîne cih û xwe ji heramîyên wî vedide, jina dîndar, olperwer, bi îffet, exlaq xweş.

**Salik**: 1. Rêwî. 2. Ewê ku bi rêyekê ve çûye. 3. Ewê ku ketiye rêya terîqetekê, derwêş, mûrîd.

**Se'y û ğeyret**: Xebat kirin, hewldan, cehd kirin.

**Se'y**: Di hec û umrê de ew rêveçûna dîyar a di navbera girên Sefa û Merwê de ye.

**Sebîl**: 1. Rê. 2. Ew çeşme û cihê ku li kenarê rê hatiye çêkirin

û ji bo rizaya Xuda belaş avê dide rêwîyan, sebîlxane. 3. Ew ava ku ji bo xêrê bêbedel tê belavkirin.

**Seda**: 1. Deng. 2. Olan. Ew dengê ku vedide û bi şûn de vedigere.

**Sefahat**: 1. Zêde zêde heyrantîya ji bo keyf û zewqa dinyayî. 2. Îsrafkirina mal. 3. Zewqperestî, keyfperestî.

**Seîd**: 1. Mûbarek, pîroz. 2. Dilşad, bextewar, mesûd. 3. Ewê li cem Xuda meqbûl.

**Sekînet**: 1. Sakin-bûn, tenahî. 2. Hizûr, dilaramî.

**Selahîyet**: Karbidestî, peywirdarî.

**Selamet**: 1. Emînbûn û dûrbûna ji derd, tengasî, qusûr, kêmasî û yên wekî van. 2. Dawîya bi xêr. 3. Riha bûn, xilas bûn. 4. Rastî, salimtî.

**Selaset**: Di îfadê de aheng, zelal, hêsankarî û herkebarî.

**Selefê salihîn**: Di serî de eshabê kîram, tabîîn, tabîê tabîînan tên. Dîsa ew hemû mûmînên ku berî me jîyane, bi îlmê xwe emel kirine û bi exlaqê xwe gihane kemalê.

**Selîm**: 1. Semîmî, temîz. 2. Mûkemmel, tekûz, sağlem, rast. 3. Bê xeter, bê tehlûke, bê zirar.

**Selteneta îlahî**: Hukmranîya îlahî, îhtîşam, mûezzamîyet.

**Selwele**: Ew dûa û selewatên ku li ser mezinê me pêğemberê Xuda têne dayîn.

**Semawî**: 1. Aîdê asîmanî, di bara asîmanî de. 2. Ew mesaja ku ji cem Heq Teala hatiye, ew tişta ku jêder îlahî ye.

**Sethî**: Ew tişta ku di sethê de dimîne, li ser ban dimîne, ewa ku bi awayekî zehf serkorane peya nabe.

**Sexawet**: Kerem, merdî, camêrî.

**Seyr û silûk**: Ew usûl e ku di terîqetê de tê şopandin û taqîbkirin. Ew rêwîtîya manewîya ji bo wusleta Heq Teala ye ku kesê dikeve terîqetê wê dike.

**Sileya rehmê**: Gihandina têkilîya lêzimtîyê, çûna cem lêziman û pirskirina hal û xatirê û arîkarîya wan kirin.

**Silsîle**: 1. Zincîr. 2. Ew helqerêza ku tiştên li hev taqîb dikin, wê pêktînin.

**Silûk kirin**: Pêbendbûna bi mûrşidek yan jî terîqetekê.

**Sîrata mûsteqîm**: Rêya rast û durust, rêya Îslamîyetê. Rêya heq, Rêya rasttirîna ku Xuda jê razî, rêya heq. Rêya ku pêğember, welî, salih, siddîq li serê ne.

**Sîret**: 1. Rewşa manewîya şexsekî, hal, hereket, tebîet,, exlaq û karaktêrê wî ye. 2. Tercuma halê Hezretê pêğemberê Xuda ye. 3. Jînenîgarî, bîyografî.

**Sirûr**: Keyfxweşî, şadmanî, dilşadî.

**Suflî**: 1. Nizm, yê li jêrê, nehêja. 2. Ewê ku qiyafetê wî pîs be, xirpanî, xirto-pirto.

**Sulb**: 1. Ew tişta ku bi marîpişt re elaqedar. 2. Ewê ku ji zurrîyeta kesekî yan jî dola wî tê.

**Sûlte**: Otorîte, desthilat, selahîyet.

## Ş-ş

**Şablon**: Qalib.

**Şamil**: Tevgir, hemûgirtî, Tişta ku dixe nava xwe, dide ber xwe, di xwe de dihewîne.

**Şanê ulûhîyetê**: Meqamê bilindê layiqê ulûhîyetê, şan û wesf.

**Şecaet**: Agîdî, lehengî, mêrxasî, wêrekî, çavnetirsî, dilpakî.

**Şefaeta uzma**: Mehdera mezintirîn. Roja qiyametê şefaet-kirina Mezinê me Hezretê Pêxember ji bo mûmînan.

**Şehadetname**: 1. Dîploma, ew kağeza ku di dawîya xilaskirina mektebekê de tê dayîn. 2. Tesdîqname. 3. Ruxset ruxsetname.

**Şemaîl**: Xuyan, tebîetan, exlaqan.

**Şemûs**: Har, nesernerm, nehir, nehelîm, nestûxwehr.

**Şeqî**: 1. Hereketxirab, xebîs, bedbext. 2. Rêbirr, çete, eşqîya. 3. Rêwîyê cehennemê.

**Şimûl**: 1.Ewa ku dide ber xwe, dixe navbera xwe. 2. Aîdbûn, şanîdan.

**Şiy'û**: Belavbûn, ewa ku ji terefê her kesî ve tê zanîn.

**Şukrana nîmetê**: Zanîna qedrê nîmetê û li hemberî nîmetbexşî tijebûna ji hissên minnetbarîyê.

## T-t

**Tabîîn**: Ewê ku gihaye nifşa sehabîyan û ji wan li hedîsan guhdarî kiriye.

**Tadîlat**: Sererastkirinan, guhertinan.

**Talib**: 1. Ewê ku dixwaze, teleb dike. 2. Telebê medresê.

**Talîm**:1 Ew meşq, xebat û rahênana ku ji bo dan hînkirinê tê kirin. 2. Gihandin, perwerdekirin.

**Tazîm**: Hurmet, rêzgirtin û mezinkirin.

**Te'lîf kirin**: 1. Berhem nivîsandin, komkirin, rêzkirin. 2. Pevxweşkirin, pev-dan-hezkirin, lihevanîn.

**Te'wîl**: Şîrovekirina peyvekê bi maneyeke ji bilî wê maneya ku ji zahirê wê tê fehmkirin.

**Te'yîd**: 1. Xurtkirin, destek-kirin, sağlemkirin. 2. Rast-dêrîn, xurtkirin.

**Teahhud**: 1. Sozdana ji bo kirina tiştek û karekî, hildan ser xwe, li xwe barkirin. 2. Ew girêbesta resmî ye ku di rewşa mirov kar bike de wê li xwe bar dike û xwe jê berpirs dizane.

**Teallûq**: 1. Elaqe, nisbet. 2. Mûnasebet.

**Teat**: Bicih anîna fermanên Xuda, îbadet.

**Teberruk**: Bereket hêvîkirin, pîroz dîtin, bi xêr û bêr jimartin.

**Teberruk**: Bereket hêvîkirin, pîroz dîtin, bi xêr û bêr jimartin.

**Teberruken**: Bi bereket jimartin, mûbarek qebûlkirin.

**Tebîetê eslî**: Exlaqê eslî, rewîştê eslî, xuy û adetê ku ji aferandinîyê tê.

**Tecellî**: 1. Xuyabûn, hatin dîtin. 2. Naîlbûna ji bo kerem û lutfa Xuda.

**Tecellîgeh**: Cihê tecellîbûnê, cihê xuyabûnê.

**Tecessus**: Xebatkirin ji bo hînbûna sirrên kesekî, yan jî hînbûna nehênîyên nava yekî, meraqkirin û lêkolîn kirin ali ser yekî.

**Techîz**: Temamkirina tiştên pêwîst, xemilandin, tekûzkirin.

**Teeddub**: Bi edeb bûn, bi tore bûn, şerm kirin, xwe ji tiştekî nebaş girtin.

**Teessur**: Di bin tesîrê de man, qeremsarî, hêvî-windakirin.

**Tefeyyuz**: Feyz dîtin, pêşveçûn, bilindbûn.

**Tefrît**: Zêde zêde îhmalkirin û sistî şanîdan.

**Tefsîlat**: Kitekiteyî, detay.

**Teheqquq**: Realîze bûn, bicih-hatin, bi meydanê hatin, çêbûn, qetîyet bidest xistin.

**Tehessus**: Bi hest bûn, hismendbûn, hestgerm bûn.

**Tehlîl**: Bilêvkirina peyva tewhîdê.

**Tehmîd**: Hemd kirin, şukr kirin.

**Tehqîqî**: Binbirr, qet'î, ew sirra ku di dereca heqqel-yeqînê de tê zanîn, bi sirr û heqîqeta wê gihayî.

**Tekamul**: Pêşhata ku gav bi gav tê meydanê. Guhertina ku gav bi gav pêktê, bi kemalê gihan.

**Têkdaner**: Xirabker, hilweşîner.

**Tekefful**: Kefîl bûn, kefalet dan.

**Tekfîn**: Bi kefen kirin, kefen lê kirin.

**Tekrîm**: Îhtîram şanîdan, bilindkirin, qedr-girtin, mezin kirin.

**Teksîf**: Himbizkirin, tîrkirin û zehfkirin, reşkirin.

**Telaqqî**: têgihiştin, dîtin-nêrîn, dan hînkirin, wergirtin.

**Telîdank**: Gustîlka dirûnê, gustîloka terzîtîyê.

**Telqîn**: 1. Fikrê xwe dan qebûlkirin, dan hînkirin. 2. Li ber serê yekî ku li ber mirinê be dubarekirina kelîma şehadetê, bi vî awayî pê da gotin e.

**Teltîf**: 1. Dil xweş kirin, dilmisdan. 2. Bi tiştên wekî rutbe-bexşkirinê, nîşan-bexşkirin û meaş zêdekirinê, keyfxweş kirin. 3. Îhsan kirin û bexşîş dan.

**Temayul**: 1. Bi terefekî ve rast xwehrbûn, meylkirin. 2. Terefdarbûna ji bo tiştekî yan kesekî ye, 3. Elaqe-şanîdan e.

**Temayuz**: Xwe şanîdan, bilindbûn.

**Tenasub**: 1. Ji hev re bûn, hev girtin. 2. Bikaranîna peyvên ku elaqa maneya wan pevre heye.

**Tenqîs**: Nuqsan kirin, kêm kirin, hindik kirin, dan xistin.

**Tenzîh**: Pakdêrîn, temîzdêrîn, ji kêmasîyan dûr zanîn.

**Teqdîs**: 1. Rastdêran, mûqeddes jimartin, rast zanîn, pejirandin. 2. Zehf hurmet şanîdan.

**Teqwa**: 1. Tirsa ji Xuda, bi tirsa ji Xuda xwe parastina ji heram û qedeğeyên dînî. 2. Bicihanîna fermanên Xuda û xwe parastina ji nehyên Xuda.

**Terennum**: Strana bi hêdî hêdî gotina ku tesîrê li rûh dike.

**Tereqqî**: 1. Zêdekirin, pêşveçûn, bilindbûn. 2. Hatina ji bo halekî baştir.

**Terkîb**: 1. Ew tişta nû ye ku ji hatin cem hev a çend tiştan pêk tê, sentez. 2. Bi vî awayî pêkanîna tiştekî nû. 3. Temam kirin, taqim. 4. Sazî, rêzkirin, çêkirin, pêkanîn.

**Tertîl**: Bi ciwanî û tecwîdkî Qur'an-xwendin.

**Tesanud**: Palpiştî.

**Tesbîh**: 1. Tenzîhkirina Xuda ji kêmasîyan. 2. Bi subhanellah gotin tazîmkirina Xuda ye.

**Tesbîhat**: 1. Geljimareya **tesbîh**ê ye. Bi maneya tenzîhkirina Xuda ji nuqsanîyan û mezinkirina wî ye. 2. Gotina peyva "subhanellah" e.

**Tescîl**: Di sicîlê de tomarkirin, di deftera resmî de nivîsandin, bi awayekî resmî erêkirin û pejirandin.

**Teserruf**: 1. Selahîyeta bikaranînê. 2. Sahib bûn, xwedî bûn. 3. Bi îdare îstîmalkirin. 4. Tesîra manewî ya welîyan li ser tişt û heyberan.

**Tesewwir**: 1. Di zêhnê xwe de zindîkirin, xeyalkirin, anîn ber çavan, fikirîna tişta ku mirov bike. 2. Fikirîna kirina tiştekî.

**Tesfîye**: Safîkirin, temîzkirin.

**Teskîn**: Rawestandin, hedan anîn, dan sekinandin.

**Teslîmîyet**: Teslîm bûn, stû xwehrkirin, riza şanîdan, îtaetkirin.

**Teswîr**: 1. Resmê yekî çêkirin. 2. Resm, fîgur, portre. 3. Bi nivîsê tarîfkirin. 4. Sûret-zindîkirin, anîn ber çavan, şeklê tiştekî anîn bîra xwe.

**Teşbîh**: Bi hev şibihandin, li hev qiyaskirin.

**Teşehhud**: Di nimêjê de tehîyyat xwendin û rûniştina ji bo tehîyyatê ye.

**Teşne**: 1. Tî, têhn. 2. Bi arzû, bi hewes, xwazyar.

**Teşyî**: Derbaskirina mirovê ku derketiye rê, oğir bi xêr kirin.

**Tewcîh kirin**: 1. Ber-dana alîyekî mûeyyen, vegerandin. 2. Axaftin û xîtabeta ji bo kesekî. 3. Daxuyandin, tefsîrkirin.

**Tewdî kirin**: 1. Bi emanet kirin. 2. Teslîm kirin.

**Teweccuh**: 1. Berê xwe dan. 2. Rûkenîya xwe şanîdan, hezkirin û mehebbeta xwe dan hiskirin.

**Tewekkul**: 1. Bi wekîl kirin, ji dîgeran re hewalekirin. 2. Bi Xuda ewlebûn, di cihê ku hêza mirov têrê nake de mirov hêzê ji Xuda hêvî bike.

**Tewessul**: 1. Wesîle jimartin. 2. Serî lê dan, mûraceetkirin. 3. Bawerkirin.

**Tewsîf**: 1. Wesifandin, mahîyet û wesfên tiştekî li holê danîn. 2. Bi kitekiteyî tarîfkirin, saliğdan.

**Tewzî**: 1. Belavkirin. 2. Dana para her kesî ye.

**Tezkîye**: Paqij-kirina nefsê ji her sifet û meylên xirab, temîzkirin, sipîkirin, bi exlaqê xweş xemilandin.

**Tezyîn**: Xweşik-kirin, sipehî-kirin, bedew-kirin, ciwan-kirin, keşxe-kirin, bi rewş-kirin, xemilandin.

**Ti kes xwe nagihîne gwîzeka wî**: Ew qeder bilind e ku kes xwe nagihîne gwîzeka wî. Ew qeder qenc e ku kes nikare xwe bigihîne dereca wî.

**Tîlawet**: Bi tecwîdkî û bi talîm û usûla wê xwendina Qur'anê ye.

**Tuğyan**: 1. Serxweveçûnî, coşîn. 2. Hiddetbûn, dijwar bûn, harbûn.

**Tuxt**: Gram.

## U-u

**Ucub**: Xwe ecibandin, serxweveçûn, kubartî, quretî.

**Ulfet**: 1. Ji hev re hînbûn. 2. Dostanî, hevaltî, aşînabûn, rind derbaskirin. 3. Hezkirin, mehebbet.

**Umûmî**: Umûmîyet, giştî, tevahî, hemûyî, gelemperî.

**Unsîyet**: Hogirî, demsazî, dostanî, sebrpêhatin.

**Uqba**: Axret, di piştî dinyayê.

**Uxrewî**: Bi axretê re elaqedar, aîda axretê.

**Uziw**: Organ yan jî aza ew perçe ye ku di zindîyan de wî rolek heye û ji bo karekî bikêr tê.

## W-w

**Wacîbû'l-Wucûd**: Ew Xuda yê [heyberê] ku hebûna wî zerûrî ye, hebûna wî bi wî ye, nebûna wî nayê fikirîn.

**Waqîa**: Bûyer, rûdan, çêbûn.

**Wasil**: Gihayî, bi mirada xwe gihiştî.

**Wate**: Yanî.

**Wecd**: Evîn, mûhebbet, heyecana bilind. Hezkirina mirov pê ji xwe diçe û pê dikeve heyecanê.

**Wecîz**: peyv-kurt û manedirêj, manedar.

**Wehdet**: 1. Yek bûn, tek bûn. 2. Yekbûna Xuda.

**Wehm kirin**: Zen kirin, guman kirin, şiwar kirin, şubhe kirin, pûçezen, psîkolojî.

**Weladet**: Zayîn, welidîn.

**Welayet**: Welîtî, dostanî, nêzîkatî, sedaqet.

**Weset**: Navîn, ne îfrat û ne tefrît.

**Wesîle**: Navgîn, wasite, pêgeh. Navgîn, wasîte, neqebeyngîn.

**Wiqû**: Bûn û xilas bûn, bi meydanê hatin, çêbûn.

**Wiqûat**: Geljimareya **weqaet**ê ye. Bi maneya ew tiştên ku çêbûne, ew bûyerên ku qewimîne, ew hadîseyên ku hatine meydanê.

**Wiqûf**: Bi kûrahî fehm kirin, zanîn, xeberdar bûn.

**Wird**: 1. Ew beşa Qur'anê hatiye veqetandin ji bo her roj ew were xwendin; ew ayet, selewat û dûayên ku di hinek wextên dîyarkirî de bi awayekî birêkûpêk tê xwendin. 2. Ew dersa ku mirîd her rojê dûbare û mûzakere dike.

**Wuslet**: Gihiştina tiştekî, pevgihan, wîsal.

## X-x

**Xaliq**: Ew navê Cenabê Heq e ku mexlûqatên xwe diaferîne, ji edemê tîne wicûdê.

**Xalîsane**: 1. Semîmî, bi awayekî ji hisên baş têr û tije. 2. Ew bizava ku ji bo mirovê semîmî layiq û babet.

**Xassû'l-xewas**: **Xass**, bi maneya taybettirîn e. **Xewas** jî geljimareya **xas** e. 1. Bijardetirînan, mezinan, qencan. 2. Xwenda, rewşenbîran, ronakbîran, kulturmendan. 3. Endam û mensûbên tarîqetê.

**Xeslet**: 1. Xuy û xusûsîyeta zikmakî, ya ku hi xulqîyetê tê. 2. Xuyê xweş, taybetmendîya sipehî.

**Xeşîn**: Dijwar, tund, serhişk, şikîner.

**Xeşyet**: 1. Tirs û xewf. 2. Hurmeta li hemberî heybeta menewî.

**Xeşyetûllah**: Tirsa ji Xuda, sawa ji Xuda.

**Xetim-kirin**: Bi dawî-kirin, xilaskirin, paşî-lêanîn.

**Xewas**: Geljimareya **xas** e. 1. Bijardeyan, mezinan, qencan. 2. Xwenda, rewşenbîran, ronakbîran, kulturmendan. 3. Endam û mensûbên tarîqetê.

**Xîlaf**: 1. Li dij, zit, berevajî. 2. Li hev nekirin, mûxalefet. 3. Dev jê berdan, jê vegerîn.

**Xilas**: Xilas bûn, temam bûn, bi dawî hatin.

**Xîtam**: Bi dawî bûn, paşî lê hatin, bi encam bûn, xilas bûn, qedîn.

**Xudû**: 1. Nefsbiçûkî, dilnizmî. 2. Îtîrafkirina evdî bi eczîyet û hîçbûna xwe li hemberê Rebbê xwe.

**Xulase**: Bi kurtî, wek xulase.

**Xusûmet**: Dijminahî, nedostî, neyartî, nehezî.

**Xuşû**: 1. Li hemberî Xuda bitirs û bi hezkirin îtaet kirin, ew halê ku ji vê hestê tê meydanê. 2. Dilnizmî, nefsbiçûkî, tewazû.

**Xwedğem:** 1. Xwedbîn, ewê ku tenê dibîne, ezperestî, tekebbur. 2. Ewê ku menfîeta xwe tenê dihizire.

## Y-y

**Yeqînen**: Bi awayekî bê şubhe kirin û bi yeqînî, bi awayekî sağlem û bı qet'î zanîn.

## Z-z

**Zahir:** 1. Tişta ku tê dîtin, xuya, elenî, eşkere. 2. Dîmena derveyî. 3. Tabîî, bêguman.

**Zahirî**: Bi xuyahî, bi awayê li ber çavan,

**Zebûn**: 1. Zeîf. 2. Bêtaqet, bêhêz, bêmecal. 3. Bêçare, reben 4. Kedermend, dilbikul.

**Zelle**: 1. Meyldan. 2. Pê şemitîn.

**Zem kirin**: Bi xirabî behs kirin, eybdar kirin.

**Zewat**: Geljimareya **zat** e. Yanî şexsan, kesan.

**Zewc**: Mêr, zilamê bi jin.

**Zewce**: Jina nîkahkirî, jina bi mêr.

**Zihûr**: Bi meydanê hatin, hasil bûn, xuya bûn, çêbûn.

**Zihûrat**: Geljimareya **zihûretê** ye, ew tişta rûdaye, xuya bûye, hatiye dîtin. 1. Yên zahir, yên hatine holê. 2. Ew halên ne di hesabê de, ewên ku ji nişka ve hatine holê.

**Zimmet kirin**: 1. Hildan ser xwe. wezîfe dan, berpirs-kirin. 2. Deyndar kirin. 3. Xistin bin hîmaye û parastinê.

**Zînet**: Sipehîtî, bedew-bûn, xweşikbûn, bixeml-bûn, birewş-bûn, keşxe-bûn.

**Zuhd**. Ji heddê wê bêhtir qîmet bi dinyayê, bi maddîyatê û bi menfîetê nedan, reğbet jê re şanî nedan, pê qenaet neanîn, derketina li hemberî her tiştên dinyewî, nefsanî û zewqî û xwe dana bi îbadetê.